



K.T.

Zanîngeha Mardin Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

**DÎWANA LAXER / MELA UMERÊ AŞIQ**

**(Metin û Lêkolîn)**

Hacı YILMAZ

11711003

Şêwirmend

Doç. Dr. Hayrullah ACAR

Mêrdîn 2019

K.T.

Zanîngeha Mardin Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

# **DÎWANA LAXER/MELA UMERÊ AŞIQ**

**(Metin û Lêkolîn)**

Hacı YILMAZ

11711003

Şêwirmend

Doç. Dr. Hayrullah ACAR

Mêrdîn 2019

## QEBÛL Û PESENDKIRIN

Teza bi navê *Dîwana Laxer Mela Umerê Aşiq (Metin û Lêkolîn)* a ku ji aliyê Hacı Yılmaz ve hatîye amadekirin û di tarîxa 09.01.2019ê da di Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî da hatîye parastin ji aliyê jûriya me ve wek Teza Lîsansa Bilind hatîye qebûlkin.

[ im z a ]

Doç. Dr. Abdurrahman ADAK

---

[Unvan, Nav û Paşnav] (**Serok**)

[ im z a ]

Doç. Dr. Hayrullah ACAR

---

[Unvan, Nav û Paşnav] (Endam)

[ im z a ]

Dr. Öğr. Üyesi Nesim SÖNMEZ

---

[Unvan, Nav û Paşnav] (Endam)

### **Pesendkirin**

Ez pesend dikim ku imzayên jorîn ên endamên hîndekarîyê yên navborî ne.

Imza

Doç. Dr. Yunus CENGİZ

Unvan, Nav û Paşnav

Rêvebirê Enstîtuyê

## KURTE

### DÎWANA LAXER

#### (Metin û Lêkolîn)

Laxer yek ji şairên helbesta klasîk a kurdî ye ku di dawîya sedsala 19em û di nîvê pêşîn ê sedsala 20em da jîyaye (1866? – 1927). Ew li devera Miksê li gundê Tînîsê hatiye dinê û niha li gundê Zivistanîyê ya Artemêta Wanê medfûn e. Ji malbateke malmela ye û binemala wan ji herêma Behdînanê tê.

Wî di medreseyên navdar ên wek Medreseya Mîr Hesenê Welî, Medreseya Sor û Medreseya Arwasê da xwendîye. Wek şairekî mutesewif, ew girêdayî terîqa neqşibendîyê bûye û di babeta edebîyatê da jî di bin tesîra Melayê Cizîrî da gelekî maye. Helbestên wî bi temayên wek tesewifî, evînî, dînî û siruştî sêwirîne. Dîwana wî ya ku di destê kurê wî da mabû rojekê duçarî lehîya ba û baranê dibe û jê encax, bîst û heşt lib kurmancî, yek farisî û yek erebî; bi tevahî sih lib helbest dimînin. Laxer bi van her sih helbestên bijare ve derbasî dîroka helbesta kurdî ya klasîk dibe.

Di nava gel da wek Mela Umerê Aşiq an jî Mela Umerê Tînîsîyê Miksî tê nasîn, bes lew ku wî di helbestên xwe da wek mexles Laxer bi kar anîye, di dîroka lîteratura helbesta kurdî da wek şair Laxer tê zanîn.

Di vê xebata xwe da em bi gelek alîyan ve li ser jîyan, berhem, hizr û Dîwana wî sekinîne û bi rûxsarî, tematîk û naverokî, me tehlîl û dahûrînên berfireh kirine.

**Peyvên Sereke:** Laxer, Mela Umerê Aşiq, Miks, Edebîyata Klasîk, Dîwan, Tesewuf

## ÖZET

### LAXER'İN DÎWANI

#### (Metin-İnceleme)

Klasik Kürt Şiirinin şairlerinden biri olan Laxer 19. Yüzyılın sonlarında ve 20. Yüzyılın ilk yarısında yaşamıştır (1866? – 1927). Müküs bölgesindedir; adı Tinis olan bir köyde doğmuştur. Mezarı da şu anda Van Edremit'e bağlı Elmalı (Zivistanî) köyündedir. Medrese geleneğinden gelen Laxer'in aile kökeni Behdînan bölgesine dayanır.

Mir Hesên Veli, Kırmızı Medrese ve Arvas Medresesi gibi, yaşadığı coğrafyanın en meşhur medreselerinde dini ve edebi eğitimini gören Laxer, tasavuf ehlidir ve Nakşî tarikatına intisabı vardır. Edebi olarak Melayê Cizirî'den çok etkilenen şair, şiirlerinde daha çok din, tasavuf, aşk, tabiat temalarını işlemiştir. Şiir divanı, oğlu döneminde bir sel felaketine maruz kalır ve büyük zarar görür. Çoğu artık okunamaz hale gelir, ne var ki oğlu yine de biri arapça, biri farsça ve yirmi sekiz tanesi de kürtçe olmak üzere otuz tane şiirini kurtarıp yeniden yazmayı başarır. İşte bu otuz güzel şiiri ile Laxer olarak kürt edebiyatı tarihine geçer.

Halk arasında Mela Umerê Aşiq ya da Mela Umerê Tînîsî olarak bilinen Laxer, şiirlerinde Laxer mahlasını kullandığı için edebiyat sahasında şair Laxer olarak tanınır.

Bu çalışmamızda, onun hayatı, divanı ve görüşleri üzerine detaylı durmanın yanı sıra şiirleri hakkında biçimsel, içeriksel ve tematik tahliller yaptık.

**Anahtar Kelimeler:** Laxer, Mela Umerê Aşiq, Müküs, Klasik Edebiyat, Divan, Tasawuf

## ABSTRACT

### LAXER'S DÎWAN

(Text and Analyse)

As one of the poets of kurdish classic literature, Laxer lived in the begin of 19th century and the first half time of 20th century (1866? – 1927). He was born in a village named Tînîs of Miks/Bahçesaray. His tomb is now in a Van Edremit's village named Zivistanî. He comes from a mullah family and the base of his family goes to Behdînan region.

As a religious pupil, he went to some famous madrasahs such as Mîr Hesenê Welî, Sor and Arwas. He was related to Naqşî tarîq and in the terms of literary he was extermely affected by Melayê Cizîrî who was the greatest poet of kurdish classic literature. His poetica is consisted of mistisizm of Îslam, religion, love and natural affects. One day his diwan was exposed to a rain flood and mostly damaged during the time of his son. However, one arabic, one persian and twenty eight kurdish, in total thirty poems were rescued and they were rewritten again by his son. Thus he has been considered as a crucial poet in the history of kurdish literature of classic.

He is known as Mela Umrê Aşiq or Mela Umerê Tînîsî in public, but because that he used Laxer as his nickname through his poems, he is named and known poet Laxer in the area of literature.

Through this work, we have focused on his life, opinions, works and poems in many ways. Many detailed analyses have been made on his poems in terms of form, content and themes.

**Key Words:** Laxer, Mela Umerê Aşiq, Miks, Classic Literature, Diwan, Sufism

## NAVEROK

KURTE.....	ii
ÖZET.....	iii
ABSTRACT.....	iv
NAVEROK.....	v
PÊŞGOTIN.....	xii
KURTEBÊJE.....	xiv
DESTPÊK.....	1
1. Kurtenêrîneke Giştî Derbarê Miksê Da Ku Laxer Tê da Jîyaye.....	1
1.1.Kurtedîrok.....	1
1.2.Berhemên Dîrokî.....	3
1.3.Çand û Erdnîgarî.....	6
1.4.Aborî.....	8
1.5.Tevna Civaksazîyê.....	8
1.6.Kurtenêrînek li Mîrektîya Miksê.....	9
1.7.Kelepora Xwendin û Ilmê ya li Miksê.....	15

## BEŞA YEKEM

1. JÎYANA LAXER/MELA UMERÊ AŞIQ.....	19
1. 1. Nezelalîyên Der Barê Nasnavê Laxer û Ronîkirina Mijarê.....	19
1. 2. Herêm û Malbata Wî.....	21
1. 3. Agahîyên Der Heqê Jîyana Wî.....	22
1. 4. Terîqet û Ramana Wî ya Tesewifî.....	24

1. 5. Mirina Wî.....	26
1. 6. Alim û Edîbên Malbata Wî.....	27
1. 6.1. Mela Xurşîd .....	27
1.6.2. Mela Nuredîn.....	28
1.6.3. Mela Evdilmecîd.....	28
1.6.4. Mela Eta Beyaz.....	29

## **BEŞA DUYEM**

### **2. VEKOLÎNA DÎWANA LAXER**

2.1.ZIMAN Û KESAYETÎYA EDEBÎ YA LAXER.....	30
2.1.1. Dîwana Wî.....	30
2.1.2. Zimanê Wî.....	32
2.1.3. Mezmûnên Hatine Bikaranîn di Helbestên Wî da.....	34
2.1.4. Biwêjên Hatine Bikaranîn di Helbestên Wî da.....	36
2.1.5. Hêmanên Erebî, Farisî û Tirkî.....	38
2.1.5.1. Hêmanên Erebî.....	38
2.1.5.2. Hêmanên Farisî.....	39
2.1.5.3. Hêmanên Tirkî.....	40
2.1.6. Hunerên Edebî.....	41
2.1.6.1. Tezad.....	42
2.1.6.2. Telmîh.....	43
2.1.6.3. Teşbîh (Wekandin).....	44
2.1.6.4. Tenasub .....	45
2.1.6.5. Teraduf (Hevwateyî).....	46
2.1.6.6. Mubalexe (Zêderewî).....	47
2.1.6.7. Kînaye (Sergirtî).....	48
2.1.6.8. Îstî'are.....	49
2.1.6.9. Te'rîz .....	50

2.1.6.10. Lef û Neşir.....	51
2.1.6.11. Tersî' .....	52
2.1.6.12. Î'ade (Lêvegerandin).....	53
2.1.6.13. Îqtîbas.....	54
2.1.6.14. Teşxîs (Kesatîpêdan).....	55
2.1.6.15. Nîda (Bangewazî).....	56
2.1.7. Kesayetîya Wî Ya Edebî.....	56
2.1.8. Mexlesa Wî.....	62
2.1.9. Şaîrên Ku Laxer Di Bin Bandora Wan Da Maye .....	62
2.1.9.1. Melayê Cizîrî.....	63
2.1.9.2. 'Ela el Mu'arr'i.....	69
2.1.9.3. Feqîyê Teyran.....	70
2.1.9.4. Ehmedê Xanî.....	72
2.2.TAYBETÎYÊN RUXSARÎ .....	73
2.2.1. Şiklê Tertîbê.....	73
2.2.2. Şiklên Nezmê.....	74
2.2.2.1. Qesîde.....	75
2.2.2.2. Xezel.....	75
2.2.2.3. Mustezad.....	76
2.2.2.4. Murebbe.....	77
2.2.2.5. Muxemmes .....	77
2.2.2.6. Texmîs.....	78
2.2.3. Wezin.....	79
2.2.3.1. Îmale.....	80
2.2.3.2. Zîhaf.....	80
2.2.4. Qafîye.....	81
2.2.4.1. Qafîyeya Mucerred .....	81
2.2.4.2. Qafîyeya Murekkeb.....	81
2.2.4.3. Qafîyeya Murdef.....	82

2.2.4.4. Qafiyeya Muqeyyed .....	82
2.2.5. Redîf.....	82
2.2.5.1. Redîfên Biqertaf.....	83
2.2.5.2. Redîfên Bêjeyî.....	83
2.2.5.3. Redîfên Kombêjeyî.....	83
2.3.CUREYÊN EDEBÎ YÊN TEMATÎK.....	84
2.3.1. Munaca'at.....	84
2.3.2. Ne't.....	85
2.3.3. Hicvîye.....	86
2.3.4. Medhîye .....	86

## **BEŞA SÊYEM**

3. TEHLÎLA METNÊ.....	88
3.1.Unsûrên Dînî.....	88
3.1.1. Navên Xwedê.....	88
3.1.2. Qur'an.....	89
3.1.3. Pêxember .....	90
3.1.3.1. Muhemmed Pêxember.....	90
3.1.3.2. Îsa Pêxember .....	91
3.1.3.3. Nuh Pêxember .....	91
3.1.3.4. Îbrahîm Pêxember .....	93
3.1.3.5. Suleyman Pêxember .....	93
3.1.3.6. Yûsiv Pêxember .....	94
3.1.4. Melek.....	95
3.1.5. Kesayetên Dînî.....	96
3.1.5.1. Loqman.....	96
3.1.5.2. Xizir .....	96
3.1.5.3. Mehdî.....	97
3.1.6. Çar Xelîfe.....	98

3.2.Unsûrên Tesewifî.....	98
3.2.1. Wehdet.....	99
3.2.2. Saqî.....	99
3.2.3. Kaseya Elest.....	100
3.2.4. Mey/Şerab/Bade.....	100
3.2.5. Bende.....	100
3.2.6. Fena.....	101
3.2.7. Zûnnar.....	101
3.2.8. Kewsera Elest.....	102
3.2.9. Secde.....	102
3.2.10.    Meyxane.....	102
3.3.Kesayetên Dîrokî û Efsaneyî.....	103
3.3.1. Cem.....	103
3.3.2. Xusrew.....	104
3.3.3. Rustem.....	105
3.3.4. Nemrûd.....	105
3.3.5. Asif.....	106
3.3.6. Azer.....	106
3.3.7. Zuleyxa.....	107
3.3.8. Leyla û Mecnûn.....	107
3.4.Unsûrên Tebîetê.....	109
3.4.1. Heywanat.....	109
3.4.1.1. Çivîk/Perende.....	109
3.4.1.1.1. Bilbil.....	110
3.4.1.1.2. Şehlûl.....	110
3.4.1.1.3. Murx/Teyr.....	111
3.4.1.1.4. Şunqar.....	111
3.4.1.1.5. Huma.....	111
3.4.1.1.6. Gûyîn û Hiraman.....	112

3.4.1.1.7. Perwane/Perperok.....	1
3.4.1.2. Mori/Ahû/Şepal/Mar/Tûle.....	113
3.4.2. Dar.....	115
3.4.3. Kulîlk/Çiçek.....	116
3.4.3.1. Gul.....	117
3.4.3.2. Qerenfil.....	118
3.4.3.3. Reyhan.....	119
3.4.3.4. Sunbul.....	119
3.4.3.5. Binevş.....	120
3.4.3.6. Nêrgiz.....	120
3.4.3.7. Sosin.....	121
3.4.3.8. Şebnem.....	121
3.4.3.9. Xonçe.....	122
3.4.3.10. Nesrîn.....	122
3.4.3.11. Yasemen.....	123
3.4.4. Bêhnên Xweşik.....	123
3.4.4.1. Misk û ‘Enber.....	123
3.4.4.2. Kafûr.....	124
3.4.4.3. Filfil/Qerenfi/Reyahîn.....	124
3.5. Navê Dîyar û Bajaran.....	125
3.6. Alavên Şerî.....	126
3.7. Amûrên Muzîkê.....	128
3.7.1. Ney.....	128
3.7.2. Çeng.....	129
3.7.3. Def.....	130
3.7.4. Qanûn.....	130
3.7.5. Dehol.....	130
3.8. Mezmûnên Eşq û Evîndarîyê.....	131
3.8.1. Dil.....	133
3.8.2. Zulf/Bisk/Kakul.....	135
3.8.3. Perî/Hûrî/Zerî.....	136
3.8.4. Xemze.....	138

3.8.5. Jehra Helahil.....	139
3.8.6. Şem û Perwane.....	139
3.8.7. Xar/Reqîb.....	140
3.8.8. Qewseyn.....	141
3.8.9. Meh/Bedr/Heyîv.....	142
3.8.10. Dam/Dav.....	143

## **BEŞA ÇAREM**

4. METNA DÎWANA LAXER.....	145
4.1 Der Barê Peydakirina Metnê Dîwanê .....	145
4.2. Tesnîf û Amadekirina Metnên Dîwanê.....	146
4.3. Transkrîpsîyona Metnê .....	146
4.4. Metnê Dîwanê.....	148
ENCAM.....	194
ÇAVKANÎ.....	197
PÊVEK.....	201

## PÊŞGOTIN

Ji derencamên dilşahîyê yê xebat û lêkolînên van çend salên dawî yek jî ew e ku şairekî wekê Mela Umerê Tînîsîyê Miksî ji dawa mij û morana dîroka windayî ya edebîyata kurdî hatîye dîtin û xelegeke zêrîn li qeyd û arşîva maxa helbesta kurmancî ya klasîk bi duristî hatîye zêdekirin.

Mela Umerê ku di helbestên xwe da wek Laxer û Miksî du mexles jî bi kar anîne, di nava xelkê herêma xwe da bi navê Mela Umerê Aşiq jî tê nasîn û behskirin. Çi heye ku ew di nav kelepura şîra kurmancî da bêtir bi mexlesa xwe Laxer tê zanîn û niqaşkirin.

Laxer şairekî helbesta klasîk a kurmancîyê ye ku di dawîya sedsala hejdehem û di serê sedsala nozdehem da jîyaye. Ev heyam ew heyam e ku li Kurdistanê dawîya sedsala mîrektîyan e û her wiha gelek guherîn û veguherînên sosyo-polîtîk û sosyo-coxrafîk qewimîne. Heyama mîrektîyê ya ku ji bo milletê kurd êwreke zêrîn a xweserîyê bû û her wisa ji geşedana bajarvanî û edebîyata kurdî ra jî qonaxeke hêja bû, êdî bi dawî hatîye.

A di serdemeke bi vî rengî da, li Miksê li devera Tînîsê Laxer tê dinê û ew jî wek gelek zana û şairên dî li medreseyan tê şandin bo xwendinê. Her çendî ku yeqîn nayê zanîn ka di kîjan salê da ji dayik bûye, tê zanîn ku wî îcazeta xwe hîcrî di sala 1304ê/mîladî 1886ê da girtîye. Em jî ji vê texmîn dikin ku wî ev îcazeta di dora 25 salîya temenê xwe ra standîye û lewma jî wiladeta wî diçe sala 1861ê mîladî. Li ser nivîsteka qebra wî jî, ku niha li gundê Zivistanîyê yê Artemeta Wanê ye, sala wefata wî 1927 dixuyê. Lewma jî meriv dikare bibêje ku wî dorê 66 salan umir kirîye û paşê çûye ber dilovanîyê.

Laxer di medreseyan wek Medreseya Mîr Hesênê Welî û ya Arwasê da xwendîye û çûye Cizîrê, li wir li Medreseya Sor jî feqetî kirîye. Ew hem ehlê medreseyê hem jî ehlê tesewif û terîqê bûye. Di vê pêvajoya han da şîyana wî ya edebîyat û helbestê jî zîyade bûye û dest bi nivîsandinê kirîye. Ew di helbestnivîsîna xwe da gelekî di bin tesîra Melayê Cizîrî da maye.

Laxer seyda û şairekî ehlê tesewifê bûye û di helbestên xwe da li nik mijarên siruşt, evîn û feleknaşîyê, exlebî serî bi mijarên tesewifê daye.

Meqseda me ji vê xebatê ew e ku em helbestên Laxer bikin latînî û çî rûxsarî çî tematîk û naverokî, bi her awayî li ser helbestên wî bisekinin; jîyan û berhemdarî û hunera wî ya edebî bidin ber ronahîya zanîn û dahûrandinê. Xebata me di bin çar beşan da hate pê: Di ya yekem da em li ser agahîyên jîyan û malbata wî sekinîn. Di ya duyem da, di bin navê Vekolîna Dîwanê da dîwan, ziman û kesayetîya wî ya edebî hate vejenîn û bi berfirehî behs li hunerên edebî hate kirin ku Laxer helbestên xwe pê xemilandine. Her wisa şairên ku tesîr li helbest û kesayetîya Laxer kirine, bi taybetî jî tesîra Melayê Cizîrî di vê beşê da hate rapêşkirin. Tehlîla rûxsarî ya helbestên wî jî di vê beşê da hate kirin. Di ya sêyem da motîf û unsûrên tematîk ên naveroka helbestên wî bi awayekî berfireh hatine vekolandin. Di beşa çarem da jî metna Dîwanê cih digire.

Ne hêsan e ku mirov bi tena serê xwe bikare ji nav xebatên zanistî û lêkolînî derkeve. Di serî da gelekî malavayîya şewirmendê xwe Doç. Dr. Hayrullah Acar dikim ku bi xêra beledî û alîkarîya wî me ev xebat bi serfirazî qedand. Ji bo Doç. Dr. Abdurrahman Adak û Dr. Öğretim Üyesi Nesim Sönmez spasdar im ku ew bûn sebeba xêrê ku me gelek kêmasî û xeletîyên xwe sererast kirin. Bi heta hetayê minedar û mutesekirê mamoste Müslîh Sezer im ku ew nebûya min xwe ji kesafeta hinavê xwe û ji oblomovîya hişê xwe xilas nedikir. Wî bê hed piştgirî û alîkarî da min. Ji bilî çavkanîyên muxtelîf, di serî da Hanefî Taşkın û Suat Orak, me ji çend hevalan îstîfade kirîye; pirr spasîya wan dikim. Bo agahîyên ku wan dan û ji ber ku ku me bi hêsanî ji arşîva wan îstîfade kir, gelekî malavayî li Seyda Mela Evdilmecîd û Seyda Mela Eta jî dikim.

Hacı YILMAZ

2019 Wan

## KURTEBÊJE

*amd.* : Amadekar

*bnr.* : Binêrin

*c.* : Cild

*hwd.* : Her wekî din

*hej.* : Hejmar

*r.* : Rûpel

*transk.* : Transkrîpsîyon

*wer.* : Werger

*TÎB* : Tehsîn Îbrahîm Doskî

*ME* : Mela Evdilmecîd

# DESTPÊK

## 1. Kurtenêrîneke Giştî Derbarê Miksê Da Ku Laxer Tê da Jîyaye

### 1.1. Kurtedîrok

Li ser rûyê dinê hin dîyar hene ku bi xisûsîyetên xasî xwe ji dîyar û deverên di cihêwaz dibin û bi gelek awayan li ser şewaza jîyana şênîyên xwe bandor dikin û dibin sêsebebê timtêl û rêzikeke resen. Çi bi erdnîgarîya xwe çi bi siruşt, dîrok, çand û folklorê xwe ve, Mikis jî yek ji wan der û deveran e ku bi wan taybetîyên xwe di dîroka avahîdanîn û bajarvanîyê da cihekî girîng digire û ji bo lêgerîn û lêkolînên zanistî her bal kêşandîye.

Ne tenê bi bilêvkirinekê, bi çend bilêvkinên ji hev piçekî cuda navê Miksê tê telafûzkirin, ku di nav gel da her wekê Mukus, Mukis, Mikis, Muks, Miks tê gotin. Bes bi tirkî navekî pir cuda lê hatîye kirin ku ew jî Bahçesaray e. Ev nav muhtemelen bi saîkeka fermî û îdeolojîk di sala 1989an da lê hatîye danîn. Ev bajarok di hêla fermîyet û polîtîk da çendî li ber bayê rojevê her ketibe jî navê Mikis dîsa jî zêdetir hatîye bikaranîn û berbelavtir e.

Agahîyên li ser peyva Miksê di çavkanîyên li ber destê me da ji hev cuda tên dîtîn. Tê gotin ku peyva Miksê bi rayeka xwe ve ji zimanê erebî tê û wateya *deyn, bac û berhevkirina van tiştên wiha*. Di erebî da forma pirjimarî jî wek *meks* dixuyê. Her wiha bi wateya cihê berhevbûn û baregehê jî tê bikaranîn. (Bilgili, 2005:18)

Her wiha agahîyeke di jî heye ku radigihîne ku di berîya Îslamê da ev dever bi navê Moksena (Moxoene) hatîye zanîn. Di nava herêma Zagrosan da cih digire ku nivîskarê berhema navdar *Vegera Hezaran Ksenoph* vê herêma Zagrosan wek wargeha Kardûkan bi nav dike. Ev kelîme ji qewmê bi navê Moksan tê ku muhtemelan li vê deverê jîyane û wek şaxekî qewmê Gurcîyan tê hesêb. Di serdema Împeratorîya Romayîyan da ev dever wek Eyaleta Moksena di dîrokê da cihê xwe girtîye û bajarokê Miksê jî bûye navenda vê herêmê, ku ev jî wek Cizîrê ji bo împeretoriya navborî bûye baregeheka muhîm a eskerî. (Hakan, 2002:9)

Vê deverê di nav seyra dîroka xwe da li gor karîgerîya xwe ya stratejîk statûyên ji hev cihê hildaye; car bûye baregeh, car bûye qeza yan jî nehîye.

Mikis û derdora wê di sedsala 7an a mîladî da bi rastî fethên ereban tê ku wê heyamê li vir desthilatdarîya ermenan hebûye. Di dema Hz. Omer da artêşa Îslamê di bin fermanîya Emir Habib bin Meslemeyî da ber bi aliyê Mezopotamyaya Jorîn ve tê şandin. Ev qumandan pêşî Erzeromê distîne ku li wê heyamê di destê Bîzansîyan da bajarekî navendî bûye. Paşê ber bi Dîyarbekir, Farqîn û Xelatê ve tîn û bere bere van herêman dixin bin dest, ta ku xwe digihînin herêma Miksê. Di vê serdemê da li herêma Miksê prensîyek hebûye ku bi girêdayî Qiralîyeta Waspurakan bûye. Di dewra Ebbasîyan da ev der di nav bajarên Waspurayan da wek bajarekî tê dîtin. Di çaxa navîn da ev herêm di bin rêvebirîya prensîyên ermenîyan da her hatîye dîtin. Rêvebirên Ebbasîyan bi Prens Gaîk ra, ku ji sulaleyekî ermenî tê, peyman datîne û wî bi tacekî qiralî tacîdar û payîdar dike. Qiralîyeta Waspurakan, Westan wek navend bi kar anîye, û di karên xwemalî da serbest û di karên deremalî da pabendê Ebbasîyan mane. Di serê sedsala 10an da prensîya Moksê jî pêbendîya xwe bo Qiral Gagîk derbeyan dike. (Hakan, 2002:9)

Herêma Miksê di sala 1064an da ji hêla xaqanê Selçûqîyan Melîkşah ve hatîye fetihkirin û ketîye bin rêveberîya wan. Paşê, heta sala 1548an bi berêkê ve desthilatdarîya hikumranên Xelat, Eyyûbî, Selçûqî Anatolî, Akkoyûnî, Karakoyûnî û Sefevî dîtîye. Di sala 1539an da dema Wan ji aliyê Qanûnî Sultan Suleymanê Osmanî ve tê bidestxistin, Mikis jî dikeve bin hakimîyeta Osmanîyan. Bes bi rûdana şerê bi Awustiryayê ra tesîra Osmanîyan li devera Wanê kêmbûnê û ev herêm careke dî dikeve bin hakimîyeta Sefewîyan. Paşê di sala 1548an da Osmanî cardî li vê deverê vedigerin û Miksê dixin bin serdarîya. Mikis ji wê demê ve di bin destê Osmanîyan da dimîne. Da ku wek sancaxakî wîlayeta Wanê bê rêvebirin Mikis ji bo Evdal Xan tê dayîn ku ji sereken begên Miksê bûye. Heta dewra Tenzîmatê rêveberîya Miksê bi destê mîr û mîrzadeyan bi cih hatîye. Bes li dû îlankirina Tenzîmatê rêveberîya malbatî ji holê rabû û lewma jî di sala 1864an da Mikis wek navçeyeke Wanê statû hildide û Derwêş Beg jî wek qaymeqamê navçeyê tê tayînkirin. Di sala 1902an da bi zagonnameyekê statûya Miksê ya navçeyî jê hildidin û wê wek nahîyekî bi navçeya Şaxê ve girê didin. Midûrê wê jî wek Muhtillah Begê

Muksî tê tayînkirin. Muhtillah Beg di dîroka nêz a Miksê de cihekî girîng digire. Lew ku bi muameleyeke qenc hereket kirîye, çî misilman çî nemisilman, bi rêveberîyeke baş di nav xelkê Miksê da tê yadkirin. Medreseya Mîr Hesên, ku di wextê da li Kurdistanê navdartirîn medreseyek e, di serdema wî da tacîdarîya xwe ya ders û îlimê dibîne. Gelek alim, seyda û zanyar ji derve hatine û li vê derê mane û ders dane. Rê li rewşa rûdan û hedîseyên nexweş hatîye girtin. Ev hal ta sala 1915an dewam dike, bes di van salên hanê da ji ber meseleya ermenîyan û şerê rûs û mihacirîya xelkê derdor gelek serûbinbûn û guherîn diqewimin. Gava Wan ji alîyê artêşa rûsan ve tê bidestxistin, da ku zêder û zîyanekî mezin çênebe, xelkê Miksê ber bi alîyê Perwarîya Sêrtê ve tê bicihkirin. Yê mane di şer û pevçûnan da gelek ji wan mirine. Paşê dema artêşa Rûs bi paş ve vedikişê miletê Miksê jî vedigerin û li gund û warên xwe rûdin. Her wiha li gund û cihên ku ermenî ji wan deran hatine koçberkirin jî bi dest xistine û bi cih bûne. Muhtillah Beg di sala 1920an da dimire. Paşê di sala 1932an da bi qezaya Kavaşê ve wek nehîyekê tê girêdan. Lê belê, di navbera salên 1958 û 1964an da cardî dibe nehîyeke Sêrt Perwarîyê, ku sebeb çî bûye bi zelalî nayê zanîn. Di sala 1964an da dîsa bûye nehîyekê Kavaşê. Herî dawî, di sala 1987an da bi qirarekî resmî bûye navçe û bi bajarê Wanê ve hatîye girêdan. (Bahçesaray İlçe Milli Eğitim Müdürlüğü, 2007)

## **1.2. Berhemên Dîrokî**

Çî mabed, çî kelh, çî pir û kanî; der û deverên xwedî dîrok li dû xwe mitleqe berhem û şûnwarên dîrokî dihêlin û ev eserên wiha kevnewarîya wê derê teyîd dike. Mikis jî yek ji wan deverên wisa ye ku niha jî hin wek şûnwar hin hê jî wek xwe mane û hin jî hatine restorekirin, xwedî hin berhemên tarîxî ye. Ji wan çend libên ku hê jî hene û agahîyên derbarê wan da derbasî qeydê bûne ev in: (Bahçesaray İlçe Milli Eğitim Müdürlüğü, 2007)

Manastira Saintes Femmesê, ku navê wê tê wateya “dêra jinên ezîze”. Xelkê deverê jî ev nav li zimanê xwe anîne û bêyî ku wateya wê biguherînin nav lê kirine “Dêra Melaşêxê”. Peyva şêxê bi tewanga xwe ya mêza jinên ezîz û xwenda îma dike. Ev dêr dikeve dûrîya Delan, li pişt gundê Sipkasê. Bi qasî 1 km ji Pira Sor dûr e û li newalekê hatîye avakirin. Li gor çavkanîyên xiristîyanî ev dêr di sedsala 10an da

hatîye avakirin. Bes hin taybetîyên wê yên mîmarî didin nişan ku ev dêr esildanî piştî sedsala 12an ava bûye.

Dêra Saint Sauverê jî yek ji wan dêran e ku dîroka avakirina wê nayê zanîn. Di nav miletî da wek “Dêra Spî” tê gotin. Dikeve nêzikê gundê Mezra Şêxan, li pişt gundê Eçîçasê ye û di nav dehl û daristanekê da xuya dike. Lew ku mabedeke muhîm e, di nav notên seyah û lêkolerên tarîxî da dibore. Di vê manastirê da dêrek heye ku li ser navê Hz. Meryem hatîye çêkirin û li wir hîcokên keşîşan hene. Xwedî kanîyekê ye û her wiha devdora wê tijî bi darên gûzan in. Tê gotin ku aş û zêtxanekî wê jî hebûye ku niha tev kavi û xirbe ne.

Her wiha bi navê Dêra Saint Jaquesê jî dereke dî heye ku lew ku li ser rasteerdeki hatîye avakirin xelkî jê ra “Dêra Deştê” jî gotîye. Li ser dîwarên dêrê tu kitabe nînin. Di nivîstekên Lalayan da tê gotin ku di sedsala 17an da hatîye bikaranîn û lewma jî tê texmînkirin ku berîya vê tarîxê hatîye avakirin.

Bi navên Dêra Georgesê û Dêra Ancoxsê du dêrên dî jî hene ku li vê herêmê wek du şûndîrokên berçav tên naskirin.

Emareyê şaristanî û avahîya herêmekê jî bê guman pir in. Bi navê Pira Sor berhemeke dîrokî heye ku li ser çemê Miksê hatîye çêkirin ku li çaryana ji navenda navçeyê tê ku çîçek alîyê dûrîya Delan ve û çîçek alîyê dûrîya Arnasê ve û çîqê dî jî ber bi navçeya Berwarîyê ve diçe. Bi 4 km ji navenda navçeyê dûr e. Gelek bilind e. Îbrahîm Sunkur dîyar dike her çendan Prof. Dr. Abdusselam Uluçam dibêje, “navê xwe ji kemera xwe ya ji kelpêjên sor çêbûyî digire”, lê bi dîtina min rasteqîn ne wisa ye. Lewre li Miksê bi navê “Mizgefta Sor” mizgeft, li Cizîra Botan jî bi navê “Medreseya Sor” medrese hatine avakirin. Ev tîne hişê mirov ku wek gerdîşekê li Kurdistanê derbasdar e. Lê dîsa çî dibe bila bibe navê wê wek “Pira Sor” xwe bi dîrokê daye pejirandin. Dîsa li gor çavkanîya navborî di navbera sedsala XIV û XVII’an de hatîye çêkirin û nivîstekên li ser serderên şaneyên pîyên wê bi sedem xerabkirina defînegeran nayêne xwendin. Ev jî dibe sedema nezanîna teqezîya dîroka çêkirina wê pirê. Bes rasteqîn çawa navborî angaş dike nîne. Lewra geştîyar û lêkolînerê bi navûdeng I.A.Orbelî di navbera salên 1911 û 1912an de du caran hatîye

Miksê ku hê ew nivîstek nehatî xerabkirin bi xwe xwendîye û çawa kurd dibêjin “rabirdûya wê sicil-hicil kirîye” û ji me re van agahîyan dide:

Ew pir ji kevir û agûrên (kelpêj/kerpîçên) xas hatibû çêkirin. Pir bilind bû, weke kevanê bû. Rîya jê derbasdibûnê jî wek şiverîya karwanan teng bû. Di xîmê pirê de du kevirên bi nivîsên ermenkî danîbûn ku bi naveroka xwe ve hev temam dikirin. Navê wê “Pira Sor” e. Di wan hikayetan de navê wê pirê derbas dibe ku di vê berhevokê de hatine bicihkirin.” “Bi gotina gotîyan, du birayên tucar ev pir çêkirîye ku di dema seferên xwe de gelek dewlemend bûbûn. Piştî demeke dirêj dema ji seferê vedigerin, qasidê xwe dişînin ji bo ku behs bigehînin merivên xwe ku ew vegeyîyane. Dêya wan dema vê behsê dibihîze, dibêje; “heke pêwîst be ku ez bi rîya cimcime û delavan re herime pêşîya wan çi feyde di dewlemendbûna wan de heye?” Li ser vî qasî ew jî bi lez wê pira sor çêdikin û dêya wan jê derbas dibe û diçe pêşîya kurên xwe. Bi gotina gotîyan, ji nivîsên ser wan keviran xuya dibe ku ew pira ku du kesan çêkirîye ku navê “Xoce” li wan kiribûn, dihate maneya tucarê ku bazirganîya mezin dike. Nivîsa pêşîn wiha ye: “Ev pir di sala 1032’an (1595) de bi destê Xoce Murad û Xoce Xêrapêt hatîye çêkirin.” Nivîsa duyem wiha ye: “Ev pir bi destê Xoce Karapêt di dewranên giran ên dema Mîr Evdal de hatîye çêkirin.” (Sunkur, 2016: r. 43)

Medrese û mekanên perwerdehî û hevojkariyê cihekî pirr girîng digrin din av mîrateya dîroka şaristanîya deverekê da. Devera Mîksê bê guman xwedî medreseyên mezin û kêrhatî bûye di dîroka xwe da. Ji van medreseyan a kuz af meşhur e Medreseya Mîr Hesên e ku li qeraxê keleha Mîksê di nav goristanê de wek kullîyeyeke pirmebest ava bûye. Mirov dikare bibêje ku li gor dîroka desthiladariya Mîr Hesên piştî sala 1566’an hatîye avakirin û dest bi xizmetê kirîye. Careke di sala 1732’an de careke din jî di sala 1858’an de hatîye restorekirin. Nivîstekên wê yê nîha ne di destê me de farisî bûne û ji hêla C.Yazicioglu ve hatîye xwendin û wergerandin û weşandin. Ev kullîye di van nivîstekên cur be cur de wek “BAXÊ ULÛM” hatîye danasîn. Ji vê jî dîyar e ku ev avahî wek medrese hatîye çêkirin.(Bahçesaray İlçe Milli Eğitim Müdürlüğü, 2007)

Her wisa Mizgefta Sor jî wek kevnawarekî ibadet û perwerdehîye ye ku agahîyên der barê vê mizgeftê de mixabin hem gelek kêr in hem jî hev nagirin û teqezîya wan jî li ber gumanê ye. Li gor timtêla avahîsazîya sedsala XVI’an e. Ev mizgeft di lîteratura Îslamî de cami’e ango nimêja cum’ê li navçeya Mîksê di vê mizgeftê de hatîye kirin. Ev mizgeft di sê pêngavan de hatîye çêkirin û sergîhayî bûye. Di nav kelha Mîksê de ye. Mirov dikare bibêje mîrê Mîksê yê di wê pardemê de desthiladar ava kirîye. Lê hinek lêkolanan angaşt kirine ku ev perestgah di pêşîya

hatina musulmanan û kurdan de hebûye, piştî ev cih ketî destê musulmanan vegerandine mizgeftê.(Sunkur, 2016: r. 43).

Bi navê Mizgefta Mela Şemseddîn berhemeke kevin heye ku ev mizgeft li Miksê li herêma Tînîsê li gundê taxa Berojê ye. Li gor nivîsteka li ser serderê di sala 1709'an de wek du menzel hatîye avakirin. Li pesarekê ye. Di sala 1915'an de ango sala rûdana mihacirî û hedîseyaya ermenîyan de hatîye sohtin. Êdî menzela duyemîn nehatîye avakirin. Du nivîstekên wê hene. (Bahçesaray İlçe Milli Eğitim Müdürlüğü, 2007)

### 1.3. Çand û Erdnîgarî

Bajarokê Miksê bi xastaybetîyên xwe ve ew qas resen û cuda ye ku ev xal di zêdenavekî ji bo Miksê da jî tê dîtin ku xelkê deverê jê ra bi tirkî “gezegen” gotîye, ango gerestêrk. Xelkê deverê her çî qas ji ber siruşt û cihê wê yê cografîk ev zêdenav lê kiribe jî, esildanî yarî û wateyeke civakî jî lê bar kirîye. Ev wateya ku “mişmirhiştin û xemnexwarî” lê mindemîç e peywendîya bajêr a bi rêvebirîya serdema komara resmî ya me'lûm jî dîyar dibe.(Bilgili, 2005:18)

Sebebekî ku ev herêm cîyawaz kirîye hindikbûna danûstaniyên wê yên bi derve ra ye ku ev jî ji ber hin şert û mercên cografîk tê. Her çî qas niha wisa nebe jî heta salên vê dawîyê têkilîya Miksê bi derve ra di demên zivistanî da bi qasî 7-8 mehan dihate birrîn. Vê jî bi xwe ra ji bo civaka Miksê halekî dî dianî pê ku çerxa heyata kesane û komelî di nav xwe da bi ewayekî sergirtî digerland.

Derencamên vê rewşê di her hêla jîyana Muksîyan da hatîye dîtin ku ji wan jî yek zanîn û lîstina kişikê ye ku li vir hema hema her kes dilvên û qabilê vê lîstikê ye. Gava navê Miksê û muksî dibe mijara qal û xeberdanê, ji tiştên ku di hiş û bîra mirovan da dilivlivin yek jî kişik e ku cureyekî werzîşê ye û wek lîstikeke kevin û qedîm tê melhezekirin.

Xelkê Miksê di nuktedanî û mizaha xwe da pêşdaçûyî tê dîtin. Wek ku tê zanîn şîyana mîzahê jî bi giştî xwe dispêre hiş û jîrîyeke zela û gihayî. Li min fikir ew e ku yek ji hêmanên ku bûye sebeb ku ev mizah çêbibe lîstika kişikê ye û her wiha çanda

wan e ku kişik bi xwe ra anîye. Lewra kişik tesîreke gelek erênî li ser hişmendîya însên dike.

Her çend ku Mikis vêga qezayekî Wanê ye, lê ew nakeve nav Hewza Gola Wanê, lew ku Çîyayên Şahab ketîye navbera Gola Wanê û Miksê bi xwe.(Sadînî, 2009:54).

Mikis dikeve başûrê Gola Wanê. Li rojhilatê wê Şax, li rojava Hîzan û li başûrê wê jî Perwarî cî digire ku ew jî qezayekî Sêrtê ye. Erda wê bi qasî 576 kîlometre kare ye û bilindahîya wê ya ji behrê jî 1670 mîtro ye. Ji bajarê Wanê 254 km jî dûr e.(Bilgili, 2005:18)

Rastîyeke jîyana avahîsazîyê jî ew bûye ku mirov ji mêj ve her daîm nêzikê avê avahî danîne û hêwirîne. Lewma jî bi kurtasî hatîye gotin ku “av avahî ye”. Di avakirina Miksê da jî ev wek faktora sereke dixuyê ku ew jî Çemê Miksê ye. Çemê Miksê yan jî bi gotina niştecihên deverê Ava Mezin bûye sebeb ku ji berê ve li deverê bi gund, bajêr; bi xanedanî û rêveberîya xwe ve heyatek hatîye pêkanîn. Çemê Miksê jî yek ji wan çemên li ser rûyê dinyayê ye ku ji yek derê dertê û ne kêr ne jî zede bi salewext wekê xwe diherike. Devera Miksê taybetîya xwe ya herî ecêb û xas jî esildanî ji vê avê digire, ku di navbera gir û çîyayên bilind de ji xwe ra gelîyekî kûr çêkirîye û tê da diherike û diçe. Çemê Dîcleyê jî serekanîya şaxekî xwe ji vê avê digire ku ev di berhema navdar a Şemsettin Samî di *Kamusu'l-A'lamê* da jî derbas dibe. “Ava Miksê, ku şaxekî Çemê Dîcleyê ye, ji berana kelha Îskender dertê ku ew jî dikeve serana bajêr û bakurê Miksê.”(Bahçesaray İlçe Milli Eğitim Müdürlüğü, 2007)

Ev çem çawa ku ji erd û çandinîyê ra bûye xezîneyeke bêhempa, heman wisa ji şair û aliman ra jî bûye menbaya îlham û tefekurê. Bê guman ji gewreşairên helbesta kurmancî Feqîyê Teyran bingeha îlhama helbestên xwe yên li ser avê ji vî çemê ha wergirtîye. Ramiyarê meşhur Bedûzeman Seîdê Nursî jî, ku alimekî devereke cînar a Miksê ye, menbaa vî çemê navborî bi Çemê Nîl ra bi lêv dike û dibêje: “Menbaya Nîl çawa ji bin Çîyayê Qemerê dertê, Ava Miksê jî ku şetavakî muhîm ê Çemê Dîcleyê ye, ji bajarê Wanê, ji nehîya Miksê, ji nav keviran û ji şikeftêkî derdikeve.” Nursî vî çemê ha ji wan çemên ku îsbata mucîzeyeke eşkere ye dihesibîne û rîwayeta hedîsekê neqil dike ku tê da qala sê avên mezin û boş ên li ser rûyê dinyayê dike: “Ji

cennetê her wext dilopek dikeve nav van çeman û lewma ew qas bi bereket in”.(Nursî, 1010:276)

#### **1.4. Aborî**

Xelkê deverê ji berê ve di rewşeke feqîr û desteng da bûye. Debara xwe bi piranî bi sewalkariyê ve diqedînin. Çandinî hê jî bi alav û edetên berê tê pêkanîn. Gûz û darên gûzan hasilatekî sereke dide şênîyên herêmê. Mêşvanî jî yek ji wan karan e ku debara xelkê Miksê pê çêdibe. Lewma jî hingvînê Miksê her wext di rewacê da bûye. (Bahçesaray İlçe Milli Eğitim Müdürlüğü, 2007)

#### **1.5. Tevna Civaksazîyê**

Dever û bajarokê Miksê xwedî dîrokeke dûr û dirêj e. Lewma jî bûye navendeke ku cure cure xelk, qewm, mezheb û çîn tê da avahî danîne û jîyane. Di zemanên berê da her çi qas qewm û çînen herêmê di bin rêveberîya mîrektîyan da jîyane jî vêga avanî û bastûra civakî ya Miksê hinekê ji ya berê cudatir e, ku tê da unsurên feodalîyê jî berdewam e. Wek tê zanîn ku li deverên dî yên welatê kurdan binyada feodali bi axa, eşîret û şêxîtiyê dîyar dibe. Bes ji vê hinek cudatir li herêma Miksê wek dîyardeyên feodalî begtî, şêxtî û ‘amtî heye ku di eslê xwe da tevî ku hemî jî kurmanc in jî, tenê ji qismê ‘amî ra kurmanc hatîye gotin. (Bilgili, 2005:18)

Wek sazûmanîyeke kevin begtî heta serdema Selçûqîyan diçe. Begtî wek sazûmana rêvberîyê hatîye dîtin û di hîyerarşîya çînî da çîna serdest û rêvebir e. Tevî gelek guherîn û veguherînên dîrokî yên civakî û polîtîk hê jî ev sîstem li Miksê heye. Di nav sosyolojîya vê herêmê da begtîyê xwe daye cihekî wisa ku di danûstanî û peywendîyên civakî da bi xwe ra hin qalib û qaîdeyên ecêb jî anîne. Her dem bi çavekî cuda li wan hatîye nêrîn û statû û payeyeke bilind li wan hatîye dan. Sermîyana wan a polîtîk, aborî û civakî her dem zêde bûye. Tiştêkî seyr e ku niha jî edetê wan ê ku keçên xwe nadin “kurmancan”, lê belê ji wan keçan distînin, berdewam e.(Bilgili, 2005:18)

Di qada civaknasîya Miksê da çîneke dî heye ku ew jî mal û malbatên şêxan in. Wek sazûmaneke dîn û dîyanetê, ders û medreseyê, îlim û zanîne kar kirine û wisa jî di nav tarîx û civaka Miksê da cih girtine û xwe wek dewama nesla Hz. Muhammed

dîtine û ji xwe ra seyîd gotine. Gundê Arwasê û derdora wê ji vê sazûmanîyê ra bûye navend. Ev xusûsîyet va demeke gelekî dirêj e ku di nav tevna civaksazîyê da heye û her çendî gelek guherîn û veguherîn çêbibin jî hê jî dewam dike. Prof I. Orbeli jî di xebata xwe da dema behsa sed sal berîya niha dike, ew jî dîyar dike ku ev kes û malbatên hanê zanayên herî bilind dihatine hesibandin.(Orbelî, 2011: 61)

Heçî qismê kurmanç in, piranîya miletê Miksê ji wan pêk tê. Wek etnîsîteyek û wek qismekî qewmê kurd tê qebûlîkirin. Di navbera beg û şêx û kurmançan da ferqeke etnik tune esildanî, bes ev ferqa ku di navberê da xuya dike ji rêveberîya dîrokî û kevneşopî tê û di bîr û hişmendîyê da jî ji xwe ra binyadekî psîko-sosyal danîye.

#### **1.6. Kurtenêrînek li Mîrektîya Miksê**

Di dîroka rêveberîya kurd û Kurdistanê da serdema mîrektîyê heyama herî pêşçav e ku her dem ji bo lêkoler û dîroknasan hêjayî balkêşanê bûye. Di sedsala 13an da piştî êrîşên moxolan li ser cîhana Îslamê, bi taybetî jî li ser paytexta dewleta Ebbasîyan dawî li dewleta Ebbasîyan hat û bi vî awayî di cîhana Îslamê da serdemeke nû dest pê kir. Di vê navberê da hikumetên kurdan yên ku di nivê serdema Ebbasîyan da ava bûbûn jî temenê xwe tijî kiribûn. Ev serdema nû ji bo kurdan serdema mîrektîyan e. Mîrektîyên herî girîng ên kurdan û bi taybetî yên kurmançan piştî êrîşên moxolan hatin avakirin û heta bi nivê sedsala 19an li ser pêyan man. Ev serdem ji bo edebîyata kurdîya kurmançî serdemeke zêrîn e. Lewra em dikarin bêjin ku hemû berhemên klasîk ên kurdîya kurmançî yên ku di destê me da ne di vê serdemê da hatine dayîn.(Adak, 2014:183)

Herêma Miksê jî yek ji wan herêman e ku di dîroka mîrektîya kurdan da cihekî girîng digire. Li gor agahîyên ku di *Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî* da derbas dibe, ba û bapîrên fermanrewayên Hîzan, Muks û Sipayêrtê sê bira bûn û ji nahîya Bilêcanê hatin vî wilayeta hanê û ew di navbera xwe da parve kirin. Her kesek çû ser para xwe û dest bi meşandina hukmê xwe kir. Rîwayeteke din jî dibêje ew kurmamên hev bûn û ew wilayeta ha di rêya şîrîkatîyê ra ji sultanên Selçûkîyan stand. Belê, axir her çawa be, yekem kesê ku li Miksê bûye mîr û navê wî di bîra xelkê da maye Emîr

Ebdal e. Du kurên Emîr Ebdal hebûn û navên wan Ehmed Beg û Hesên Beg bûn. (Bedlîsî, 2007:312)

Mîrtîya malbata Mîr Ebdal Beg piştî mirina wî bi van mîrzadeyan qewîtir bûye û dewam kirîye. Ji van her du kuran Mîr Ehmed Beg li dû koça bavê xwe hevsarê mîrektîyê girt destê xwe û di vê wilayeta hanê da kar û barên rêveberîyê bi awayekî herî baş pêk anî. Lê çî heye ku Zeynelbegê Fermanrewayê Hekkarîyê ku bi Mîr Ehmed ra di nav berberî û xilafetîyê da bû, dest avêt birayê wî Hesên Beg, xwest ku xirinçafi bikeve nav her du birayan û hêza mîrektîya Miksê lawaz bike. Lewma jî serkeftinên Hesên Begî yê di şerê Naxçivanê da kir hêcet û ew bir Stenbolê da ku Padîşayê Osmanî Sultan Suleyman wî xelat bike û rêveberîya Miksê bide wî. Axirî, fermanek da derxistin û nehîye û kelha Karkarê ji Mîrektîya Miksê dan veqetandin û Hesên Beg kir rêveberê wê sancaqê. Bi vî awayî her du birayan fermanrewatîya zemanê desthilata xwe bi hev ra derbas kirin. Piştî 30 sal di ser desthilatdarîya wan ra derbas bû, Ehmed Beg mir û li dû xwe du zarokên kur hiştin: Ebdal Beg û Mîr Îmameddîn. (Hakan, 2002:21)

Di heyama şerên navbera Osmanî û Îranîyan da herêma rêveberîya ku zêde tengasî kişandîye eyaletên li sînora û li nêzî sînora bûne. Wan û deverên derdora wê jî nesîbê xwe ji van pevçûn û teşqeleyan bê guman standîye. Hikumeta Osmanî jî ji bo ku hikumranîya xwe qewîtir bike û bi ser bikeve bi mîrekên Kurdan ra ketîye nav hevkarîyê. Bes berjewendîyên desthilatdarîya Osmanîyan çawa îcab kirîye bi mîrektîyan ra danûstanîyên xwe wisa saz kirine; car piştevanîya hinekan kirîye, car ew beranbezî hev kirine. Heman rewş li herêma Miksê jî qewimîye. Piştî ku sancaqa Karkarê dikeve destê Mîr Hesên, bi destê mîrê Hekkarîyê, Mîr Ehmedê Mîrê Miksê tê gilîkirin û bi fermana hikumeta Osmanî bi qasekî di hepsê da dimîne. Di heyama mîrektîya xwe da Mîr Hesên jî rêveberîyeke baş pêk tîne û lewma jî ji alîyê xelkê ve zehf tê hezkirin. Bi navê Weqfa Mîr Hesên weqfekê dide avakirin û mal û milkîyeta xwe dibexşîne vê weqfê. Li ser rêya Muks û Kawaşê xaneke mezin dide çêkirin, ku ev xan ji bo karwanan gelekî bi kêr hatîye. Her wisa li ser navê xwe medreseyekê dide avakirin ku wek medreseya Mîr Hesên bi sedan sal dibe navenda îlm û xwendinê. (Hakan, 2002:22)

Mîr Hesenê ku hem ji alîyê ermenîyan ve hem jî ji alîyê kurdan ve gelekî hatîye hezkirin li ser navê rêveberî û zanînê li dû xwe mîrateyeke qenc dihêle û diçe. Goristana ku tê da medfûn e jî bi navê wî ye. Piştî mirina wî kurê wî Rustem Beg dibe hakimê sancaqa Karkarê. (Bedlîsî, 2007:313)

Di vê navê ra piştî hepiskêşanê û piştî ku Mîr Hesen dimire, Mîr Ehmed careke dî dibe mîrê Miksê. Piştî demekê ew jî dimire û kurên wî dikevin şûna wî. Axir dem tê, li ser rêveberîyê di nav kurmaman da nexweşî dertê û li hev nakin. Kurê Mîr Hesen Rustem Beg bi alîkarîya hikumeta Mehmudî dibe xwedîyê sancaqa Karkar. Evdal Begê Duyem ê kurê Mîr Ehmed jî dibe mîrê Miksê û ji wî jî du kur çêdibin. Di serdema Sultan Muradê Sêyemê Osmanî da li ser Îranê ve seferê tê lidarxistin. Lewma jî ji seraya Osmanîyan ji 36 mîrekên Kurdan ra ferman tê şandin da ku ew jî dema îcab kir beşdarî wê seferê bibin. Di nav van 36 navan da navê Duyem Ebdal Begê Miksê jî derbas dibe. Duyem Ebdal Beg di sala 1597an da wefat dike û li pey wî bi navê Mîr Muhammed û Mîr Ehmed du kurên wî dimînin. (Bedlîsî, 2007:312)

Lew ku Şerefhanê Bedlîsî berhema xwe di sala 1597an da xilas kirîye, agahîyên ku di *Şerefnameyê* da der barê dîroka sîyasî ya mîrektîya Miksê da digihin me ev qas e.

Paşê em ji çavkanîyên dî hîn dibin ku di navbera wî û kurmama wî Mîr Hesenê Duyem da pevçûn çêdibe. Mîr Ehmed bi yekîtiya eşîretên derdor di wî şerî da bi ser dikeve û mîrtîya xwe xurttir dike. Piştî Mîr Ehmedê Duyem em di salên 1630an da wek mîrê Miksê Seyîdxan Beg dibînin. Di van heyaman da di navbera mîrektîya Hekkarîyê û ya Miksê da şer û nexweşî dertên. Bingeha van şeran her çendî tam ronî nebe jî tê zanîn ku esildanî ji du meseleyan dertê: yek, şerê desthilatdarîya herêmeke berfireh; ya dî jî ew e ku navtêdana rêveberên hikumeta Osmanîyan da ku mîrektîyên Kurdan her dem ji bo menfeetên wan fermanber bin û bi serê xwe jî xurttir nebin. Di vê maweyê ra sefera Rewanê (1635) çêdibe. Mîrê Hekkarîyê Mîr Imadeddîn jî ji hikumeta Osmanîyan dûr disekine û dest diavêje ser sancaqa Miksê. Li ser vê Mîr Seyîtxan serî li Dîyarbekirê dide û rewşa sancaqa Miksê ji Artêşa Humayûn ra vedibêje. Paşê tê, bi piştevanîya serrêveberê Wanê Hasan Paşa dixwaze ku cardî vegere û sancaqa xwe bistîne, bes bi ser neketîye. Her wiha fermana ku bi xwe ra

anîbû jî ji alîyê Mîrê Hekkarîyê ve, ku Mikis bi dest xistibû, nehatîye qebûlkinin.(Hakan, 2002:26)

Di sefera sala 1638an a li ser Îranê ve ku sersefer jî Padîşah bi xwe bûye, da ku Kelha Wanê û derdora wê bê parastin ji sancaqan esker hatine xwestin. Sancaqa Miksê jî 15 leşker şandine. Dema ku Ewliya Çelebî di sala 1655an da eyaleta Wanê zîyaret dike, qeyd dike ku wê wextê Mikis wek sancaqeke Wanê bûye. Di ser 20 sancaqan fermanrewatîya Dewleta Osmanî hebûye ku wezîfedan û yan jî wezîfestandin di destê wan da bûye. Lê belê Mikis di nav wan sancaqan da nebûye. Wan sancaqan bac didane eyaleta Wanê. Ji bilî van sancaqan rêveberîyên wek Mehmûdî, Hekkarî û Bitlîsî hebûne ku ew wek mîrektîyan bûne û wisa dixuyê ku Mikis jî di nav wan da bûye û ji Osmanîyan serbixwe rêveberîya xwe kirine. Dîsa Ewliya Çelebî behsa van bûyer û salan dike ku şerek di navbera walîyê Wanê Melek Ehmed Paşa û Mîrê Bitlîsê Mîr Ewdal Xan da diqewime, bes begên wan sancaqên girêdayî eyaleta Wanê dil pê nakin ku bikevine şer û destekê nadin walîyê Osmanîyan. (Hakan, 2002:28)

Ji van salan heta salên 1800î zelalîyeke baş tune ka çî û çawa qewimîye, lê tê zanîn ku hinek mîrektîyên Kurdan ên wek Botan, Hekkarî, Mehmûdî, Behdînan û Soran bi hêz bûne û desthilatdarî kirine ta dawîya sedsala mîrektîyan. Tê gotin ku mîrektîyên wek Mikis, Hîzan û Sipayêrdê ji hêz û qeweta xwe kêr kirine û wek sancaq bi wîlayetên hikumeta Osmanî ya navendê ve mane. Herêma Miksê jî her wisa ber bi sedsala 19an ve di navbera mîrektîyên Botan û Hekkarî û rêveberîya Osmanîyan a Wanê da wek herêmeke tampon rol û fonksîyon dîtîye.

Rêveberîya Miksê di nîveka sedsala 18an da her çî qas mîrektîya Botanê pejirandibe jî di serê sedsala 19an da ketîye bin bandora mîrektîya Hekkarîyê. Di sedsala 18an da hin malbatên sereke hebûne ku di desthilatdarîya Miksê da cih girtine. Ev malbat wek ku di *Şerefnameyê* da jî derbas dibe xwe ji nesla Ebdal Begê mîrê ewil ê Miksê dîtine û bi begên Hîzan û Sipayêrdê ra jî xizm û pismam bûne. Ji van malbatan yek jî Eyûbxanbegî ne ku li merkeza Miksê û gundên derdor serdest bûne. Ya duyem Begên Mîr Muhammedî bûne ku ew jî li gundê Şingirîs û derdora wê bi cih û war bûne. Malbata Zeynelbegî jî li gundê Sipkanîsê hebûne û li wan derdoran hakimî kirine. Her wiha Kelehî jî malbateke hikumran bûye. Di nav van

malbatên sereke da ya ku mezintir bûn û hukmê xwe berfirehtir kirin Eyûbxanbegî bûn û bi navê Abdî Beg û Mîr Ehmed du kurên wî çêbûne. Heta wextê Abdî Beg di malbatê da rêveberî bi vî awayî saz bûye: Seyîdxan Beg, Mîr Sêvdîn, Zeynel Beg, Ahmedxan Beg, Eyûbxan Beg, Abdî Beg. Yazdeh kurên Abdî Bêgî çêdibin û îca ew sulale wek Malbata Eyûbxanbegî hatine nasîn. Tê rîwayetkirin ku Eyûbxan Beg û kurê wî Abdî Beg exlebî li dij mîrektîya Botanê micadele dane. Her çî qas Abdî Beg meqsed dike ku tevî Miksê bixe bin desthilatdarîya xwe, malbatên wek Zeynelbegî û Mîr Muhammedî destekê nadinê û ew jî negihiştîye encameke teqez.. (Hakan, 2002:37)

Piştî Abdî Beg birayê wî Mîr Ehmedê Kal serkarîya malbatê ji kurê Abdî Begî Şêxî Beg ra dihêle. Ji vir û şûn da hêza mîrektîya wan cardî zêdetir dibe. Digel xwişka Şêx Sebhetullahê Arwasî ra dizewice û bi vê wesîleyê jî piştgirîya malbatên şêxan jî distîne. Dixwaze ku li dij Mîrektîya Hekkarîyê rabe û bac û xeracê nede wan. Bes ev fikra wî ji alîyê malbatên wek Zeynelbegî û Mîr Muhammedî ve nayê qebûlkirin. Lewma jî Şêxî Beg bêgav dimîne ku ewil bi wan malbatan ra micadele bike. Bi alîkarîya eşîrên wek koçerên Alikan û yên derdor dibe hakimê herêma Miksê. Cardî wek Mîrê Miksê digijin hêza xwe ya mîrektîyê. Piştî vê xurtbûnê Şêxî Beg dest bi hereketên eskerî dike û diavêje li ser baregeh û kelhên cîranan û wan bi dest dixwe. Pêra pêra Kelha Paxasê jî ku di herêma Kawaşê da cihekî stratejîk bûye, digire bin bandora xwe. Paşê Şêxî Beg van hêzên Ebbasî ku xwe wek mîrebayên Mîrektîya Hekkarîyê didîtin berteref dike û qismê zêde yê Kawaşê jî digire bin mahîyeta xwe. Piştî qasekî, rêvebirên derdorê yên wek Mîrektîya Hekkarîyê û mîrîbayên wan ji vê rewşa hanê bêzar dibin û li ser rêyekê difikirin ka çawa Şêxî Begî ji holê rakin û ji bin bandora wî derkevin. Vê wezîfê didin serrêvebira desthilatdarîya Ebbasî ya Şaxê ku navê wê Saadet Xanim bûye. Saadet Xanim, ku wek Adile Xanim jî tê zanîn, xeber ji Şêxî Begî ra dişîne, dîyar dike ku ew ji ber wan serkeftinên wî şad e û wî pîroz dike. Paşê pêşniyaza zewaca pê ra dike ger Şêxî Beg jî qebûl bike û wî vedixwîne seraya xwe. Şêxî Beg vê teklîfê qebûl dike û digel 30-40 zilamên xwe ve diçin û bêyî ku haya wî ji melhezeya wan a esil hebe li wan dibin mêvan. Axir, Adile Xanima Ebbasî wê şevê bêbextîyê li wan dike û Şêxî Beg di xew da tê kuştin û zilamên wî bi begê xwe yê kuştî ve di paş da vedigerin. (Jaba, 2000: 47; Hakan, 2002:39)

Şairê wî çaxî ku Weda'î ye û hem jî debîrvan û şêwirmendê Şêxî Begî ye, li ser vê qewamê pir xemdar dibe û mersîyeyeke bi navê *Îro Ji Destê Felekê* dinivîse. (Weda'î, 2012:98)

Îro ji deste felekê

Kanê cîhangîrê cîhan

Bigrîn ji bo Şêxî Begê

Kanê cîhangîrê cîhan

...

Esker helgirt û çûyî Şax,

Pêk ve hinarin çûye Tax,

Ev çerx pir azar e ax,

Kanê cîhangîrê cîhan.

Joryan şihand û mîr birin,

Sed sond û 'ehd jê re kirin,

Mekrê jinan her hazir in,

Kanê cîhangîrê cîhan.

Mîr xwendin û birne herem,

Jê re kirin sond û qesem,

Vêk ra kirin lutf û kerem,

Kanê cîhangîrê cîhan.

.....

Piştî kuştina Şêxî Beg malbata Eyûbxanîyan wek serek Xan Mehmûd qebûl dikin û kurê Şêxî Beg Muhtila Beg jî dibe rêvebirê Miksê. Xan Mehmûd wek mîrekî jêhatî, wêrek û hişk tê nasîn. Pêşî dest pê dike ku wan deverên ku berê di destê wan da bûne, cardî bi dest bixin û hakimîyeta xwe berfirehtir bikin. Bi malbatên hêzdar ên derdora xwe ra dikevin şeran û wan jî têk dibin. Piştî ku piştî xwe qewî dike, Xan Mehmûd bi Bedirxan Begê Botî ra hevkarîyê dike û tevlî serfihildana wî dibe. Li dû şikestina hedîseya Mîr Bedirxanê Botî ew jî digel wî tê girtin û tê mişextkirin. Piştî vê qewamê dîsa jî kurê Şêxî Beg Mihtila Beg rêveberîya Miksê dike. Mihtila Beg ji lew ku li ser edalet û xweşîyê rêveberîyê dike, çî ermenî çî misilman, ji alîyê xelkê

Miksê hemûyan ve tê hezkirin û destekkirin. Wek ku li jor jî hatibû qalkirin, di meseleya koçberkirina Ermenîyan da zehf hewl daye da ku jin û zarok û yên bêguneh neyên qetilkirin û li wan xwedî derketîye. Di diroka wê heyamê da wek rêvebirekî ku li herêma Miksê pêşî li qetlîamên mezin girtîye tê nasîn. (Hakan, 2002:40)

Romannûs Elîyê Evdîrehman jî xwestîye ku romanekê li ser vê kesayetê dîrokî binivîse bes hê netemambûyî umrê wî bi têrî nekirîye û roman nivîşkan maye. (Uzun, 1995:386).

### **1.7. Kelepora Xwendin û Îlmê ya li Miksê**

Li her derê dinyayê ji bo şaristanîya mirovahîyê derîyê herî ronak, zanîn û fêrbûna xwendinê bûye. Wek mijûlahîyeke zêhnî û kitêbî, xwendinê asta xweşikahîya jîyanê li mirovan her û hey bilind kirîye û rengekî çê daye muamelat û kesayetîya wan.

Bêguman, pingara xwendin û zanînê di her dewreke dîroka mirovahîyê da cuda bûye û her wisa di her erdgarîyê da jî bi şêl û şemalekî dî derketîye. Wek cografya, îklîm, kodên çandî û civakî, gelek faktor hene ku li ser prosesa xwendin û zanîna mîletekî tesîr kirîye. Sazîya rêveberî û desthilatdarîyê jî her wisa yek ji wan egeran e ku bi tevlîbûna xwe ve kar û barên xwendinê binbandor kirîye. Di tarîxa mîletê kurd da jî ji xwendin û zanyarîyê danehev û tecrûbeyek heye ku hêjayî gotin û qeydê ye, ku ew jî wek sazîyeke dîrokî ya ilm û fêrbûnê medrese ne. Medrese wek kelîme, ji zimanê erebî tê û cih û mekanên ku tê da ders tê dayîn, tadrîsat tê kirin, perwerdehî çêdibe û karê xwendin û ilmê pêk tê ye.

Li erdnîgarîya kurdan jî, wek sazîyên ilm û xwendinê, medrese di dema mîrektîyên kurdan da vebûne, di nav demê ra geş bûne û hasilat dane. Piştî rêveberîya Dewleta Ebbasîyan bi dawî bûye, li cografyaya Kurdan hikumetên sîyasî yên wek mîrektîyan ava bûne, qewm û herêma xwe bi rê ve birine. Ji bilî rêveberî û berevanîya devdorên xwe, van mîrektîyan zehf qîmet daye xwendin û tehsîlata mîletên xwe. Lewma jî medrese dane avakirin û destek dane dersdar û dersgiran. Alim, seyda û zanayên gelek wecda derketine û feqe û şagirtên heweskar û jêhatî ji van deran îcazet standine. Paşê, belavî nav mîletê xwe bûne. Ji vê kelepora xwendin

û ilmê mirateyeke wisa berfireh çêbûye ku asta xwendin û xwenasîna wî miletî di pêş de çûye û jê ziman, çand û edebîyateke geş maye.

Ji van mîrektîyan yek jî mîrektîya Miksê ye ku herêma xwe bi rêvebirineke pak idare kirine, avahîyên ilm û xwendinê dane çêkirin. Di heyama van xanedanîyan da ji bilî niştecihtîya li deverên gundewar niştecihtîyeke di jî derdikeve pêş ku ew jî bajarî û bajarvanî ye. Agahîyeke edetî ye; tê zanîn ku di navbera bajarvanî û rewşa rewşenbîrî û zanînê da jî li her heyam û li her devereke dinyayê her dem peywendîyeke rasterast çêbûye. Wate, rêveberî çend qewî û qenc bûye, bajarvanî bi pêş da çûye; bajarvanî çi qas geş bûye ew çend ilm û zanîna wê dever û wî miletî jî ji xwe zêde kirîye û kemilîye. Ev korelasyona ku her ber bi erênîyê ve ye bê guman rê li ber çêbûn û kemilîna ziman û edebîyatê jî vekirîye û rê daye ku zana û berhemên hêja derkevin da ku ew milet xwe pê ronî û îdare bike. Tam jî di vê nuqteyê da tespîta Zülküf Ergün îcabî gotinê ye ku wiha dîyar kirîye:

Ew nîrxên madî û manewî yên ku şaristanîyê pêk tînin li bajaran dihat afirandin. Weku unsûrên madî yêh şaristanîyê; perestgehên dêrîn, dêr, mizgeft, seray, pir, peyker, kanî, hemam, şanogeh û tiştên mîna van tev li bajaran dihatin çêkirin. Her wiha xwendin, perwerde, rêxistina dîn, cemaetên dînî, hîyerarşîya civakî, rêvebirin, nivîs, edebîyat, zanist û huner jî li bajaran derketin holê. Ji ber vê jî mirov dikare bibêje ku bajar destpêka pêvajoya şaristanîyê ne û bingeha şaristanîyê jî bi bajarvanîyê ra hatîye avêtin. (Ergün, 2014:49)

Xanedanî û bajarvanîya Miksê jî ne derveyî vê qaîdeyê ye, ku ev pêvajoya ku li jor hat qalkirin di serdema mîrektîyan da tê dîtin. Van her du faktoran tesîreke pozîtîf li mîrateya ilm û xwendinê jî kirîye. Di dîroka îlim û îlimdarîya miletê kurd da cihê medreseyên ku li Miksê hatine avakirin gelekî muhîm e. Mîna tekya û medreseyên deverên di di nav van medreseyên Miksê da jî di warê fiqih, hedîs, tefsîr, kelam, hiqûq, tesawif, ilm û zanîna Îslamê da xwendin û tedrîsat hatîye kirin û bi vî awayî jî kelepora çand, ziman û edebîyatê jî derketîye holê.

Dema em li tarîxa xanedanîya Miksê dinêrin, hin mekan dertên pêşîya me ku gelek şexsîyetên berhemdar ên ilm û edebîyatê derxistine. Ev medrese ji bo derdorên ilm û irfanê balkêş bûne û ji mîr û rêvebirên heyamên xwe piştgirî û destegirî standine.

Yek ji wan jî Medreseya Mîr Hesenê Welî ye ku rêya zehf kesên alim û xwenda tê ra derbas bûye. Mîr Hesenê Welî (1520-1566) yek ji mîrên Miksê bûye ku heyama rêveberîya wî gelekî wecda bûye û li tarîxê jî bi navekî qenc hatîye tomarkirin. Ev şexsîyet ji ber ku zêde bîaqil bûye, paş û pêşîya xwe dîtîye, û gelekî jî dîndar û xweşbîn bûye, Miksîyan ew wek welî dîtîye û pejirandîye. (Epözdemir, 2015:60)

Di dîrok û herêma Miksê da her çî qas tekyaya û medreseyeke kevin û navdar jî be di der barê vî cihê han da agahî û pêzanînên ew çend berfireh tune. Tê dîyarkirin ku milkîyeta li ser şexsê xwe giş dibexşîne û Weqfa Mîr Hesenê Welî dide avakirin. Tekya û medreseya wî dibe navenda xwendin, ilm û irfanê. (Hakan, 2002:22)

Der barê vê babetê da Feqî Huseyin Sağniç jî agahîyeke wiha dide: “Mîr Hesenê Welî yek ji wan mîrekan bû ku nêzikî 800 sal berî dema me, li çîyayê Axîrofê tekyayek ava kiribû û dixebitand. Bi vê tekyayê çûn û hatina Miks û Kawaşê ji bêewlewîyê derxistibû. Li rexê tekyaya xwe ji bo îbadeta misilmanan mizgeftêk û ji bo îbadeta xiristîyanan jî dêrek ava kiribû. Medereseya wî ya li nava bajarê Miksê navdar bû. Ew avahîyên qenc ên Mîr Hesenê Welî heta salên 1960’ê jî xebata wan dewam kirîye. (Sağniç, 2002:369)

Wek dorhêla xwendin, ilm û zanîne, li Miksê yek jî medrese û tekyaya Erwasî heye ku ji serdema avabûna xwe ta niha karîgerîya wê bi çend awayan ve berdewam e. Wek malbat û hereketeke pêşîronkirin û îrşadê xwedî paşxaneyeyeke dîrokî tê zanîn.

Malbata Erwasîyan di sedsala XIII. a miladî de piştî dagirkirina Bexdayê bi destê Hulagû, ji Bexdayê veqetîyane. Li gor zanyarîyên di destê me de ev malbat hemî cih û warên xwe yê Bexdayê hiştine û 14 Rebûlaxir 696/10 Çile 1297’ê de ber bi Mûsilê ve bi rê ketine. Demekê li Mûsilê mane û paşê çûne Reha û Bilîs û Sêrtê û di van deveran de bi cih bûne. Di wê demê de mezinê malbata Erwasîyan Hecî Qasim Bexdadî bûye û Hecî Qasim beşeke ji malbata xwe li Şîrwanê bi cih kirîye. Hecî Qasim Bexdadî bi neseba xwe digihîje Şêx Abdulqadir Geylanî. Kurê Hecî Qasim Bexdadî yê mezin Muhammed ku bi leqeba “Qutub” tê nasîn, bi fermana bavê xwe diçe devera Colemêrgê û Mîr Brahim Xan zîyaret dike. Piştî vê zîyaretê Brahim Xan keça xwe Fatima bi Muhammed Qutub re dizewicîne. Tê gotin ku Brahim Xan bi xwe di gel Muhammed Qutub tê Miksê û di gundê Erwasê de ji bo zavayê xwe

Muhammed Qutub di sala 740/1399'ê medrese û tekve û mizgeftê ava dike. Muhammed Qutub di vê medresê de him muderisê ewil him jî wek şêxê terîqeta Qedirî yê ewil dest bi wezîfê dike û xelkê Miksê irşad dike. Ev medrese bi navê *Medresa Erwasî* di nav Miksê û derdora Miksê tê naskirin û bi sedan sal e bi vî navî xizmeta xwe didomîne. Medresê Erwasê ji aliyê edebîyata Kurdî û belavkirina zanistên Îslamî bi zimanê Kurdî ve xizmetek mezin kirîye û roleke mezin listîye. Lewra muderisê ewil ê medresa Erwasê Muhammed Qutub, di qada tîbbê de bi zimanê Kurdî kitêbek nivîsandîye. Navê kitêba wî *Kitabu't-tib* e. Tê gotin ku berhema pexşanê ya bi zimanê Kurdî ya ewil ku hatîye nivîsandin ev berhem e. Di kitêba *Îkdu'l-Cumân* de tê gotin ku ev berhem di gel kitêba *Hawle'l-Edebi'l-Kurmancî* ya Tehsîn Brahim ed-Dûskî li Erbilê di sala 2004'ê de hatîye çapkirin. (Kavak, 2014: 23).

Muhammed Qutub ku wek Şêx Muhammed Erwasî yan jî wek Melayê Erwasî jî tê zanîn li ser gîya û dermanan bi kurmancî pirtûkekê dinivîse ku navê wê jî Tiba Melayê Erwasî datîne. Wek metneke pexşanî, vê berhemê jî di dîroka kitêxaneyê kurdî da cihekî taybet girtîye. (Yıldırım, 2013: 12)

Di kevneşopîya avahîsazîya vê medrese û rêyê da çend navên girîng û dîrokî hene ku niha jî di nav gelê herêmê da baş û bi dilşadî tên yadkirin: Seyîd Abdurrahîm Erwasî (w.1786), Seyîd Abdurrahman Erwasî, Seyîd Sibxetullah Erwasî (w. 1829), Seyîd Fehîm Erwasî (w.1895)

Ji vê malbatê kesek heye ku di weşangerî û rewşenbîrîya kurd da xwedî cihekî bijare ye ku ew jî Muhammed Şefîk Erwasî ye ku di kovara Kurdistanê da sernivîskarî kirîye ku di sala 1919an da li Stenbolê derdiket. Her wiha dîwana Melayê Cizîrî jî di wan heyaman da daye çapkirin. (Aydeniz, 2013:41)

Ji kesên navdar ên ku ji vê kanîya ilm û tadrîsatê têhnîya xwe birîye yek jî Seîdê Nûrsî ye ku di îcazeteke xwe da behsa Seyîd Fehîm Erwasî dike.(Kavak, 2014: 23).

El hasil, çî bi erdnîgarîya xwe ve çî bi dîrok û rêvebirîya xwe ve û çî bi ilm û medreseyên xwe ve, devera Miksê di avahîsazîya şaristanîya Kurdistanê da cihekî berfireh û muhîm digire.

# BEŞA YEKEM

## 1. JÎYANA LAXER/MELA UMERÊ AŞIQ

### 1.1. Nezelalîyên Der Barê Nasnavê Laxer û Ronîkirina Mijarê

Bi xebat û lêkolînên ku di van salên dawîn da pêk tên xwelî û xubara li ser cewherên dîroka edebîyata kurdî her diçe radibe û axir çî hebe bi zelalî dertê ber çavan. Bi vî awayî jî nedîyarî û şaşîyên li holê eşkere dibin û rastîya esas her çî be tê eyan û beyanê.

Laxer jî, ku wek Mela Umerê Aşiq an jî wek Mela Umerê Tînîsîyê Miksî jî tê zanîn, yek ji wan cewher û şexsîyetan e ku hem ji bin wê xubarê dereng hatîye derxistin hem jî bi nasnavê xwe ve bi hin şairên dî ra hatîye tevlihevkerin û di qeyda dîroka edebîyata kurdî da xelet hatîye bicihkirin. Lewra mexlesa Laxer di tarîxa edebîyata kurdî da ne ji alîyê kesekî tenê ve hatîye bikaranîn. Her wisa tê zanîn ku Xalid Axayê Zêbarî jî ev mexles emilandîye. (Adak, 2014:264).

Nasnavê Laxer yekemîn car di sala 1959ê da dema Mela Ehmedê Zivingî şerha xwe ya dîwana Melayê Cizîrî çap dîke, berçav dibe û dîna baldarên mijarê dikşîne. Di berga duyem a şerha bi navê *el-Îqtu'l Cewherîyyu fi Şerhî Dîwana Cizîrî* ya Mela Ehmedê Zivingî da li ser nasnavê Laxer texmîsek jî tê weşandin, ku ev texmîs li ser helbesteke Melayê Cizîrî ye. Zivingî jî di despêkê da îma dîke ku Laxer şairekî Kurd e û her wisa ji ber ku ketîye nav daneya dîwana Cizîrî, dibe ku hevdemekî Melê bi xwe jî bûye. Vê texmîn û destnîşankirinê ji bo lêkolerên paşê hizreke wiha çêkir ku madem wisa ye divê heyamê vî şairî kevin be û hetta dibe ku ev şair şagirtekî Melayê Cizîrî bûye. (Doskî, Şemrexî, 2011:5).

Ev nezelalî bi vî rengî heta sala 1983yan wek xwe dimîne ta ku pirtûka Sadiq Bahaeddînê Amêdî ya bi navê *Hozanvanê Kurd* dertê pîyaseyê. Çî heye ku agahîya ku ev pirtûk jî dide wê perdeya xumanîya li ser nasnava Laxer qatmertir dîke û şaşîtîyeke dî diqewime. Ew jî xwe dispêre gotinên şifahî yên derdora Behdînanê ku hatîye gotin ku nasnavê Xalid Axayê Zêbarî esildanî Laxer bûye. Lewma jî ji wir û şûnde der barê Laxer da çî hatîye gotin û nivîsîn, bêyî ku bingeheke rasteqîn pê ra

hebe, tev teşmîlî Xalid Axayê Zêbarî kirine. Îca, qineteke dî jî pê ra çêbûye û gotîye madem Laxer Xalidê Zêbarî ye, ku we, ew dê xwedanê *Beyta Sêsebanê* jî be û her wekê tê gotin li ser çax û dema Mela Mensûrê Girgaşî û Bateyî yan jî li dû wan bi heyameke bi çend salan jîyaye ku ev jî tê miqabilî dûmahîya sedsala panzdehan û serê sedsala şazdehan. Û Sadiq di kitêba xwe da hindekî ji *Beyta Sêsebanê* ya Xalidê Zêbarî vediguhêzîne, bes jê nayê zanîn ku ew Laxer e û şî'reka Laxerî jî ji destnivîsekê vediguhêzîne û ji wê jî nayê zanîn ku ew Xalidê Zêbarî ye. Lewma jî agahîyên ku di pirtûka bi navê *Hozanvanên Kurd* da derbas dibe ji rastîyê ber bi gumanê ve diçe (Doskî, Şemrexî, 2011:6).

Ev guman û nezelaî wiha her berdewam dike ta ku bi gotina Tehsîn Îbrahîm Doskî ew rastî Laxerekî dî tîn ku perçeyek ji dîwana Laxer dikeve ber destê wan û êdî ew pê emîn û piştrast dibin ku Laxer ne Xalid Axayê Zêbarî ye, bilakis ew Mela Umerê Aşîq e ku ji hêla Miksê ji gundê Tînîsê ye û wî di helbestên xwe da wek mexles Laxer bikar anîye.

Bi vî awayî xwelîya li ser vê babetê tê avêtin û êdî tê zanîn ku erê, bi navê Laxer şairekî kurmançî heye û ew jî Mela Umerê Tînîsîyê Miksî ye.

Wisa tê bawerkirin ku sebebê jî heye ka çima ev tevlihevî çêbûye; ku ew jî ev e ku Mela Umer di heyamê mihacirîya şerê Osmanî û Êris da ji Miksê mişext bûye û çûye Beroşka Behdînanê bi qasî sê salan li wir maye û li wan deran miderisî kirîye. Tê gotin ku muhtemelen helbestên Laxer vê heyamê li van deran belav bûne û paşê di nav milletê wê deverê da eslîyeta meseleya Laxer şilû bûye û ka Laxer mexlesa kîjan şairî bûye bi zelalî nehatîye zanîn û lewma jî her helbesta ku li ser nasnavê Laxer hatîye dîtin nîspetî Xalid Axayê Zêbarî kirine.

Ji bo şair û nivîskaran di bijartina nasnavan da jî helbet hin saîq û melhezên cuda hene. Gava meriv li jîyan û hizra Mela Umerê Tînîsî agahdar dibe meriv bi aşkerayî dibîne ka çima şair ev nasnav ji xwe ra bijartîye û li ser vê nasnavê helbest nivîsandine. Wek kesekî ehlê tesewif û edebîyatê, Mela Umer xwedî dilnizmîyeke xas bûye û ji xwe ra heyateke sade bijartîye. Xwe mezin nedîtîye û wek hizreke nefspiçûkî ji xwe ra mexlesa Laxer layîq dîtîye. Laxer, yanê kesê ji giregir û

nefsmezinîyê dûr; ji rêzê û sade. Ev xisûsîyet di nav ehlê eşq û irfana tesewîfî da ne tişteki tehecubê ye. Jixwe ev xala hanê di ruhê helbestên wî da dîyar e:

Bes e Miksî bike kutah li behsê  
Ji qîl û qalê Laxer şî'rê mensûb  
(xezel 1/7)

Mele Umerê Aşîq, her wiha ji xeynî Laxer bi navê Miksî mexleseke dî jî emilandîye. Hetta di zehf helbestên wî da ev her du mexles (Laxer û Miksî) bi hev ra hatine bikaranîn:

Ma murîdanê tewafîn der terîqê bê dilan  
Miksîyê Laxer bi şeydayê rewan tên roz û şeb  
(xezel 4/11)

Li alîyê dî, tê zanîn ku Mele Umer di nav derdor û beledên xwe da bi çend navên wek Mela Umer, Mela Umerê Aşîq, Mela Omerê Tînîsî, Mela Umerê Miksî, Mela Umerê Tînîsîyê Miksî û Laxer tê nasîn û bilêvkin.

## 1. 2. Herêm û Malbata Wî

Di çêbûn û geşedana însên da gelek faktor hene ku her yek ji hêlekê ve tesîrê li însên dike. Malbat û erdnîgarî jî ji wan du hêmanên girîng in ku rasterast bandorê li beden, kesayetî, kar û mijûlahîya meriv dikin û cihana wî dîyar dikin. Laxer jî di alîyê van her du faktorên da yekî bi siud û talih bûye ku di nav malbateke eşîrê û xwenda da tê dinê û li herêmeke wekê Miksê ku bi tarîxa mîrektî, bajarvanî, ilm û medreseyan xwe ve meşhur e, dijî.

Mela Umer kurê Abdussemedî ye û ji malbata 'Etûyîyan e ku di nav eşîrên Miksê da eşîreteke xurt û navdar bûye. Navê dêya wî Şewqîye ye; hetta bi zêdenav digotinê Şîmşeqîqe. Jineke zehf salîha bûye. Bi xwe jî mintesibê şêxê Arwasê bûye, yanê mensûbê Şêx Fehîmê Arwasî. (Taşkın, 2017)

Ev malbat li devera Miksê wek eşîreta Tînîsî jî tê naskirin, ku Tînîs gundeki Miksê ye û dikeve başûrê navçê, li nêzî derdora Arwasê. Tê zanîn ku ev derdor di

hêla ilm û tedrîsatê da gelekî baş bûye û bê hed alim, feqe û zanyar dane. (Doskî, Şemrexî, 2011:7)

Eslê binemala Mela Umerê Tînîsî ji devera Behdînanê ye. Tê gotin ku bav û kalikên wan li dor sala 1591ê zayînî ji gundê Beroşkê ber bi Bakur ve mişext bûne û çûne li bajarê Miksê li taxa Berojê cîwar bûne. Gundê Beroşkê gundeki eşîreta Doskîyan bûye û bi navê Beroşka Se'dûnî hatîye nasîn. Gundekî navdar û mezin bûye. Cihê ilm û zanîn û medreseyan bûye. Medreseya Beroşkê di nav medreyên derdor da navdartirîn medrese bûye û ji bo ehlê xwendinê cihekî balkêş û cazib bûye. Bo mînak, çavîyekî binemala Şêxên Birîfka nevyên Şêx Şemseddînê Exlatî hatibûne Beroşkê û li vir cîwar bûne. Hetta çend alim û zanayên di jî ji vê medreyê derçûne. (Doskî, Şemrexî, 2011:7)

### **1.3. Agahîyên Der Heqê Jîyana Wî**

Ji *îcazetnameyê* tê derxistin ku Mela Umerê Miksî li devera Miksê hatîye dinê, lê belê di kîjan salê da çêbûye teqez nayê zanîn. Lew ku *îcazeta* xwe di sala 1304ê mişextî/1886ê zayînî da wergirtîye (bnr. Pêvek 1), tê texmînkirin ku ew di derdora bîst û pênc salîyekê da bûye. Lewra jî ji vê tê derxistin ku sala jidayikbûna wî jî digihîje sala 1860ê zayînê yan jî derdora wê salê. (*Îcazetname*, 1886:14)

Wekê her zarokê li gundan wî jî temenê xwe yê biçûkatîyê li cihên avî û di nav gumrehîya siruştê da derbas kirîye. Bes di berê ra jî qesta xwendinê kirîye, li ber destê bavê xwe xwendîye û di nav feqeyên gund da ew jî yek ji wan feqeyên jîr û jêhatî bûye. Lewra tê zanîn ku Tînîsî ji berê ve mintiqekî ehlê mela û feqeyan bûye. Paşê wî jî, wekê ku ji bo gelek feqeyên herêmê eynî ye, berê xwe daye gundeki di da ku xwendina xwe bilindtir û zêdetir bike. Lew ku di wê heyamê li devera Miksê wek medreseya Mîr Hesenê Welî û Medreseya Arwasê medreyên navdar hebûne, li gor gotina nevyê wî Mela Evdilmecîd, Mela Umerê Tînîsî li van merdeseyan jî feqetî kirîye û ilmê xwe di ber kemalê ve ristîye. Paşê û ew pismamê xwe Mela Xurşîd bi hev ra çûne Cizîrê, bi çend salan li Medreseya Sor xwendine û li wê dere jî eşqa wan a helbesta Melayî zêdetir bûye. Digel hevalên xwe gelek wextên xwe, xaseten jî şevên roja îne, li ser merqeda Mela borandine û bi eşq û şewqeke nedîtî ji diwana Mela şîr xwendine. Bi xweşxwendina xwe ve û bi eşqa xwe ya şîrî ve di nav

hevalên xwe da Mela Umer pêşçav dibe û bala Seydayê xwe jî dikşîne. Lewma jî seydayê wî dixwaze dîwanê her wext bi wî bide xwendin. Bi vî awayî Mela Umer wek Mela Umerê Aşiq tê nasîn û navdar dibe. Paşê cardî vedigere bajarê Miksê û ji Seydayê Mela Şeban, ku seydayekî gewre yê Medreseya Mîr Hesenê Welî bûye, îcazetnameya xwe distîne. (Doskî, Şemrexî, 2011:9)

Piştî ku îcazeta xwe standîye, bi qasî deh salan li Medreseya Mîr Hesenê Welî midêrîsî kirîye û gelek feqeyên berkeftî mezûn kirine. Lew ku bi xwendin, dersdayîn û ilme xwe ra gelekî eleqedar bûye û eşqa helbestê û tesewifê lê daye, nîyet nekirîye ku bizewice û ji van kar û emelên xwendin, tehsîlat û eşqê dûr bimîne. Wî xwestîye ew her tim wekê seydayên xwe yê ruhanî Melayê Cizîrî bi ilm û edebîyatê ve mijûl be û jîyana xwe bi wî rengî kuta bike. Bes dêya wî îsrar kirîye ku bizewice û ew jî bi ruhê dayikane dixwaze miriweta lawê xwe bibîne û bibe xwedî nevî û nevîçirkan. Her wiha radibe diçe li ba Şêx Fehîm Arwasî ku ew Mela Umer îqna bike û wî di ber zewacê ra bîne. Axir Mela Umer ew neşkîndine û li ser xatirê du însanên ku di heyata wî da zehf hêja bûne, zewicîye. Mela zewicîye lê belê hiş û hinavê wî dîsa li ser eşqa xwendin û ilme bûye. Hetta ji feqeyekî wî, ku navê lê Şêx Mehme Qasim bûye, tê bihîstin ku Mela Umer di helbesteke xwe ya dirêj da li ser zewacê jî ferdekê ho gotîye ku meriv jê nememnûnîyeta wî ya ji zewacê derdixîne. (Taşkın, 2017)

Xwezil bi roja rehîne, ne xwezil bi ya mintehîbûne  
Aliman berda zewacê, ev çî bela û rîp e em ketine

Bi navê Nuredîn yek zarokê wî dibe û ew jî paşê dixwîne û dibe mela, û bi navê Mela Nuredîn dersdarî û melatîyê dike. Mela Nuredîn bavê Mela Evdilmecîd e ku niha jî Seydayê Mela Evdilmecîd li heyatê ye û derbarê bav û bapîrkên xwe û Dîwana wî da yê ku berfirehtirîn xwedî agahî ew bi xwe ye.

Mela Umer piştî dersdarîya Medreseya Mîr Hesenê Welî û piştî zewacê diçe gundê Teremaxa Miksê û dibe melayê wê derê. Heta mihacirîyê li wê derê melatîyê dike. Tê gotin ku Mela Umer li wê derê xutbeyên salane jî amade kirine. Paşê çî mela çûne wî gundî ew xutbe xwendine. Nevîyê wî paşê pirsîyarîya van xutban dike ku bi destxetên Mela Umer bi xwe bûne, lê belê nikare bi dest bixe. Jê ra tê gotin ku hinekan hildane û birine û firotine. (Taşkın, 2017)

Heyamê mihacirîyê ji bo Mela Umerê Aşiq jî bi xwe ra zext û dijwarî anîye. Ji ber şerê Osmanî û Rûsan devera Serhedê rojên dijwar borandine û Miks jî di nêv da, li gelek cihan şer û nexweşî çêbûne û xelkê deverê mecbûr mane ku derkevin û ji xwe ra penagehên dî bibînin. Lew ku li Miksê jî xelkê ermenî hebûne, tesîra van şer û pevçûnan sîrayetî van deran jî kirîye û zehf kurmancên herêmê cihên xwe şemirandine û derketine. Di vê hengamê da Mela Umer jî dil dike ku biçê Başûr. Bi malbatî diçine alîyê Behdînanê. Her çendî qesta gundê bav û kalikan, yanê gundê Beroşkê bike jî li gundê bi navê Memanê dimîne. Lewra wextê ku diçe, ewilî li Şêx Evdilqeharê Memanî dibe mêvan. Dema Şêx hay ji serpehatî û meseleyê dibe û dibîne ku seydayekî baş e, jê dixwaze ku Mela Umer li gundê wan bimîne û melatîyê bike. Ew jî qebûl dike û li medreseya lê miderisî dike û di alîyê ilm û xwendinê da gelek qencî û kara wî digihe wê medreseyê û herêmê. Tam sê salan li vir dimîne û paşê dîsa gava ku rewşa Serhedê normal dibe vedigere welatê xwe. Ev mayîna wî ya li devera Behdînanê, wek ku li jorê jî hatîye dîyarkirin, dibe sebebeke girîng ku helbestên li ser navê nasnavê Laxer li wan deran bilav bibin û derî li hin şaşîtî û nezalalyên der barê heqîqeta mexlesa Laxer da vekiribin. (Taşkın, 2017)

#### **1. 4. Terîqet û Ramana Wî ya Tesewifî**

Wek rê û rêzikeke ramyarî û dînî dîroka tesewif û terîqetê gelekî kevin û berbilav e. Di seyra tarîxa Îslamî da cihekî girîng girtîye û di meseleya ontolojîya însên da bûye rêyeke meşîyanê û hêwirgeheke xwelêvegir. Wek sazîyeke dînî, civakî, çandî û hetta polîtîk di tarîxa miletan da rol listîye û bi xwe ra hişmendî û hizreke xwedî rêzik pêk anîye. Di vê hişmendîya terîqetî û tesewifî da wek Xweda, Pêxember, Şêx/Murşîd sê hêmanên girîng hene, ku ji bo ehlê xwe rabiteyeke fikrî çêkirîye. Bêtir atmosfereke ruhanî û manewî daye avakirin. Ji vê hişmendîyê alim, zana, arif, aşiq û şairên gelekî baş û bandorker derketine û cihana însanan ronî û watedar kirine.

Meriv wextê hem li serdema Laxer tê da jîyaye hem jî coxrafyaya lê maye û xwendîye binêre, wek derencam dertê holê ku ne pêkan e ku kesên bi ilm û xwendinê ra eleqeder bûbin ne girêdayî rêyeke yan jî ekoleke hizrî bin û nebin ehlê terîq. Lewra ev serdem ew serdem e ku di herêma kurdan da bi hin sebeban bergeha terîqet û tesewifê gelekî berfireh bûye û rengê xwe daye pergala civakê û ruhê însanan. Mela Umerê Tînîsî jî yek ji wan alim û arifan e ku ew jî bi ruhîyeta xwe ve di nav vê

atmosfera da sêwirîye û ji bilî melatî û dersdarîyê ew bûye ehle terîq û her wiha şairê eşqê.

Bê guman, du wargeh û ekolên tesewifê rasterast tesîr li ser Mela Umer û cîhana wî ya derunî kirine. Ji van yek jixwe dergah û atmosfera Arwasê ye ku bi malbatî ehlê vê derê ne. Lew ku dêya wî yek ji murîdên sadiq ên mala Arwasîyan bûye, Mela Umer hê di malzarokatîya dêya xwe da dikeve bin tesîra vê dorhêlê. Ev dorhêl ji terîqa Neqşibendîyan bûye û di heyamê Mela Umer da yê ku serîrşada wan kirîye jî Şêx Fehîmê Arwasî bûye. Mela Umer ew qas pevgirêdayîyê wî ye ku li ser gotin û emrê şêxê xwe dizewice. Şêx Fehîm kurê Şêx Evdilhemîdê kurê Şêx Evdirrehmanê kurê Qutbê Arwasî ye. Di sala 1241ê hîcrî/1825ê zayînî da hatîye ser dinê û 1313ê hîcrî/1895ê zayînî da çûye ser dilovanîya Xwedê. Ew yek ji wan şêxên neqşibendîyê yên navdar bû û xelîfeyê Seyîd Tahayê Nehrî bûye. (Doskî, Şemrexî, 2011: 11)

Şewqîyê Xanî jî ku şairekî xwedî dîwan e, wek Laxer girêdayî terîqa nexşibendîyê ye û murîdê Şêx Fehîm Arwasî bûye. Her wiha wî li ser şêxê xwe helbesteke kurmancî jî nivîsîye. (Adak, 2017: 61)

Wargeh û atmosfera duyem jî hawirdora Medreseya Sor e ku Mela Umer hewayekî manewî û edebî wergirtîye ji ruhanîyeta Melayê Cizîrê û helbestên wî. Ger meriv bibêje ku Mela Umer perwerdehîya xwe ya tesewifî ji dergahê Arwasê, ilmê melatîyê ji medreseyên derdor, xasseten ji Medreseya Mîr Hesênê Welî û şîyana xwe ya edebî jî ji Cizîrê standîye, nabe derencameke xelet. Lewra hem ji rîwayetan hem jî ji helbestên Laxer dîyar e ku ew ketîye ber eşqa Melayê Cizîrî û di bin tesîra helbestkarîya wî da jî gelekî maye. Malika li jêrê bi peyvsazî û naveroka xwe ve ji ya Melê ew qas ne dûr e:

Min sehergeha ezel dî meyfiroşan rast û çep

Reqs û best in tèn semayê dûş bi dûşan rast û çep

(xezel 3/1)

Li gorî rîwayetên ku ji feqa û endamên malbata wî hatine ta niha, Mela Umerê Aşiq xwedî kerametên jî bûye. Dema haya meriv ji heyat, kesayetî û mijûlahîyên wî dibe, meriv bivê nevē îhtîmala mimkunatê dide van rîwayetan. Hem qencekî Xwedê

bûye, hem kar û emelê wî tev ilm û irfan bûye. Her wiha bi derûnîyeta xwe ve ehlê eşq û tesewifê bûye û sofitîyeke kaw û xas jî lê hebûye. Yek ji wan kerametan ev bûye ku dema Mela Umer wefat dike diqewime û gundî tev dibin şahidên vê hedîseyê: Roja Mela Umer wefat dike, refek teyrên spî tîn û li serê banê wê mala ku tê da ruhê xwe teslîm dike, datînin. Gava cenazê wî dibin cihê şuştin û kefenkirinê, ew refa teyrîkên spî difirin û cardî tîn li serê banê wê hewşîkê vedidin. Wextê gundî darbestê radikin û dibine nav goristanê, ew refa teyrîkan jî wan teqîb dikin û diçin li serê dareke nav zîyaret da vedinişin. Heta kar û barê veşartina cenazeyî xilas dibe ew refa teyrîkan ji wê derê venaqetin û tev berê xwe didine ser qebra Mela Umer. Piştî telqînwendin û veqetana gundîyan, tê dîtin ku refa teyrîkan tîn xwarê û diçin li ser gora taze datînin. Bi qasekî li ser tîrbê dimînin û paşê radibin û fir didin diçin. Gundî tev şahidîya vê qewamê dikin û hin gundî jî hey wax dikin, heyfa xwe tînin ku wan heqeten jî Mela Umer nas nekiribûne û dikevin nav derûnîyeke nedameyî.(Taşkın, 2017)

### **1. 5. Mirina Wî**

Mela Umer piştî ku ji Behdînanê vedigere û tê, li Miksê zêde nemaye û hatîye gundê Îrçê bi cih bûye, ku ev gund gundekî mintîqa Xavesorê ye. Salek du salan li vir dimîne, paşê diçe gundê bi navê Sêvakraka Artemêtê. Li vî gundê hanê jî du salan melatî kirîye û paşê ji vê derê jî mal bar kirîye.

Axir, piştî umrekî li pey ilm, irfan û şîrê ku wekê mêşeke hingîvê ji wir û vir hildaye û di kewara xwe ya jîyanê da berhev kirîye, Mela Umer di dawîyê da tê li gundê Zivistanîyê bi cih dibe û melatîya xwe dewam dike. Gundê Zivistanî, wek ku di xebata Tehsîn Doskî û Huseyn Şemrexî da tê dîyarkirin ne gundekî devera Miksê ye. Ev gundê hanê gundekî navçeya Wanê Artemêtê ye û di navbera Artemêtê û Wanê da ye. Gund nêzikî behrê ye û dikeve serana Rêya Îpekyoluyê. Bi tirkî ji vî gundê hanê ra niha Elmalı Köyü tê gotin. Wefata Mela Umer jî li vî gundî diqewime û a niha di goristana gund da medfûn e. Li ser nivîsteka qebra wî ya ku ji hesinê hatîye dorpêçkirin û xemilandin wiha hatîye nivîsandin: Lağır Lükabi İle Meşhur Olan Müküslü Mulla Umeri Aşık, Vefat 1927 (yanê, Mela Umerê Aşiq ku bi Leqeba Laxer Meşhûr bûye, Wefat 1927).

Her wiha li vî gundî li ser navê Mela Umerê Aşiq qursxaneyeye Qur'anê ya zarokên kur jî heye ku girêdayî Miftûtiya Artemêtê ye (Edremit Müftülüğü, Molla Ömer-i Aşık Erkek Kur'an Kursu).

Di xebata Doskî û Şemrexî da tê dîyarkirin ku Laxer di sala 1912an da wefat kirîye, bes dema meriv bala xwe dide vê nivîsteka li ser qebra wî, tê dîtin ku Mela Umer ne di sala 1912an da wefat kirîye, ew di sala 1927an da çûye ber dilovanîya Xwedê (bnr. Pêvek 2).

Bi vî awayî, dertê holê ku gundê Zivistanî ne gundekî devera Miksê ye ku Mela Umer li wir mirîye. Ev gund wek ku li jorê jî hat dîyarkirin gundekî Artemêtê ye û di navbeyna Wan û Artemêtê da cî digire. Her wiha sala wefata wî jî 1912 nîne, lê belê sala 1927 e.

Ji sala tarîxa îcazname û ya li ser nivîsteka li ser gora wî em texmîn dikin ku Mela Umerê Aşiq nêzikê 76-77 salan umir kirîye û paşê wefat kirîye. (Îcazname, 1886:14)

## **1. 6. Alim û Edîbên Malbata Wî**

Di Kurdistanê da gelek malbatên malmelayî hene ku wek silsile bi sedan sal dewam kirine. Mela Umerê Aşiq jî yek ji van malbatan tê ku di dîroka ilm û edebîyata kurdî da nav daye û cih girtîye. Devera Tînîsê devereke xwendin û medreseyan bûye. Gelek alim ji wê derê derketine. Çawa ku di nav pêşyên malbata Mela Umerê Aşiq da alim û seydayên baş hebûne, piştî wî jî ji heman malbatê alim û edîbên ku hatine zanîn derketine, wec û tevkarî dane derdora xwe û milletê xwe. Ji wan em dê behsa çar şexsiyetan bikin.

### **1.6.1. Mela Xurşîd**

Mela Xurşîd kurmamê Mela Umerê Aşiq e û wan bi hev ra xwendine. Bi hev ra çûne Cizîrê û ji helbesta Cizîrî binbandor bûne. Li jor hat dîyarkirin ku seydayê wan ê li medreseya Cizîrê gelekî hij ji van her du feqeyên ji hêla Miksê kirine. Helbestên Melayê Cizîrî her daîm bi wan dane xwendin û haj ji aliyê wan yê edebî çêbûye. Mela Xurşîd her çi qas zewicîye jî lê belê di pişt xwe ve tu dûnde nehiştîye. Li hin

deveran melatî kirîye û bi helbestê ra jî mijûl bûye. Ji bilî tenê helbestekê, der barê ka dîwana wî hebûye yan na û çend helbest nivîsandine da tu agahîyeke zêde tune di destê malbatê da. Lê belê ji qencbûna vê şîrê wer xuya dibe ku Mela Xurşîd bi helbestnivîsandinê ra ser êşandîye û dibe ku dîwana wî jî hebe yan jî gelekî helbest nivîsandibin. Ji vê helbestê dixuyê ku bi navê Beyazî mexles jî bi kar anîye. Li ser gotina pismamê wî Mela Eta em hîn dibin ku rihê wî gelekî spî bûye, lewra ev mexles li xwe kirîye. Her wiha paşnavê vê malbatê jî vêga Beyaz e û tê gotin ku çîroka paşnavdanîne bi mexlesa Mela Xurşîd ra têkilidar e. (Taşkın, 2017)

### **1.6.2. Mela Nuredîn**

Mela Nuredîn kurê Mela Umerê Aşîq e. Wî jî melatî kirîye û ji edebîyat û helbesta kurdî dîr nemaye. Her çî qas di destê malbatê da helbesteke ku ji wî sadir bibe tune be jî, eleqe û mijûlahîya wî bi helbesta kurdî ra hebûye. Lewra çî ji dîwana Laxer mayî, wî bi dû ra cardî nivîsandîye û wî ev helbest û hin helbestên Cizîrî û Xanî di nav kitêbokekê da anîye ba hev û wek berhemek li pey xwe hiştîye. Mela Nuredîn hêj di zarokatîya xwe da bavê xwe wînda dike. Belkê jî lewra berhemên mîrateya edebî û ilmî ya bavê wî Mela Umerê Aşîq kêr gihîştine wî bi xwe. Di serê salên heştîyî da wî wafat dike. (Taşkın, 2017).

### **1.6.3. Mela Evdilmecîd**

Mela Evdilmecîd kurê Mela Nuredîn e û lewma jî dibe nevîyê Laxer. Paşnavê wî Beydaş e. Di sala 1953an dali gundê Deştû yê navçeya Şaxê hatîye dinê. Lewra di wê heyamê bavê wî Mela Nûredîn li wê derê mela bûye. Seyda li deverên cuda û li ba gelek melayan feqetî kirîye û ders wergirtîye. Di dawîyê da dibe feqeyê Şêx Şemsedînê Arwasî ku ew jî nevîyê Şêx Fehîmê Arwasî bûye. Îcaza xwe jî li gundê Arwasê distîne. (Taşkın, 2017)

Di herêma Wanê da îro wek alim û seydayekî pêş tê zanîn û nasîn. Li ser êş û nexweşîyeke giran, va çendeke dirêj e li Enqerê û Wanê tedawî dibîne. Di berîya nexweşîya xwe da li medreseya Mizgefta Îmamê Rebbanî ya li Tokîya Artemêtan muderîsî dikir. Bi navê Serkehnî pirtûkeke wî heye ku tê da bi zimanê kurdî, tirkî û erebî behsa heman mijarê kirîye. Pirtûk wek kitabeke nesîhet û we'z û meseleyên

dînî tê dîtin. Pirtûk bi alfabeya erebî hatîye nivîsîn û ji weşanên Pamukê derçûye. Her wiha Seyda Mela Evdilmecîd ji tradîsyona edebî ya malbatê jî nemaye kêr û her çî qas wek pirtûk derneketibin jî wî hin şîrên kurmancî nivîsîne.

#### **1.6.4. Mela Eta**

Mela Eta jî ji vê malbatê ye û pismamekî Mela Evdilmecîd e. Di sala 1962an da li Miksê li taxa Beroj hatîye dinê. Di temenke biçûk da dest pê feqetî û xwendinê dike. Mela Eta, hin cihan û li ba hin melayên navdar ên wekê Mela Taha û Mela Zekî ders radike. Vêga di 56 salîya xwe da ye û li mizgefta gundê Zivistanîyê melatî dike û di heman wextê da jî di medreseya bi navê Qursa Qur'anê ya Mela Umerê Aşîq da seydatîyê dike û dersan dide feqe û xwendekarên medreseyê. Mela Eta jî ji xeynî dersdarîyê wek gelek melayên dî ji hunera helbestê hez dike û ew bi xwe jî carnan helbestên kurdî dinivîse. Ew jî dixwaze ku siberoj li dû xwe, çî şîr çî menzûm, berhemên edebî û ilmî bihêle. (Taşkın, 2017)

# BEŞA DUYEM

## 2. VEKOLÎNA DÎWANA LAXER

### 2.1. ZIMAN Û KESAYETÎYA EDEBÎ YA LAXER

#### 2.1.1. Dîwana Wî

Kelepora nivîskî ya dîroka ziman û edebîyata Kurdî ji berê ve rastî helaketî û bêsiudîyên xirab hatîye. Yan di talde û kuncikên tarî da mane û ketine ber bayê kifkîbûn û rizîbûnê yan jî hatine dizîn û wek metayekî tîcarî hatine firotin û windakirin. Her wiha ji ber hin sebebên polîtîk ên nenormal jî, ku serdestan li vî zimanî û berhemên wê kirine, gelek berhem û xebatên wek dîwan û destxet hatine şewitandin û yan jî binaxkirin. Li aliyê dî terkexemîya li van însanên derdora van berhem û xebatan jî sersebebeke dî ye ku eserên kurdî tûşî mirin û windabûnê bûne û lewma jî di lêkolîn û lêgerînên roja îroyîn da dijwarî û nexweşkêşî dertên pêşîya lêkoler û xebatkerên vê qadê.

Dîwana Laxerî jî ji van karesatan nefilitîye û ew jî bûye xwedî tecrûbeyên dilşewat. Li ser neqîlkirina nevîyê wî Seydayê Mela Evdilmecîdê Mîksî, ku wî jî ji bavê xwe Mela Nureddîn seh kirîye, dîwana Laxerî dîwaneke kamil û mezin bûye û li ser hemî herfên hecayê hatîye nivîsîn. Lê belê, ji wê dîwanê ya ku maye roja îroj û niha li ber destan dixuyê, tenê helbestên ku bi qafiyeya elîfê heta qafiyeya dalê ye. (Doskî, Şemrexî, 2011: 11)

Mixabin ku şîrên dî li ber destan nemane. Felaketa ku hatî serê dîwana Laxerî jî wiha tê qisekirin: Mela Nuredîn havîneke mala xwe dibe zozanan, zozanên bi navê Çanoq ku wê demê ji gundê Şabûrê diçûne wir. Rojekê, dibe ba û bager, tavîya baranê xurt dibe û axir di dawîyê da lehî çêdibe û di ser zozên da tê xwarê. Ji reşmal û kepirên heyî, gelek ji wan li ber xezeba lehîyê dikevin û zerarê dibînin. Ji van avahîyan yek jî ya mala Mela Nuredîn bûye ku lehîyê daye ser û zehf xesaret daye kelmelên hundir. Gelek eşyayên wan; nivîn, firaq, kitêb û tiştên dî, axir çî hebe dane ber xwe û birine. Mixabin ku di nav navtûya malê da pirtûkên Mela Nuredîn jî hebûne û ji wan jî yek dîwana Laxer bûye. Zerarekî mezin digihe dîwanê. Diwan ew

qas şil dibe û di nav herî û tirçola lehîyê da dilewite ku nivîsa wê diheşive û nayê xwendin. Her wisa per û merên wê jî ji hev dibin û diçiritin. Çi heye ku Mela Nuredîn zehf li ber dikeve û ji dîwanê çî qasikê mayî dide hev û helbestên ku karibûye xwendine yan jî helbestên ku ji ber zanibûye cardî nivîsandine. A ev helbestên ku niha li ber destê me ne bi vî awayî ji xêra Mela Nureddîn ji xezeba lehîyê hatine filitandin û ta roja îro hatine.(Taşkın, 2017)

Çi heye ku texmîsa li ser xezela Melayê Cizîrî hatî nivîsandin di destxeta Mela Nûredîn da tune. Lewra qismê texmîsê jî di dîwanê da heşîfîye û nehatîye xwendin. Her wisa, wî ev texmîs ji ber jî nizanibûye da ku li destxeta xwe zêde bike. Lewma jî di destxeta Mela Nûredîn da em vê texmîsê nabînin. Li ser gotina Mela Evdilmecîd, bavê wî Mela Nûredîn car carna gotibûye ku di dîwana Laxer da texmîsek jî hebûye ku li ser xezeleke Melayê Cizîrî hatîye nivîsîn. Her wisa dibêje ku Şêx Muhemmed Qasimê Arwasî, Şêx Muhemmed Salihê Arwasî û seydayê wî bi xwe Şêx Şemseddînê Arwasî jî gotine ku texmîseke Laxer li ser xezeleke Melayê Cizîrî hebûye. Der barê meseleya ku ev texmîs cara ewil di *el-Îqtu'l Cewherîyyu fi Şerhî Dîwana Cizîrî* ya Mela Ehmedê Zivîngî da tê çapkirin û tê dîtin jî da Mela Evdilmecîd wiha difikire: Ev texmîs di nav medreseyan da hatîye xwendin û jiberkirin ta ku gihiştîye medreseyên herêma jêr. Gava Mela Ehmedê Zivîngî jî şerha xwe dinivîse, lew ku texmîs li ser xezela Melayê Cizîrî ye, hewce dibine ku wê texmîsê jî lê zêde bike, lê belê ew jî nizane ka ew texmîs aydê kîjan şairî ye.

Paşê haya malbatê jî bi vê texmîsê çêdibe û Mela Evdilmecîdê nevîyê Laxer jî dema destxeta bavê xwe Mela Nûredîn ji nû ve dinivîse vê texmîsê jî wek helbesta dawî li Dîwanê zêde dike.

Ji bo mîrateya ilmî ya Mela Umerê Aşîq bêtalihîyekî dî jî çêbûye. Dema wefat dike pirtûkên wî bê serguh dimînin. Kurê wî Mela Nuredîn hê wê demê zarok bûye. Feqeyên wî hinek kitêbên Mela Umer bi xwe ra birine. Yê mayîn jî, xanima wî ew qas lê miqate nebûye û hinek jê firotine jî. Lew ku Mela Nuredîn jî wê demê zarok bûye, wî jî nekarîye tiştêkî bike.

Axira axirîn, kurê Mela Nuredîn Mela Evdilmecîdê Miksî jî bi destê xwe xetên helbestên mayî cardî nivîsandine û ya ku bûye bingeha xebata Doskî û Şemrexî jî ev

destxet bûye. Lê belê ev xebata me esildanî li ser destxeta Mela Nûredînê kurê Laxer, ku destxeta herî kevin e (bnr. Pêvek 3), tê kirin. Hem destxeta Mela Evdilmecîd hem jî ya nusxeya Doskî û Şemrexî bi vê destxetê ra hatine muqayesekirin.

### 2.1.2. Zimanê Wî

Wekê ku tê zanîn xerca nivîsê bi ziman û kelîmeyan tê sêwirandin. Pirsra ka nivîskar ziman çawa û bi çi rengî bi kar anîye gelekî muhîm e ji bo lêkoler û nirxandekarên edebîyatê. Ev pirs bê guman xaseten ji bo helbest û helbestkaran zêdetir tê pirsîn, lew ku estetîzekirin û şêwazdayîna zimên û kelîmeyan di helbestristinê da cihekî zehf fireh û girîng digire. Dema meriv dêhn û bala xwe dide helbestên Mela Umerê Aşiq, tê dîtin ku zimanekî ew qas sivik û sade nehatiye bikaranîn. Her çendî peyvên sade û terkîbên fêambar hebin jî, helbest bi şêwaza helbesta klasîk hatine ristîn û tê da wek bedrê munîr, perwane, kaseya elest, dozexê hîcranê, meya baqî, şehlûl û bilbil, miskê tetarî, perîya şox û şepal, sewdaperîya mehrû, jehra helahil û hwd gelek mezmûn û terkîbên edebîyata klasîk hene.

Ew Miksîyê Laşerî ku mest e<sup>1</sup>

**Sekranê ji kewşera elest e**

Yaran ji me ra ku ‘eqd û di best e

Qeṭ’a ku ji davê ew nerest e

Şeyda û cunûn e her demê ra

(muxemmes 1/5)

Bulbulê dil pur birîn e ew ji **xarê sorgulan**

‘**Endelîban** qîl û qalên şubhegahê keç û rast

(xezel 5/4)

Bi helakên ji **firaqê** li me dil şed ker kir

**Perîya şox û şepal** sîne tejî **xençer** kir

Bi dused rengê ‘ezabê ku di nêv cîgerê kir

---

<sup>1</sup> TÎD “Ev Miksîyê Laşerî ku mest e”

Bi nîhan atêşî bû pê û perengê qer kir  
Kî bi vê zîlm û cefayê bi qelbê ber der ket

(muxemmes 2/5)

Her wiha lew ku Laxer kesekî ehlê tesewifê bûye, termînojîya tesewifê ya ku niha ji gelek xwîneran ra giran tê hatîye emilandin. Sebebeke dî ya ku zimanê Laxer ne sivik e ew e ku Laxer ji kevneşopîya medreseyan tê û bi ilm û irfaneke berz mijûlahî kirîye.

Xweş weqt e mecalê geşt û seyran  
Nêv baxçeyê gul binevş û reyhan

**Sermest** ji keyf û 'îşq û heyran

**Erbabê meweddetê** vediran

Çeşme şevqê ji şohbetê ra

(muxemmes 1/3)

Şêwaza helbestkarîya Melayê Cizîrî jixwe xasseten divê bê bilêvkin ku gelekî kartêkerî li helbesta Laxer kirîye û kirîye ku bestandina risteyan hinekê ji fêmarîyê dûr bikeve.

Meyperestan **helqebest** in tên temaşayê Mela

Servê azadî **xeraman** çîmenan tên roz û şeb

(xezel 4/3)

Wek gelek alim û şairên kurmancî Laxer jî ji bilî zimanê xwe erebî û farisî jî zanibûye û bi qasî ku helbesteke astebilind lê bike aşînayê van zimanan bûye. Vê jî kirîye ku gelek peyv û terkîbên erebî û farisî ku encax ehlê vî karî pê bizanin, di helbestan da cih bigirin û helbestan ji sadeyîya zimên hinekê dûr bixin.

Ĥusn û **tefsîlê** ne tê dê kîye wê **teqrîr** ket

Bi qelem bêxte kitabê bi reqem defter ket

Bi **feşahet** key beyanê bi 'ilm **zîwer** ket

Bi qîyasê key mîşalê di lîbasê zer ket

Nayête şerh beyanê ku **debir tehrîr** ket

(muxemmes 2/1)

Her çendî helbestên Laxer bêtir zimangiran û mişt bi mezmûnên edebîyata klasîk bin jî li ber çavê me dikeve ku gelek malikên sade û fêambar jî derbas dibin, ku xwînerêke ji rêzê hewce bi ferhengê nabîne da ku pê serwext bibe dema dixwîne.

‘Umrê me bû nîhayet roja me çûye êvar

Heyfa ku newcîwanî borî bi meşxelê ra

(qesîde 1/5)

Bide saqî meyê îro çep û rast

Bi îlhamê meyê îro çep û rast

(xezel 6/1)

Gelekî asa ye ku li ser her şairê tesîra devoka herêma lê dijî xuya bike. Lew ku bav û bapîrkên wî ji devera Behdînanê hatine (1591) û şêwaza devoka Miksê jî nêzî ya Behdînanê ye, tesîra devoka Behdînanê di risteyên Laxer da pir aşkera dixuyê, bi taybetî jî di kişandina lêkeran da.

Ruh û ya dil ew dixwazit dê feda **kem** ew ciwan

Şehrîyar e xwundkar e pakê valê ên xerîb

(qesîde 2/5)

**Hemîşe** kare tev efsan û hîle

Bi merdanê Xuda ra cengê û kûb

(xezel 1/3)

### 2.1.3. Mezmûnên Hatine Bikaranîn di Helbestên Wî da

Mezmûn tê wateya têgih û me'nayê. Cureyekî gotin û vegotinê ye ku di hunera edebîyatê da wek qalib û şêwazeke derbirînê tê bikaranîn. Bi kurtasî, mezmûn tişteki di nava komepeyvnan da vedişêre, bes bi awayekî din jî di ber bîra meriv dixê. Yanê wateyeke hunerane û remzane ye ku di hundirê peyv û gotinan da li me çav diniqîne. Bo mînak, hinek peyv û terkîb hene ku dema wek mezmûn tîn emilandin, esildanî wateya “devê yarê” didin. Di metneke da dema em rastî “ava heyatê, gul, gulpik, şerab û le’l” tîn, em pê serwext dibin ku ji van mezmûnan qesta gotyar devê yarê ye.

Yanê gava ku “gulpik” hat gotin, êdî ne hewce ye ku rasterast devê yarê bê bilêvkirin. Lewma jî, em tê derdixin ku edebîyata klasîk bi sedan sal e ku bi mezmûnan şikl û şemalêkî estetîk û narîn bi dest xistîye. (Pala, 2013:299).

Di helbestê da jî wek peyv, têgeh û terkîb; mezmûn tên bikaranîn û helbestkar bi xêra van mezmûnan merem û meqseda xwe bi uslûbeke edebî û bedew werdipêçe, paşê beyan dike. Bikaranîna mezmûnan xaseten di edebîyata klasîk da berbelav û zêdetir e. Gelek mezmûn hene ku ji yekê zedetir wate û îmaya wan heye. Axir ew wate di nav konteksa xwe da xwe dîyar dike. Bo mînak, *şerab* mezmûneke gelek berbelav e ku bi me’nayên nêzî hev an jî dûrî hev tê emilandin.

Mela Umerê Aşiq jî yek ji wan şairan e ku di bikaranîna mezmûnên da serfiraz û berkeftî dixuyê. Bêguman tesîra Mela û di tekya û medreseyan da meşxeleya wî ya bi îlm û irfanê faktora herî sereke ye ku Laxerî helbestên xwe ev qas bi mezmûnan sêwirandîye.

Bedrê munîr, perwane, wehdet, sekranê kewsera elest, rewneq, murxê dilê uşşaqan, şehriyar, zulf, ebrû, perî, sewdaperîya mehrû, saqî, muxbeçe, dêmbedr, şehîdê meyfiroşan, dilber, dozexê hîcran, xarê sorgulan, çerxê felek, meyê baqî, miskê tatar, perîya şox û şepal, şuphetê Cem, kaseya elest, gulzar, salikê wehdetseyarê, neqş û nîgarê Çîn, bûse, hwd...

Dil **bedrê mûnîr** e ‘îşq û gêra

Ayatê celal e şewqê vêra

Herdemê remeqê ji zewqê dêra

**Perwanesîfet** meraqê pê ra

Pê ra nekirim ji xeberê ra

(muxemmes 1/1)

**Murxê dilê ‘uşşaqan** seydên bi damê **zulfet**

Ey peykeranê qudsê şurîde **bulbulê** ra

(qesîde 1/4)

Çust û çapûk tên bi ‘ezma kuştina tey Laxerî

Miksîya heq bû **şehîdê meyfiroşan** rast û çep

(xezel 3/7)

Li **meh û mîhrê** şeveq daye ji zertacê serî

Bi xusufê û kusefê girtine ba muşterî

*Perîya Qudsê* libasê wê ji rengê beşerî

**Dêm durr û le'l û leb û xalê ji mişkê Teterî**

Dê bi şewkê **serê zulfan** me yeqîn ebter ket

(muxemmes 2/4)

Ji Miksî Laxerî şeyda ye şahid

**Meyê baqî** deyê îro çep û rast

(xezel 6/7)

Li pêşber **bût** me bir **secde**

**Zunarê** bermîyan bend e

Ûcîcabî rakirin perde

Neman **mehtabê gerden** 'ac

(murebbe 1/4)

Keçrû ye **çerxê felek** dêrîn neyar e pur bi kîn

Her mûdam ew ceng û cû ye gah û gahê keç û rast

(xezel 5/5)

Ji mînakên jorê jî tê xuyan ku mazmûnên hatina bikaranîn di helbesta klasik da gelekî berbelav in û ji xwendevanên edebiyata klasik ra pirr aşina ne. Van mazmûnan bê guman çêjêke edebî daye riste û rêzeyên metnên helbestî.

#### **2.1.4. Biwêjên Hatine Bikaranîn di Helbestên Wî da**

Biwêj xemla zimên in û karê têgihiştinê siviktir dikan. Wek hêman û dînamîkên herî girîng û bibandor ên zimanekî tên hesibandin. Ji bo dîyarkirin û têgihiştina têgihan, biwêj bi mentiq û qalibên arizî yê wî zimanî hatine dîtin û afirandin. Ji aliyê wate, wesf û çawanîyê ve xweserî xwe ne; zêdetir ne di wateya ku pêşî tê fêhmkirin, di wateyeke din da tên bikaranîn. (Zeraq, 2005:7).

Biwêj cureyekî îfadeyê ye ku naverokeke felsefî/hîkemî û şêwazeke parzûnkirî lê heye. Bi vê hêl û sifna xwe ve, esildanî, ne dûrî bestin û ruhê helbestê ye jî. Şairan jî di helbestên xwe da biwêj bi kar anîne û jê wec girtine. Zanîn û emilandina biwêjan nîşanê wê çendê ye ku di xebirdan û berhemên xwe da kesên biwêjgo û biwêjnûs ji atmosfera gel û civaka xwe ne dûr in û bi awayekî resen û kemilî ehlê zimanê xwe ne. Her wiha biwêjemilandina kesekî dipeytîne ku wî kesî zimanê malbatê baş navoyî kirîye. Lewra agahîyeke giştî ye ku gotin û nivîsa bi biwêjan derbarê hakimbûna li zimên da asteke bilind dide nîşan. Biwêj her çî qas nêzikê edebîyat û helbesta gel jî be, tê dîtin ku di helbesta klasîk da jî hatîye emilandin. Ji kesên ku şarezayê zimên û çanda gel bûne yek jî seyda û mela bûne. Lewma jî Mela Umerê Aşiq bê guman helbesta xwe ji biwêj û çêja wê bê par nehiştîye û di gelek risteyan da biwêjên cihêwaz bi cih kirine. Biwêja ku di malika jêrê da derbas dibe niha jî di nav axaftin û dîyalogên rojane da gelekî tê gotin û bihîstin:

‘Umrê me bû nîhayet **roja me çûye êvar**

Heyfa ku newcîwanî borî bi meşxelê ra

(qesîde 1/5)

Dîsa di vê malikê da jî em dibînin ku biwêjê çend tesîr û bedewî daye vegotina helbestê:

Min pur ji firaqa te di dil tîr û neşabin

**Xunê ji du çeşman vedirêjim** çîye ba’îş

(xezel 8/3)

Em dikarin hin biwêjên ku di helbestên Laxer da derbas dibin bi vî awayî li vir rêz bikin:

sîneyê min kir hedef tîran(qesîde 2/7), cîhan yekser kir ateş(xezel 1/1), şeyda kirime(xezel 2/2), dil ji min bir(xezel 3/3), dozexê hîcranê soxtim(xezel 5/2, bi ilm zîwer ket(muxemmes 2/1), nefesa Îsa(muxemmes 2/2), dil sed ker kir(muxemmes 2/5), sîne tijî xencer kir(muxemmes 2/5), dil û can da(xezel 7/7), gîsû marê reş bigestim(muxemmes 3/3), destê me girt(xezel 11/7), xurbet li me bar kir(mustezad 1/9), ji kerem perde hilanî(muxemmes 5/3), dinya bûye leylan(texmîs 1/3)

### 2.1.5. Hêmanên Erebî, Farisî û Tirkî

Tu wextê jî zimanek ji derdora xwe xalî nebûye û nebûye xwerû. Her ziman ji çand û ziman û edebîyatên derdora xwe û yên di binbandor bûye û bi wan ra ketîye nav danûstandineke du alî. Kurdî jî yek ji wan zimanan e ku hem tesîr li zimanên cînêr kirîye hem jî ji wan tesîr hildaye û sûd wergirtîye. Bi taybetî jî helbesta klasîk ji terkîb û hêmanên zimanên derdor gelekî wec girtîye. Ev jî ji ber wê çendê tê ku di medreseyan da berhem û çavkanîyên dersê exlebî erebî bûne û di heyama geşedana edebîyata klasîk da edebîyata farisî jî bi nezma xwe ve serdest bûye. Lewra ji van heyaman şairên pirzimanzan derketine û di helbestristina xwe da ji erebî û farisî îstîfade kirine. Hem ji wan îstîfade kirine û hem jî di wan zimanan da helbestên astbilind jî nivîsîne. Laxer jî helbet yek ji wan helbestkaran e ku şairekî sêziman e û helbesta xwe ya kurmançî bi mezmûn û unsûrên van zimanan sêwirandîye û her wiha di van zimanan da jî helbest nivîsandine. Ji helbestên wî yên ku niha li ber destê me libek erebî ye û libek jî farisî. Ji van her du nimuneyan jî dîyar e ku Laxer di helbestnivîsîna farisî û erebî da jî qabilhuner bûye. Her wisa em ji van mînakên derdixînin ku wî bi ihtîmaleke mezin helbestên erebî û farisî nivîsîbûne.

#### 2.1.5.1. Hêmanên Erebî

Sê sersebeb hene ku tesîra zimanê erebî li ser zimanê kurdî gelek e. Lew ku milletê kurd peyrewê dîne Îslamê ye û zimanê Qur'anê erebî ye, alim û helbestkaran jî bikaranîna zimanê erebî wek serfirazîyek dîtîye û zimanê xwe bi unsûrên erebî ava kirîye. Ya duyem di medrese û mekteban da îlm û xwendin bi berhem û zimanê erebî hatiye kirin, lewma jî edebîyat ji vî çendî dûr nemaye. Ya sêyem, li ser navê Îslamê serwerî û fethên milletê ereb kirîye ku tesîra erebî berbelav bibe û di nav zimanên cînêr da qayîm û bi cih bibe. Kurdî û erdnîgarîya wê jî ji vî bawêşînga erebî veder nebûye û helbet jê binbandor bûye.

Bê guman Mela Umerê Aşiq jî di helbestên xwe da carna ji bo kaffiyeçêkirinê, carna ji bo hunerê û carinan jî ji ber ku peyv û hinek terîm di kurdî da tune bûne unsûrên erebî bi kar anîne.

Pîrîyîyê natuwanim cewrem qabaihem pur

**Ef'al û qewlê xeyrem** neyzade menzîlê ra

(qesîde 1/6)

Li meh û mîhrê şeveq daye ji zertacê serî

Bi **xusufê û kusufê** girtine ba muşterî

Perîya Qudsê **libasê** we ji rengê **beşerî**

Dêm durr û le'l û leb û xalê ji mişkê Teterî

Dê bi şewkê serê zulfan me **yeqîn ebter** ket

(muxemmes 2/4)

Gelek peyv û terkîbên erebî hene ku di nav kurdîyê da beremal bûne û hem li ser zimanê ehlê ilmê hem jî di xweşbêjîyên rojane da tên bikaranîn. Ev jî yek ji wan mînakên e ku di van her du malikên xezeleke Laxer da derbas dibin:

**Zemzem û eswed mezahir** tên ji rûyê esmeran

'Ezmê ba *ihram* û 'umre hacîyan tên roz û şeb

(xezel 4/9)

**Ferzê 'eyn e 'eqda ihramê** dema bêt ew perî

Lew di 'ilmê ehlê halan weysîyan tên roz û şeb

(xezel 4/10)

### 2.1.5.2. Hêmanên Farisî

Lew ku ji heman malbatê ne û biramakên hev in, çî di terkîban da çî di peyvên da kurdî û farisî gelekî dişibin hev. Lewma jî şairên van her du zimanan ji bo ku helbesta wan bi asayî û rewanî bê sêwirandin ji wan sûd standine. Ji ber ku di herka dîrokê da bi serwerî û welatê xwe ve miletekî bi ser û ber bûye û her wiha wek Mewlana, Camî, Hafîz, Nîzamî û Sadî li wan şairên namdar hebûne, nabe xelet ku meriv bibêje tesîra farisî li ser kurdî zêdetir bûye.

Di dîroka edebiyata kurdî da hejmara pênuşên kurdî yê farisî ne kêma in. Hinan hem bi kurdî û farisî nivîsîne hinan jî tene bi farisî nivîsandine. Şerefname yek ji wan nimuneyan e ku xwerû bi farisî hatîye nivîsandin, bes şair Wida'î hem bi farisî helbest nivîsiye hem bi kurdî. (Acar, 2016: r.299)

Laxerê Miksî jî bê guman yek ji wan şairên kurmancîyê ye ku bi awayekî serkeftî cih daye unsûrên farisî û hetta bi farisî jî pêûs listîye û helbest nivîsandîye. Li vir jî çî ji bo kafîyeyê çî jî ji bo ku cih bide mezmûnên ku bi xêra helbesta farisî ketîya nav edebîyata alema Îslamê, em di helbesta Laxer da rastî peyv û terkîbên farisî tèn ku xemleke dî daye awaz û avanîya helbestê.

Roja ‘esîrê Taha ma ra meke **feramûş**

Sultânê şedrê mehder **feryadresê** Melê ra

(qesîde 1/3)

Ah û ezîn gerdûnê dîn **kuştendeyê merdê Xuda**

Sed hezar şehzade wê mirne mîşalê ên xerîb

(qesîde 2/3)

Wisa ye ku Laxer di hin helbestên xwe da ji peyv û terkîban borîye, cih daye hevoksazîya farisî jî. Dibe ku ev hem ji bo hêsankirina gotinê hem jî dibe ku atmosfera edebîyata wî çaxî wisa dixwaze, hatîye xwestin û nivîsîn ji alîyê şair ve.

**Men bendeyê fermanberem** ey şahê cîhanîyan

‘Ebdalê vexwîne

Pêşî xwe muşerref me bike barî tu ey can

Hem canê cîhan rûh

(mustezad 1/4)

### 2.1.5.3. Hêmanên Tirkî

Laxer dibe ku tirkî jî zanibûye, lewra gelekî kê m jî be em dibînin ku wî çar û pênc kelîmeyên tirkî yên wek axac/ağaç (dar), çox/çok (gelekî), yox/yok (tune), oxilme (yoklama) di helbesta xwe da bi kar anîne. Ji nimuneyan jî xuya dibe ku ev peyvên tirkî bi rengê telafûza kurdî hatine nivîsîn. Bes ji van nimûneyan nayê wê wateyê ku Laxer tirkîyeke baş zanibûye, lewra ev peyvên han hem gelekî basît in hem jî kurdên tirkînezan jî van kelîmeyan mimkun e ku bizanin.

‘Ebdalê di rojê ‘eyd û hereman

Ez bûm bi tenê di kuncê hicran

Çeşmê me bi xwîn e dil bi giryan

Vê narê firaqê kirime **añac**

(murebbe 2/4)

Eger Mehdî nîye kî dê di vê 'esrê 'edalet ket

Cîhan der hem û pur aşûb şer û fitne muruwwet **yoax**

(qesîde 4/4)

Çîn girtîye sirban ji seraser bi kef û kef

Xwînê weh dirêjin ku li şûran cemidî kef

Dunya bûye leylan ji lixaban diwerit kef

*“Rom û ‘ecemî girtîye **oxilme** bi şef şef*

*Cohîte moxulan hatine cengê hebeşî”*

(Texmîs 1/3)

Em dibînin ku Laxer di bikaranîna peyvên tirkî da jî ketîye bin bandora Mela, lew ku Melayê Cizîrî jî peyvên tirkî bi vî awayî bikaranîne.

### **2.1.6. Hunerên Edebî**

Çi devkî çî nivîskî, du taybetîyên gotin û vegotina edebî hene ku qabilgotin her dem li pey wan bûne, ku ew jî yek fesahet e yek jî belaxet. Ji bo vê jî bikaranîna hunerên edebî gelekî muhîm e. Helbesta klasîk jî xemleke xwe ji hunerên edebî distîne. Ji bo ku gotin û vegotin cuwan û bi bandor be helbestkaran serî li gelek peyv û qalibên hunera edebî daye.

Zimanê edebî ji metnê ra ji peyv û kelîmeyan ji nû ve kirasekî cuda çêdike. Lewma jî metin ji xwîner û guhdaran ra dibe fehmarîyeke dî ku mahîyet jî şikl û şemal jî li metnê diguhere. Helbest êdî ne ji şair, sembol, fikir û hêmayan pêk tê, rasterast ji peyv û kelîmeyan pêk tê. (Eagleton, 2011: r. 76)

Wek helbestkarekî klasîk, Laxer jî bi şewazeke şareza helbesta xwe bi cuwankarîyên edebî vehonandîye.

### 2.1.6.1. Tezad

Çi hest be çi fikir û çi xeyal be, gotina du tiştan e ku di alîyê wateyê da ev her du tişt dijberê hev in. Ji vê hunerê ra tîbaq, tatbiq, mutabaqat, muqabele û mustezad jî tê gotin. (Külekçi, 1999:76).

Wek mecaz, gava ku du tiştên qet naşibin hev û dijberî hev bin were gotin an jî bê nivîsandin, ew gotin bêtir tesîrê li ser muxatabên xwe dihêle. Hunera tezaadê, çi klasîk çi modern, bi giştî di helbestê da berbelav e. Şairan jê gelekî îstîfade kirine. Laxer jî yek ji wan şairan e ku dema merem û meqseda xwe nivîsîye, serî li vê şêwaza edebî daye.

Min sehergaha ezel dî meyfiroşan **rast û çep**

Reqş û best in tîn semayê dûş bi dûşan rast û çep

(xezel 3/1)

Meyperestan helqebest in tîn temaşayê melek

Serwê azadî xeraman çîmenan tîn **roz û şeb**

(xezel 4/3)

**Ëman** dil kirîye cayê **şadûmanî**

Ji bin çûn kûçeyê îro **çep û rast**

(xezel 6/5)

Guhdarê **reqîban** meke **dostê** feramûş

Ez behrê Xuda dostê bi dostê heye lamîş

(xezel 8/5)

Tu meke behşê hûdûşê ra bi kes

**Şubh** yar nîne **êvarê** hûdûş

(xezel 9/7)

### 2.1.6.2. Telmîh

Telmîh, ji vegotinê zêdetir qest û destnîşankirina tişteki ku ji alîyê gelek kesan ve tê zanîn e; çî bûyer, çî çîrok, çî efsane, bawerî, gotin, referansên pîroz û hwd. (Külekçi, 1999:165).

Hunermend bi rêya vê hunerê agahîyeke ku tê zanîn cardî ber bîr dixê û di navbera hinek tiştan da şibandin û pevgirêdanan çêdike. Di risteyeke helbestê da dema em rastî, bo mînak, navê Zuleyxayê tîn, çîroka Yûsiv Pêxember û Zuleyxayê dikeve ber bîra me. Şertekî telmîhê jî ew e ku tiştê ber telmîhê dikeve divê ji alîyê gelek kesan ve bê zanîn yan jî bi hindikahî zana û rewşenbîr pê agahdar bin. Lew ku Laxer şairekî mutasavîf e, di helbestên wî da wek telmîh em mezmûnên dînî zêdetir dibînin.

Ruhanîyan tu ruh î hem rewneq î ji gulê ra

**Ṭufanîyan** tu **Nuh** î der behrê xergulê ra

(qesîde 1/1)

**Heyder** e ya **Rustem** e der ceng erê ceng yan **Umer**

**Şahê merdan merdê meydan** şehdê dalê ên xerîb

(qesîde 2/8)

Ba hîlm û melahet xweş çûn **Yusufê** dewran e

‘Îşqê ku **Zuleyxayê** sewda kirime ya Reb

(xezel 2/8)

Ji cemala xwe hîcabê vekir û rojê hilat

Perîya rengê ferîşteşenema leb ji nebat

Bi Şemed sondê dixwem sermayeyê rûh û heyat

Bi **nefese** ‘**Îsa** ji wê îhya kirî ‘ezm û rufat

Ger nûmayed yekî engûşt cîhan dê kerî ket

(muxemmes 2/2)

Di nimuneya herî dawî me dayî da “nefesa Îsa” heye, ku ev telmîh mucîzeyê Hz Îsa dixê li ber bîra me ku wî bi emrê Rebbê xwe mirî cardî vedijand û nefes didayê.

Ger pêwistîya mînakeke dî jî hebe, ya li jêrê bi ser qisseyê Îbrahîm Pêxember û Nemrûd ve tê avêtin ku amaje li ayatekî Qur’anê tê kirin, ku Xwedê ji êgir ra difermîne ku bisekine û bibe hênikahî ji bo Îbrahîm Pêxember, da ku wî neşewitîne:

Nedibû xelâs Xelîl e ez germenarê Nemrûd

“**Berden selam**”ê Heq got nagahê geşte mefrûh

(xezel 13/5)

### 2.1.6.3. Teşbîh (Wekandin)

Teşbîh peyveke erebî ye û tê wateya wekandinê. Di kurdî da mirov dikare ji teşbîhkirinê ra bibêje wekandin an jî mînandin. Di hunera teşbîhê da gava wekandin di navbera du tiştan da hat kirin, ya hindik yan jî lawaz bi ya xurt an jî zêde tê wekandin. (Cîhanî, 2013:40; Kûlekçi, 1999:28)

Gava yekî ji yekê ra got “rûheyîvê”, em dibînin ku rû bi heyîvê hatîye şibandin. Yanê heyîv ew qas bedew e ku rûyê amaje pê tê kirin jî wekê heyîvê ye û spehî û xweşik e. Li vir helbet bedewî xasî heyîvê ye. Rû çî qas jî bedew be ji heyîvê bedewtir nîne, bes ji bo ku spehîtahiya “rû” jî bê çespandin wek heyîvê hatîye dîtin û bi wê hatîye wekandin. Çend navgîn û daçekên wekandinê di kurdî da ev in: mîna, wekê, şuphê, teşbîhê, nola, hindî, bi qasî, tu dibêjî qey, heçku...

Laxer jî di helbestên xwe da bê guman hest û boçûnên xwe bi rêya teşbîhê anîyê zimên û ji vê hunera edebî sûd wergirtîye.

**Dil bedrê mûnîr** e ‘îşqê gêra

Ayatê celal e şewqê vêra

Herdemê remeq ji zewqê dêra

Perwanesîfet meraqê pê ra

Pêra nekirim ji xeberê ra

(muxemmes 1/1)

Barî Xudayê yekta mara bibexşe Taha  
Curm û gunehê min boş **wek jengê şeyqelê** ra  
(qesîde 1/7)

**Her çende tu sulţan î wek morê heqîr im ez**  
Wî Asifê ber textê bîna kirme ya Reb  
(xezel 2/7)

Tên bi de'wayê û cîdalê cengîyanê meyperest  
**Şubhetê şîr û jîyan û pur xurûşan rast û çep**  
(xezel 3/5)

Miksîyê Laxer di nêv ateşê hecra te bisoxt  
Çehv û dîden wê bi emrê te ji exyarê bidox  
**Her wekî perwaneyê wê can di rêya dînê firoxt**  
Nagehan peykê qezayê ne'reyê zed ev çi got  
Beş bike tu ji vê meqalê pirr şewaê xem û beş  
(muxemmes 4/4)

#### 2.1.6.4. Tenasub

Tenasub bi wateya xwe ya ferhengî tê me'neya “guncanbûn û lêanîn”ê, bes wek hunera edebî wiha tê pênasekirin: Di heman cihê da bikaranîna bi hev ra ya peyv, terkîb an jî biwêjekê ku di navbera wan da di alîyê wateyê da têkilî û pevgirêdanek hebe. (Küleççi, 1999:185).

Tenasub şêwazeke edebî ye ku şairên klasîk gelek caran serî lê dane di helbestên xwe da. Bê guman Laxer jî ji wan şairan e ku ev huner di helbestên xwe da emilandîye. Ji mînakan jî dê dîyar bibe ku Laxer ev huner bêtir bi mijarên tesewifê ve têkilîdar ava kirîye.

Ruhanîyan tu ruh î hem rewneq î ji gulê ra  
*Tufanîyan* tu **Nuh** î der **behrê** xergulê ra  
(qesîde 1/1)

Ji malika jorê dixuyê ku di navbera peyvên *tûfan*, *Nûh û behrê* da tenasubek heye, ku di dîroka mirovahîyê da meseleya Tûfana Nûh Pêxember heye.

Ma **murîdanê** tewafîn der **terîqê** bê dilan  
Miksîyê Laxer bi şeydayê rewan tên roz û şeb  
(xezel 4/11)

**Bubulê** dil pur **birîn** e ew ji **xarê sorgulan**  
‘Endelîban qîl û qalên subhegahê keç û rast  
(xezel 5/4)

### 2.1.6.5. Teraduf (Hevwateyî)

Teraduf tê wê wateyê ku kesek di gotina xwe da du yan çend peyvên ku me'neya wan yek be bi kar bîne. Ev huner cuwanî û tesîreke taybet dide gotin û nivîsînê.(Cîhanî, 2013:48).

Gava em bala xwe didin helbestên Laxer, em dibînin ku wî ev hunera edebî jî di helbesta xwe da kêr nehiştîye.

Hemîşe kare tu efsan û hîle  
Bi merdanê Xuda ra **cengê û kûb**  
(xezel 1/3)

Saqîyan **cam** û **qedeh** ez xemrnûşîn pur kirin  
Dane destê ‘aşiqan û meyxuran tên roz û şeb  
(xezel 4/2)

**Bulbulê** dil pur **birîn** e ew ji **xarê sorgulan**  
‘Endelîban qîl û qalên subhegahê keç û rast  
(xezel 5/4)

Buryanê kırım **hîcr** û **firaqa** te biraştim  
Xûrbet li me bar kir

Nêv **heps** û cihê **derd** û **xeman** yarê gomaştem

**Zindanê** xeman rûh

(mustezad 1/8)

#### 2.1.6.6. Mubalexe (Zêderewî)

Ev peyva ku ji erebîyê tê di zimanê kurdî da tê wateya zêderewî yan jî mezinkirinê. Di cuwankariya edebî da ew e ku kesek di wekandin an jî di şîroveya tiştekî da gelekî zêderewîyê bike û wekandinên wisa bîne ku mirov nikaribe bawer bike, lê di bara toreyî da ciwan be. Wekê ku di *Mem û Zînê* da jî derbas dibe, bi mubalaxakirinê qesta giranbûn û girîngîya tiştekî tê kirin û tê kirrandin. (Cîhanî, 2013:49).

Ev çend ji hêstirêd Memê jar

Şîn bûn li rex şetî sipîndar

Lew ku bi zêdetir li ser zemîna hest, xeyal û pêşrewkan tê avakirin, hunera helbestê ji vê şewaza hunerê ya edebî ra gelekî guncan e û Laxer jî di bikaranîna vê hunerê da ji şairên dî qet di paş da nemaye. Wî xwestîye ku gotina wî hizr û halê wî bi awayekî zelal nîşan bide.

#### Dozexê hîcranê sohtim ez serî hetta qedem

Ah ji ber tîrên firaqê rûsîyahê keç û rast

(xezel 5/2)

Bi helakên ji firaqê li me **dil sed kerî kir**

Perîya şox û şepal **sîne teji xençerî kir**

Bi dused rengê ‘ezabê ku di nêv cîgerê kir

Bi nîhan ateşî bû **pêt û perengê qerî kir**

Kî bi vê zîlm û cefayê bi qele ber derî ket

(muxemmes 2/5)

Meqtûlê di me’reka qetalê

**Hejmar me hezar û sed bi ermah**

### 2.1.6.7. Kînaye (Sergirtî)

Kînaye tê wateya gotina sergirtî. Dema meriv nexwest ku fikr û gotina xwe rasterast derbeyan bike serî li hunera kînayeyê dide û meqseda xwe bi awayekî sergirtî û mecazî tîne zimên. Ev uslûba edebî hem kurtegotinê bi xwe ra tîne hem jî rê dide ku axiver, çi kêfxweşî çi jî gazinda xwe, bi şêwazeke edebî û bi bandortir dil û hinavê xwe vebêje. Her peyv û gotina kînayeyî xwedîyê du wateyan e; wateya nêzik û wateya dûr. Wateya rûveyî û berçav wateya gotinê ya nêzik e. Lê ku meriv wateyeke dî li gotina xwe bike û bixwaze amaje bi tiştekî dî bike ew jî dibe wateya dûr. (Cîhanî, 2013:43).

Bo mînak, ku dema gotina “ew kesekî çavvekirî ye” tê guhê me, em jê “vekirina çavî bi xwe” fêhm nakin; em jê derdixînin ku gotîyê vê cumleyê esildanî dixwaze tiştekî dî bibêje û bi awayekî sergirtî dixwaze bibêje “ew kes haj xwe û berjewendîyên xwe heye, feqîrok nîne û hişyar û jêhatî ye.”

Îcar, em dibînin ku Laxer jî di bikaranîna şêwaza edebîya ya bi navê kînaye da serkeftî dixuyê. Gotina xwe rasterast nabêje, bi terhekî mecazî kînayeyê bi kar tîne û dixwaze esildanî tiştekî dî bibêje. Ji xwîneran ra jî fehmkirin dimîne.

Ev Miksîyê Laxerî ku mest e  
Sekran ji kewşera elest e  
Yaran ji me ra ku ‘eqd dibest e  
Qeṭ’a ku ji **davê ew nerest e**  
Şeyda û cunûn e her demê ra  
(muxemmes 1/5)

Bo mînak, di malika jêrê da em dibînin ku şair bi gotina “*roja me çûye êvar*” xwestîye bibêje ku kalbûnê lê bar kirîye û dawîya umrê wî ye.

‘Umrê me bû nîhayet **roja me çûye êvar**  
Heyfa ku newcîwanî borî bi meşxelê ra

(qesîde 1/5)

Di texmîsa ku ji bo helbesteke Melayê Cizîrî nivîsîye da jî Laxer hunera kînayeyê diemilîne û bi îfadeya “dunya bûye leylan” dixwaze tiştêkî dî bibêje û wateyeke dûr li gotina xwe bar dike.

Çînê girtîye sirban ji seraser bi kef û kef  
Xwînê weh dirêjin ku li şûran cemedî kef  
**Dunya bûye leylan** ji lixaban diwerit kef  
“Rom û ‘Ecemî girtîye oxilme bi şef şef  
Cohtê Moxulan hatine cenga Hebeşî”

(texmîs 1/3)

Mîksî bi temennî ye şeb û roz  
Ez **destê te bit şehîdê ermağ**

(xezel 12/9)

#### 2.1.6.8. Îstî'are

Ev huner teşbîha kurtkirî ye. Peyv di wateya xwe ya rastîn de nayê bikaranîn, belkê wateyeke dî lê tê barkirin. Di teşbîhê da çar hêman hene: ya dişibe (muşebbeh), ya lê tê şibandin (muşebbehun bîh), alîyê şibandinê û daçeka şibandinê, lê belê di îstî'areyê da yek hêman heye, ku ew jî ya lê tê şibandin e. Ger yekî got “ey perî, ka nezerek bide vî alî”, li vir *perî* îstî'are ye, ku yê gotî yara xwe/mixatabê xwe şibandîye *perîyê* û hew. Yanê yek hêman hatîye bikaranîn. (Küleççi, 1999:48).

Di helbestê da ji hunerên edebî yên ku gelekî tèn emilandin yek jî îstî'are ye. Xaseten helbestkarên klasîk di veavakirina vê hunerê da şareza û serketî ne. Heçku Laxer e, ew jî di vê meseleyê da kêr nemaye û bi vê sen'etê kemil û xemil daye risteyên helbesta xwe.

Heyder e ya Rustem e der ceng erê ceng yan ‘Umer  
**Şahê** merdan **merdê** meydan şehdê dalê ên xerîb

(qesîde 2/8)

**Sewdaperîya mehrû** îro kirime ya Reb  
Der zawîye putxane secde birme ya Reb

(xezel 2/1)

Min sehergaha ezel dî **meyfiroşan** rast û çep  
Reqs û best in tèn semayê dûş bi dûşan rast û çep

(xezel 3/1)

**Zemzem û eswed** mezahir tèn ji rûyê esmeran  
‘Ezmê ba îhram û ‘umre hacîyan tèn roz û şeb

(xezel 4/9)

### 2.1.6.9. Te’rîz

Di çarçoveya ferhengî da tê wateya “daberizîn, diserdaçûn û tenkîd”ê ye. Wek istilahekî edebîyatê jî tê wateya ku “tu alîyê tiştêkî destnîşan bikî bes alîyê dî qest bikî. Di te’rîzê da her daîm serzenîş, gazind, sîtem û îstîhza heye. Ger li ba yekî *tima* tu bibêjî “comerdî mêran dîke camêr”, tu esildanî gotina xwe di ser ê tima ve diavêjî û wî hem îqaz dikî hem jî îstîhza dikî û bi vî awayî jî qîsîmen jî be tu dadiberizî wî kesî.(Külekçi, 1999:64).

Kêm jî be, di helbestên Laxer da jî ev cure huner heye. Laxer di hin mijarên tesewifî da behsa hin tiştan kirîye û ji hin hal û karakteran digazîne.

Pîrîyê natuwanim **curm û qabaîhem pur**

Ef’al û qewlê xeyrem neyzade menzîlê ra

(qesîde 1/6)

**Felek dînya te kir îro puraşûb**

**Cîhan yekser te kir ateş xwe ra çûb**

(xezel 1/1)

**Ê bi vê ‘eynê fenayê dil bidet**

**Dê bibit ew dîn bi xeddarê hudûş**

(xezel 9/9)

**Naçim bi kenîştan û derê dêr û mesacid**

**Cuz meygedeyê rind û xeraban ra bidem bac**

(xezel 11/4)

**Ez çûme gelek medreseyan qet me nedî kes**

**Ku dersê bide yane bixwûn ‘işqê û minhac**

(xezel 11/5)

Ji van rêzeristeyên jorê tê fehmkirin ku Laxer ji bo hin mesele û rewşan gilî û gazind kirîye û bi vî awayî îaret li hin halên nexweş kirîye. Dema dibêje ku êdî ew dê neçe medrese, dêr û kenîştan, ew esildanî qesta lawazbûna ruhê van mekanaan dike û perestin û dersa li van deran tê kirin ji eşq û şewqê dûr e.

#### **2.1.6.10. Lef û Neşir**

Lef tê wateya werpêçan û berhevkirinê; neşir jî tê wateya belavkirin û weşandinê. Lê di zanista cuwankarîya toreyî da lef û neşir ew e ku hozan çend peyvan li dû hev bîne û rêz bike û paşê jî çend peyvên dî ku peywendî û têkilîya wan bi peyvên pêş ra hebin bîne û wan bi hev ve girê bide. Ji desteya yekem ra lef, ji ya duyem ra neşir tê gotin.(Cîhanî, 2013:53).

Di helbestên Laxer da jî em rast tînin ku şewazeke bi vî awayî hatîye avakirin.

**Bostanê cemalê girt rewneq**

**Xemlîne şenewber û murewneq**

Teşbîhê nucumê çerxê ezreq

Dîbayê keşa ji ser şebah berq

Şehlûl û binal bi bilbilêra

(muxemmes 1/2)

**Bilbil te çîye bi nal û efîan**

**Bulbulê hengame û xulxul û bi giryan**

Bi *gul* tu neşînî şubh û şaman

Ney mişlê min î gûyîn û hîraman

Daîm me ji yarêdîlfikarest

(muxemmes 3/4)

Li vir di bin navê bostan û bulbul da hin peyvên ku ji wan neşir dibe dixuyên; ji bostan navên kulîlkan û rewşa bostanan ya xemilandinê tê vegotin. Her wisa deng û newayên xweş ku ji bulbulê sadir dibin di bin navê bulbul da hatine gotin û neşirkirin.

#### 2.1.6.11. Tersî'

Di bara wateyî da gewherbendîkirin e, lê di cuwankariya edebî da ew e ku hozan malikekê binivîse ku giştî peyvên her du nîvmalikên wê du be du bi hev du ra hev kêş û hevpaşbend bin. (Cîhanî, 2013:51).

Ev nimuneya ji *Mem û Zînê* dê meqseda me ronî û îzah bike:

Me'mûl e *li bal gelek* 'elîman

Meqbûl e *li bal gelek* hekîman

Di helbesta Laxer da jî, kêr jî be, şewazbikaranînên wiha dixuyên.

Felek dinya **te kir** îro puraşûb

Cîhan yekser **te kir** ateş xwe ra çûb

(xezel 1/1)

Bide saqî *meyê îro çep û rast*

Bi îlhamê *meyê îro çep û rast*

(xezel 6/1)

#### 2.1.6.12. Î'ade (Lêvegerandin)

Î'ade ew huner e ku şair peyv an jî terkîba di dawîya malika pêş da ye di serê malika paşê da dubare bike û lê vegeîne. Ji van curehelbestan ra mu'ad jî tê gotin. (Külekçi, 1999:244)

Hem di stran û folklorê kurdî da hem jî di helbesta klasîk da ew awa huner gelekî berbelav e, bes bi qasî ku tê hêvîkirin di helbesta Laxer da ev qas tune.

Li pêşber bût me bir secde  
Zunarê bermîyan bend e  
Hîcabî rakirin perde  
**Numan** mehtabê gerden‘ac

**Numandin** du keman yengê  
Kêşandin wê li ser cergê  
Xedeng erjengê şeb jengê  
Bişušta xwînê ez dil **zac**

**Bi zacê** xwînê dil şeyqel  
Kirin Mîsrê û bê mesqel  
Kêşandî ber mehê cedwel  
**Muselsel zulfê** pur çîn û dac

**Muselsel zulfê** kakûl bûn  
Tejî misk û qerenfil bûn  
Bi xetaş û xalî filfil bûn  
**Bi neqşê** çînê bû emşac

**Bi vê neqş** û nîgarê Çîn  
Reyhan û sunbul û nesrîn  
Binevş û sûsin û yasemen  
**Mu’aniq gerdenê** wek ‘ac

**Mu’aniq destê gerden** bûn  
Tewafa le’lê erzen bûn  
Hecac xal û hecer fûn bûn  
Wekîlê Miksî Laxer hac

(murebbe 1/4, 5, 6, 7, 8, 9)

Ji çarînekên jorê jî dîyar e ku destpêka her çarînekê bi peyv an jî terkîba dawî ye çarîneka berê xwe hatîye pê. Ev huner dike ku hevahengîya di navbera beşên helbestê da hêsatir û rewantir be.

### 2.1.6.13. Îqtîbas

Wateya ferhengî ronahî yan jî pizotjêwergirtin e. Lê di ciwankariyê da tê wateya ku hozan di nivîs an jî gotina xwe da cih bide pişkeke gotin yan jî nivîsa kesekî yan jî metneke dî bi nav û bang her kes dinase û dizane.(Cîhanî, 2013:51).

Şair Laxer jî di helbestên xwe da ji metnên dî îqtîbas kirîye û ji vê hunera edebî ku gotin û metnê dewlemend û xweşiktir dike wec girtîye.

Ferdê heq fermî; **ey agir sar be û silava te li Îbrahîm be**

Her wisa mêrê heq wek ku bi rebbê bêhemta re

(qesîde 3/3)

Îqtîbasa li malika jorî, bo mînak, ji ayeta 69an a sûreya Enbîyayê hatîye wergirtin: “Me got ey agiro! Li ser Îbrahîm bibe hênîkahî selametî!”

Di malika jêr da jî gotina rast û çep ji helbesta Melayê Cizîrê ya bi navê “Lew seher cewlan didit bayê sebayê rast û çep” hatîye wergirtin. (Cizîrî, 2007:52)

Min sehergaha ezel dî meyfiroşan **rast û çep**

Reqs û best in tên semayê dûş bi dûşan **rast û çep**

(xezel 3/1)

Her wisa di vê malika bê da jî jêwergirtinek heye ku di hedîseke qudsî ya Muhemmed Pêxember da dibore û dibêje, “tu nebûyayî me ev dunya nedixuliqand”. Ev gotin di bawerîya nibûweta Îslamî da gelekî qayîm û berbilav e.

Ey namê tu heq rûzê ezel kirdî Muḥammed

Mezbûr e di Qur’anê reqem kirdî Muḥammed

Tu eslê wucudê heme ‘alem ji te peyda  
Barî ji te ra (**lewlak**) e fermûdî Muḥammed

(qesîde 5/1, 2)

#### **2.1.6.14. Teşxîs (Kesatîpêdan)**

Teşxîs peyveke erebî ye û tê wateya kesayetîpêdanê. Di cuwankariya edebî da ew e ku taybetiya mirovan li tişt û halan tê barkirin û wan wekê mirovan raber dike. Yanê “danxeberdana kulîlkê” dibe hunera teşxîsê, lew ku “xeberdan”a ku xasî mirovan e, ji bo kulîlkê jî hatîye dayîn. Bo mînak di vê malika memû zînê da hunera teşxîsê heye. (Cîhanî, 2013:48).

Pirsî ji dinê min ev bi hikmet  
Mehra te çi? Gote min ku himmet

Kêm jî be, em di helbestên Laxer da rastî vê şêwaza hunera edebî tîn ku xemleke cuda daye ahenga rist û malikên vegotina wî.

*Gef li min xwar bi mirinê, sozê xwe bi teqez vebirî bi kirinê*

Noq bûm bi serxweşî di xubara qîyamê ku peyda bû l’min

(xezel 10/3)

*Şeba îro xeber anî ji ahûya şepal û şûx*

*Nesîmê da me mizgînî ku dê bêtin helatên tûx*

(qesîde 4/1)

#### **2.1.6.15. Nîda (Bangewazî)**

Nîda, di ciwankariya edebî da ew şêwaz e ku helbestkar cûş û xirûşîya hest û kelecaniya xwe bi dengê bilind bîne zimên û nîdayên wek ey, ya, aya, ah, hey û hwd bi kar bîne. Bi vî awayî şair, her çi be axir, tiştê ku bangî lê dike ji xwe ra dike muxatab û pê ra dikeve nav xweşbêjîyê. Ev qismen jî dibe hunera teşxîsê jî. (Külekçi, 1999:135).

Mîna gelek şairên klasîk ên kurdî Laxer jî ev şewaza edebî li helbestên xwe bar kirîye û hizr û hestên xwe yê kelegerm derbirandîye. Ne tenê bang li derveyî xwe kirîye Laxer; her wisa wî berê xwe daye xwe û gazî xwe jî kirîye.

**Ey Laxerî şeyda** ku di vê 'esrê çû Miksê

Aya bi şeca'et dil û can da ku zerî hat

(xezel 7/7)

**Ey şehînsahê** 'Ereb pursê li halê ên xerîb

Rehmê kun binger be şefqet 'arzûhalê ên xerîb

(qesîde 2/1)

Dozexê hîcranê sohtim ez serî hetta qedem

**Ah ji ber tîrên firaqê** rûsîyahê keç û rast

(xezel 5/2)

**Ya Reb çi letîf zat e** li min der nezerê hat

Bi 'ayîneyê heqîqet bi çû mîrat û durrê hat

(xezel 7/1)

**Ey namê tu** heq rûzê ezel kirdî Muḥammed

Mezbûr e di Qur'anê reqem kirdî Muḥammed

(qesîde 5/1)

### 2.1.7. Kesayetîya Wî ya Edebî

Laxer, bê guman şairekî helbesta klasîk e. Ew di lêkirina helbesta klasîk da serkeftî ye û şarezayê mezmûn, motif, cuwankarî, rê û rêbazên vê cure edebîyatê ye. Her çi qas piranîya helbestên wî xezel jî bin, wek qesîde, muxemmes, murebbe, mustezad hwd, wî çend cureyên di yê nezmê ceribandine. Li alîyê dî, wî texmîseke gelekî serkeftî bo helbesteke Melayê Cizîrî jî nivîsiye.

*Texmîs:*

Laxer di zemanê xwe û şî'rê tu 'Ela yî

Çendî te hebin dax û birîn têki bela yî

Rengîn ji derd û eleman şubhê Wela yî

*“Ellaħ çî tebi’etbeşer î xwe ne Mela yî  
Vê cewr û cefayê tu peyapey dikeşî”*

(texmîs1/10)

*Muxemmes:*

Her dem di xeyalê min ney û mey  
Medhûş kirim ji wehdetê hey  
Ta yarê bibînim û bi hey û hey  
Bûsim kefê destê dostê ba pey  
Ku ‘eqlê fîraq û hicrî dîra

(muxemmes 1/4)

*Qesîde:*

Sîneyê min kir hedef tîran ji qewsê ebrûyan  
Lê dibarînit peyapey ceng û zalê ên xerîb

(qesîde 2/7)

*Xezel:*

Felek dînya te kir îro pur aşûb  
Cîhan yekser te kir ateş xwe ra çûb

(xezel 1/1)

*Murebbe:*

Wê şem‘ê şebê şemalê gerden  
Gulçehre dehan û xonçe erzen  
Wek sêb du nîm û lebşekerken  
‘Uşşaqê bi qûtê can e muhtac

(murebbe 2/3)

*Mustezad:*

Geh geh bi xeder dikirî barê kerîmê

Yarem tu keremkar

Şevqet bike carek me vexwînê bi herêmê

Mîhman e me an rûh

(mustezad 1/2)

Laxer jî mîna her şairên kurdî yên klasîk ji kevneşopîya medreseyê tê; feqetî kirîye, bûye mela û wek seyda û alimekî payebilind ders daye û îcaza feqe û melayan daye. Vê nêrîta medreseyî bê guman tesîreke mezin li ser hişmendîya wî ya edebî û terza nivîsandîna wî kirîye. Vê pêvajoya xwendinê kirîye ku haja Laxer ji gelek tiştên ilmî, edebî û tesewifî û zimannasîyê çêbe. Wek kesekî ehlê terîq û medreseyê, Laxer mezmûn û motîfên bi mijarên dînî û tesewifî ve eleqedar bi kar anîne.

**Sewdaperîya mehrû** îro kirime ya Reb

Der zawîye **putxane secde** birme ya Reb

(xezel 2/1)

Husn û tefsîlê ne tê dê kîye wê teqrîrî ket

Bi qelem bêxte kitabê bi reqem defteîr ket

Bi fesaşet key beyanê bi ‘ilm zîwerî ket

Bi qîyasê key mîşalê di lîbasê zerî ket

Nayête şerh û beyanê ku debir tehrîrî ket

(muxemmes 2/1)

Di nîvhenda helbesta ku bi motîfên tesewifê ve eleqeder da bê şik eşq û evîn heye. Di helbesta Laxer da jî ev mijareke sereke ye ku pirr caran dertê pêşîya me. Lew ku dilî wek bedrê munîr dibîne, eşqê jî cewhera vê rengvedana îlahî dibîne.

**Dil bedrê mûnîr** e ‘işqê gêra

Ayatê celal e şewqê vêra

Herdemê remeq ji zewqê dêra

**Perwanesîfet** meraqê pêra

Pêra nekirim ji xeberê ra

(muxemmes 1/1)

Dîsa di xezeleke dî da evînê ji xwe ra dike behsa mijarê û xwe nêzedostê aşiqan dibîne.

Saqîyan cam û qedeh ez xemrnûşîn pur kirim

Dane destê ‘aşiqan û meyxuran tèn roz û şeb

(xezel 4/2)

Faktoreke ku zimanê Laxer ê helbestê zengîn kirîye pirzimanzanîya wî ye. Ev jî helbet ji xêra xwendina medreseyan e. Laxer ji bilî zimanê xwe yê maderî sê zimanên dî jî dizane. Bi qasî ku helbesteke a’la lê ke farisî û erebî dizane û di helbestlêkirina kurmancî da jî ji xezîne û edebîyata van zimanan sûd werdigire. Belkê bi qasî ku bikare pê helbestê binivîse zimanê tirkî nizane, bes em dibînin ku kê jî be di nav hin helbestên wî da peyvên basît ên tirkî jî diborin. Helbesta Laxer di nav vê asoya berfireh a zimanan da hatîye avakirin, lewra jî asta hunera wî ya edebî berztir bûye.

Tê zanîn ku bi termînolojîya xwe ve tesîra zimanê farisî û erebî li ser zimanên cînêr gelek e. Kurdî jî bi ber vî bayê ferhengî û edebî ketîye.

Ûîkmeta van remz û razan muşkilatê xemzeyan

Kî di vê ‘esrê beyan ket bê ‘eyan tèn roz û şeb

(xezel 4/8)

Bi **helakên** ji **firaqê** li me dil şed kerî kir

Perîya şox û şepal sîne tejî xençerî kir

Bi dused rengê ‘**ezabê** ku di nêv cîgerê kir

Bi **nîhan atêşî** bû pêt û perengê qerî kir

Kî bi vê **zîlm û cefayê** bi qele ber derî ket

(muxemmes 2/5)

Laxer sofîmeşreb bûye û di nav terîqeta Arwasê da rabûye. Ji van malikên jêr jî xweş dîyar e ku ew girêdayî remz û rêzika sofîyan bûye û wek murşîd şêxê wî hebûye, ku ew jî çawa li jorê hatîye behskirin Şêx Fehîmê Arwasî bûye.

**Miksî eger gunah e pur kirine wê tebah e**

Racî ye ez Îlah e Xeffar e tewbe lê ra

(qesîde 2/8)

**Seccade û sebhe me kirin rehnê zîyaret**

Laxer bibe tu şahidê Miksî di şebê dac

(xezel 11/9)

Miksî te tenê can bi xeman da di firaqê

Laxer bi ciwanan

**Şeyxê me bi îrşadî çûye cayê 'Iraqê**

Xurbetkeşê man rûh

(mustezad1/9)

Karê ilm û edebîyatê di nav miletan da karekî bijare ye û di her awayî da payeyeke berz dide însên. Kêm alim û edîban li ber xwe dane ku nekevin bin tesîra neyînî ya vê statuya ku ji însên ra nefsmezinî û qurekubarîyê tîne. Gava em berê xwe didin Mela Umerê Tînîsî, du mexlesên wî hene û navê wî jî zehf caran bi sifatekî dî hatîye bilêvkirin. Mela Umerê Tînîsî di heman wextî da wek Mela Umerê Aşiq jî hatîye zanîn û binavkirin. Ev jî dide nîşan ku ev helbestkar bi rastî jî di dergê û agirê eşqê da jîyaye û bûye yek ji wan kesên ku ehlê eşq û evînê ne. Narê aşiqbûna wî ew ji gelek nepakîyan parastîye û bûye yek ji wan kesên ku Mewlana di malikeke xwe da behsî dike:

Huş be û ew çendî tu li ber nekeve axir

Nefsa ku dibe aşiq êdî emare nabe (Mewlana, 2017: r. 38)

Lewma jî meriv dikare bêje ku eşqê hem şexsîyeta wî ya însanî kemilandîye hem jî şexsîyeta wî ya edebî.

Alîyekî edebî yê şexsîyeta Laxer hevnêznasîyarîya wî ya bi siruşt û heyberên di nav siruştê da ye. Wekî gelek şairên klasîk wî jî emel û arezûya dil û hinavê xwe bi

hinek heyberên siruştê anîye zimên û helbesta xwe bi gul û çiçekan, dar û çivîkan, heyv û stêrikan û hwd neqîşandîye û gihaye mirazê xwe yê gotin û nivîsînê.

**Bostanê cemalê** girt rewneq

Xemlîne **şenewber û murewneq**

Teşbîhê **nucumê** çerxê ezreq

Dîbayê keşa ji ser şebah **berq**

**Şehlû/** û binal bi **bulbulê** ra

(muxemmes 1/2)

**Çîmena** sultanîyê rewneq ji rengê **kewkeban**

**Gulistana** şahîyê **serwê** rewan tên roz û şeb

(xezel 4/5)

Wek hunera vegotina edebî şairan ji bo hin tiştan sembol bi kar anîne û vê jî bi xwe ra cuwankariya “sembolîzekirinê” derxistîye holê. Di edebîyata klasîk da dîyardeya sembolîzmê gelekî aşkera ye. Vegotina sembolîk bi taybetî jî li ser hinek herfan hatîye vesazkirin û vê jî çêjeke hunerî daye tevnsazîyê malik û risteyên şairan. Lew ku Laxer jî helbesta klasîk honandîye, wî jî di vî hunera sembolîzekirinê da edet xira nekirîye û helbestristina xwe bi hin herfên sembolîk dirust kirîye.

**Surmeyê çeşman** û dîde rewşenê ez xakê paş

Ba duşed hîle û bazê çeşmeyê **dalê** ên xerîb

(qesîde 2/6)

Sîneyê min kir hedef tîran ji **qewsê ebrûyan**

Lê dibarînit peyapey ceng û **zalê** ên xerîb

(qesîde 2/7)

### **2.1.8. Mexlesa Wî**

Mela Umerê Aşiq du mexlesan bi kar tîne, ku yek jê Laxer e û yek jî Miksî. Hozan pîrr caran van her du nasnavan di malika dawî da bi hev ra bikar tîne. Mexlesa Miksî jixwe ji herêma ku lê bûye û jîyaye tê. Bes mexlesa wî Laxer bi wateya xwe ya

*bêxêr, lawaz, beredayî, kêrnehatî, wecneda* dide nîşan ku Mela Umerê Aşiq nefsbîçûk bûye û neketîye bin tesîra neyînî ya ilm û edebîyatzanîna xwe. Her çî qas zana, alim û şairekî hêja bûye jî wî nasnavê Laxer şayanî xwe dîtîye û xwe di nav nefsnizmahîya tesewifê da parastîye.

Ev **Miksîyê Laîerî** ku mest e  
Sekran ji kewsera elest e  
Yaran ji me ra ku ‘eqd dibest e  
Qeṭ’a ku ji davê ew nerest e  
Şeyda û cunûn e her demê ra  
(muxemmes 1/5)

**Laîerîyê Miksî** bi wey ta key xurûr  
Xudrehan ez destê mekkarê hudûş  
(xezel 9/13)

Ji xanî dûr mebe *Laîer* ku **Miksî** xakê dergah e  
Qerîn û mehmremê yar be xeyyar pûş û bi ser kunkux  
(qesîde 4/8)

### **2.1.9. Şairên ku laxer di bin bandora wan da maye**

Tiştêkî gelekî asa ye ku kesayetîyên mîrateya edebîyatê di bin bandora hev da mane. Pêşrewan her dem peyrewên xwe di bin tesîra xwe da hiştine. Di edebîyata klasîk a kurdî da jî mînakên vê meseleya bandorkirin û binbandormayînê heye. Her çî qas peyrew jî tevahîya mîrateya pêşrewên xwe sûd wergire jî em dibînin ku xaseten di bin tesîra kesekî da dimîne şair û wî kesî jî xwe di hin alîyan da wek mînak digire. Laxer jî helbet ji tevahîya helbestkarên kurdî û her wiha ji şairên helbesta miletên di îstîfade kirîye.

#### **2.1.9.1. Melayê Cizîrî**

Melayê Cizîrî ew gewreşair e ku kê mî şairên kurdî hene ku di bin bandora helbesta wî da nemabin. Laxer jî zêdetirîn di bin tesîra Melayê Cizîrî da maye û şêla

helbesta wî dewam kirîye. Çi di alîyê mezmûn û terkîban da çi jî di alîyê cuwankarîyên edebî da, di navbera helbesta her duyan da gelekî nêzikatî heye. Wî jî wekê Cizîrî bêtir xezel nivîsandine û mijar û babetên tesewifî ji helbestên xwe ra kirîye kakil û naverok. Her wekê ku li jorê jî hatîye qalkirin Laxer ketibûye ber bayê eşqa helbesta Cizîrî û di helbestxwendina wî da gelekî serkeftî, awazxweş û ji dil bûye. Wî ew qas ji helbesta Melê hez kirîye ku texmîsek jî bo helbesteke Melê dinivîse:

Remzek ji nesîmê li çemen da û xweşî

Rabû ji xewê sebze û şebnem diweşî

Çendî xebitî dil ku biket seyr û neşî

*“Nêrgiza mest û xeraman di sehergeh ku meşî*

*Bişkiftî sîfexunçe ji çara ereşî”*

(texmîs 1/1)

Her du malikên dawî ji xezeleke Melayê Cizîrî ne. Heçî her sê malikên pêşî aydê Laxer in. Bi vî awayî li ser deh xezelên Melê texmîs hatîye avakirin.

Laxer di hin helbestên xwe yên dî da jî dide nîşan ku tesîra helbesta Melayê Cizîrî li ser şêweya helbesta wî zêde ye. Bo mînak:

***Cizîrî:***

Lew *seher* cewlan didit bayê sebayê *rast û çep*

Sosin û sinbul bi *mestî bèn semayê rast û çep*(Cizîrî, 2007: 52)

***Laxer:***

Min *sehergaha* ezel dî meyfiroşan *rast û çep*

Reqs û best in *tên semayê dûş bi dûşan rast û çep*

(xezel 3/1)

Dîsa di helbesteke xwe ya dî da Laxer ristina xwe gelekî şibandîye ya Melê û terkîb û mijara wî bi kar anîne:

***Cizîrî:***

Mişlî goyîn te rewan nal ji dilê miskînî tên

Em nizanin tu çira her we dinalî *şeb û roz* (Cizîrî, 2007: 107)

**Laxer:**

Hîkmeta van remz û razan muşkilatê xemzeyan

Kî di vê ‘esrê beyan ket bê ‘eyan tên *roz û şeb*

(xezel 4/8)

Di helbesteke xwe ya dî da peyva *hudûş* ji xwe ra kirîye bingeh, ku ji vê jî dixuyê ku tesîra şeweya Cizîrî li ser Laxer pîrr bûye.

**Cizîrî:**

Tu *sehergeh bi temaşa were bazarê hudûş*

Lê te bê faîde azar-î nedît xarê *hudûş* (Cizîrî, 2007: 69)

**Laxer:**

*Wer temaşa carekî darê hudûş*

Çi newa têtin ji dîwarê *hudûş*

(xezel 9/1)

Gava em derbirana “dil ji min bir” seh dikin filhal helbesta Cizîrî tê bîra me. Bê guman Laxer jî ev îfade di du sê helbestên xwe da bi kar anîye. Ev jî emareyek e ku bandora Cizîrî ya li ser Laxer dide ber çav.

**Cizîrî:**

*Dil ji min bir dîlberek zîba qeba*

Çavxezal û pirşepal û mehlîqa (Cizîrî, 1986: 294).

**Laxer:**

*Dil ji min bir nazenîne zerkulahe keç û rast*

Şahê hûbban sorşêrinê pur sîpahê keç û rast

(xezel 5/1)

Her tişt li alîyekî, di xezelekê wî da malikek heye ku em tê da rasterast rastî navê Melê tên.

Roja ‘esîrê Taħa mara meke feramûş

Sultânê sêdrê mehder feryadresê *Melê* ra

(qesîde 1/3)

Rêzemaalîkên li jêrê hatine rêzkirin ji wan çend emareyan in ku derfet dide me ku em eşkere pê serwext bin ka tesîra helbesta Melayê Cizîrî çend çêbûye li ser helbesta Laxer.

**Cizîrî:**

*Îd e û herkes ji dîdara te lê pîroz e î'd*  
Ez tinê mehrûmê dîdar im bi sed menzîl be'îd (Cizîrî, 2007: 91)

**Laxer:**

*Îd e yarê xemkûsarê herkesê ba teyrê şad*  
Ezmê yarem xef dibînim her qitalê ên xerîb  
(qesîde 2/4)

**Cizîrî:**

Meşî û mestane reyhanî *dilê min di di amancê*  
*Reşandî sîneyê tîran* bi qewsê her du mal ebrû (Cizîrî, 2007: 201)

**Laxer:**

*Sîneyê min kir hedef tîran* ji qewsê ebrûyan  
Lê dibarînit peyapey ceng û zalê ên xerîb  
(qesîde 2/7)

**Cizîrî:**

*Ristem û Cimşîd û Xalid, Hemze yan şêrê 'Elî*  
Aferîn ya şehsiwarê tirk û rimbazê ereb (Cizîrî, 2007: 47)

**Laxer:**

*Heyder e ya Rustem e der ceng erê ceng yan 'Umer*  
Şahê merdan merdê meydan şehdê dalê ên xerîb  
(qesîde 2/8)

**Cizîrî:**

Bi dama muhbetê bend im  
Xedenga firqetê dil nuht

Bi şubhê *murxê nîmbismil*

Di hev wertêm di xwînê da (Cizîrî, 2007: 36)

**Laxer:**

Wey muxbeçeyê can bir der dawî bi yek 'îşwe

Wek *teyrekî nîmbesmel* mewta kirme ya Reb

(xezel 2/4)

**Cizîrî:**

Bi Qur'anê bi ayatê eger pîrê xerabatê

Bibêjit *secde bin Latê* murîdên wî dibin qatê (Cizîrî, 2007: 26)

**Laxer:**

Şukrane *birim secde pêş saqîyê meyxane*

Go: bendeyê dêrînê kehla kirme ya Reb

(xezel 2/6)

**Cizîrî:**

Şah *bi gesta kuştina min rim hejandin bêsebeb*

Da me çêşmê qehr û xeşmê rim li dil da go edeb (Cizîrî, 2007: 47)

**Laxer:**

Çust û çapûk *tên bi 'ezma kuştina tey Laxerî*

Miksîya heq bû şehîdê meyfiroşan rast û çep

(xezel 3/7)

**Cizîrî:**

Şox û şengê zuhrerengê dil ji min bir dil ji min

Awirên heybetpilingê dil ji min bir dil ji min (Cizîrî, 2007: 166)

**Laxerî:**

Dil ji min bir *muxbeçanê sîmendama çehregul*

Çêşm û mestan cam di destan xemrenûşan rast û çep

(xezel 3/3)

**Cizîrî:**

*Eqdê-i ihramê dema dilber xwîya bê ferd- 'eyn*

Secdeyek ber wan du birhan nagirit cih sed şimaz (Cizîrî, 2007: 104)

**Laxerî:**

*Ferz û 'eyn e 'eqda ihramê dema bê ew perî*

Lew di 'ilmê ehlê halan weysîyan tèn roz û şeb

(xezel 4/10)

**Cizîrî:**

Bi narê firqetê suhtim ji ferqê ser heta pê da

Xedenga xefletê nuhtim ji berqa lami'a tê da (Cizîrî, 2007: 36)

**Laxer:**

*Dozexê hîcranê sohtim ez serî hetta qedem*

Ah ji ber tîrên firaqê rûsîyahê keç û rast

(xezel 5/2)

**Cizîrî:**

Destê qudret ku hilavêt ji bejna te niqab

*Bi cemala ceberûtî me neman perde û hicab*(Cizîrî, 2007: 46)

**Laxer:**

*Ji cemala xwe hîcabê vekir û rojê hilat*

Perîya rengê ferîşteşenema leb ji nebat

Bi Şemed sondê dixwem sermayeyê rûh û heyat

Bi nefesê 'Îsa ji wê îhîya kirî 'ezm û rufat

Ger nûmayed yekî engûşt cîhan dê kerî ket

(muxemmes 2/2)

**Cizîrî:**

Belko dîwar-i bi guh bin bi Xudê kî bi Xudê

*Bi tu rengî nekirî eşkere esrarê hudûş*(Cizîrî, 2007: 69)

**Laxer:**

*Tu meke behsê hudûşê ra bi kes*

Şubh yar nîne êvarê hudûş

(xezel 9/7)

**Cizîrî:**

Hin ji nik dêrê ve tèn qesta kenîştê hin dîkin

*Ne ji van im ney ji wan im min derê xemmar-i bes* (Cizîrî, 2007: 110)

**Laxer:**

*Naçim bi kenîştan û derê dêr û mesacid*

Cuz meygedeyê rind û xeraban ra bidem bac

(xezel 11/4)

**Cizîrî:**

*Heyata dil meya baqî*

*Binoşin da bi muştaqî*

‘Ela ya eyyuhe s-saqî

Edir ke’sen we-nawilha (Cizîrî, 2007: 25)

**Laxer:**

*Meya baqî bi muştaqî*

Vexwe raqê ji dest saqî

Kemerdestbestê ya waqî

Bi pêşî Azerê zertac

(murebbe 1/3)

**Cizîrî:**

*Dilberê îro seher avête cergê min du dox*

Yek li sîne yek li dil da lew ji min tèn ax û ox (Cizîrî, 2007: 86)

**Laxer:**

*Seba îro xeber anî ji ahûya şepal û şûx*

Nesîmê da me mizgînî ku dê bêtin helatên tûx

(qesîde 4/1)

**Cizîrî:**

Netrik û tayên bi rîşî ê di zêr in pê ve wîşî

Min du fêris dîn di pêşî *murwe û insafî yox* (Cizîrî, 2007: 86)

**Laxer:**

Eger Mehdî nîye kî dê di vê ‘esrê ‘edalet ket

Cîhan der hem û pur aşûb şer û fitne *muruwwet yox*

(qesîde 4/4)

**Cizîrî:**

Ah û oxên min ji dil tèn lê ji ber tîra qizil tèn

Yan ji kovanên di kul tèn jê *dizêt her xwîn û zox* (Cizîrî, 2007: 86)

**Laxer:**

Nefes’Îsa û Loqman î şîfadarê hemû derdan

Ku an dem wê birîn û cerh ku ji *têtin ‘edab û zox*

(qesîde 4/6)

### 2.1.9.2. ‘Ela el Mu’arr’i

Tesîra edebiyata derdor jî li ser şairan teqez çêdibe. Baxisus tesîra ziman û edebiyata erebî li ser îlm û edebiyata kurdî ne kêr e. ‘Ela el Mu’arrî jî ji wan helbestkarên dêrîn ên ereban e ku bi helbesta xwe ve meşhur e û bi naverok û terza xwe ve helbestkarên li pey xwe binbandor kirine. Ji van kesan yek jî Laxer e ku di nav helbesta xwe da cih daye navê vî şairî. Malika jêrê jî ji heman texmîsê ye û tê da hem mexlesa Laxer dibore, hem ya Mela. Her wisa tê da navê du şairên dî jî diborin ku Laxer wan nawan dide û xwe bi wan şairan ra qîyas dike û bi vî awayî pesnê helbesta xwe dide:

Laxer di zemanê xwe û şî’rê tu ‘Ela yî

Çendî te hebin dax û birîn têki bela yî

Rengîn î ji derd û eleman şubhê Wela yî

“*Ellah çi tebi’etbeşer î xwe ne Mela yî*

*Vê cewr û cefayê tu peyapey dikeşî*”

(texmîs 1/10)

Di çapa dîwana Melayê Cizîrî ya ku ji alîyê Zeynelabidîn Zinar ve di sala 1986an da hatîye amadekirin da ji bo *'Ela* wiha hatîye gotin: *'Ela, yan 'Elayî: 'Ela el Mu'arrî ye ku şairekî navdar ên Ereban bû û ji bajarê Mu'ernet-ul Nu'mana li Sûrî ye.* (Cizîrî, 1986:214).

Ji bo heman kesî di *Gerdenîya Gewherî* ya şerha dîwana Melayê Cizîrî da tê gotin ku *xuya ye ku 'Elayî navê şairekî faris e lê me navê wî nebihîstîye.* (Zivingî, 2013:264).

Heçî navê dî ye, yanê Wela; di heman pirtûka şerhê da bi du îhtîmalan hatîye dîyarkirin; dibe ku ev jî nasnavê şairekî be, lê belkê jî ji peyva “wel” be ku ji bo hemî kulîlk û gul û çîçekên biharê tê gotin, yanê laşê te wekê wan rengîn e. Lê belê, di çapa ya Zeynelabidîn Zinar da ev peyv ne wek nav û nasnavê kesekî hatîye dayîn, wek peyva ku tê wateya bihara ji gul û çîçekan.

Wisa xuya ye ku Laxer ji van şairên navborî agahdar e û di bin tesîra wan da maye. Lewra belasebeb ev nav nehatine bilêvkin.

### **2.1.9.3. Feqîyê Teyran**

Her şair lazim e ku serê pêşîn şairê herêma xwe û nêzikê xwe nas kiribe û xwendibe. Ji bo Laxer jî şairê herî nêzik Feqîyê Teyran e lew ku her du jî ji Miksê ne û di heman medreseyan da xwendine û di heman rêyan da meşîyane. Feqeyê Teyran yek ji pêşrewên Laxer e, lewma jî ne pêkan e ku tesîra wî û helbestkarîya wî li ser Laxer çênebûbe. Di helbesta klasîk da şairê ku herî zêde helbestên xwe bi çarînekan ava kirîye Feqîyê Teyran e û em dibînin ku Laxer jî çarînek nivîsîne. Mijar û naverokên wan hema dişibin hev û her duyan bi eynî rûhî helbest ristine. Her wiha mexleseke Laxer jî Miksî ye. Laxer zehf caran vî mexlesê di gel Laxer bi kar tîne, bes helbestên ku tenê ev mexles jî bi kar anîye dixuyên:

Çust û çapûk tîn bi 'ezma kuştina tey *Laxerî*

*Miksîya* heq bû şehîdê meyfiroşan rast û çep

(xezel 3/7)

*Miksî* eger gunah e pur kirine wê tebah e  
Racî ye ez Îlah e Xeffar e tewbe lê ra  
(qesîde 1/8)

Di nav mexlesên ku Feqîyê Teyran bi kar anîye da Miksî jî heye ku dibe ku di vê nuqteyê da Laxer jê binbandor bibe:

Way dilo bawer ji min î, ê ji işqê bû kebab  
Mihmeta cezbê buwarî, ew tîne zanin we ye

Her kesê carek bibînî, bejn û balaya bulend  
Wan guneh têtin bi Miksî, seh diket halê te ye (*Gulnar, 2018:88-89*)

Çima ku di gelek alîyan da mişterekîya wan heye, meriv bê guman dikare bêje ku bandora Feqîyê Teyran li ser şêwaz û naveroka helbesta Laxer çêbûye.

***Teyran:***

Ey dilbera gerdenzucac  
Way nazika mislê zucac  
Qamet ji reyhana qirac  
Wêran ez im malim xirab (Sadînî, 2014:158).

***Laxer:***

Ya Reb çi sor şirîn e  
Ew serw û naz û xennac  
Xweş û hûr nazenîn e  
Gerden ji şûşeya ac  
(murebbe 3/1)

***Teyran:***

Xwedawenda gunehkar im  
Bi heqqê zatê ekber key  
Pelîtê mucibê yar im  
Bi wê Rewza munewwer key (Sadînî, 2014:462).

***Laxer:***

Ferdayê rojê meşser curm û nedametim pur  
Ummîdê ez tu Ƨaha key tu şefa'atim rûh  
(xezel 13/6)

#### 2.1.9.4. Ehmedê Xanî

Her çend wek şexs û helbesta xwe ve yê ku zehf zêde tesîr li ser Laxer hiştî Melayê Cizîrî jî be, em dizanin ku wî jî şairên dî jî muheqeq bandor hildaye. Ehmedê Xanî yek ji van şairan e ku sîya helbesta wî li ser malikên Laxer dîyar dike.

**Xanî:**

*Saqî tu ji boy Xudê kerem ke*  
Yek cur'eyê mey di camê cem ke (Ciwan, 2013:161)

**Laxer:**

*Saqî ji Xudê ra ku me mey xwar û şebê dac*  
Rewşen li me ke wek şebê dîbaceyê mî'rac  
(xezel 11/1)

**Xanî:**

*Da cam bi meyê cehannuma bit*  
Herçî me îrade, te xuya bit (Ciwan, 2013:161)

**Laxer:**

*Camê ji lebê nûşi peyapey li feqîran*  
Bexşende bike xeyr û sewab e te me ra rac  
(xezel 11/2)

Ji malikên jor xuya dike di terkîblêkirin û bangkirinê da di navbeyna gotinên Xanî û Laxer da şibandinek heye. Her du jî van mazmûnan hema hema di heman wateyê da bi kar tînin.

Dîsa li ser wateya qelbê însên ku di tesewifê da cihekî girîng e, di navbera rêzemaalikeke Xanî û murebbeyeke Laxer da nêzikîyek tê dîtin.

**Xanî:**

Perde ku rabbitin ji ber arîdê dilistan e xweş

Dil ku ji xeman bête der bilbilê gulistan e xweş (Ciwan, 2013:278).

**Laxer:**

Perde ku ji rûyê rabit

Aşiq ji heyatê dê reha bit

Ûetta ve qîyametê nerabit

Emma bi şehadetê di mî'rac

(murabba 2/7)

Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran û Ehmedê Xanî sê stêrikên geş yên asîmanê helbesta kurmançî ne ku her kî li pey wan hatibe, ne mimkun e ku ji wan sûd wernegirtibe û di bin tesîra wan da nemabe. Lew ku Laxer jî di dîrokê da wek peyrew li pey van şairan tê, asa ye ku ketibe bin şewaza helbestnivîsîna wan. Heke ku tevahîya dîwana Laxer li ber destê me bûya, me dê tesîra van şairan di helbestên wî da zêdetir bidîtana.

## 2.2. TAYBETÎYÊN RUXSARÎ

### 2.2.1. Şiklê Tertîbê

Wek helbestvanekî klasik, Laxer li dû xwe Dîwanyek hiştîye. Helbestên di Dîwanê da li gor rêza elîfbêyê hatine honandin. Ji ber ku di afata lehîyê da destxeta *Dîwanê* maye di bin avê da, tenê helbestên heta herfa dalê (د) hatine xilaskirin. Bi taybetî helbest bi herfên elifbaya erebî hatine nivîsîn. Tenê bi herfên kurdî yên ku di elifbêya erebî da tune, bi herfa “pe” (پ) yê xezelek nivîsîye. Laxer bi herfên erebî yên weke “elif, bê, tê, sê, cîm, hê, xê, dal”ê helbest nivîsîne. Bi tîpa ye (ع) helbestek nivîsîye ku ew jî texmîsa li ser helbesta Melayê Cizîrî ye. Wek ku me di beşên berê da qal kiribû ku ev helbest di nusxeya destxeta Mela Nûredîn da tune, bes di ya Mela Evdilmecîd da heye. Me li jêr, helbestên ku di *Dîwanê* da cih girtine, li gor qafîyeyê û di cihgirtina destnivîsê da, şematîze kirine.

Herf	Hejmara Helbestan	Rêza helbestan a di Dîwanê da
ا-a	2	1,2
ب-b	5	3, 4, 5, 6, 8
پ-p	1	7
ت-t	5	9, 10, 11, 12, 13
ث-s	4	14, 15, 16, 17
ج-c	4	18, 19, 20, 21
ح-h	3	22, 23, 24
خ-x	4	25, 26, 27, 28
د-d	1	29
ي-y(î)	1	30

*Tablo 1: Tabloya rêza helbestan ku di Dîwanê de hatine bikaranîn.*

### 2.2.2. Şiklên Nezmê

Di vê binbeşê da emê li ser şiklên nezmê yên ku Laxer di Dîwana xwe da bikaranîne rawestin. Di Dîwana Laxer da, şiklên ku herî zêde di edebîyata klasîk da tene bikaranîn cih girtine.

Şiklên nezmê û hejmara wan wiha ne: Di Dîwanê da 15 xezel, 5 qesîde, 5 muxemmes, 3 murebbe, 1 texmîs, 1 mustezad hene. Di Dîwana Laxer da 6 şiklên nezmê (qesîde, xezel, murebbe, muxemmes, texmîs, mustezad) hatine emilandin. Di nav van şiklên nezmê da yê herî zêde cih digire xezel e. Di nav van helbestan da qesîdeyek farisî û xezelek jî erebî ye.

#### 2.2.2.1. Qesîde

Qesîde peyvekî ‘erebî ye û tê me’neya “qesdkirinê, berê xwe dana cîhekî û nîzîkbûnê.” Di edebîyata kurdî da ji bo pesin û mezinahîya Xwedê, kesayetîyên dînî yên mezin û navdar û ji bo kesayetîyên rêvebir tê nivîsîn. Qesîde cara yekem ji aliyê helbestvanê ‘Ereb Muhelhîl ve, pênc esir berîya hîcrete hatîye nivîsîn. Qesîde wekî termekî edebî ew teşeyê nezmê ye ku her du misrayên malika yekem di nav xwe da

hemqafîye ne; rêza beytên din a yekem bi qafîyeyê ve serbest, ya duyem bi beyta yekem re hemqafîye ye. Hemû beytên wê bi weznekê ve girêdayî ne. Risteya qafîyeya qesîdeyê wiha ye: aa xa xa xa xa... (Dilçin, 2009:122-123; Adak,2014:405-406)

Rêza Qesîdeyê Di Dîwanê da	Hêjmara Malikan	Cureyê Qesîdeyan
2	8	Munaca't
3	9	Dia
5	9	Munaca't
26	8	Culûssîye
29	7	Ne't

Tablo 2: Tabloya rêz û malikên qesîdeyên ku di Dîwanê de hatine bikaranîn.

Di Dîwana Laxer da piştî xezelê, şiklê ku herî zêde hatîye bikaranîn yek jî qesîde ye. Qesîdeyên Laxer gorî malikê xwe zêde dirêj nînin. Jixwe di edebîyata kurdî da hejmara malikên xezel û qesîdeyan nêzikî hev in.

#### 2.2.2.2. Xezel

“Xezel” peyveke ‘erebî ye û tê wateya bi jinan re axaftina li ser eşq û evînê. Di edebîyatê de jî tê me’neya cureyeke helbestê ku li ser eşq û evînê tê nivîsandin. “Xezel” cara pêşî di edebîyata ‘Ereban de derketîye holê. Piştî Farisan ev cure di pêş de birine û paşê jî ev şiklê nezmê ketîye nav edebîyata Kurdan jî. “Xezel” cureyeke helbestê ya edebîyata klasîk e. Di edebîyata kurdî de xezel wekî qesîdeyê bi giştî ji pênc û heft beytan heta bi derdora bîst û sih beytan pêk tên.

Xezel ji du risteyan pêk tê û dibe beyt an ango malik. Malika yekem di nav xwe de hemqafîye ye, di beytên din de rêza yekem bi qafîyeyê ve serbest e; ya duyem jî bi beyta yekem ve hemqafîye ye. Awayê tertîba xezelê jî, wekê ya qesîdeyan aa-ba-ca... ye. Di edebîyata kurdî de bi giştî hejmara beytên xezelê ji pêncan ne kêm in û ji pênc dumalikan heta sihan (5-30) hatine nivîsîn. Xezel bi naveroka xwe ve ji çend cureyan pêk tê. Wekê xezela aşiqane (kamiranî û êşa evînê dike mijar), xezela rîndane (behsa zewq û kêfa dinyayê dike), xezela şûxane (behsa spehîtî û dilberîya yarê dike), xezela sûffiyane/arîfane (li ser ramana tesewifê disekine), xezela hikemî/hekîmane (li ser mijarên hikemî û felsefî radiweste). (Dilçin, 2009:104-105; Adak, 2014:409).

Şiklê nezmê yê ku herî zêde di Dîwanê da hatîye bikaranîn xezel e. Di Dîwana Laxer da 15 xezel hene û hejmara malikên wan ji 6an heta 13an didome. Hejmara malikên xezelê di tabloya jêr da xuya dike.

Rêza Xezelê Di Dîwanê da	Hêjmara Malikan
4	7
6	9
7	7
8	11
9	7
10	7
12	7
14	7
16	13
17	7
18	9
23	9
24	7
27	7
28	6

Tablo 3: Tabloya rêz û malikên xezelên ku di Dîwanê de hatine bikaranîn.

### 2.2.2.3. Mustezad

Mustezad ew cure ye ku ji xezelê derketîye û misrayekî wê dirêj û yek kurt e. Ji rêzên kurt ên ku li ser rêzên xezelê tîr zêdekirin ra “zîyade” tê gotin. Wezna rêzên kurt, ji wezna tefileyên rêzên dirêj ên ewil û yên dawîyê pêk tîr. (Dilçin, 2009:204)

Mustezadên ku misrayên wan yên dirêj û yan jî zîyadeyên (misrayên kurt) wan bêne dubarekirin jê ra “mustezada mutekerrîr”, misrayên zîyade li pêşîya misrayên dirêj bin dubarekirin jê ra “mustezada mudewwer” tê gotin. Mijarên mustezadan wekê yên xezelan in. Eşq, şerap, tebî’et, dûrketin, xurbet, dîn û tesewif mijarên mustezadan in. (Dilçin, 2009:204)

Di Dîwana Laxer da tenê mustezadek heye, ji 9 beytan pêk tê û wezna wê jî wiha ye:

*Mef’ûlu / Mefaîlu / fe’ûlun (rêza dirêj)*

*Mef’ûlu / Fe’ûlun (rêza kurt)*

#### 2.2.2.4. Murebbe

Murebbe ew cureyê helbestê ye ku ji çarrêzan pêk tê û bi wezna ‘erûzê tê nivîsîn. Du cureyên murebbeyê hene: Eger di benda yekem de malika dawî, di dawîya hemû bendan de bê dubarekirin, jê re “murebbeya mutekerrîr (murebbeya dubarekirî); ku neyê dubarekirin, bi tenê bi qafiyeyê hevbeş bin jê re “murebbeyê mûzdewîc” tê gotin. Sê murebbeyên Laxerî jî “murebbeyê mûzdewîc” in

Rista qafiyeya vê şiklê wiha ye: aaab-bbba-ccca-ddda; abab-cccb-dddb-eeeb (murebbeyê mûzdewîc) û abaB-cccB-dddB.../aaaA-bbbA-cccA... (murebbeyê mutekerrîr). Ji hejmara çarrêzên wê re sînora tune ye. Mesela, murebbeyên Feqîyê Teyran, “Îlahî Lew Dikim Zarî, 363 çarrêz e. Murabba, derbarê her mêjarê da tê nivîsîn. (Dilçin, 2009:212)

Rêza Murebbeyê Di Dîwanê da	Hêjmara Çarrêzan
19	9
20	8
21	9

Tablo 4: Tabloya rêz û çarrêzên murebbeyên ku di Dîwanê de hatine bikaranîn.

#### 2.2.2.5. Muxemmes

Muxemmes ew şiklê nezmê ye ku bendên wî ji pênc misrayan pêk tên. Benda yekem di nav xwe da û her sê û yan jî her çar rêzên/misrayên pêşîn yên bendên din di nav xwe da û her du misra an jî misraya dawî ya bendên din bi benda yekem ra hemqafiyê ne. Di muxemmesekî da rêza dawî ya benda yekem yan jî her du rêzên dawî ya benda yekem di dawîya hemû bendan da bê dubarekirin jê ra “muxemmesa mutekerrîr”, neyê dubarekirin jê ra “muxemmesa muzdewîc” tê gotin. (Dilçin, 2009:216)

Vehandina qafiyeya muxemmesê wiha ye:

1. *Muxemmesa Muzdewîc:* a) aaaaa/bbbba/cccca ...

b) bbbba, cccca, dddd ...

2. *Muxemmesa Mutekerrîr/Dubarekirî:* a) aaaaA/bbbbA/cccA

b) aaaAA/bbbAA/cccAA (Dilçin, 2009:217)

Di Dîwana Laxerî da pênc muxemmes hene û her pênc muxemmes jî “muxemmesên muzdewîc” in.

Mijarên muxemmesê wekê yên xezelê berfireh e, bi taybetî mijarên wekê eşq û evîn, mehbûb, mijarên dînî û tesewifi têne bijartin.

Hejmara Muxemmesê	Rêza Muxemmesê Di dîwanê da	Hejmara bendan
1	1	5
2	11	7
3	13	5
4	15	4
5	25	6

Tablo 5: Tabloya rêz û bendên muxemmesên ku di Dîwanê de hatine bikaranîn.

#### 2.2.2.6. Texmîs

Texmîs li ser beytên xezel û qesîdeyekê zêdekirina sê rêzan e. Rêz û beytên ku têne zêdekirin di nav xwe de hemwezn û hemqafiyê ne. Rista qafiyeya texmîsê weha ye: aaa(aa)-bbb(ba)-ccc(ca), ...

Cureyekî texmîsê jî ew e ku helbestvan sê rêzan diêxe di nav beyta xezel û yan jî qesîdeyê. Rêza bendê ya ewil û ya dawî aîdê xezela ku tê texmîskirinê ye û her sê rêzên di navbeynê da jî aîdê helbestvanê ku texmîsê çêdike ye. Ji vê cure texmîsê ra “texmîsa muterref” tê gotin. Ji vê karê ra jî taştîr/teştîr tê gotin. Rista qafiyeya texmîsa muterref wiha ye: (a)aaa(a), (b)bbb(a), (c)ccc(a) ... (Dilçin, 2009:223)

Di helbesta Kurdî ya kilasîk de ji kevintirîn mînakên texmîsan yek jî ya Mela Umerê Tînîsî (Laxer) ye. Ev texmîs, ji 10 bendan pêk tê û li ser xezela Melayê Cizîrî hatîye çêkirin.

#### 2.2.3. Wezin

Hemû helbestên Laxerî bi wezna erûzê hatine honandin. Peyva arûzê tê wateya alî, rê, rêbaz, hêştira serkeş û stûna konê tîn nişandan. Kêşa arûzê ji hinek qalib/pîvaneyên ku helbestek an jî manzûmeyek ji serî heta binî li gorî wan tê nivîsandin ra pîvanên arûzê tê gotin. Bo nimûne “Mefa’îlûn mefa’îlûn mefa’îlûn mefa’îlûn” pîvanekî kêşa arûzê ye ku helbestkar dikare helbesta xwe ji serî ta dawîyê li gorî vî qalibekî dî binivîse. (Adak, 2013:340)

Qalibên erûzê yên di helbestên Laxer da hatine bikaranîn di tabloya jêr da hatine nîşandayîn.

<b>Rêza Helbestan di Dîwanê da</b>	<b>Behr</b>	<b>Qalib</b>
3, 5, 7, 8, 9, 11, 15, 16, 17, 25	Remel/nesalim	<i>Fa`ilatun/Fa`ilatun/Fa`ilatun /Fa`ilun</i>
1	Muctes/ nesalim	<i>Mef`û lu / Me fa i lun / Fe`û lun</i>
13, 20, 23	Muzarî/ nesalim	<i>Mef`ûlu / Mefailun / Fe`ûlun</i>
2	Muzarî/nesalim	<i>Mef`ûlu / Fa`ilâ tu /Me fâ`îlu/Fa`i lun</i>
4, 10	Hezec/nesalim	<i>Mefa`îlun / Mefa`îlun/ Fe`û lun</i>
21	Recez/Nesalim	<i>Mustef`îlun / Fe`ûlu</i>
24	Muzarri/nesalim	<i>Mef` û lu / Fa`i lâ tun / Mef` û lu / Fa`i lâ tun</i>
30	Hezec/nesalim	<i>Mef`ûlu / Mefailun / Mef`ûlu / Mefailun</i>
6, 12, 14, 18, 22, 27, 28, 29	Hezec/nesalim	<i>Mef`ûlu / Mefailu / Mefailu / Fe`ûlun</i>
26	Hezec/salim	<i>Mefa`îlun Mefa`îlun Mefa`îlun Mefa`îlu</i>
19	Hezec/nesalim	<i>Mefa`îlun / Mefa`îlun</i>

Tablo 6: Tabloya qalib û behrên erûzê yên ku di Dîwanê de hatine bikaranîn.

Helbestvanê şareza di heman wextê da di bikaranîna weznê da jî serkeftî ye. Qisûrên wezna erûzê çend hindik bin, helbest ew qas serkeftî dibe. Her çendî di bikaranîna erûzê da Laxer serkeftî be jî lê dîsa di hinek cihan da qisûrên erûzê derketine dixuyên. Li jêrê em dê li ser van qisûran rawestin.

### 2.2.3.1. Îmale

Eger heceyeke kurt ji bo ku li weznê bê, dirêj bê xwendin, wê demê îmale derdikeve meydanê. Îmale, dirêjxwendina heceyeke kurt e. (Adak, 2013:346)

Bo nimûne:

*Mef'û lu / Mefâ'îlu / Me fâ î lu / Fe'û lun*

Sewdape/rîya mehrû /îro **kiri** /me ya Reb

Der zawî/ye putxane/ **secde biri**/me ya Reb

(îmale)

(xezel 2/1)

### 2.2.3.2. Zîhaf

Ji bo weznê, hêceyên erebî û farisî kurt têne xwendin. Zîhaf, kurtxwendina dengdêreke dirêj e, an jî kurtxwendina heceyeke dirêj e. Hebûna zîhafê di helbestê de wek qisûr tê qebûlkin. (Adak, 2013:382)

Bo nimûne:

*Fe'ilatun / Fe'ilatun / Fe'ilatun / Fe'ilun*

*(fe'lun)*

**Mujde** da me/ nesîmê ji/ şepalê me/hê rux

Di sehergah/ê kerîmî /bi wîsalê /**mehê** rux

Ji kuşad dil bû xerîmê di cemalê mehê rux

Ji hesed sohtî reqîbê çu şemalê mehê rux

**Min** dil perwaneyê şem'ê delal e mehê rux

(muxemmes 5/1)

### 2.2.4. Qafîye

Qafîye jî wekê weznê di helbestê de hêmaneke ahengê ye. Herî hindik, di mabeyna du misrayan de dubarekirina dengan e. Bi awayekî din qafîye, di dawîya du misrayan da dubarekirina dengan e. Di helbesta klasîk da ji herfa bêdeng a ku tê dubarekirin ra herfa “rewî” tê gotin. Qafîye, li gorî emilandina vê herfê tê binavkirin. (Adak, 2014:397)

Çend nimûne cureyên qafîyeyê yên ku di helbestên Laxerî de hatine bikaranîn ev in:

#### 2.2.4.1. Qafîyeya Mucerred

Tenê bi dubarekirina herfa rewî pêk tê. Di vê şêweya ahengê de qafîye ji herfên dengdêr ên dirêj yan jî ji herfên nedengdêran pêk tê. (Adak, 2014:397)

Dame şed rengê ‘ezabê û belayê xem û beş  
Bi hezar guneh ‘îtabê û cefayê xem û beş  
Nekirî pursê li halê me bi bayê xem û beş  
Çi xeder bû li me kir şeh bi hewayê xem û beş  
Qe neanîne xeyalê bi edayê xem û beş  
(muxemmes 4/1)

Wê şem’ê şebê şemalê gerdan  
Gulçehre dehan û xonçe erzen  
Wek sêb du nîm û lebşekerken  
‘Uşşaqê bi qûtê can e muhtac  
(murebbe 2/3)

#### 2.2.4.2. Qafîyeya Murekkeb

Herfên ku qafîyeyê pêk tînin, ji du herfan an jî zêdetir bibe, qafîyeya murekkeb pêk tê. Sê cureyên vê qafîyeyê hene. Qafîyeya murdef, muqeyyed û muesses. Laxer ji xeyrê qafîyeya muessesê herdu cure qafîye pêk anîne. (Adak, 2014:397)

#### 2.2.4.3. Qafîyeya Murdef

Peyvên ku qafîyeyê çêdikin di nav wan da herfa “*ridf*”ê hebe “qafîyeya murdef” pêk tê. Herfên *ridfê*, “elîf, waw û yê” ne. Herfa *ridfê*, di berîya herfa rewîyê da bê dubarekirin, qafîyeya murdefê pêk tê. (bihar/şikar)

Xweş weqt e mecalê geşt û seyran  
Nêv baxçeyê gul binevş û reyhan

Sermest e ji keyf û 'îşq û heyran

Erbabê meweddetê vedîran

Çeşmê şeveqê ji sohbetê ra

(muxemmes 1/3)

Dil ji min bir nazenînê zerkulaḥê keç û rast

Şahê hûbban sorşêrînê pur sîpaḥê keç û rast

(xezel 5/1)

(peyvên qafiyê yên din ev in: rûsîyah, ah, subhegah, gah, rah, belah.)

#### 2.2.4.4. Qafiyeya Muqeyyed

Berîya herfa rewîyê dubarekirina herfên hemcîns ê ku bêhereke bêne bikaranîn, qafiyeya muqeyyedê pêk tê.

Perîya dêm bi nûr nar e weya nûr e cism

Bi leṭafet xwe şekerxa çî ṭilism e çî ism

Bi du zencîrê sîyeh ḥelqe girêdame resm

Ger liber quflê di zindanê kırım ḥeps besim

Bi me da cur'eyekî camê xeyalê mehê rux

(muxemmes 5/5)

#### 2.2.5. Redîf

Piştî qafiyeyê, di dawîya misrayan da dubarekirina qertaf, peyv û komepeyvan e. Ji helbestên bi redîf ra “mureddef” tê gotin. Sê cureyên redîfê hene. (Adak, 2014:399).

##### 2.2.5.1. Redîfên Biqertaf

Ev cure redîf ji qertafan tenê pêk tên.

Hindî ku hebin xûb û zerif her di xemî ne

Derxûnê ceger pareyê derd û elemî ne

Wek şehde hebin da'i çî ḥacet qesemî ne

“Çendî te but û latê nîşarê qedemî **ne**  
‘İcazê meke vê tu ji nesla Qereş î”

(texmîs 1/6)

### 2.2.5.2. Redîfên Bêjeyî

Ev cure redîf ji qertaf û bêjeyan an jî tenê ji bêjeyan pêk tên.

Nimûne:

Şed barê te zulm e li min yarê sîtem **çerx**  
Yek barê nekir dost e li min karê kerem **çerx**

(xezel 14/1)

### 2.2.5.3. Redîfên Kombêjeyî

Ev cure redîf ji qertaf û kombêjeyan an jî bi tenê ji kombêjeyan pêk tên.

Nimûne:

Ey şehînşahê ‘Ereb pûrsê li halê **ên xerîb**  
Rehmê kun binger be şefqet ‘arzûhalê **ên xerîb**

(qesîde 2/1)

Min sehergaha ezel dî meyfiroşan **rast û çep**  
Reqş û best in tèn semayê dûş bi dûşan **rast û çep**

(xezel 3/1)

## 2.3. CUREYÊN EDEBÎ YÊN TEMATÎK

Tesnîfkirina tematîk jî xebateke lêkolîna akademîk e ku li ser helbestê tê kirin. Helbesta klasîk jî li gor hin temayan tê binbeşkirin û bi awayekî zelal li ber çavan tê raxistin. Carinan helbest li dor yek temayê tê ristîn ku ji van temayan ra tewhîd,

munaca'at, na't, hîcvîye, mî'racîye, mewlîd, methîye, mersîye û hwd tê gotin. Ev wek têgeh ji helbestê ra dibe navekî tematîk.

Helbesta klasîk a edebîyata kurdî jî berhemên wiha dane. Jixwe di dîwanên mureteb da hin ji van cureyan wek şert û qaîde tê dîtin. Wek şairekî helbesta klasîk, Mela Umerê Miksî jî serî li van cureyên tematîk ên nezmê daye û helbestên ku babetdîyar in, nivîsîne.

### 2.3.1. Munaca'at

Tê wateya xilbilîna hundirîn û ji Xweda ra lava û hêvîkirin e. Munaca'at di edebîyatê da ew helbest e ku li ser lava û hêvîkirina ku ji Xweda ra tê kirin, tê honandin. Bi pirranî di şiklê xezel û qesîdeyê da tê nivîsîn. Ji edebîyata Ereban derketîye û belavî derdor bûye. Dema şairên klasîk dîwanên mureteb ava kirine, wek cureyekî tematîk a pîroz a helbestê, munaca'at ji xwe ra wek qaîde dîtine û di serê dîwanê da cih danê. Her wiha, lew ku bi temayekî pîroz e, mesnevînûsan jî di serê berhemên xwe da cih ji helbesta munaca'at ra veqetandine. Naveroka vî cureyê helbestê exlebî dînî ne û hêz û qudreta Xwedê tîne zimên û her wiha evdînî û acizîya însên a li pêşberî Xwedê tê derbeyankirin. (Pala, 2005:340)

Di nav helbestên Laxer ên li ber destê me da du sê helbest bi temaya munaca'atê hatine nivîsandin. Laxer di van rêzemaalikan da berê xwe dide Xwedê, bi lava û hêvîyan dua dike, dixwaze ku mexfîreta xwe di ser curm û gunehên wî da biwerîne.

Ruhanîyan tu ruh î hem rewneq î ji gulê ra

Ṭufanîyan tu Nuḥ î der beḥrê xergulê ra

(qesîde 1/1)

Barî Xudayê yekta mara bibexşe Ṭaha

Curm û gunehê min boş wek jengê seyqelê ra

(qesîde 1/7)

Dîsa di helbesteke xwe ya ku bi erebî nivîsîye da, Laxer serî li munaca'atê dide û lava û hêvî ji Rebbê xwe dike ku ew bi rehmeta xwe ve were hawar û azara wî.

Ya zexîra min! Bibe hogir û dilovan ji bo min canzelîlê

Min xelas bike bi soza pêkan û xwedî hawar e  
Dişewitand gîyan germaya evîna Mûksî wi wiha digot  
Ya hawara hewarkeran, di bobelatan da hawar û meded

(xezel 10/4, 7)

### 2.3.2. Ne't

Ew helbest e ku di edebîyata cîhana Îslamî da ji bo pesindana Hz. Pêxember tê nivîsandin. Di van helbestan da şair bi Pêxember ra dikeve nav hasbîhalekê û jê mehderî û şefeetê dixwaze. Her çendî bi pirranî bi teşeyê qesîdeyê hatine nivîsîn jî şairên ku bi xezel, rubaî û murebbe û mustezadê jî ceribandine hene. Wek rêgezeke bingehîn di tertîba dîwanan da piştî tewhîd û munaca'atê cih digre. Naveroka na'tan exlebî rîsaleta Pêxember, mu'cîzeyên wî, hîcret û eza û cefaya wî ye ku di rêya dîn da kêşaye. (Pala, 2005:350)

Laxer jî hem bi qesîdeyê ev cure tema ceribandîye hem jî bi şiklê murebbeyê. Di van na'tan da şair pesin û delalîya Pêxember vedibêje, her wiha wek şairekî ehlê îman û tesewifê jê şefeetê hêvî dike.

Mestan û nazenîn î şûx û şepalê me rûh  
Xakanê kîşwerê dil her ca ji bo te meftûh  
Ey pîşewayê 'alem çerxê berîn ji bo Tûr  
Nêv keştê ger nebûya tufanê xerq fikir Nûh

(xezel 14/1, 4)

Ey namê tu heq rûzê ezel kirdî Muḥammed  
Mezbûr e di Qur'anê reqem kirdî Muḥammed  
Tu eslê wucudê heme 'alem ji te peyda  
Barî ji te ra (lewlak) e fermûdî Muḥammed

(qesîde 5/1, 2)

### 2.3.3. Hîcvîye

Mexsed ji vê cureyê tematîk rexne û tenkîda tişteki, kesekî û halekî ye. Mijara hîcvîyeyan çewtî, xeletî û şehitîyên şexsan û civakê ye. (Sezer, 2016:87)

Şair di hîcvîyeyan da hem gazindan ji tişteki dike hem jî bîr û bawerîyên xwe tîne zimên. Zimanê hîcvîvê bi awayekî hişk û giran e. Nivîsandina vê cure helbestê helbet cesaret dixwaze ku kesekî desthilatdar hatibe rexnekirin. Laxer jî ev cure ceribandîye, gilî û gazinda xwe ji halê dinyaya heyî û hazir dike.

Felek dinya te kir îro pur aşûb

Cîhan yekser te kir ateş xwe ra çûb

Xelaîq ger bi vê rengê libasê

Heta kengî zulm bit bo te merxûb

Bes e Miksî bike kutah behsê

Ji qîl û qalê Laxer şî'rê mensûb

(xezel 1/1, 2,7)

Naçim bi kenîştan û derê dêr û mesacid

Cuz meygedeyê rind û xeraban ra bidem bac

Ez çûme gelek medreseyan qeş me nedî kes

Ku dersê bide yane bixwûn 'işqê û minhac

(xezel 11/4, 5)

### 2.3.4. Medhîye

Tê wateya pesindan û medihkirinê. Di edebîyatê da dema medhê kesek yan jî tişteki hate kirin, ew dibe metna medhîyeyê. Bi pirranî kesên alim û zana yên ilm û irfanê, yan jî desthilatdar û giregirekî wê serdemê ji alîyên şairan ve tîne medihkirin. Her çendî bi pirranî di şeklê qesîdeyê da bê nivîsandin jî tê zanîn ku medhîyeyên di teşeyên dî yên nezmê jî hatine nivîsandin. (Pala, 2005:350)

Ji naveroka helbesteke Laxer jî dîyar e ku wî ev helbest wek medhîyeyekê nivîsiye û tê da pesnê sultanê dewrê dide û pê kêfşahîya xwe tîne zimên.

Şeba îro xeber anî ji ahûya şepal û şûx

Nesîmê da me mizgînî ku dê bêtin helatên tûx

Sehergeh min dî rast û çep xuya şahim bi şadî hat  
Sipahê pur giran şehbalê ber textê ‘edalet çox

Cîhanabadê me’ mûrî li textê seltenet rûnişt  
Xeyalî’m Mehdî ye min bûye zahir ew humayûn tûx

Eger Mehdî nîye kî dê di vê ‘esrê ‘edalet ket  
Cîhan der hem û pur aşûb şer û fitne muruwwet yox

(qesîde 4/1, 2, 3, 4)

# BEŞA SÊYEM

## 3. TEHLÎLA METNÊ

### 3.1. Unsûrên Dînî

Faktoreke sereke ya ku hizir û melhezeyên însên; hest, reftar, şexsîyet û tercihên wî di bin tesîra xwe da dihêle pergala bîr û bawerîyê ye ku wek çarçoveyêke têgehî jê ra dîn tê gotin. Tesîra fikra dînî çawa ku li ser her tiştî dixuyê, her wisa li qada huner û edebîyatê jî xwe dide dîyarkirin. Helbesta klasîk a kurdî jî yek ji wan qadan e ku em tê da gelekî rastî hêmanên dînî tên. Lewra helbestkarên vê cure hunerê dîndar bûne û di bin tesîra bawerî û çanda dînê Îslamê da jîyane û fikirîne. Atmosfera tesewîfî bi xwe ra hin hêman û motîfên dînî anîne û şexsîyetên ku bi edebîyatê ra mijûl bûne bivênevê ev motîf li gor hizir, hissîyat û şîyana xwe emilandine. Lew ku Laxer jî salikê vê rêyê bûye di helbestên xwe da bi awayekî siruştî cih daye van motîfan û kakila helbesta xwe bi van motîf û unsûran ava kirîye.

#### 3.1.1. Navên Xwedê

Di bingeha bawerîya dînî da wek xaliq û afirîner Xweda heye û Ew jî bi hin navên xwe tê bilêvkirin, ku her navek bi wateya xwe ve taybetîyêke Wî ya mitleq diwesfîne. 99 navên Xwedê hene û ev nav wek “Esmau’l-Husna” tên gotin, yanê lew ku Xweda temsîla xweşikîya mitleq dike, jê ra navên herî xweşik û spehî hatîye gotin.(Acar, 2017: 97).

Di edebîyata tesewîfî da navên Xwedê her wext hatine bikaranîn û şairan hêvî û mededa xwe di ser van navan ra gihandine Xaliq û Rebbê xwe. Em dibînin ku Laxer jî di helbestên xwe da cih daye navên Xwedê û hewar û mededa xwe li dor van navan ristîye.

Laxer di nav helbestên xwe da cih daye van navên wek Xuda, Taha, Barî, Racî, Îlah, Xeffar, Wacib, Reb, Heq, Mewla û Semed.

Yên li jêrê çend heb mînak in ku me ji helbestan hilda vê derê.

Ah û ezîn gerdûnê dîn kuştendeyê merdê **Xuda**

Şed hezar şehzade wê mirne mîşalê ên xerîb  
(qesîde 2/3)

Saqî çû nezer da min dîn ba dilê xaret kir  
Taquet me nema êdî wenda kirme ya **Reb**  
(xezel 2/3)

Ji cemala xwe hîcabê vekir û rojê hilat  
Perîya rengê ferîştesenema leb ji nebat  
Bi **Şemed** sondê dixwem sermayeyê rûh û heyat  
Bi nefese ‘Îsa ji wê îhya kirî ‘ezm û rufat  
Ger nûmayed yekî engûşt cîhan dê kerî ket  
(muxemmes 2/2)

**Barî Xudayê** yekta mara bibexşe **Ṭaha**  
Curm û gunehê min boş wek jengê şeyqelê ra  
Miksî eger gunah e pur kirine wê tebah e  
**Racî** ye ez **Îlah** e **Xeffar** e tewbe lê ra  
(qesîde 1/8-9)

### 3.1.2. Qur’an

Çi nivîskî çî nenivîskî, her dînek metneke wî ya pîroz heye. Metna pîroz a dînê Îslamê jî Qur’an e. Wek kitabeke pîroz, Qur’an temasî gelek mesele û mijaran dike. Çi madî çî me’newî, li ser rê û rîsma heyatê ji hukmên wê tesîreke zêde heye. Lew ku ehlê dîn û bawerîyeke xas û tesewîfî bûye, Laxer jî di helbestên xwe da cih daye navê Qur’anê yan jî bi hin terman ve ew îma kirîye.

Miksî bi heqqê **Qur’an**  
Te’wîzê herz û canan  
Can ra bi baz û bend î  
Mezbûr ke bi medrac  
(murebbe 3/10)

Ey namê tu heq rûzê ezel kirdî Muḥammed  
Mezbûr e di **Qur’anê** reqem kirdî Muḥammed

(qesîde 5/1)

Dil bedrê mûnîr e ‘îşqê gêra  
**Ayatê celal** e şewqê vêra  
Herdemê remeq ji zewqê dêra  
Perwanesîfet meraqê pêra  
Pêra nekirim ji xeberê ra

(muxemmes 1/1)

### **3.1.3. Pêxember**

Di dîroka mirovahîya dêrîn da kesên ku ji Xwedê peyam hildane û bi metnekê derpêşî mirovan kirine hene. Ev kes wek pêxember yanê peyamhinêr hatine binavkirin. Ew qasidên Xwedê ne û mirov ji merez û meqseda Xaliqê alemê agahdar kirine. Di şûna peyva pêxember da “nebî” û “resûl” jî tê bikaranîn. Her çendî pêxember nebin jî di tarîxa mirovayetîyê da hin şexsîyet hene ku bi bîr û bawerîyên xwe û bi kirinên xwe ve wek kesên husn-î mîsal hatine dîtin û insanan ji wan feyz û sûd wergirtine.

#### **3.1.3.1. Muhemmed Pêxember**

Pêxemberê dînê Îslamê Hz Muhemmed Mustefa. Di sala 571ê mîladî da hatîye dinê. Pêxemberê dawî yê silesileya nubûvetê ye ku bi însan û pêxemberê pêşîn Hz. Adem dest pê dîke. Muhemmed tê wateya “kesê ku hatî hemd û senakirin, kesê pesnê wî hatî dayîn û jê hatî şikirandin”. Di edebîyata klasîk da bi nav û sîfatên wek Ehmed, Ehmedê Muxtar, Behra Keremê, Fehrê Cîhanê, Mustefa, Mehbûbê Xuda, Habîbûllah, Resûl, Resûlûllah. Gelek helbest li ser hatine nivîsîn ku di edebîyatê da jê ra na’ t tê gotin.(Pala, 2005:330).

Wek na’tnûsekî, Laxer jî di helbestên xwe da behsa Pêxember kirîye; car navê wî bi xwe bi lêv kirîye car jî nasnavekî wî.

**Meħbûbê Xuda** yî bi xweda tu aşîna yî  
Meb’usê li **Meħmûdê** meqam ferdê **Muħammed**

Miksî me kuşa destê îradet ji meweddê

Lazim bi meweddê bikirî hemdê **Muhammed**

(qesîde 5/6, 7)

Ey **pîşewayê** ‘alem çerxê berîn ji bo Tûr

Nêv keştê ger nebûya tufanê xerq dikir Nûh

(xezel 13/4)

### 3.1.3.2. Îsa Pêxember

Pêxemberê dawî yê Benîsraîlîyan e. Pirtûka wî *Încîla* pîroz e. Bîr û bawerîya xiristîyanîyê li ser vî pêxemberî û vê kitabê hatîye veavakirin. Bi ruhdâyîna Melakê Cibrîl, Hz. Îsa wek mu’cîzeyekê ji dêya xwe bê bav bûye. Lewma jî mu’cîzeke pêxembertîya wî jî vejandina mirîyan û saxkirina çavkoran bûye. (Pala, 2005:335).

Bi van xisûsiyetên xwe ve Pêxember Îsa di metnên edebî û dînî û felsefîk da cih girtîye û ji şair û nivîskaran ra bûye remz û motîfeke balkêş.

Laxer jî, çî ku ehlê tesewifê ye, wek remz û unsûreke dînî û tarîxî bi taybetîyên mu’cîzeyên wî ve cih dayê û merema xwe vebestîye.

**Nefes’Îsa** û Loqman î şîfadarê hemû derdan

Ku an dem wê birîn û cerh ku ji têtin ‘edab û zox

(qesîde 4/6)

Ji cemala xwe hîcabê vekir û rojê hilat

Perîya rengê ferîşteşenema leb ji nebat

Bi Şemed sondê dixwem sermayeyê rûh û heyat

Bi **nefesa** ‘Îsa ji wê îhya kirî ‘ezm û rufat

Ger nûmayed yekî engûşt cîhan dê kerî ket

(muxemmes 2/2)

### 3.1.3.3. Nuh Pêxember

Pêxember Nuh wek Ademê Duyem tê zanîn. Piştî Hz. Îdrîs dema ku cardî benîadem ji rêya rast û heqîyê dertên Hz. Nuh wek pêxember tê şandin ji alîyê Xwedê ve. Bi salan bang li qewmê xwe kir ku werin ser rêya heqîya îmanê bes ji bilî

kurên wî Sam, Ham û Yafes, û xanimên wî, pir hindik kesan îman pê anîn. Her wiha kurekî wî yê bi navê Yam jî bawerî lê nekir. Piştî qasekî hêvîya xwe ji qewmê xwe birî û ew hewalî Xwedê kir. Paşê, ji Xwedê jê ra wehîy hatîye bê ku keştîyekê çêke da ku xwe ji tûfana ku dê Xweda di ser qewmê wî yê ji rê derketî rake bifilite. Bi emrê Xwedê ji her cure heywanekê jî cotek heywan hilda keştîyê û mane benda tûfana helaketîyê. Piştî dît ku li her derê av dixuyê gazî kurê xwe Yam kir da ku were îmanê û xilas bibe, bes kurê wî neçû û got ku dê derkeve çîyayakî bilind û bi wî awayî reha bibe. Lê tûfana rabûyî her der di bin pêl û avê da hişt, ji xeyrî keştîya Nuh Pêxember her tişt di bin ava serîxwer da ma û bû helaketîya hemû gîyanberên li ser rûyê dinyayê. Dema baranê veda, tûfan sekinî û her der hêmin bû tenê yên ku di keştîya Nuh da ku tê bawerkirin ku li serê Çîyayê Cûdî danîye, bi sax û silamet man. Wisa tê bawerkirin ku bi vî terhî mirovayetîyê ji nû ve dest pê kir. Lewma jî Hz Nuh wek bavê duyem ê mirovayetîyê tê dîtin. (Pala, 2005:361).

Îca, bi vê qisseyaya xwe ve meseleya Hz Nuh û keştîya wî bûye motîfeke muhîm di metnên cur be cur da. Ev mesele xaseten di metnên edebî da bûye pêgireke derbirandinê ku şair û nivîskarên di berhemên xwe da emilandine.

Dem a em li metnên Laxer dimeyzînin, tê dîtin ku di çend cihan da behsa Hz. Nuh û meseleya wî hatîye kirin.

Ruhanîyan tu ruh î hem rewneq î ji gulê ra

*Tufanîyan tu **Nuh** î der behrê xergulê ra*

(qesîde 1/1)

Ey pîşewayê ‘alem çerxê berîn ji bo **Tûr**

Nêv **keştê** ger nebûya **tufanê** xerq dikir **Nûh**

(xezel 13/4)

**Bêkeştî** li ber **behrê** firaqê erixîm ez

Xewfek me hebû lew bi wîsalê perixîm ez

Bîhnek ji wîsalê me bihîst û kerixîm ez

*Wek tûle li pey mûçe li dorê çerixîm ez*

*Çix kir me hebîbê go: tu narî biqesî*

(texmîs 1/9)

#### 3.1.3.4. Îbrahîm Pêxember

Hz. Îbrahîm berîya zayînê di sed sala XIIan da hatîye dinê. Li ser jîyan û qiseya wî di Qur'anê da gelek ayet hene (Beqere 127, En'am 74-79, Enbîya 58-70, Îbrahîm 37, Hûd 73). Ji bavekî senemperest bûye. Di dewra qiral Nemrûd da jîyaye. Bi bîr û bawerîya xwe ya henîf û tewhîdî ve serî li pûtparêzîya Nemrûd rakirîye. Lewma jî gelek helaket hatine sêrî. Ji ber dildarî û îxlasa bawerîya xwe bi navê Xelîlullah (Dostê Xwedê) jî tê binavkirin. Bi manciniqan avêtina nav agirî bes bi înayeta Xwedê ew gurîya pêt û alavên êgir jê ra bûye gul û gulistan. (Pala, 2005:225).

Taybetîyên serpêhatî û çîrokên wî yê mu'cîzeyî di edebîyata klasîk da wek metafor û hêmayên peyamê tê dîtin ku şairan cihekî gelekî fireh jê ra veqetandine.

Laxer jî ji vê nesîbê nemaya paş û helbesta xwe bi metaforên ku bi Hz Îbrahîm û serpêhatîya wî ve têkilîdar in, vehonandîye û ristîye.

Ferdê heq fermî; ey agir sar be û silava te li **Îbrahîm** be

Her wisa mêrê heq wek ku bi rebê bêhemta re

Dibe gulşen û gulzar agir li dora heqperest

Reb hemîyan rizgar dike, wek **Xelîlê** xwe rizgar kir

(qesîde 3/3, 4)

#### 3.1.3.5. Suleyman Pêxember

Kurê Pêxember Dewud e. Di 12 salîya xwe da li şûna bavê xwe li têxt rûniştîye. Hem qiral û hem pêxember bûye. Debara xwe ji xezîneya dewletê na, ji zembîlên çêkirîye derxistîye. Xwedî hukim û selteneteke muhteşem bûye. Hukmî cinan kirîye û ew di avakirina qesra hikumetê da dane xebitandin. Xwedê şîyana gelek cure mucîzeyan bexşandîyê. Karibûye bi teyr û tûran ra biaxîfe û ji zimanê wan fehm kirîye. Karibûye bayî qontrol bike. Gustîlkeke wî hebûye ku li serê "îsmê ezam" nivîsî bûye. Qaşa vê gustîlê ji kevirê ahmer bûye û lewma jî karibûye serwerîya heywanên hov bike. Gustîla xwe tenê wextê ku çûye destavê derdixist û dida wezîrê xwe Asif yan jî xanima xwe. Muhra Suleyman ji vê gustîlkê tê. Bi navê hudhud teyrikekî wî hebûye ku ji dûr ve tişt didîtin û di çolên bêserûber da cihê avê dizanîye.

Yê ku agahîya Belqîseyaya welatê Sebeyê jî dayê ev teyrik e û bûye sebeb ku Belqîs bi textê xwe ve bibe fermanbera Hz Suleyman û îman bi wî û dînê wî bîne. Çiroka wî û morîyê jî heye ku her û hey hatîye gotin. Bi artêşa xwe ve dema ku rojekê di newalekê ra derbas dibe, serekê morîyan tembe li morîyên qewmê xwe dike da ku xwe bidin alî çî ku artêşa Suleyman tê û wan di bin pê xwe da nepelixînin. Ev xeber tê guhê Hz Suleyman û ew jî gazî sermorîyê dike ka çira wisa dibêje, tevî ku wî jî zanibûye ku ew artêşa pêxemberekî ye û tu carî zerareke wisa jê sadir nabe ji bo morîyan. Sermorî jî wiha cewab dide: Min go dibe ku hevalên min ji ber heybet û debdebeya te ji xwe biçin û şîret û nesîhetên te ji bîr bikin, lewma”. Wisa tê zanîn ku berîya zayînê di sed sala Xan da jîyaye. Çil salan sultanî kirîye. Di 60 salîya xwe da wefat kirîye. Piştî mirina wî welatê wî bi navê Yehuda û Îsrail dibe du şeq. Di Qur’anê da bi qasî 53 ayet (Sebe 12-21, Naml 15-44, Sad 30-40) hene ku derbarê Hz. Suleyman û çîroka wî da ne. (Pala, 2005:412).

Di edebîyat klasîk û metnên dêrîn da Hz. Suleyman bi van serpehatî, taybetî û mu’cîzeyên xwe bûye remz û motif. Di helbesta klasîk a kurdî da jî zehf caran derbas dibe. Her wiha Laxer jî di helbesta xwe da motîfa Suleyman Pêxember bi kar anîye.

Asîf weger **Suleyman** şed Xusrewan û Cemşîd  
Ser ber derê te danîn der bezmê koleyan rûh

(xezel 13/3)

### 3.1.3.6. Yûsiv Pêxember

Yek ji pêxemberên Benîsraîlîyan e. Kurê Hz Yaqûb e. Di Qur’anê da (Yûsiv 1-104) bi dûr û dirêj hîkaye û serpehatîya wî tê vegotin. Ji 12 kurên Yaqûb Pêxember yê herî biçûk û berdilê bavê xwe ew bûye. Di xewna xwe da dibîne ku di gel roj û heyîvê 11 stêrikan jê ra secde dibirin. Bavê wî xewna wî şîrove dike û dibêje ew 11 stêrik birayên wî ne û Xweda ew ji birayên wî çêtir xuliqandîye. Çiroka wî û her yanzdeh birayên wî dirêj e ku ji ber hesûdfîyê ji alîyê wan li bîreke xalî tê avêtin û ku tê da dimîne û paşê jî karwana ku di ber bîrê ra diçe dibîne ku ronahîyek ji hundirê bîrê tê. Birayên wî dibêjin ku Yûsiv ji alîyê guran ve hatîye xwarin û îşligeke xwînkirî bo bavî tê nîşandan. Yûsivê biçûk bo melikê Misrê tê firotin. Bi bedewîya xwe ew qas nav daye ku xanima melîk Zelîxa çav berdide Yûsiv û lewma jî gelekî

senîmenî di serî da tên. Îftira û derheqî tê kirin û Hz Yûsiv diavêjin zindanê. Wek şirovekarê xewnan û emsalê xweşî û bereketê, bedewî û îsmetê tê zanîn. Çîroka wî û Zelîxayê di nava xwe da gelek mijarên însanî dihundirîne. *Qisseyaya Yûsiv* xweşiktirîn qiseya Qur'anê ye û lewma jî wek “ Ahsenû'l Qissas” tê wesifkirin. Ji gelek aliyên xwe ve bûye motîf û mijara edebîyatê û rêzematîkên helbestan neqîşandîye.(Pala, 2005:485).

Di helbesta Laxer da jî em rastî vê motîfa hanê tên. Laxer bi agirê eşqa dilê xwe ve xwe wekandîye wî û xwe wek Yûsivê dewra xwe dîtîye.

Ba hîlm û melahehet xweş çûn **Yusufê** dewran e

‘Îşqê ku Zuleyxayê sewda kirme ya Reb

(xezel 2/8)

Sed **Yusufê** zeman î zîwer ji hûsnê ru'yet

Tu canê cawîdan î sultanê sîne meşrûh

(xezel 13/2)

#### 3.1.4. Melek

Wek ferîşteh, milyaket an jî melaîke jî tê gotin. Ji nûrê ne û zayenda wan tune. Ne dixwin û ne vedixwin, û razan bo wan nîne û ne ji mexlûqatên dî ne. Her daîm fermanberên Xwedê ne û bi kar û barên baş û qenc ra mijûl in. Xwedê hêz û qudret daye wan û her daîm di nav zikir û tesbîhatê da ne. Hejmara wan ka çend in, tenê Xweda dizane, bes di nav milyaketan da çar heb hene ku wek melekên mezin(Cebraîl, Mikaîl, Îsrafil û Ezraîl) tên hesabîn. Lew ku pak û pakîze û rind in, di edebîyatê da yar û dilber zehf caran bi melekan tên wekandin.(Pala, 2005:303).

Laxer jî di helbesta xwe da cih daye vê motîfa dînî û razber û merema xwe anîye zimên.

Dema avêtine nava êgir, li hewayê bi **Cebraîl** re got

Li te na, lê belê hewcetîya me bi Rebê bîna heyê

(qesîde 3/2)

Ji cemala xwe hîcabê vekir û rojê hilat

Perîya rengê **ferîşteşenema** leb ji nebat

Bi Şemed sondê dixwem sermayeyê rûh û heyat  
Bi nefese 'Îsa ji wê îhya kirî 'ezm û rufat  
Ger nûmayed yekî engûşt cîhan dê kerî ket  
(muxemmes 2/2)

### 3.1.5. Kesayetên Dînî

#### 3.1.5.1. Loqman

Der barê pêxemberî yan jî welîbûna wî da rîwayetên ji hev cuda hene, lê bêtir wek bendeyek salih tê qebûlkirin. Di Qur'anê da sureyek bi navê "Loqman" heye. Xwedê navê wî di kitabê da di ayeta duwazdehem a vê sureya navborî da da wiha zikir dike: "Bi rastî jî ji bo ku şukra Xwedê bike me ilm û feraset daye Loqmên." (Acar, 2017:112.)

Di deqên edebî da bi sebra xwe ve û li hember jan û êşa xedar bi hidariya xwe û bi şikirdariya xwe ve wek mezmûnekê tê bikaranîn. Laxer jî ev nav wek mezmûneke selahî û xweşîyê di helbesta xwe da bi cih kirîye.

Nefes'Îsa û **Loqman** î şîfadarê hemû derdan  
Ku an dem wê birîn û cerh ku ji têtin 'edab û zox  
(qesîde 4/6)

#### 3.1.5.2. Xizir

Bi ferhengî tê me'neya hêşînahî û tazebûnê. Bi mecazen jî wateya ku ew kesê ku ava heyatê vexwarîye û bûye nemir. Der barê wî da ka welî ye yan pêxember e, rîwayetên muxtelîf hene. Di hişmendî û çanda miletî ya bawerîyê da wek kesekî hawargihiş û hêvîda tê zanîn. Çîroka wî di Qur'anê da di gel Hz Mûsa (Kehf 59-81) derbas dibe. Navê wî zehf caran bi Îlyas Pêxember ra dibore. Wek du destebira, tê bawerkirin ku li welatê zilûmatê di heyama Îskenderê Zûlqerneyn da jê ra bûne rêber û li pey ava heyatê gerîyane. Tê bawerkirin ku salê carekê Xizir û Îlyas tèn ba hev û diçin hecê. Ji vê rojê ra "Xidirellez" tê gotin û ev roj jî 6ê Gulanê ye. Bi vê rojê xelk derdikevin geşt û seyranan. Wek efsaneyeke mişt mu'cîzeyî, tê bawerkirin ku Xizir li

ser behran digere û sicadeya xwe rastî li ser avê dike û nimêj dike. Gava pê li axê jî dike, ax nerm dibe û hêşnahî çêdibe. Her wiha hewa germ û xweş dibe. Tê fikirîn ku li ser hespekî boz siwar dibe û ser ta pê libasên wî kesk e. Ji ber van taybetîyên xwe yê ku ji insan ra derasayî tî Xizir di edebîyatê da wek motîfeke erênî û xweşîyê derbas dibe. Xaseten jî di gel îmajên wek ava heyatê, Îskender û zilûmatê parîyekî sereke jî Xizir e. Gelek îmajên yaran ên ku dildaran şad dike û vedijîne bi vê metaforê tê vegotin. Her wiha di tesewifê da jî wek “ilmê ledûn”ê jî kînaye ye. (Pala, 2005:485).

Her wekê ku di edebîyata klasîk a kurdî da derbas dibe, ev îmaja hanê di risteyên Laxer da jî li pêş çavê me dikeve.

Şahidên dêmbedr û saqîyê zehresîma **Xizirpûş**

Muṭriban ney û çeng û awaz ba surûşan rast û çep

(xezel 3/2)

### 3.1.5.3. Mehdî

Tê wateya kesên ku ghiştine li ser rêya heq û rastîyê. Bi nêzika qîyametrabûnê ra tê bawerkirin ku dê kesekî bi navê Mehdî wek xelaskerekî were û alema însanîyetê bîne ser rêya rast û heqîyê. Lewma jî tê wateya elametê qîyametê jî. Bi bawerîya berfirehtirîn, Mehdî Hz Îsa ye ku vêga li tebeqa çaran a semayê rûniştîye. Dema roja wê hat, dê dakeve devera Şamê û di destî da kopalê wî dê berê xwe bide alîyê rojavayê ve û alema insanan ji şerrê Deccal xilas bike. Di vê serdemê da şerîeta Hz. Îsa dê hikumferma be. Di edebîyatê da wek kesê hatî pesindan û xilaskerê derd û eleman tê şayesandin. (Pala, 2005:301).

Cîhanabadê me'mûrî li textê selţenet rûnişt

Xeyalim **Mehdî** ye min bûye zahir ew humayûn tûx

Eger **Mehdî** nîye kî dê di vê 'esrê 'edalet ket

Cîhan der hem û pur aşûb şer û fitne muruwwet yox

(qesîde 4/2, 3)

### 3.1.6. Çar Xelîfe

“Xelîfe” tê wateya kesê ku li şûna kesekî di rûniştîye û karê wî gerandîyê. Çar xalîfe (Ebubekir, Umer, Osman, Elî) jî ewkesên bijare, zana û pêşek in ku piştî Hz Muhemmed rêveberîya milletê xwe û dînê Îslamê kirine ra tê gotin. Paşê di dîroka rêveberî ya sîyasî ya cîhana Îslamê da ji serokên dewlet û hikumetan ra hatîye gotin. Di Qur’anê da jî insan wek xelîfeyê Xwedê tê pênasekirin (Beqere 30). Di xelîfeyên rêveberî û hikmedar da zanyarî, edalet, kîfayet û selamet tê xwestin. (Pala, 2005:185).

Ji çar xelîfeyên Îslamê jî, her yekî şîyan û taybetîyekê wî hebûye. Hz. Ebubekir bi sadiqî û comerdîya xwe ve, Hz Umer bi edaleta xwe ve, Hz Osman bi tewazû û pakîya xwe ve û Hz Elî bi cesaret û neseba seyîdîyê tê zanîn. Wek şexs û sembol ev çar xelîfe di metnên edebî da ji bo derbirîna hin hest û hizran hatine bikaranîn. Laxer jî helbet helbesta xwe bê van navên xelîfeyan nehiştîye veder û ew emilandine.

**Heyder** e ya Rustem e der ceng erê ceng yan **‘Umer**

Şahê merdan merdê meydan şehdê dalê ên xerîb

(qesîde 2/8)

### 3.2. Unsûrên Tesewifî

Tesewif tê wateya mîstîsîzma Îslamê. Di nav pêvajoyeke dirêj û piştî hin qewaman derketîye rasta ekolên fikrî yên cîhana Îslamê. Her çendî heta dema Muhîddînê Erebi gelek merhale li pey xwe hiştîbin jî, tesewif esildanî bi wî ra berbelav dibe û dikeve rêyeke pergali. Ya bingeha tesewifê digire nezerîyeya afirandina alemê ye. Wate, Xweda Wicûdê Mutleq e, lewma jî di heman demê da Kemalê Mutleq, Cemalê Mutleq û Husnê Mutleq e. Xweda xwestîye xwe îzhar bike, lewma jî ev arezû bûye sebeb ku Ew alemê bixulîqîne. Madem heyîna mutleq û delalîya mutleq Ew bi xwe ye, meqseda însên jî divê ew be ku xwe bigihîne Wî û di wê rêyê da nefsa xwe tune bike û xwe di Wî da heyî bike. Di vê rêyê da heft mertebe hene ku ew jî tewbe, zuhd, tewekul, qineet, uzlet, zikir, tewecuha li bal Xwedê ve, sebir, mureqebe û riza ye. Di dawîyê da salik digihe meqamê Wehdetê û paşê Fenafillah pêk tê.(Pala, 2005:440).

Wek ruh û hizreke dînî û Îslamî, tesewif çawa li ser gelek tiştan tesîr kiribe her wiha wê li ser kesayetîyên edebî û li ser metnên edebîyatê jî tesîr hiştîye. Edebîyata klasîk bêtir di bin bandora vê ekola hizrî û dînî da teşe girtîye û şairan bi term û istilahên vê ekola mîstîk helbest honandine. Lew ku di kevneşopîya medreseyan da hewayê bandorker a fikrî zehftir tesewif bûye, edebîyata klasîk ya kurdî jê xalî nebûye û naverok û unsûrên tesewufê tê da gelekî aşkera dixuyên. Wek ku li jorê jî hatîye zikiririn, Laxer şairekî ehlê tesewufê ye û lewma jî di helbestên wî da gelek hêmanên cîhana tesewufê derbas dibin. Ji van çend libên sereke ev in:

### 3.2.1. Wehdet

Tê wateya tak û tenêtiya Xwedê. Di teswufê da ya elzem ew e ku di nav kesretê da wehdet hebe, yanê yekaneîtiya Xwedê. Her tişt bi kesretîya xwe ve ji Wê tê. Ew ser û destpêka heyîne ye. Her tişt elametê hebûna Wê ye. Bê vîn û rizaya Wê tişteke ku bibe û biqewime tune.

Her dem di xeyalê min ney û mey  
Medhûş kirim ji **wehdetê** hey  
Ta yarê bibînim û bi hey û hey  
Bûsim kefê destê dostê ba pey  
Ku 'eqlê firaq û hicrî dîra

(muxemmes 1/4)

### 3.2.2. Saqî

Yê ku meyê dide. Dergahê tesewufê wek meyxaneyekê tê tesewurkirin û yê ku meyê belav dike û digerrîne ra saqî tê gotin. Ew jî ji murşîd îstîfere ye. Şair jî wê wek yar û dilberê dibîne.

Bide **saqî** meyê îro çep û rast  
Bi îlhamê meyê îro çep û rast

(xezel 6/1)

### 3.2.3. Kaseya Elest

Di destpêka afirandina mexlûqatan da sozdan û hevnasîna qul û Rebb da, pîrsa ku Xwedê pîrs kirîye ka Ew e yan na Rebbê wan, û ku wan jî gotîye belê. Wek bezmê elestê tê binavkkirin ev civîn û şewra Xwedê û ya evdan a herî kevn e. Di edebîyatê da jî wek mezmûneke tesewufî tê bikaranîn û şair wê dike alava vexwarina wê meya eşqê. Aşiq wextê gazî dilbera xwe dike, dibêje ku wî hê di zemanekî zehf kevin da ew nas kirîye û dil daye wê. (Pala, 2005:72).

Gîsûyê çû marê reş bigestim

Ev nîm û bi dabê zulfê bestim

Mexmûrê ji **kaseya elest** im

Kê em roz ji ‘aqilê xwe xwestim

Zahir ku me batîne veşarest

(muxemmes 3/3)

### 3.2.4. Mey/Şerab/Bade

Di edebîyata klasîk da gelekî hatîye bikaranîn. Carinan bi peyvên cam, pîyale, qedeh, peymanê ji meyê behs çêdibe û mecazê mursel tê sazîkirin. Bi lezzeta xwe û bi taybetîya xwe ya serxweşker ve gelek teşbîh pê çêdibin. Di tesewufê da wek alaveke ku ruh û derûnîya insên bi coş û xweş dike dîyar dibe. Bi rengê xwe ve dişibe lêv, xwîn, rondik û hinarkê. (Pala, 2005:52).

Eger **camek** şîrîn dî tu kesê ra

Bes jehrê dikî nêv camê meşrûb

(xezel 1/6)

Salikê wehdetserayê hey bi **mey**

Dil ne bende ew bi zûnnarê hudûş

(xezel 9/12)

### 3.2.5. Bende

Evd, kole û yê girêdayî. Zehf carna bi padîşah û sultan ra tê bikaranîn. Di tesewufê da kesê ku evdîniya xwe qebûl dike û berê xwe tenê dide Xwedê. Di

edebîyatê da yar wek sultan tê dîtin û aşiq jî wek bende çî jê tê xwestin dike. (Pala, 2005:66).

**Bendeyê şadiq** ji bo rager biket her ta'etê

Dê vexût zehra helahîl her di rahê keç û rast

(xezel 5/6)

### 3.2.6. Fena

Merhaleya dawî ya di rêya tesewufê da ew e ku evd/aşiq di wehdeta Xwedê da bibe yek û tê da tune û fena bibe. Yanê tê wê radeyê ku xwe fenafillah dike û dibêje ji xêncî Xwedê hew tişteki dî heye. Di edebîyatê da jî şair wek aşiqekî di nav arezuya wusleta yarê da ye.

Ê bi vê 'eynê **fenayê** dil bidet

Dê bibit ew dîn bi xeddarê hûdûş

(xezel 9/9)

### 3.2.7. Zûnnar

Çarikeke serpûxik e ku bi elameta keşetîyê dide der. Di bîr û bawerîya xiristîyanîyê da nîşaneke muhîm e ku kesê ev dîn qebûl kir zûnnarê girê dide û xaçekê jî bi serî ve dide. Di tesewifê da tê wateya dilsozî û xwedayîna Xwedê. Di edebîyatê da jî bi rêya hin hunerên ciwankarîyê şair dilsozîya xwe ya ji bo dilberê eyan dike. Di çîroka *Şêxê Se'nan* da jî derbas dibe ku Şêx ew qas dilikîyê keça xaçparêz û kuffarî dibe, di dawîyê da zûnnarê jî girê dide.

Zûnnar di malikeke Laxer da jî welê derbas dibe:

Salikê wehdetsarayê hey bi mey

Dil ne bende ew bi **zûnnarê** hûdûş

(xezel 9/12)

### 3.2.8. Kewsera Elest

Avek e li cennetê. Tê bawerkirin ku mislê wê li dinyayê jî hene. Kesê jê vedixwe êdî tî nabe. Di tesewifê da tê wateya ku ew kesê ku di bezmê elestê da soz daye Xwedê ku dê her evdinîya Wî bike, tu car dê tî nebe û nekeve şaşî û gunehan. Di edebîyatê da jî bi me'neya lêvên yarê tê teşbîhkirin.

Ev Miksîyê Laxerî ku mest e

Sekran ji **kewsera elest** e

Yaran ji me ra ku 'eqd dibest e

Qeṭ'a ku ji davê ew nerest e

Şeyda û cunûn e her demê ra

(muxemmes 1/5)

### 3.2.9. Secde

Di nimêjê da serîdanîna li erdê ye. Di tesewifê da tê wateya ku ji Xwedê pêştir ji tu kesî û tu tiştî ra evdinî û bendetî neyê kirin. Yanê lew ku her tişt masîwa ye, her Xwedê ye yê ku meriv serî li ber bitewîne. Di edebîyatê da jî ji bo dilsozîya aşiq tê bikaranîn ku ew ji xeyrê wê yara xwe berê xwe nade tu kesê. Xwe dike qurbana wê û serî dide ber derîyê wê.

Li pêşber bût me bir **secde**

Zunarê bermîyan bend e

Ĥîcabî rakirin perde

Numan mehtabê gerden'ac

(murebbe 1/4)

### 3.2.10. Meyxane

Meyxane ew mekan e ku lê mey û şerab tê vexwarin. Di tesewifê da di şûna tekke yan jî dergahê terîqetê da tê bikaranîn. Di hin cihan da qest ji meyxaneyê cenneta baqî ye. Di edebîyatê da wek cih û peywenda ku evîna yarê daye avakirin tê emilandin.(Pala, 2005:192).

Çira sofi netê îman  
Di **meyxanê** biçî mî'rac  
Musilman be ji bosaqî  
Werin secde bi vê minhac

(murebbe 1/1)

### **3.3. Kesayetên Dîrokî û Efsaneyî**

Çi baş çî xirab, di kevnedîroka hevpar a mirovahîyê da hin şexsîyet hene ku bi taybetîya xwe ya sereke di metnên edebî da wek motif û îmaj hatine bikaranîn. Van navan rê daye ku nivîskar ya di dil û hişê xwe da bi awayekî asan, vekirî û bandorker vebêje û merema xwe, çî xwîner be çî guhdar, bigihîne muxetebên xwe. Wextê em dêhn û bala xwe didinê, em dibînin ku Laxer jî ji van navan çend hebên pêş di rêzematikên xwe da bi kar anîne.

#### **3.3.1. Cem**

Çaremîn hikumdarê sulaleya Pişdadîyan e û li gor mîtolojîya Îranê bi heft sed sal an jî hezar sal emir kirîye û di heyama Hz. Nuh da jîyaye. Ji bo padîşahên navmezin û spehî wek sifet tê bikaranîn û di *Zend Avestayê* da jî wek mabûdekî hîndî derbas dibe. Bûye sebebê derketina gelek kar û sine'etên ku ji bo mirovahîyê kêrhatî ne. Salnamaye şemsî ji wî tê û roja newrozê jî wek sersal hatîye qebûlkin. Li gor efsaneyekî, dema li dinyayê digere û tê, tê Ezerbeycanê û li wir textekî ku ji durr û mucewheran biriqî dide çêkirin û li cihekî bilind dide danîn. Bi xwe jî di esnayê rojhilatinê da bi tac û cil û bergên mişt gewherî li wir rûniştîye û lewma jî her der di nav ronahîyê da hiştîye. Dema xelkê ev hal dîtîye ji wê rojê ra nûroj û ji Cem ra jî Cemşîd(şahê ronahîyê) gotine. Li gor hinekan Cemşîd Pêxember Suleyman e, lewma jî bi bayî yan jî bi gustîlka xwe ve tê yadkirin. Ger bi eynikê hat bibîranîn dibêjin ku ew Îskender e. Li alîyê din tê gotin ku yê ku şerab cara pêşîn çêkirîye ew e, lewma jî camê Cem, meclîsa Cem, ayîna Cem bi vê meqsedê tê bikaranîn. Di tesewifê da bi navê “meqamê cem” merheleyeke payeberz jî heye. Di edebîyatê da wek sembola kêf û vexwarinê, sermestîyê, desthilatdarî û payeberzîyê tê emilandin.(Pala, 2005:86).

Di helbesta klasîk da şairan îma li çî kiribin, bi wî awayî metafora Cem/Cemşîd bi bi kar anîne. Em lê rast tên ku di helbesta Laxer da jî wek îmajekê dîyar dibe.

Laxerî emrê humayûn bi serim hatî çî kem  
Can ji min sîne dixwazit dile dê wê jî bidem  
Belkî carek ew li hâlê me bipirsit ji kerem  
Nezerê ew li gedayan biketin şubhetê **Cem**  
Miksîya rabe ‘înayet bextê yarê mehrî ket  
(muxemmes 2/7)

Aşif weger Suleyman sed Xusrewan û **Cemşîd**  
Ser ber derê te danîn der bezmê koleyan rûh  
(xezel 13/3)

### 3.3.2. Xusrew

Di mesnewîya bi navê *Xusrew û Şîrîn* da navê karakterê mêr e. Ji şahekî Îranî ye û nevîyê Nuşîrewan e. Lew ku gelekî hez ji masîyan kirîye bi nasnavê Perwîz jî tê nasîn. Perwîz tê wateya masîyê. Di sala 589an da dertê ser text û paşê evîndarê keçeke ermenî ya bi navê Şîrîn dibe. Ev eşq bilavî dinyayê dibe û navê Xusrew jî dikeve nav çîrokên efsaneyî. Ji bo yara xwe Qesra Şîrînê dide avakirin. Bi navên cuda cuda heft xezîneyên wî hebûne. Di mesnewîyên bi navê *Ferhad û Şîrîn* an jî di *Xusrew û Şîrîn* da wek “aşîqekî gihiştî yara xwe” tê zanîn. (Pala, 2005:220).

Di gelek metnên edebî da jî telmîh li vî navî û li vê çîrokê hatîye kirin. Laxer jî wek îmajeke desthilatdarî û evînê ev nav ji xwe ra kirîye pêgir û di nava helbesta xwe da bi cih kirîye.

Minnet ku ji bextê xwe me şakir di xerîbî  
Şeydê xwe kirim ser perîya **Xosrevê** nû kax  
Seyqalê bi xwûna me ji nû wî daye şîrê  
Wê **Xosrevê** xûban ji ceger lê kirî bû zax  
(xezel 15/3, 4)

### 3.3.3. Rustem

Qehremenekî Îranî ye. Pesnê navê wî di *Şehnameyê* da zehf dibore. Giş sifâtên wek Rustemê Zal, Purê Zal, Rustemê Dastan, Heftxanê Ecem ên wî ne. Di helbesta klasîk da sembola qehremanî, jan, qudret û xalibîyetê ye. Hê di ciwanîya xwe da gelek dêw kuştine û nav daye. Tê bawerkirin ku di zemanê Keykawus da berîya zayînê di qirna 4an da jîyaye. Li dij hikumdarên Turanî şer kirîye. Bi kuştina Sîyawuş û bi xilaskirina Guştabê ji esaetê ve navdar e. Neketîye dînê Zerduştîyan. Lew ku por, birh û mijangên wî ji dêya xwe ve spî bûye, ev sifata Zal danê. Wateya peyvê wek jina pîr e. Wextê bi vî awayî ji dêya xwe bûye, bavê wî Sam gotîye ku ew nîşaneyê bêtalihî û bêyomîyê ye; lewra jî ew wek kurê xwe qebûl nekirîye û birîye danîye çîyayê Elburzê. Zal li wir ji alîyê teyrê Sîmurxê ve hatîye xwedîkirin û mezinkirin. Lewma jî jê ra gotine “Dastan”, yanê “hîle”. Ji ber vî qasî jî di hunera helbestê da navê Rustem di menaya zulf, mijang, birh, çav û xemzeya ku dildaran bi hîlekarî dikujin da tê bikaranîn. (Pala, 2005:2382)

Helbestkarê klasîk û tesewifê Laxer jî ev navê efsaneyî li helbesta xwe zêdekirîye û daye nîşan ku ew ji kesayetên efsaneyî û dîrokî agahdar e.

Heydere ya **Rustem** e der ceng erê ceng yan **‘Umer**

Şahê merdan merdê meydan şehdê dalê ên xerîb

(qesîde 2/8)

### 3.3.4. Nemrûd

Wek damezirînerê welatê Babîlê tê hesabîn û wek qiralê ku Hz Îbrahîm avêtîye nav êgir tê dîtin. Tê gotin ku di heyama berîya zayînê di salên 2640î da jîyaye. Nemrûd piştî ku Îbrahîm Pêxember avêtîye êgir jî îman pê neanîye. Di edebîyatê da bêtir di gel Hz. Îbrahîm û bi wateya cenceserîya ku yar dide dildarî tê yadkirin. (Pala, 2005:356).

Şair Laxer jî ev nav di nav vê peywendê da bi kar anîye û li kesayetên telmîhkirî yên helbesta xwe zêde kirîye.

Nedibû xelaş Xelîl e ez germenarê **Nemrûd**

“Berden selam”ê Heq got nagahê geşte mefrûh

(xezel 13/5)

### 3.3.5. Asif

Di metnên edebî yên rojhilatî da wek hevwatera wezîr tê bikaranîn. Ev bernav ji navê wezîrê Hz Suleyman Asaf maye. Tê bawerkirin ku ev kes ehlê ilmê kîmyayî bûye û di gel textê wê ve Belqîs daye anîn. Ger ku şairekî ev nav emilandibe, tê wê waterê ku wî qesda “kesê xwedî tevdîr û erk” kirîye. Li gor şairan Asef wek îmaj temsîla fezîlet, pêşdîtin, rêveberî û serfirazîyê ye. Ji ber hunera telmîh û tenasubê Asef her daîm di gel Suleyman û xetemê ve hatîye behskirin. (Pala, 2005:33).

Wek şairekî klasîk Laxer jî ev navê simbolîk di helbesta xwe da bi hunera tenasubê di gel Suleyman Pêxember emilandîye.

**Asif** weger Suleyman sed Xusrewan û Cemşîd

Ser ber derê te danîn der bezmê koleyan rûh

(xezel 13/3)

Her çende tu sultân î wek morê heqîr im ez

Wî **Asifê** ber textê bîna kirme ya Reb

(xezel 2/7)

### 3.3.6. Azer

Di Qur'anê da (En'am 74) tê bibîranîn ku navê bavê Hz. Îbrahîm e. Debara xwe bi pût û senemçêkirênê dikir. Tê rêwayetkîrin ku navê wî kesê ku Hz. Îsa saq kirîye û kirîye elametê mu'cîzeyê xwe jî Azer bûye. Bi xwendîna xwe ya farisî ev kelîme tê waterê “agir” jî û di edebîyatê da bi vê îmayê jî tê bikaranîn. Her wiha waterê wê ya di jî “bedew” e. (Pala, 2005:49).

Meya baqî bi muştâqî

Vexwe raqê ji dest saqî

Kemer dest bestê ya waqî

Bi pêşî **Azerê** zertac

(murebbe 1/3)

### 3.3.7. Zuleyxa

Kelîme wek Zelîxa jî tê gotin. Di çîroka Pêxember Yûsîv da di gel gelek çîrok û serpêhatîyan ve derbas dibe û di dawîyê da jî dibe xanima wî. Melîkeya Mexrîbê bûye û her çi qas bi ezîzekî wî welatî ra zewicî be jî destê mêrî lê neketîye. Hê pêşîya zewaca xwe di xewneke xwe da Yûsîv dibîne û lê aşiq dibe. Paşê dema bi rastî jî tûşî Yûsîv tê, li dor wî gelekî dizivire da ku wî bi dest bixe. Hetta bi paşîyê ve kirasê wî diqetîne û bê dilê xwe hetka wî dibe û wî di zindanê dide avêtin. Di edebîyatê da bi zehfî wek hunera tenasubî di gel Yûsîf Pêxember tê qalkirin û telmîha naveroka çîroka evîna wê û Yûsîvî tê kirin. (Pala, 2005:490).

Di dîroka edebîyata kurdî da bi navê *Yûsîv û Zuleyxa* mesnewî hatîye nivîsîn ku muellîfê wê jî Selîmê Hîzanî ye. Wek şairekî ehlê tesewîfê Laxer jî ev remz li helbesta xwe wer kirîye û îşaret li bal çîroka eşqa wê û Hz. Yûsîv kirîye.

Ba hîlm û melahet xweş çûn Yusufê dewran e  
Işqê ku **Zuleyxayê** sewda kirme ya Reb

(xezel 2/8)

### 3.3.8. Leyla û Mecnûn

Du qerektên çîrokeke evîne ne ku di dîroka edebîyata cîhana Îslamî da li serê gelek mesnewî hatine nivîsandin. Wisa tê bawerkirin ku çîrok rast e û ev her du serleheng jî du kesayetîyên heqîqî ne. Li gor rîwayetekê, Mecnûn leqebê şair Qeys bîn Mulevvaha'l- Amirrî ye û ev leqeb ji şîroveya helbestên wî hatîye derxistin. Tê gotin ku Leyla jî dotmama wî bûye û ev her du şexs ji malbata Emewîyan bûne. Rastîya çîrokê ev e ku Leyla û Mecnûn hê di zarokatîya xwe da ji hev hez kirine. Piştî derheqî û gotegotên derdor dêya Leyla wê hebsî çadirê dike û nahêle ew jê derkeve. Çi ku Qeys jî dilbera xwe nabîne êdî, ew jî gelekî xemdar dibe û wek kesekî sews bi çil û çiyayan dikeve. Piştî hingê jî jê ra Mecnûn (dîn) tê gotin. Her çi qas bavê wî daxwaza Leylayê bike jî malbata wê ji ber ku Qeys dîn û sews bûye Leylayê nadinê û ew jî kurê xwe da ku baş û bi şifa be dişîne Ka'beyê. Mecnûn jî li ber qabeyê dua dike ku ew derd û kedera wî zêdetir be. Duayên wî qebûl dibin. Bavê wî

bi awayekî neçar vedigere. Mecnûn jî bi deşt û çîyayan dikeve, bi heywanên hov û kûvî ra dibe heval û bi heyîv û stêrikan ra dikeve nav nasîyarî û hesbîhalekê. Di vê hînê ra jî helbestên dildaxîn û evînê dinivîse. Bi navê Newfel, Mîrekî ereban helbestên wî dixwîne û qirar dide ku vî kesî ji vî derdî xilas ke. Ji bo Mecnûn daxwaza Leylayê dike ji bavê wê, bes cardî nadinê û ew jî bi artêşa xwe ve diavêje ser qebîleya bavê Leylayê û dikin şer. Lê belê Mecnûn jî, da ku artêşa Newfel têk biçê dua dike da ku zirar negihîje Leylayê. Cara duyam dîsa dibe şer û artêşa Newfel bi ser dikeve, lê lew ku seh dike ku Mecnûn wisa dua dike, Leylayê hîlnadin û nabin. Paşê Leyla bi kesekî bi navê Îbn Selam ra tê zewicandin. Leyla jî lew ku dixwaze ji evîna Mecnûn ra sadiq bimîne bi hêceta cinekî digire û nahêle mêrê wê dest bideyê. Dibêje ku ji zaroktîya wê ve ji hêla cinekî ve tê hebandin, lewma jî ger ew destê xwe bide wê, ew cin dê wan her dukan jî bikuje. Leyla bi vê terhê wî ji xwe dûr digire û piştî qasekî jî jixwe mêrik dimire. Hingê Leyla serbest dimîne û li pey Mecnûn dikeve û li çolekê rastî wî tê, bes Mecnûn pê ra eleqeder nabe. Lewra ji eşqa Leylayê borîye û derbasî eşqeke menewî bûye û têkilîya xwe ji cîhana madî gişt birîye. Piştî vê hevdiîtinê Leyla hêvîya xwe jê dibire û tê. Bi qasekî êş û janê dikêşe û dimire. Li ser xebera wê Mecnûn jî dibeze û tê, tê û diçe ser qebra wê û dua dike û ji Xwedê dixwaze ku ew jî bimire li wê derê. Duaya wî qebûl dibe û bi nefesa dawî dibêje “Leyla!”... û can dide. Bi vî awayî wusleta wan dimîne axiretê. Ev çîrok her çend wek mesnewî ji alîyê gelek kesan ve hatibe nivîsîn jî cara ewil bi ser û ber ji alîyê Nîzamî (mir. 1204) ve hatîye amadekirin.(Pala, 2005:288).

Di gelek edebîyatên milletên cîhana Îslamî da nimuneyên nivîskî yên vê mesnewîyê hene. Di edebîyata kurdî da jî di gel a Harisê Bedlîsî/Sewadî (m 1748) çend mesnewîyên dî jî hatine nivîsandin ku babet tev çîroka Leyla û Mecnûnê ye. (Adak, 2014:99)

Karakterên vê çîrokê di metnên edebî da gelek caran derbas dibe. Gava şair qesda evîna bêmiraz, sewdaserî, eşqa heqîqî û dîn û dîwanetîyê dike navê van her du lehengan derdibirîne û merema xwe tîne zimên.

Laxer jî helbesta xwe bê van navan nehiştîye û telmîh li kesera çîroka wan kirîye.

Mexmûrê meyê husn û cemalê me çu *Mecnûn*

*Leylasîfetê* mişlê neyê ew ku perî hat

(xezel 7/6)

### **3.4. Unsûrên Tebîetê**

Tebîet ew jîngeh e ku bi giştî sê alemên jîndar (insan, heywan, nebat) tê da dijîn û di nav wê yekparetîya siruştî da cihê xwe digirin. Metnên edebî helbet ji peywendîya di navbera van her sê aleman veder nemaye û her wext binbandor bûye. Bi ajal, dar, kulîlk, av, çûk, deşt û çîyayên xwe ve siruşt her dem di helbestan da cihê xwe girtîye û îlham daye helbestkaran.

#### **3.4.1. Heywanat**

Çi xwişxwişek çî yên perende û çî jî yên kedî û kûvî, gelek heywan hene ku di nav tebîetê da dijîn. Ew jî di nav yekparetîya gerdûnê da alemeke muhîm e. Her yekê bi taybetîya xwe ya resen rola xwe dileyîze. Mirovan jî di navbera xwe û heywanan da bi hin alîyan ve pevgerîdanek dîtine û tesbît kirine. Yan xûy û xasyetê xwe li heywanan bar kirine yan jî taybetîya wan li xwe teşmîl kirîye. Di metnên dîroka edebîyatê da jî navên gelek ajelan derbas dibe. Li me eyan e ku di helbestên Laxer da jî navê gelek heywanan diborin û her yekê di nav çarçoveya wateya hunera edebî da hatîye rêzkirin.

##### **3.4.1.1. Çivîk/Perende**

Wek heywanên perende çûk û çivîkan gelek caran di çîrok û helbestan da cihê xwe girtîye û hewes û motîvasyon dane nivîskaran. Her çivîkek bi xusûsiyetên xwe ve bala mirovan kêşaye û tesîr li hest û hizrên wan kirîye. Di helbesta klasîk da jî her çivîkek bi wateyeke taybet hatîye emilandin. Laxer jî bi mebesta derbirana hest û hizrên xwe çûk û çivîk ji xwe kirine hêcet û wesîle, bi rêya hin hunerên edebî ev unsûrê biçengûper di rêzematikên xwe da bi cih kirine. Şehlûl, bilbil, murx, endelîb, gûyîn, hiranman, teyr, şûnqar çend nav in ku di helbesta Laxer da derbas dibin. Perwane/perperok jî lew ku xwedî çeng û peran e û her wisa difire, li vê celeba heywanan tê hesibîn.

### 3.4.1.1.1. Bilbil

Bilbil ew çivîk e ku helbesta klasîk bê wî nayê melhezekirin. Bi xwendin û awaza xwe ya ku guhdaran mest û dilxweş dike ve sembola dildaxînîya aşiqan e. Wîtewîta wî wek newa û strana herî xweş tê qebûlîkirin. Carna bi xwe dibe aşiq, lê carna dibe can û dilê aşiqan. Her daîm wek aşiqê gulê tê dîtîn. Dengê wî yê xweş wek helbest û strana aşiqan tê fikirîn. Çawa ku bilbil bê gul nabe dilber bê aşiq nabe. Strîyên gulê çawa dilê bilbilê bi xwîn kirîye, zilm û ezîyeta dilberê jî wisa dilê aşiqan dax dike û jan dideyê. Gul ji bo nazîyê; bilbil ji bo nîyazîyê hatîye afirandin. Nalîna wê wek girîn û axîna aşiqan tê dîtîn. (Pala, 2005:77).

Her wiha ji bo bilbilê peyvên wek endelîb û hezar jî tê bilêvkirin.

Bostanê cemalê girt rewneq

Xemlîne şenewber û murewneq

Teşbîhê nucumê çerxê ezreq

Dîbayê keşa ji ser şebah berq

Şehlûl û binal **bi bulbulê** ra

(muxemmes 1/2)

**Endelîban** şî'r û qale her mûdam

Wek tezerrû xweş û gulzarê hûdûş

(xezel 9/3)

### 3.4.1.1.2. Şehlûl

Şehlûl jî texlîdeke bilbilê ye û ev her du nav exlebî bi hev ra tèn bikaranîn. Bi sewt û awazekî sermomest dixwîne.

Bostanê cemalê girt rewneq

Xemlîne şenewber û murewneq

Teşbîhê nucumê çerxê ezreq

Dîbayê keşa ji ser şebah berq

**Şehlûl** û binal bi bulbulê ra

(muxemmes 1/2)

### 3.4.1.1.3. Murx/Teyr

Murx jî peyvek e ku di helbesta klasîk da pirr caran derbas dibe û bi taybetîyên xwe ve carinan dişibe dildaran carinan jî dişibe dilberan. Ji zimanê farisî tê. Çav û nêrîna aşîq, dil û canê aşîq dibe murx û çûkek di helbestê da. Şair her daîm wek murxekî awazxweş û dilbirîn e. Bi çîveçîva xwe, bi firîna xwe, bi ketina dafikan, bi hêlîna xwe, bi qefaltin û êxistina qefesê û serbestîya xwe ve murx wek îmajêke muhîm di helbestê da cih digire. (Pala, 2005:342).

Lew ku Laxer şairekî pirziman e, wî jî di nav helbesta xwe da peyvên erebî, kurdî û farisî ku tînen yek me'neyê bi hêsanî bi kar anîye. Ev qaîde ji bo peyvên wek *çûk*, *teyr* û *murx* pêkan e bê gotin.

**Murxê** dilê 'uşşaqan şeyd in bi damê zulfet  
Ji peykeranê qudsê şurîde *bulbulê ra*

(qesîde 1/4)

Miksî me ji rengê te ye Laxer wekû **teyrê**  
Daîm di qefesê bê xeber û xemxwarê çû ax

(xezel 15/6)

### 3.4.1.1.4. Şunqar

Şunqar jî yek ji wan navên çûkan e ku di helbesta Laxer da derbas dibe. Cinsekî bazan e ku di helbestê da temsîliyeta xweşnêçîrîyê û leyzbazîyê dike. (Yıldırım, 2010:102).

Tu bibîn weqtê sema tînen sorperî  
Reqs û bazê wan çu **şunqarê** hûdûş

(xezel 9/4)

### 3.4.1.1.5. Huma

Çivîkeke ku di stran û helbestan da pirr caran dîyar dibe huma ye ku ew jî ji farisîyê hatîye û ketîye nav edebîyata milletên cînêr. Di wateya şans û siudê da tê emilandin. Tê bawerkirin ku wek çûka cennetê li Çîyayê Qaf, li giravên Oqyanûsê

yan jî li Çînê dijî. Di zemanên berê huma dihate firandin. Piştî hingê li serê kê bidaniya ew dibû pedîşah, lewma navê çûka siud û dewletê jî lê danîne. Di edebîyatê da tê wateya rêya ku diçe mirefehî, talih, qudret û aramîyê. Zehf caran jî bi anka û sîmurgê ra jî tê tevlihevkirin. Di helbesta klasîk û evînê da di şûna yarê da hatîye îfadekirin; yarê berê xwe da kîjan dildarê xwe, tê wê wateyê ku teyrê şans û siudê li serê wî kesî vedaye. (Pala, 2005:216).

*Murxê* dil kir ji kuşadê fer û perwazê **huma**

Ji fereş şehperê hîmmet li serê sedr e nûma

Soht dil canê reqîbê bi xem û derdê bi ma

Perîya rû yî qemer ser ji hîcabê bi nûma

Hazîrê cezbe yê da dil ji cemala mehê rux

(muxemmes 5/2)

#### 3.4.1.1.6. **Gûyîn û Hîraman**

Gûyîn û hîraman jî du teyrikên dî ne ku Laxer di helbesta xwe da wek hêma bi kar anîye û di ser taybetîyên wan ra dil û hinavê xwe verêjtîye bo ehlê helbest û edebîyatê.

Bilbil te çîye bi nal û efşan

Hengame û xulxul û bi giryan

Bi gul tu neşînî şubh û şaman

Ney mişlê min î **gûyîn û hîraman**

Daîm me ji yarê dîlfikarest

(muxemmes 3/4)

#### 3.4.1.1.7. **Perwane/Perperok**

Wek heywanokeke perende, perwane jî remzeke gelekî muhîm e ku bi têkilîya xwe ya bi êgir ra û bi hin taybetîyên xwe yê din ve di edebîyatê da cihekî berfireh digire. Xasseten ji wê perperoka ku bi şev li dor êgir û ronahîyê dizivire ra tê gotin. Di edebîyata klasîk da temsîla aşîqan dike. Tê qebûlkirin ku perwane aşîqê şemê ye. Li dor şemê piştî ku bi qasekî zivirî, xwe diavêje nav êgir û canê xwe dide. Şairan jî

yara xwe şibandine êgir, xwe jî şibandine vê heywanokê. Axir di rêya yar û dilbera xwe da şewitîne, nexweş ketine û jan kêşane. Di tesewifê da jî ev perwane remzeke muhîm e. Ronahî wek eşqa îlahî tê dîtin; yê ku dil dabe vê eşq û evînê jî wek ehlê tarîq tê hesêbkirin. Çîroka Şem û Perwaneyê zehf caran bûye mijara mesnewîyan jî.(Pala, 2005:370).

Di helbesta Laxer da jî perwane bi hin xusûsiyetên xwe ve gelek caran dibore.

Miksîyê Laxer di nêv ateşê hecra te bisoxt  
Çehv û dîden wê bi emrê te ji exyarê bidoxt  
Her wekî **perwaneyê** wê can di rêya dînê firoxt  
Nagehan peykê qezayê ne'reyê zed ev çi got  
Bes bike tu ji vê meqalê pîrr şewaê xem û bes  
(muxemmes 4/4)

Weşlê **şem'perwaneyê** daîm he meqlûb e bi can  
Ger çi zahir pê disojit pur bi ahê keç û rast  
(xezel 5/3)

Yarim ku eger xerez te can e  
**Perwane** ye can te rû ye mişbah  
(xezel 12/4)

#### 3.4.1.2. Morî/Ahû/Şepal/Mar/Tûle

Morî di edebîyatê da li gel Hz Suleyman tê yadkirin, lewra meseleya morîyê pê ra heye. Ezameta sultanîya wî û gewdeya morîyê ya hûrkanok dibe ku tê berawirdkirin.(Pala, 2005:258).

Her çende tu sultan î wek **morê** heqîr im ez  
Wî Aşifê ber textê bîna kirme ya Reb  
(xezel 2/7)

Ahû navekî dî yê xezalê ye. Lew ku heywaneke çavspehî, bêhnxweş, narîn û silevil e di edebîyatê da tê bikaranîn û ji bo dilberê bûye mijara teşbîhê. Lê herî zêde ji ber bêhna xwe ya xweş tê wekandin. (Pala, 2005:14).

Şeba îro xeber anî ji **ahûya** şepal û şûx  
Nesîmê da me mizgînî ku dê bêtin helatên tûx  
(qesîde 4/1)

Şepal şêra mê ye û di metnên edebî da bi spehîtahîya xwe wek motîfeke ciwanî û pêkhatîyê ji bo yarê tê bikaranîn.

Bi helakên ji firaqê li me dil sed kerî kir  
Perîya şox û **şepal** sîne tejî xençerî kir  
Bi du sed rengê ‘ezabê ku di nêv cîgerê kir  
Bi nîhan ateşî bû pêt û perengê qerî kir  
Kî bi vê zîlm û cefayê bi qele ber derî ket  
(muxemmes 2/5)

Mar wek heywanekî xwişek di metnên edebîyatê da exlebî di wateya kezî û biskên yarê yên reş tê bikaranîn. Çawa ku mar sehwa û tayê çêdike ji bo insên, her wisa bisk û gulîyên yarê jî ji bo dilê evîndaran bi xwe ra ta, tirs û heyecanê tîne.

Gîsûyê çû **marê reş** bigestim  
Ev nîm û bi dabê zulfê bestim  
Mexmûrê ji kaseya elest im  
Kê em roz ji ‘aqilê xwe xwestim  
Zahir ku me baîninê veşarest  
(muxemmes 3/3)

Tûle navekî dî yê seyî ye ku di metnên edebîyatê da wek bendewar û sadiq tê hesibîn û bo mirovan tê wekandin.

Bê keştî li ber behrê firaqê erixîm ez  
Xewfek me hebû lew bi wîsalê perixîm ez

Bîhnek ji wîsalê me bihîst û kerixîm ez  
Wek **tûle** li pey mûçe li dorê çerixîm ez  
Çix kir me hebîbê tu narî biqêşî

(texmîs 1/9)

### 3.4.2. Dar

Dar wek ber û xemleke siruştê cur bi cur peyda dibin. Ji alema nebatatê ye û hem li ser rûzemîna dinê hem jî di jîyana insên da xwedî kartekeke gelekî fireh e. Di metnên edebîyatê da jî zehf caran xuya dibin û dibin derfet da ku nivîskarê metnê xwe li wan bigrin û hest û çavenêrîya xwe bi rêya hin cureyên hunera ciwankarîyê îfade bikin. Di alema nêrînê da her darek xwedî wateyekê ye. Bo mînak, di helbestê da dema navê serwê derbas dibe, em dizanin ku şair belasebeb qala wê darê nekirîye û qesta bejn û bala yara xwe kirîye.

Di helbestên Laxer ên di ber destê me da jî navên çend daran ên wek'er'er, senewber, serw, murewneq, û şîmşad derbas dibin û her wiha di risteyeke xwe da jixwe tirkîya darê jî wek *axac* bi kar tîne.

'Ebdalê di rojê 'eyd û hereman  
Ez bûm bi tenê di kuncê hicran  
Çeşmê me bi xwîn e dil bi giryan  
Vê narê firaqê kirme **axac**

(murebbe 2/4)

Senewber yek ji van daran e ku di helbesta klasîk da di wateya bejn û bala yarê da dibore. Texlîdeke cisnê dara kajê ye û dema dixemile ehlê siruşt û helbestê dikevin bin kartêka wê. (Yıldırım, 2010:99)

Murewneq jî temsîla xemlîna yarê dike û wek motîfeke dilxweşkirinê tê bikaranîn.

Bostanê cemalê girt rewneq  
Xemlîne **senewber** û **murewneq**

Teşbîhê nucumê çerxê ezreq  
Dîbayê keşa ji ser şebah berq  
Şehlûl û binal bi bulbulê ra

(muxemmes 1/2)

Du sê darên dî yên ku di helbesta klasîk da wek motîf derbas dibin hene ku tev di wateya bejindirêjî û bejinspehîtiya yarê da hatine bikaranîn. Ew darên ku wekê herfa elîfê zirav û dirêj dema ku li ber bayî diheje, ji aşiq û şairan ra bûne îlham ku bikevin nav hunerên edebî yên ku cureyên şibandinê dihewînin. ‘Er’er, serw û şimşad ji wan daran in ku wek motîfên siruştê ketine nav edebîyatê û ji bo ehlê edebîyatê bûne îlham.

Şahidên qed şubhê ‘er’er sergiran tên roj û şeb  
Sunbulên ta ta li dêmê dîlberan tên roj û şeb  
Meyperestan helqebest in tên temaşayê Melak  
Serwê azadî xeraman çîmenan tên roz û şeb

(xezel 4/1, 3)

Hûrên di beheştê û perî cumle cema tên  
Zuhre reqîşî çeng û çexane bi xîna tên  
Xulxul dikevîtin çemenan têk bi newa tên  
Şimşad bi meş sosin û sunbul bi sema tên  
Ey serwêxiraman ku tu carek bimeşî

(texmîs 1/2)

### 3.4.3. Kulîlk/Çîçek

Wek unsûreke tebîetê, kulîlk di helbesta klasîk da di gel reng, şikl û bêhna xwe ve dertên pêş. Her wiha lew ku tovê zerzebat û fêkîyan in, kulîlk hin wateyên balkêş hildidin ser xwe. Li alîyê dî kulîlk li pêş bayê dihejin û ev taybetîya wan jî dilê şairan binbandor dike. Kulîlk carna bi wateyên xwe yên heqîqî tên bikaranîn carna jî bi rengekî mecazî dikevin nav gotin û metnan da ku di navbera kulîlk û hin xusûsiyetên dilberê da teşbîhek bê sazîkirin (Yıldırım, 2010:100)

Laxer jî di nav peywenda tesewif û evînê da navên çend heb kulîlkan li ber bîr dixe û helbesta xwe bi gul û kulîlkan dixemilîne. Bêhn, reng, şemal û wateyên wan jî hev cuda, kulîlkên ku di risteyên Laxer da derbas dibin ev in: gul, binevş, reyhan, sunbul, çîmen, sorgul, qerenfîl, nesrîn, sosin, yesemîn, xonçe, şebnem.

### 3.4.3.1. Gul

Gul ew kulîlk e ku di edebîyata klasîk da ya ku herî zêde û berfireh qala wê tê kirin. Têkilîyeke xurt heye di navbera rengê gulê û rûyê yarê da. Çi bi rengê xwe ve çi bi bêhna xwe ve gul her daîm terr û taze ye; lewma jî di nav bax û baxçeyan da û bi biharê çav her wext li gulê ye. Ji bo heyamê biharê jî dema gulan tê gotin û meha gulanê jixwe navê xwe ji vebûn û vebîşkivîna gulan hildide. Vebîşkivîna gulê çend şên û xweş be, pişirîn û beybûna wê jî ew qas zû û bi xem dibe. Gul zehf ked û xemxwarinê dixwaze. Divê ava wê her wext hebe. Têkilîya gulê bi bilbilê ra jî heye, lewma jî ev pewendîya nazik wek motîfekê di helbestê da tê emilandin. Gul wek kulîlka cennetê jî tê dîtin, lewra wextê Hz. Îbrahîm di nav agirî hatîye avêtin ew agir û alav dagerîyaye baxçeyekî bihuştê. Di tesewifê da jî wek remza yar û wisletê tê dîtin û têkilîya wê û bêhna Pêxember bi hev ra heye.(Pala, 2005:171).

Xweş weqt e mecalê geşt û seyran

Nêv *baxçê gul binevş û reyhan*

Sermest e ji keyf û 'îşq û heyran

Erbabê meweddetê vedîran

Çeşmê şeveqê ji şohbetê ra

(muxemmes 1/3)

Ruhanîyan tu ruh î hem rewneq î ji **gulê** ra

Tufanîyan tu Nuḥ î der behrê xergulê ra

(qesîde 1/1)

Mekanên ku gul û kulîlk li wan deran tîn danîn û tîn xemxwarin jî derbas dibin; wek gulşen, çîmen, gulzar, bostan, baxçe.

Dibe **gulşen** û **gulzar** agir li dora heqperest  
Reb hemîyan rizgar dike, wek Xelîlê xwe rizgar kir  
(qesîde 3/4)

Bê perde û rûpûş ji eywanê bimeş der  
Wer seyrê **gulîstan**  
Serwê sehî xemlîne nîhalê turre ‘er’er  
**Bostanê** rewan rûh  
(mustezad 1/6)

Peyveke dî jî heye ku di gel çîçekan, xasma di gel gulê tê bikaranîn ku her daîm wateyeke neyînî dide: xar; yanê dirîk û strîya dara gul û çîçekan. Ev di alema eşqê da wek cewr û cefaya ku yar didin û di tesewifê da jî di rêya wusleta gulê û yarê da wek xwestikên nefsa emare tê dîtin.

Bulbulê dil pur birîn e ew ji **xarê sorgulan**  
Endelîban qîl û qalên subhêgahê keç û rast  
(xezel 5/4)

Di nav gulan da *gula sor* xwedî cihekî taybet e. Ya ku herî zêde heraret û kûrahîya aşîq û şairan dide nîşan ev reng gul e ku hem bi reng û şemala xwe ve hem jî bi bêhna xwe ve gula herî zêde berdil û xweşik tê hizirîn.

Bubulê dil pur birîn e ew ji **xarê sorgulan**  
Endelîban qîl û qalên subhêgahê keç û rast  
(xezel 5/4)

### 3.4.3.2. Qerenfil

Qerenfil jî ew çîçek e ku bi bêhna xwe û bi rengê xwe bûye motîfêke xweşik ku carna bergindîya hest û hizrên mirovan kirine. Her çendî qerenfil temsîla şîn û xema li pey mirinê bike jî em dibînin ku di helbesta Laxer da bi wateya xwe ya jîndar û xweşik ve dîyar dibe.

Muselsel zulfê kakûl bûn

Tejî misk û **qerenfil** bûn  
Bi xeṭaṭ û xalî *filfil* bûn  
Bi neqşê çîne bû emşac  
(murebbe 1/7)

### 3.4.3.3. Reyhan/Rihan

Reyhan di edebîyata klasîk da bi bêhn û şiklê xwe ve tê nirxandin. Por û mûyên tenik ên bihkî li kulîlka reyhanê tê şibandin. (Pala, 2005:376).

Bi vê neqş û nîgarê Çîn  
**Reyhan** û *sunbul* û *nesrîn*  
*Binevş* û *sosin* û *yasemen*  
Mu'aniq gerdenê wek 'ac  
(murebbe 1/8)

Netrik û tîtan di nêv zulfên **reyaḥîn** tên sema  
Hurî û qudsê bidîtin rû dipûşan rast û çep  
(xezel 3/4)

Ji malikan jî dîyar e ku Laxer hem yekjmarî (reyhan) hem jî pirjimarîya (reyaḥîn) rihanê di helbesta xwe da bi kar anîne.

### 3.4.3.4. Sunbul

Sunbul kulîlkeke xweşik e ku bi bêhn û şiklê xwe li porê yarê tê şibandin. Hetta tê gotin ku esildanî ew hesûdîya porê yarê dike û xwe dişibîne. Sunbul û gul zehf carnar bi hev ra tên bikaranîn; ew jî ji ber ku porê wek sunbulê dikeve li ser hinarikên yarê yên wek gulê. (Pala, 2005:414).

Bi vê neqş û nîgarê Çîn  
*Reyhan* û **sunbul** û *nesrîn*  
*Binevş* û *sosin* û *yasemen*  
Mu'aniq gerdenê wek 'ac  
(murebbe 1/8)

### 3.4.3.5. Binevş

Kulîlkeke dî jî binevş e ku di helbesta klasîk da bi hin wateyên muxtelîf ve ji şairan ra bûye jêderka îlham û wekandinê û di helbestên wan da derbas dibe. Wek çîçekeke stûxwar hatîye dîtin. Bi bêhna xwe ve dişibe miskê. Li bazaran bi qevd qevd firotina binevşan bi qevda porê yarê hatîye şibandin. (Pala, 2005:305).

Em dibînin ku di helbesta Laxer da ev kulîlk bi bêhn û şemalê xwe yê nazik ve derbas dibe.

Xweş weqt e mecalê geşt û seyran

Nêv bağçeyê gul **binevş** û reyhan

Sermest e ji keyf û 'işq û heyran

Erbabê meweddetê vedîran

Çeşmê şeveqê ji sohbetê ra

(muxemmes 1/3)

### 3.4.3.6. Nêrgiz

Nêrgiz navê kulîlkekê ye ku di stran û helbestan da gelekî dibore. Bi bêhn û rengê xwe mirovan sermest dike. Narîn û reng lê zer e. Bi çîroka xwe ve xwedî paşxaneyêke mîtolojîk e. Tê gotin ku Narsîs (Narkîsos) xortekî zehf beşerxweş bûye, lê belê ji eşqê qet tiştek fêhm nekirîye. Keçikên derdor lê aşîq ketine, bes vî lawikî tu rû nedaye wan. Van keçikan jî piştî hingê gilîya wî li ba Xwedayan kirîye û wek cizayekê, Xwedayan wisa kirîye ku Narsîs rojekê di avê da rûyê xwe bibîne û lê aşîq bikeve. Soxî, wisa jî dibe û ew jî esnayê ku xwe di avê da bi awayekî ji xwe çûyî seyr dike, rip dikeve nav avê û tê da dixeniqê û dimire. Paşê cendekê wî dirize û jê çîçekeke wek çavan hişîn dibe û bi awayekî stûxwar û şehla li derdor dinêre. Li gor efsaneyêke dî jî di navbera gul û nêrgizê da peywendîyeke mîna eşqê qewimîye û nêrgiz bûye wek çav û ta roja qîyametê mehkûmê eş û hîcranê bûye. Lewma jî di navbera nêrgiz û çav da tenasubek hatîye danîn. (Pala, 2005:356).

Remzek ji nesîmê li çemen da û xweşî

Rabû ji xewê sebze û şebnem diweşî

Çendî xebitî dil ku biket seyr û neşî  
Nêrgiza mest û xeraman di sehergeh ku meşî  
Bişkiftî *sîfetxunçe* ji çara ereşî

(texmîs 1/1)

#### 3.4.3.7. Sosin

Sosin bi pelên xwe yên tûj û dirêj balkêş e. Bi vê taybetîya xwe ve dişibe zimanê yarê yê tûj û tehl.(Acar, 2017:163)

Bes, bi bêhna xwe ya xweş ve jî kulîlkek e ku ji bo bêhna yarê dibe motîfeke siruştî. Di helbestên Laxer da jî ev hêla vê kulîlkê dertê pêş.

Bi vê neqş û nîgarê Çîn

*Reyhanû sunbul û nesrîn*

*Binevş û sosin û yasemen*

Mu'aniq gerdenê wek 'ac

(murebbe 1/8)

#### 3.4.3.8. Şebnem

Şebnem dilopa avê ye ku li ser belgên gul û gîyayan xasseten bi sibehan çêdibe. Di helbestê da bêtir li gel kulîlkan tê emilandin. Ger li ser çavî be dişibe rondikên bilbilê, ger li ser laleyê be dişibe mirwarîyê, ger li ser xonçeyê be bi diranê yarê tê şibandin. (Pala, 2005:423).

Remzek ji nesîmê li *çemen* da û xweşî

Rabû ji xewê *sebze û şebnem* diweşî

Çendî xebitî dil ku biket seyr û neşî

*Nêrgizamest* û xeraman di sehergeh ku meşî

Bişkiftî *sîfetxunçe* ji çara ereşî

(texmîs 1/1)

### 3.4.3.9. Xonçe

Di helbestan da peyva xonçeyê jî zehf caran tê bikaranîn. Kîjan dibe bila bibe, tê wateya kulîlka hê ku venekirîye û belgên xwe nepişkivandîye. Di helbesta klasîk da di şûna devê yar û dîlberê da tê dîtin. Yanê yara ku devê wê venabe, xeber nade û xwe li bêdengîyê datîne bi xunçedehehen tê binavkirin. (Pala, 2005:168).

Hetta helbesta Macin ya bi navê “Yara Kê yî Tu” bi vî awayî dest pê ke:

Sorgula *xonçedehehen* nazik nîhala kê yî tu

Mehweşe gulpîrehehen şox û şepala kê yî tu

Laxer jî cih daye vê mezmûna nazik û li nexşa helbesta xwe werkirîye.

Wê şem'ê şebê şemalê gerdên

*Gulçehre dehan* û **xonçe** erzen

Wek sêb du nîm û lebşekerken

‘Uşşaqê bi qûtê can e muhtac

(murebbe 2/3)

### 3.4.3.10. Nesrîn

Ji gula bejî û çîyayî ra nesrîn tê gotin. Wateya wê ya mecazî wefadarî ye. Bi bêhn û rengê xwe ve bala şair û aşiqan kêşaye û her wiha wan jî di rêzemaalîkên xwe da bi cih kirine. Her çî qas şênbûna dilşadîyê bide Laxer, lê li alîyê din temsîla huznê jî dike. Hetta gava yekî ev kulîlk di xewna xwe da dît, tê wê wateyê ku ew kes dê bi qewamekê rû bi rû be ku melûlî lê peyda bibe.

Bi vê neqş û nîgarê Çîn

*Reyhanû sunbul* û **nesrîn**

*Binevş û sosin* û *yasemen*

Mu'aniq gerdênê wek ‘ac

(murebbe 1/8)

### 3.4.3.11. Yasemen

Yasemen jî navê kulîlkekê ye ku di edebîyata klasîk da bi pirranî bi bêhn, reng û belgên xwe ve balê dikşîne û dibe jêderka îlhamê bo şair û hozanan. Li hinarikên yarê tê wekandin. (Pala, 2005:480).

Laxer jî ev çiçek di nav koma kulîlkan da bi nav kirîye û helbesta xwe pê neqîşandîye.

Bi vê neqş û nîgarê Çîn

*Reyhanû sunbul û nesrîn*

*Binevş û sosin û yasemen*

Mu'aniq gerdenê wek 'ac

(murebbe 1/8)

### 3.4.4. Bêhnên Xweş

Gul û gîyayên bêhnxweşik jî unsûrekî siruştê ne ku di metnên edebîyatê da dixuyên. Aşiq û şairan di navbeyna bêhna yarê û van bêhnên xweşik da peywendîyek dîtine û nivîsîne. Her wiha hin heywan jî bi bêhnên xwe yên xweşik ve tînan.

Dema em lê mêze dikin, Laxer jî ev motîfa bêhnê bi kar anîye û behsa hin gul, gîya û heywanên ku xasseten bi bêhna xwe navdar in kirîye.

#### 3.4.4.1. Misk û 'Enber

Misk ji ûrê xezala nêr tê girtin û çêkirin ku ev heywan ji cureyekî bizina kûvî ye û exlebî li Turkistanê peyda dibe. Şair di navbera vê bêhnê û bêhna porê yarê da tenasubekê dibîne. Miskîn jî kelmeyek e ku di edebîyatê da bi rêya tewrîyeyê di şûna mîskê tê emilandin. (Pala, 2005:324).

Enber madeyek e ku li behra Hîndê ji zikê masîyekî tê derxistin. Rengreş û bêhnxweş e û mîna zelqê nermijok e. Ew ji ûrê masîyê ye û ji zikê tê avêtin. Paşê bi qet qet dertê ser rûyê avê. Şairên klasîk ji ber bêhna wê, wê dikin behsa helbestên xwe. Li ba wan bisk û xalên dilberê her dem wekê misk û enberê bêhnxweş û sermestker e. (Pala, 2005:23).

Xal û nuqte û ‘**enber û miskê** te fişandî  
Yek nuqte nedî kes qelemê sehwe kişandî  
*Kafûre* kirî şefhe sewadê neqışandî  
Kê deste ji qudret weh kişandî weh reşandî  
Qevsê du hîlalan li beyazê bireşî  
(texmîs 1/5)

Li meh û mîhrê şeveq daye ji zertacê serî  
Bi xusufê û kusufê girtine ba muşterî  
Perîya Qudsê libasê we ji rengê beşerî  
Dêm durr û le’l û leb û xalê ji **mişkê Teterî**  
Dê bi şewkê serê zulfan me yeqîn ebterî ket  
(muxemmes 2/4)

#### **3.4.4.2. Kafûr**

Li welatên Rojhilata Dûr exlebî peyda dibe. Riwêkek e ki ji berê ve di tipê da her daîm hatîye emilandin. Zelqa ji vê darê ye ku hem nermik e hem bêhneke xweş dide. Di wextên dêrîn da ji bo ku bêhn nedin û genî nebin, mirî bi ava kafûrê dihat şuştin. Di edebîyatê da ji bo bedena yarê xasseten jî bo gerdena yarê tê bikaranîn. (Pala, 2005:251).

Xal û nuqte û ‘*enber û miskê* te fişandî  
Yek nuqte nedî kes qelemê sehwe kişandî  
*Kafûre* kirî şefhe sewadê neqışandî  
Kê deste ji qudret weh kişandî weh reşandî  
Qevsê du hîlalan li beyazê bireş  
(texmîs 1/5)

#### **3.4.4.3. Filfil/Qerenfî/Reyahîn**

Ev her sê jî gîyayên bêhnxeşik in ku ji celeba kulîlkan jî tê hesibîn. Ji berê ve di nav gel da di saqkirina nexweşîyan da hatine emilandin. Her wiha di metnên

edebîyatê da ji xwe ra cih girtine. Şairan ji bo bêhnxweşîya por, beden, nefesa yara xwe ew wek motîfên teşbîhê dîtine û emilandine.

Muselsel zulfê kakûl bûn

Tejî *misk* û **qerenfil** bûn

Bi xeşa û xalî **filfil** bûn

Bi neqşê çîne bû emşac

(murebbe 1/7)

Netrik û tîtan di nêv zulfên **reyañîn** tên sema

Hurî û qudsê bidîtin rû dipûşan rast û çep

(xezel 3/4)

### 3.5. Navê Dîyar û Bajaran

Di metnên edebîyatê da her wext navên cih, mekan û bajaran derbas bûne. Li her cihekî çîrokeke wî heye; li her mekanekî taybetîyeke wî heye û her wisa li her bajarekî kesayetî û dîrokeke wî heye. Lewma jî bi van xusûsiyetên xwe ve yan rasterast hatine binavkirin an jî bi awayekî dî hatine îmakirin. Bo mînak, dema navê Çîn û Maçînê derbas dibe, hem xexş û xemlên li wan deran tê îmakirin hem jî dûrahî û berfirehîya wî welatî tê îşaretkirin. Her wisa wextê qala Teterê hat kirin, em dizanîn ku xwedîyê bêjeyê qesta xezala wê derê û bêhna xezala wê derê dike. Her dîyarekî di nava seyra tarîxa mirovahîyê da ji xwe ra kesayetîyek û çîrokek hewandîye.

Di helbestên Laxer ên ku li ber destê me ne da jî navê gelek deveran derbas dibe. Şair helbe her navek di nav metna xwe da bi taybetîyekê ra mezc kirîye û daye pêş çav. Dîyarên ku di navhelbestan da derbas dibin ev in: Xutele, Teter, Çîn, Hîndîstan, Efxan, Buxara, Maçîn, Dera, Tebrîz, Şîraz, Esfexan, Ermexan, Qureyş, Eden.

Nêv behrê **Xutelê** pur ney keştî û ne zewreq

Tu destegirê mayî burhanê bê dilê ra

(qesîde 1/2)

**Efxanî** û **Buxara**

**Maçîn** û **Çîn** û **Dara**

Xercê diden bi can ra  
'Er' er li bejnê dîbac

**Tebrîz û Eşfehanî**

**Şîraz û Ermeğanî**

Tînin bi ser nîhanî

Der zîrê payê bi minhac

(murebbe 3/7, 8)

Bi cununê me gelek taze û nûreste çinî

Bû ji miskê perîya weşlê cînanê medenî

Laxerî bo negrî hîç kesê ins û cinî

Kulbeyê baxê **Qureyşî** bi nesîbê **'Edenî**

Mîksîya serwê rewanê bi kemalê mehê rux

(muxemmes 5/6)

### **3.6. Alavên Şerî**

Di deqên edebîyatê da wek motîf hin alavên şer û cengê tên bikaranîn ku her yek di nav peywenda metnê da xwedî wateyeke mecazî û alegorîk e. Bo mînak, gava tûjî û tehlîya xebera yarê tê qalkirin ku di aşiq da birîn vedike, vê rewşê di ser şûr û xencerê ra vedibêjin û esildanî îmayê li kûrahî û xedera birînê dikin. Her wisa spehîtahî û dilrakêşîya çavên yarê li alîyê aşiq û dildaran wek guleyeke xedar tê wesifkirin. Alavên herbê di nav rêzematikên metnên edebî da bi munasebeta hin hunerên edebî wate û karekî dî li xwe bar dikin û dikevin nav fehmedarîya çandî ya hişmendîya civakê. Yanê dema behs li birhên yarê tê kirin feraseta civakê pê dihesa ku ew birh wek tîrên sertîj tîrên dîtin. Êş û birîna alavên şerî kujer in û dibin sebaba mirinê. Aşiq jî dema behsa êş û kedera ku ji eşq û evîndarîyê dikêşe dike, encax dikare alavên şerî bigihîne hawar û mededa xwe.

Wek kesekî aşiq û mutesewif, Laxer jî xwe li gor hin qaîdeyên helbesta klasîk vegirtîye û ev motîfên han di helbesta xwe da bi kar anîye. Alavên ku di helbesta Laxer da diborin ev in, ku her yekê di metnê da ji xwe ra wateyek daye çêkirin: şîr,

rim, tîr, zirh, mizraq, ermah, nîşab, misrî, neşabîn, qews, keyber/kêr, nebal/sertîr,  
xedeng û yengî.

Ew bi **şîr** û **rimh** û **tîran** têne *ceng* û *bazîyê*  
*Şehlewendan* libsê **zirhê** dir' dûşan rast û çep  
(xezel 3/6)

Min pur ji firaqa te di dil **tîr** û **neşabin**  
Xunê ji du çeşman vedirêjim çîye ba'îş

Mecrûhê ji **mizraqê** reqîban tu dibînî  
Xûnabê dirêjin bikî jehrîye ye lawîş  
(xezel 8/3, 6)

Xwîn rêhtinê 'aşiqan kî bah  
Kuştim te duhi bi **xençer** îdah

Seffak û qetîlê 'aşiqan î  
**Misrî** te kêşa li meqtelê lah

Meqtûlê di me'reka qetalê  
Hejmar me hezar û sed bi **ermah**  
(xezel 12/1, 2, 3)

Numandin du keman **yengê**  
Kêşandin wê li ser cergê  
**Xedeng** erjengê şeb jengê  
Bişuşta xwînê ez dil zac  
(murebbe 1/5)

### 3.7. Amûrên Muzîkê

Muzîk parçeyekî girîng ê çandê ye. Di warê şekilgirtina ruhî û çandî ya gelan da cihekî berfireh ê muzîkê heye. Her wiha muzîk xwedî fonksiyoneke wisan e ku dihêle zanav û nasnameya gelan û mirovan bê hêvişandin û çanda wan jî bi awayekî bênavber ji nifşan li nifşên din bê veguhastin. (Beyaz, 2007:5)

Wek unsûreke çandî û civakî, muzîk ne tenê bi meqseda kêfxweşî û demborîyê hatîye afirandin, her wisa ew ji bo terapîya ruhê insên jî hatîye dîtin û ji bo ku bi awayekî dewlemend pêk were jê ra amûr hatine çêkirin. Yanê muzîk li ser amûrên xasî xwe hatîye saz kirin.

Çawa ku tesîrê li gelek tiştan dike, muzîk tesîrê li edebîyatê jî dike. Peywendî û mijûlahîya edebîyatkaran çî rasterast çî ne rasterast bi muzîkê ra her hebûye û jê îlham wergirtine. Hetta tê dîtin ku ger helbest strana bêdeng be stran helbesta bideng e. Di edebîyata klasîk da jî amûr û motîfên muzîkjenîyê di rêzemaalîkan da xwe didin der. Wek rêyeke xweîfadekirinê, helbestkaran dil û risteyên xwe dane ber newaya muzîkê û bi rêya hin ciwankariyên wêjeyî ew di beyt û rêzeristeyên xwe da bi cih kirine.

Dema em li rêzemaalîkên Laxer difekirin, hin amûrên muzîkê yên wek ney, çeng, def, dahol û qanûn dertên pêşîya me. Her amûrek bi newa û wateya xwe ve ji xwe ra cihekî dibîne. Her wisa em dibînin ku termên bi muzîkê ra rasterast eleqeder ên wek reqs, newa, zikir, mitrib, awaz jî di helbestan da dixuyên.

#### 3.7.1. Ney

Rastîya wê nay e esildanî. Ji qamîşê tê çêkirin û amûrekî nefeskî û pifî ye. Ji kesê neyê lê dide ra jî neyjen/neyzen an jî nayî tê gotin. Bi xasyetê xwe enstrûmanekî newanerm, dildaxîn û lahûtî ye. Lew ku çêkirin û lêdana wê jî ne ew qas zehmet e di nav gelan da bi zêde berbelav bûye. Yek ji amûrên muzîka tesewifê ye. Tê rîwayetkirin ku gava Hz. Pêxember raza îlahî ji Hz Elî ra pispisandîye, Hz. Elî di bin giranîya vê sîrrê da hidar nekirîye, rabûye çûye li ser devê bîrekî ku li derkenarê Medîneyê bûye. Sîrrê xwe ji bîrê ra gotîye, li ser vî qasî ava bîrê jî hidar nekirîye, biqbiqîye û daye devî û di ser da pêl bi pêl avêtîye. Piştî hingê, avê ew derdor

vegirtîye û paşê jî li her kenarê avê qamîş hişîn bûne. Şivanekî jî, ku pezê xwe li wan deran çêrandibûye, ji wan qamîşan yekê jê dike û hin cihê wê kunkunî dike û pif dikeyê. Dengê ku ji wê qamîşê derketî dengê dilxweş û xiroşker bûye. Hz Pêxember jî dema ev newa bi tesadufen bihîstîye mesele ka çi ye teze fêhm kirîye. A ew roj ev roj e, ney bûye jêderka îlhamê bo ehlê hunerê. Her wisa Mewlana jî bi neyê dest pê mesnewîya xwe dike. (Pala, 2005:358).

Di gelek rêzikên Laxer da jî ney wek amûrekî muzîka lahûtî derbas dibe.

Her dem di xeyalê min **ney** û mey

Medhûş kirim ji wehdetê hey

Ta yarê bibînim û bi hey û hey

Bûsim kefê destê dostê ba pey

Ku ‘eqlê firaq û hicrî dîra

(muxemmes 1/4)

Şahidên dêmbedr û saqîyê zehresîma Xizirpûş

*Muṭriban* **ney** û *çeng* û *awaz* ba surûşan rast û çep

(xezel 3/1)

### 3.7.2. Çeng

Dişibe qanûnê, bes bi çiqanî tê girtin û bi tilîyan tê jenandin, lewma jî amûrekî wek arpê jî tê dîtin. Yê ku ji dara zerdeleyê tê çêkirin navdartirîn in. (Pala, 2005:358).

Di tesewifê da tê wateya têkilîya dilî ya ku bi alema melekûtî ra tê danîn. Wekê din jî ji bo dengê xeybê tê gotin. (Acar, 2017:191)

Laxer jî di nav atmosfereke melodîk da ev amûr di hin cihan da bi kar anîye.

Şahidên dêmbedr û saqîyê zehresîma Xizirpûş

*Muṭriban* **ney** û **çeng** û *awaz* ba surûşan rast û çep

(xezel 3/2)

*Mûxni û muṭrib bi çeng û nay û def*

Saz diken îro di vê warê hûdûş

(xezel 9/5)

### 3.7.3. Def

Erbane yan jî tef jî tê gotin. Ji çermê heywanên malê yê helal e ku bi qasnaxekî daîrewî ve hatîye alandin û şidandin. Ew daîre bi zengil û pûlan ve hatîye nitirrandin. Bi dest û milan tê lêdan. Di edebîyatê da temsîliyeta riperipa dengê aşiq dike; wekê dî rûyê yarê jî îma dike. (Pala, 2005:109).

Em dibînin ku wek termekî muzîkê di helbestên Laxer da jî dibore.

*Mûxni û muṭrib bi çeng û nay û def*

Saz diken îro di vê warê hûdûş

(xezel 9/5)

### 3.7.4. Qanûn

Ji amûrên têlbendî yê muzîkê yek jî qanûn e. Bi her du tilîyên şehdeyê tê jenandin. Serê van her du tilîyan ve divê du heb mizrapên metal hebin. Amûrekî denglîrîk e. Bi tarîxa xwe ve xwedî kevnahîyeke dirêj e. Di helbesta Laxer da li cihekî tenê derbas dibe.

Guh bide ber *zîkr* û *awazê neyê*

Ku bi **qanûn** tê ji dewwarê hûdûş

(xezel 9/2)

### 3.7.5. Dehol

Dehol amûrekî destlêdanê ye. Li her du alîyên çembereke fireh çermek tê girêdan û şidandin. Daholjen bi qayîşekê ve li stûyê xwe dialîne û her du alîyên li gor hin rîtman dide ber du darîkên biçûk. Daholvan her du destên xwe diemilîne û dengê gur û xurt jê derdikeve. Bi giştî di dawetan da tê lêdan. Her wisa di meha remezananê da ji bo ku xelkî şîyarî paşîvê bikin, tê lêdan. Li alîyê dî tellal û xeberbir

jî daholê wek amûra agahdarkirinê diemilînin. Di edebîyatê da jî wek dengê xurt ya lêdana qelbê aşiq tê hizirîn. Laxer jî di xezeleke xwe da wek amûra agahdarkirinê bi kar anîyê.

Miksîya ta kengî di ber vê qesra mecaz de dê bimînî

Li **dehola** çûn û mirinê bixe, li xwe bike hêminî

(qesîde 3/9)

### **3.8. Mezmûnên Eşq û Evîndarîyê**

Eşq halê hezkirina zêde ye. Dildarî û hubba ku meriv pê li tiştêkî yan jî kesekî pêwend be. Edebîyata klasîk û ya tesewifê hema bêje bi av û hewayê eşqê meyaye û bi agirê evînê kew girtîye. Di gelek dîn û efsaneyan da xulîqîna gerdûn û heyatê li ser eşqê çêbûye. Di hedîseke qudsî da îşareta ku li ba vê babetê tê kirin wiha ye: “Ez xizîneyeke veşartî bûm, min xwest ku werim zanîn û lewma jî min ev alem xulîqand.” Tê gotin ku di bingeha vê kelama felsefîk da eşq heye. Felsefeya Wehdetê Wucûd jî Xwedanasîyê bi rêya eşqê pêk tîne jixwe. Eşq bingeha delalîya heyîna insên e ku Xweda dil ji xwe ra kirîye eyne. Insan ehsewîye teqwîm e, Xweda husnê mutleq e. Gelek ekolên tesewufî û pratîkên wan eşqa îlahî ji xwe kirine miraz û meqsed. Eşqa îlahî ji maddîyatê ber bi me’newîyatê ve, ji cismîyatê ber bi ruhanîyetê ve diçe. Di vê rêyê da gelek halên ji hev cuda hene. (Pala, 2005:38).

Evîn, îşq, eşq, hubb, mehebbet û mewddet jî hin têgeh in ku ji bo eşqê tîn bikaranîn.(Yıldırım, 2010: 67)

Eşqa ku em di edebîyata klasîk da dibînin di gelek awayan da dixuyên. Halên ku ji hestewarîyekê sade pêk tî ta halê nexweşî û mirinê, gelek awa dertên pêşîya me. Eşq di navbeynîya du alîyan da diqewime; aşiq û maşûq. Alîyê ku zêde li ber eşqê dikeve û êş û azarê dikşîne aşiq e. Ev hesteke wisa ye ku dibe sebeb ku carna aşiq nexweş dikeve, melankolîk dibe û hetta dimire. Fedekarîyêke muezzem heye di vê rêya teng û nexweşkês da. Di metnên edebîyatê da bi hin munasebetên ji hev cuda behs li eşqê her daîm hatîye kirin. (Pala, 2005:39).

Gelek şairên klasîk û tesewifê eşq wek zembereka heyatê dîtîye û nivîsîye. Melayê Cizîrî afirandina alemê li ser çar hêmanan dibîne, bes difikire ku bingeha van çar unsûran jî li ser hub û eşqê hatîye avakirin:

Me cewher unsurik xamis nûma îro di tal' da  
Di vê reqwîmê insanî li talî' bûne fal ebrû (Cizîrî, 2007:201)

Bi evîne melek û çerx û felek tene sema  
Rewşen in têkî bi mîhrê ji sema ta bi semek (Cizîrî, 2007:134)

Hetta wî xwe piştî Muhîddînê Êrêbî şêxê duyem ê dergahê işqê dîtîye û wiha gotîye:

Di işqê şêxê sanî me, bi dil behrê me'anî me  
Li-zî hîcrîn we-zî qelbîn şifa'ûn fî îşaratî (Cizîrî, 2007:232)

Bi qasî ku tê bîra min, her wisa şairê helbesta klasîk a tirkî Fuzûlî jî her tiştî bi eşqê qaîmdar dibîne û jê paş hew qil û qaleke beredayî dibîne:

Her çi hebe li vê alemê eşq e  
Wekê din tev qil û qal e (Pala, 2003: 390).

Lew ku hem kesekî aşiq bûye hem jî ehlê tesewifê bûye, di helbesta Laxer da gelek peyv, term û mezmûn hene ku yan rasterast an jî bi îmayê îşaretî li eşqê dikin û pê ra eleqeder in. Hetta di malikeke xwe da xwe dîrek ji alema eşqê dihesibîne, hewce bi ders û ilmê nabîne. Her wiha teksîr jî nake ku alema derveyî eşqê rexne jî bike.

Naçim bi kenîştan û derê dêr û mesacid  
Cuz meygedeyê rind û xeraban ra bidem bac  
Ez çûme gelek medreseyan qet me nedî kes  
Ku dersê bide yane bixwûn 'işqê û minhac  
(xezel 11/4, 5)

Peyvên mîna yar, evîn, eşq, delal, hîcran, êş, sefa, sewda, rind, şehîd, meweddet, şeyda, cunûn, ebter, xem, nalîn, husn û cemal, fîraq hwd di rêzematikên şairî da berbelav in.

Ji **xemê** zulfê perîşan im nema **şabr û qerar**

Ji dil û sîne me çûn destê me ber gerdenê **yar**

Di şebê ‘eydê **wîsalê** ne xemê maye ne ‘ar

**Şefletê** nagehî xamûş kirim rû ve sitar

Dil bir û **can** ma di bendanê **xeyalê** mehê rux

(muxemmes 5/4)

**Şefayê** mey dibit **xem** rengê ez dil

Bi **şox** im xaneyê îro çep û rast

**Xemdarê** ji wê dil bûye şed **ker**

Şekîbayê deyê îro çep û rast

(xezel 6/3, 4)

Miksî çî eger di ‘eyd û xwar e

Miskîn û esîr û hicredar e

Laxer me bes e **şehîdê yar** e

Bûsek me bese ji gerdena ‘ac

(murebbe 1/8)

Di helbesta Laxer da gelek mezmûn hene ku ji her halê zêdetir bi halê eşq û evînê ve têkilîdar in.

### 3.8.1. Dil

Bi eşq û evînê ra têkilîdar her çî biqewime li dergehê dil diqewime. Dil mekanê hest û hîssiyata insên tê dîtin. Dil miqamê bang û xîtabê ye. Aşiq di gel dilê xwe xeber dide, hesabîhal dike. Derd û kulên xwe jê ra dibêje. Dil teyrikek e, bi xem û kederê xwe xwedî dike. Eşq û delalîya yarê wî talan bike û bike kavi jî, bes ew dîsa jî umîdewar e. Navekî wî yê dî jî qelb e, her wext diguhere. Lewma jî dil demdeme

ye. Yar wextê dibe sultan jana evînî jî dibe artêşa wî û paşê jî qedera welatê bi navê dil dibe perîşanî û kavlê kulê. Bêleqederîya yarê wî dîn û har dike, dike mecnûn û dike dîwane. Paşê jî bi perîyan ra dibe heval, bi hov û kûvîyan ra dibe hogir. Zulfên yarê bo wî zincîr e, bi wê zincîrê her qeydkirî ye. Zeqena yarê jî êdî jê ra dibe zindana kûr û tarî.(Pala, 2005:39).

Serê sifte dil newêrek e, bes dema dikeve rêya eşqê dibe şêr û pehlêwanekî cesûr. Êdî çi tehloke hebe li pêşîya wî, ne xem e bo wî. Ew êdî canfida û şahlewendek e. Yar bo wî êdî her tişt e. Bê yar jîyan jê ra kul û elem e. Hebe tunebe yar e her tiştê wî.

Dil dema dikeve eşqê dibe kaseyek, şûşeyek an jî dibe qedehek. Bi zû dişikê. Bi rengê şerabê tijî xwîna sor e tê da. Lew ku yarê ew red kirîye yan jî jê ra naz kirîye, ew bûye şerab û xwîna tilpdayî. Lewma jî ew xerîb û rebenek e ku her daîm xwîn dadîqurtîne. Nalîn û kalînên wî yan bi neyê ye yan bi tiştêkî dî. Di tesewifê da dil wek eynikekê tê dîtin. Di vê eynikê da heyîna Xwedê zahir dibe. Ji yên ku ji heqîqeta dilî beled û haydar in ra ehlê dil tê gotin. Di edebîyata klasîk da bê hed û hesab teşbîh û mecaz hene ku li dor dil hatine bikaranîn.(Pala, 2005:168).

Laxer jî di helbestên xwe da bi wayetên muxtelîf mezmûna dil emilandîye û daye nîşan ku ew ehlekî dil e û ji dîwana aşîqan tê.

**Dil** bedrê mûnîr e *'işqê* gêra  
Ayatê celal e şewqê vêra  
Herdemê remeq ji zewqê dêra  
Perwanesîfet meraqê pêra  
Pêra nekirim ji xeberê ra  
(muxemmes 1/1)

Ruħ û ya **dil** ew dixwazit dê fedakem ey ciwan  
Şehrîyar e xwundkar e pakê falê ên xerîb  
(qesîde 2/5)

Şefayê mey dibit xem rengê ez **dil**  
Bi şox im xaneyê îro çep û rast

Ûemdarê ji wê **dil** bûye sed ker  
Şekîbayê deyê îro çep û rast

Ûeman **dil** kirîye cayê şadûmanî  
Ji bin çûn kûçeyê îro çep û rast

(xezel 6/3, 4, 5)

### 3.8.2. Zulf/Bisk/Kakul

Di edebîyata klasîk da ji bo yar û dilberê motîfa herî zêde tê bikaranîn belkê jî por û cureyên şiklê wî ne. Bi şikl û rengê xwe ve bi bêhn û delalîya xwe ve bûye kakilê gelek beyt û rêzamalikan. Bi şel û şemala xwe ve dikeve ber gelek peyv û teşbîhan: rişte, zincîr, silsile, mar, çengal, dar, dûpişk, xet, helqe, bend, gîsû, cewr, zirh, peştemala Qabeyê, rê, sunbul, hemayîl û hwd. Bi bêhna xwe ve misk, enber, semen, rihan, ud û hwd. Bi rengê xwe ve jî dibe berginda peyvên wiha: şev, leyl, Leyla, zulumat, mexrîb, şevrev, hîndû, kufr, zunnar hwd. (Pala, 2005:384).

Zulf, kakul, bisk, berbisk, kezî, gulî, pûncik, ta û mûyên yarê belkê jî hêmanên herî dilrûba ne ku dilê aşiq û evîndaran li xwe dialînin û wan ber bi xwe ve dikêşin. Ew motîfa ku di edebîyatê da rêzamalikan dixemlîne helbe ji helbesta Laxer veder nebûye û ji wî ra jî bûye neqşeke dilbir.

Murxê dilê ‘uşşaqan şeyd in bi **damê zulfet**

Ji peykeranê qudsê şurîde bulbulê ra

(qesîde 1/4)

Çetreseywan mah û keywan **şerhê zûlfê** xalê tu

Ev sema û çerx û gerdan ba xeyalê ên xerîb

(qesîde 2/2)

Netrik û tîtan di nêv **zulfên reyaşîn** tên sema

Hurî û qudsê bidîtin rû dipûşan rast û çep

(xezel 3/4)

**Gîsûyê çû marê reş** bigestim

Ev nîm û bi **dabê zulfê** bestim

Mexmûrê ji kaseya elest im

Kê em roz ji ‘aqilê xwe xwestim

Zahir ku me baîninê veşarest

(muxemmes 3/3)

**Muselsel zulfê kakûl** bûn

Tejî *misk* û *qerenfîl* bûn

Bi **xetax** û xalî *fîlîl* bûn

Bi **neqşê çînê** bû emşac

(murebbe 1/7)

### 3.8.3. Perî/Hûrî/Zerî

Perî ji jinên cinan ra tê gotin. Lew ku nayên dîtin, wer tê bawerkirin ku gelekî spehî û bedew in. Bi sêhr û efsûneke taybet derdikevin ber çavan. Tê gotin kî wan dibîne nikare ku nebe aşiq û sewdalîyê wan. Lew ku hey carnan dixuyên û penîçav dibin û lew ku di şel û şemalên cuda cuda da dixuyên perî hin taybetîyên yarê dihewînin. Ji kesên ku gazî perîyan dikin ra perîxan tê gotin. (Pala, 2005:369).

Hûrî jî tê bawerkirin ku keçikên bihuştê ne. Gelekî spehî û nûrîn in. Çavxezal in. Her çi delalî û bedewî hebe li wan tê teşmîlkin. Lewma jî di helbestê da bi tehereke berfireh tê bikaranîn. (Pala, 2005:212).

Heçî zerî ye, ew jî ji bo jin û keçikên spehî û bedew tê gotin. Rûken û çavxezal in. Xasyetmelek in. Ji bo dildaran dilrakêş û kujer in. Di edebîyatê da jî da ku delalîya yarê were zanîn û beyankirin bi peyva “zerî” tê wesifkin.

Perî, hurî û zerî sê motîfên bedewî û delalîyê ne ku şairan di risteyên xwe da nekarîne xwe bidin alîyekî û ji emilandin û şibandina wan dûr bimînin. Lewma jî di ser hin hunerên edebî ra ev term ketine nav edebîyatê û hunera gotin û vegotinê estetîze kirine.

Wate, radeya herî bilind a xweşikî û bedewîyê encax bi van têgihan hatine zimên. Hetta hin şair ew qas dilkîyê gulyara xwe bûne, yara xwe ji van husn-î mîsalan dahî zêdetir bedew û berdil dîtine. Feqîyê Teyran yek ji wan e ku xweşikîya tevahîya hûrî û perîyan jî ji ya xwe hindiktir dibîne:

**Hûrî** ku têk cema bin

**Perî** hem di wê gavê

Hemî ji reng çira bin

Nêzikê şems û tavê

Ji şerma xuya nabin

Ji husna wê **gulbavê** (Dêreşî,2011:135).

Em dibînin ku ji ber aşîqtî, mutesewifî û şairîya xwe, Laxer jî bi van kelmeyan ronahî û xweşikî li helbesta xwe zêde kirîye.

Ew **perî** ku ku dileyzin reqşîyan e rast û çep

**Hûr** û qudusê xwe bi seyranê ewan tên roz û şeb

(xezel 4/4)

Bi helakên ji firaqê li me dil şed kerî kir

**Perîya şox û şepal** sîne tejî xençerî kir

Bi du şed rengê ‘ezabê ku di nêv cîgerê kir

Bi nîhan ateşî bû pêt û perengê qerî kir

Kî bi vê zîlm û cefayê bi qele ber derî ket

(muxemmes 2/5)

Ey Laxerî şeyda ku di vê ‘esrê çû Miksê

Aya bi şeca’et dil û can da ku **zerî** hat

(xezel 7/7)

**Hûrên** di *beheştê* û **perî** cumle cema tên

Zuhre reqîşî çeng û çexane bi xîna tên

Xulxul dikevîtin çemenan têk bi newa tên

Şimşad bi meş sosin û sunbul bi sema tèn  
Ey serwê xiraman ku tu carek bimeşî  
(texmîs 1/2)

#### 3.8.4. Xemze

Tê wateya çavnêrîna yarê ya şehla, tîrkî û me'nedar. Di edebîyatê da nêrîna yarê dibe sebaba bi hezaran xemzeyan û di her xemzeyekê da jî me'neyek heye. Tevgerike wisa ye ku xwe diqelizîne û wisa hunera xwe pêk tîne. Kes pê nahese. Aşiq û evîndarê li ber xemzeyan ketî dikeve nav elem û izdirabê, lê çî ecêb e ku ev elem û izdirab bi xweşê wî diçe. Di helbestaklasîk da zêdetirîn li bal tîr, şûr û xencerê ve tê şibandin. Hedef jî can, dil û sîne ye. Di peywenda çav û mijang û birhên yarê da mijang wek tîr, birh wek kevan tê dîtîn. Yar ew qas hoste ye ku di emilandîna tîr û kevanê xwe da bi mû hela şaş nabe û li hedefa xwe dide. Her wisa ji ber şehlafekirîna wê, xemze di edayê mest û serxoşîyê da ye, lewma jî ji sozê wê ra qêm navê. Xemze carna dibe kujer. Gava aşiq ji alîyê xemzeyê ve hat kuştin, aşiq dibe şehîd, xemze dibe kafir. (Pala, 2005:162).

Di helbesta klasîk da wek motîfeke sereke, xemzeyê hunera helbestê ya Laxer jî neqîşandîye. Ew di gelek risteyan da bi wayetên cuda hatîye bicihkirin.

Hîkmeta van remz û razan muşkilatê **xemzeyan**  
Kî di vê 'esrê beyan ket bê 'eyan tèn roz û şeb  
(xezel 4/8)

Bê dil ji *qewsê ebrû*  
Mecrûh e dil şikeste  
**Nebalê xemzeyan** pur  
Tên *sîneyan* ji ebrac  
(murebbe 3/4)

Her **gezme** û *awir* ku ji *çavên* te bi *kil* hat  
Me *sîne hedef* da ber û yek yek ne bi *til* hat  
Ahek me nehişt şebr û sukûn bê tehemil hat

Derba cegerê bû ku me ev nale ji dil hat  
Ma ah û fişanan dikirit kes ji xweşî

(texmîs 1/8)

### 3.8.5. Jehra Helahil

Jehra kujer. Axû. Di metnên edebî da bêtir di gel tîryaq, şekir, şîrînahî, şerbet û marê ra tê emilandin. Cewr û cefaya ku yar dide dibe jehra mirinê. Lewma jî aşiq ji ber wê xem û kederê sebrê dike bes di hinavê xwe jehrî dibe û tê ber mirinê. Jehra helalil li wê êş û qehra ku dildêr dikşîne tê wekandin.(Pala, 2005:489).

Gava em dixwînin, em dibînin ku di helbesta Laxer da jî ev hêma derbas dibe û dide nîşan ka çend kûr û tîr e sebr û jana ku şair di hinavê xwe dikêşe.

Bendeyê şadiq ji bo rager biket her ta'etê  
Dê vexût **zehra helahîl** her di rahê keç û rast

(xezel 5/6)

*Zilmekê pur pê xweş in ger bi me dî **jehra hela***

Ji îta'et nekêşin ser bi cefayan û bela  
Lêke Barî bi 'înyet tu nezer de bi fela  
Teyeswe'l xêrmend illa bi qewlê emela  
Ger çi danî me di nêv atêşayê xem û bes

(muxemmes 4/3)

### 3.8.6. Şem û Perwane

Mum jî tê gotin jê ra find jî. Lew ku şewitîn û xilasbûna şemê zemanekî pîrr û dirêj digire di edebîyatê da wek mezmûnekê tê bikaranîn. Zehf caran di gel perwaneyê ra tê behskirin. Wek çîrokeke efsaneyî çîroka Şem û Perwaneyê jî heye ku bûye babeta gelek mesnewîyên edebîyata cîhana Şerqê. Bes di metnên edebî da rasterast wek du mezmûnên eşq û evînî yên agir, ronahî, helandin, kizrandin, dilsozî û wusletê tê dîtin û xebitandin. Dema aşiq dibe perwane şem jî dibe rû û hinarikê yarê ku ji ber evînê sor û sorqîçî dibe. Her wiha di tesewifê da jî wek du mezmûnên

mecaz û teşbîhê jî tê dîtin û sêwirandin. Di rêya wehdetê da perwane wek derwêşekî aşiq û sermest xwe tune dike û wasilî murşîd û yara xwe dibe. (Pala, 2005:427).

Çi pêkve çî jî cuda cuda, ev her du motîf di helbestên Laxer da gelek caran derbas dibin.

Weşlê **şem'perwaneyê** daîm he meqlûb e bi can

Ger çî zahir pê disojit pur bi ahê keç û rast

(xezel 5/3)

**Perwane** eger çî dil dînîm e

Bi yar yekê **şem'** e ew mûqîm e

Canê xwe bi can didet ku dîme

Yar çendê *disojî* wey hekîm e

Laxer di fîraqê yarê zarest

(muxemmes 3/5)

Ma **şem'ê wîsalê** demekî şeb li me hilkey

Dê kew bigrin cerhê meraqa te ye hadîş

(xezel 8/4)

Miksîyê Laxer di nêv ateşê hecra te bisoxt

Çehv û dîden wê bi emrê te ji exyarê bidoxt

Her wekî **perwaneyê** wê can di rêya dînê firoxt

Nagehan peykê qezayê ne'reyê zed ev çî got

Bes bike tu ji vê meqalê pîrr şewaê xem û bes

(muxemmes 4/4)

### 3.8.7. Xar/Reqîb

Strî û dirrîk. Di edebîyatê da ji unsûrên ku eza û cefayê dide aşiqan ra tê dîtin. Li pêşberî wisletê halekî asê û nexweşkês e. Gava yar wek gulşenekê hat şibandin reqîb jî ew devî û dirîkên derdora gulê ye ku kêsê nade ku dildar xwe bigihîne. Di danûstanîya aşûq û maşûqan da mutleqe reqîb û nexêrxwaz hene. A ev halên bi derd

û keder bi çîrokên xwe li edebîyatê cih digirin. Xar be reqîb be, axir bo dildêr her çî eş û janê welidîne wek axyar û mixrik tê hesabîn. (Pala, 2005:191-374).

Laxer jî di helbestên xwe da wek motîfeke evîn û tesewîfî bi kar anîye.

Bubulê dil pur birîn e ew ji **xarê sorgulan**  
Endelîban qîl û qalên subhêgahê keç û rast  
(xezel 5/4)

Bedkêş û cefa çûye kûhen kîn û neyar e  
Danîne di nêv sîne hezar **xarê elem** çerx  
(xezel 14/3)

Qe nizanim çî xeta dît ji min yarê yeqîn  
Wê bi guhdarî **reqîban** li me pur kîn e yeqîn  
Demekî dostê were û ji kerem ba me neşîn  
Hey bike murdeyê şed sale bi dîdarê vejîn  
Kes heyê ma ji Xudê ra ku evê mehderî ket  
(muxemmes 2/3)

### 3.8.8. Qewseyn

Qews kelîmeyeke erebî ye û bi kurdî “kevan” e. Helbestkar şemalê birhên yarê dişibîne kevanê. Kevan hem amûrekî şerî ye hem jî navê bircekê ye. Kelîmeyên qews, qewsê quzeh, ebrû, hîlal bi piranî pêkve tînen emilandin. Di Qur’anê da jî ev peyv derbas dibin. Di sureya Necmê da dema behsa çûyîna mî’racê tê kirin tê gotin ku mesafeya di navbera Xwedê û Pêxember da bi qasî qewsekê bûye. Birh li serana çavan ra ne û mijangan dixin tîr û direşînin sîne û canê dildarê sînedoxî. (Sezer, 2016:106).

Bi wateya xwe ya tesewîfî û evînîyê ve Laxer jî ev motîf li helbesta xwe neqîşandîye û qesda eşbirîna ku aşîq di ber maşûq da dikêşê dike.

Sîneyê min kir hedef tîran ji **qewsê ebrûyan**

Lê dibarînit peyapey ceng û zalê ên xerîb

(qesîde 2/7)

Bê dil ji **qewsê ebrû**

Mecrûh e dil şikeste

Nebalê xemzeyan pur

Tên sîneyan ji ebrac

(murebbe 3/4)

Gazindê ji derd û eleman qet meke êdî

Ev talih û bextê we mûbarek te li kê dî?

Meşûlê muradê me ji tîra bi çepê dî

Ey dil ji **kevanê helek** exterme şehîdî

Minnet ku tu exterme yî qewsê biweşî

(texmîs 1/7)

### 3.8.9. Meh/Bedr/Heyîv

Meh çavkanîyeke ronahîyê ye. Ronahîya wê wekê ya rojê ne pêt û agir; nûr e. Nûra xwe ji rojê distîne û di şevên reş û tarî da şewqê dide dinê û ronahî dike. Di metnên edebî da ev meh ji rûyê yarê pêştir ne tiştêkî dî ye. Destê kesekî dî negihayê û nêzikî wê nebûye. Her wext naxuyê. Li jor e her daîm. Spehî û nazdar e. Rûşen û dilşad e. Di heyîvkeyîrînê da aşiq wê dişibîne halê ku porê wê di ser rûyê wê da hatîye û ew nixumandîye. Gelek şikl û şemalê heyîvê hene ku ji bo uzvên rûyê yarê tê wekandin ji alîyê aşiq ve. Meha çardehî ya herî zêde ye ku ji bo sîmayê yarê tê emilandi. Ew rûyekî wisa bedew e ku tu qusûra wî tune. Di heyamê xwe yê hîlal û dasûk da meh ji bo devê yarê yan jî birhên yarê tê şibandin, ku zerîf e û narîn. (Pala, 2005:42).

Di helbesta kurdî da bi hêsanî wek peyvên meh, heyîv, bedr tê xuyan. Laxer ev mezmûn di wateya tesewîfî û evînê da gelek caran kirîye hêmana helbesta xwe.

Dil **bedrê mûnîr** e ‘îşqê gêra

Ayatê celal e *şewqê* vêra  
Herdemê remeq ji zewqê dêra  
Perwanesifet meraqê pêra  
Pêra nekirim ji xeberê ra  
(muxemmes 1/1)

Sewdaperîya **mehrû** îro kirime ya Reb  
Der zawîye putxane secde birme ya Reb  
(xezel 2/1)

Şahidên **dêmbedr** û saqîyê *zehresîma* Xizirpûş  
Muṭriban ney û çeng û awaz ba surûşan rast û çep  
(xezel 3/2)

Mujde da me nesîmê ji **şepalê mehê rux**  
Di seḡerahê kerîmî bi **wîsalê mehê rux**  
Ji kuşad dil bû xerîmê di **cemalê mehê rux**  
Ji ḡesed sohtî reqîbê çu **şemalê mehê rux**  
Min dil perwaneyê şem'ê **delal e mehê rux**  
(muxemmes 5/1)

### 3.8.10. Dam/Dav

Dafik û kemîn. Por û biskên yarê ji bo çivîka dilê yarê dav û bendekî xeternak e. Ku ketê jê xilasbûn dijwar dibe, belkê jî jixwe naxwaze ku êdî jê xilas be. Çeng û perê wê tê şikandin û di nav davikê da êsîr dimîne. Di rêzemaalîkên edebî da bi giştî di gel zulf, xal û xetan ra tê dîtin. Xal wek qûtê nêçîrê zulf jî wek benda kemînê tê hizrîn. Wek nefse emare di rêya tesewifê da jî tê bikaranîn.(Pala, 2005:105).

Em dibînin ku di Laxer da jî ev wek mezmûneke sereke hatîye bicihkirin.

Ev Miksîyê Laxerî ku mest e  
Sekran ji kewşera elest e  
Yaran ji me ra ku 'eqd dibest e

Qeṭ'a ku ji **damê** ew nerest e  
Şeyda û cunûn e her demê ra

(muxemmes 1/5)

*Murxê* dilê 'uşşaqan *şeyd* in bi **damê zulfet**  
Ji peykeranê qudsê şurîde bulbulê ra

(qesîde 2/4)

Da **bende bi damê serê zulfa** te sehergeh

Ku xwest ji me can rûh

Ma bo me dibit can û dilê direhtin xergeh

Dostem bistan rûh

(mustezad 1/1)

# BEŞA ÇAREM

## 4. METNÊ DÎWANA LAXER

### 4.1. Der Barê Peydakirina Metnê Dîwanê

Haja me cara ewilîn ji xebata Tehsîn Îbrahîm Dorskî û Huseyn Şemrexî çêbû ku wek pirtûk li Başûr di sala 2011an da bi alfabeya erebî ji aliyê weşanxaneyê Spîrêzê ve hatibû çapkirin. Di wê pirtûkê da der barê jîyan, malbat, Dîwan û mexlesa Laxer da da bi kurtasî agahî hatine dayîn. Metnê Dîwanê jî li gor rêza alfabetîk a erebî hatîye rapêşkirin. Di dawîya pirtûkê da jî pêvekek û ferhengoke biçûk heye.

Piştî bidestxistin û xwendinê, me qirar da ku em li ser Laxer û Dîwanya wî xebateke analîtîk û zanistî çêkin. Me destxetên ku di destên malbatê wî da nin jî bi dest xistin. Di destê malbatê da sê destnivîs hebûn, ku ya kevintirîn a Mela Nûredînê kurê Laxer bû, ku ew jî di nav deftereke cîltekirî da hatibû nivîsandin. Kaxiza vê defterê kevin û bi aher bû, her wisa di vê deftera bi bergeke reş cîltekirî da piştî beşa helbestên Laxer hin helbestên Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî jî cih digirtin. Ji vê jî me texmîn kir ku Mela Nûredîn muhtemelen bi vî awayî xwestîye ku keşkulekî biçûk ji xwe ra çêke. Beşa helbestên Laxer 16 wereq bû û destnivîsa helbestan bi hêsayî dihat xwendin. Nevîyê Laxer Mela Evdilmecîd li ser metnê di binê hin kelîmeyan da wek jêrenot bi zimanê erebî wateya wan nivîsîye.

Her wiha destxeteke di jî hebû ku Mela Evdilmecîd ji ber destxeta bavê xwe Mela Nûredîn ji nû ve nivîsîye. Ev jî wek deftereke bi peren spî û A4 e. Heman jêrenotên bi zimanê erebî di vê destnivîsê da jî hene. Li aliyê di Mela Evdilmecîd Dîwan cardî bi dest nivîsandîye, lê belê di vê destxeta nû da ew jêrenotên bi zimanê erebî yên ji bo hin kelîmeyan tune ne. Yanê di destê malbatê da vêga sê destxet hene ku ya herî kevin a Mela Nûredînê kurê Laxer e. Her duyên di jî yên Mela Evdilmecîdê nevîyê Laxer e ku niha jî li heyatê ye. Her çî qas me ji malbat, derdor û lêkolînerên vê qadê pirs û pirsîyar kir jî destxeteke ku Laxer bi xwe nivîsîbe nehate dîtin. Serencama dîwana wî û ya texmîsê di beşên berê da jixwe hatibû vegotin.

#### **4.2. Tesnîf û Amadekirina Metnên Dîwanê**

Piştî me helbestên pirtûka Doskî û Şemrexî latînîze kirin, me destnivîsên li nik malbatê jî anîn û ji nû ve latînîzekirina xwe li ser destxeta herî kevin a Mela Nûredînê kurê Laxer çêkir û ji nû ve sererast kir. Di dawîyê da jî me metna destxetê ji devê Seyda Mela Eta, ku yek ji malbata Laxer e, guhdarî kir û kêmasî û xeletîyên xwe teshîh kir. Bi vê terhê jî cara pêşîn e ku helbestên Laxer bi tevahî tîn latînîzekirin.

Rêzebendîya helbestan di hemû xebat û destxetan da bi herfên alfabeya erebî bû jixwe. Me ev rêzemendî wek xwe hişt û ji helbesta yekem ta helbesta sîyem me reqem da helbestan. Her wiha di nav kevanekê da herfa qaffiyeyê ya ku helbest lê hatîye bestin, li rexê reqemê jî bi cih kir.

Ji alîyê şiklên nezmê ve me helbest kategorîze kirin û 15 xezel, 5 qesîde, 5 muxemmes, 3 murebbe, 1 mustezad û 1 texmîs derketin ber çav. Me navê teşeyê nezmê li helbestan danî. Her wisa, çi malik çi çarerêz çi pêncêrêz; me helbest ji pênc beşan carekê jî kategorîze kir û bi vî awayî dîyar kir. Mînak: Xezel 3/4, yanê xezela sêyem û malika çarem. Lewma jî me beşên tehlîl û îzahatên xwe yê li ser metnê Dîwanê li gor vê bindabeşkirina tertîba nezmî pêk anî.

Heçî qalibê pîvaneyê ye, me di serê her helbestê da behreya wê ya erûzê bi puntoyeke hûrdek û bi formekî xwehrkî/îtalîk dîyar kir.

#### **4.3. Transkrîpsiyona Metnê**

Wek bingeha xebatê me destxeta Mela Nûredîn ku ya herî kevin e, ji xwe ra mînak girt û destxeta Mela Evdilmecîd û metnê xebata Doskî û Şemrexî jî lê qîyas kir û bi vî awayî xendina metnan kir. Ji herfên alfabeya erebî ber bi ya latînî ve, transkrîpsiyona metnê li gor alfabeya standard a navnetewî hatîye kirin û dengên ku herfa wan di alfabeya kurdî ya latînî da tune ne bi vî awayî hatine dîyarkirin:

## Elîfbêya Transkrîpsiyonê

ء	: ’
ت	: Tt
ث	: Sş
ح	: Hh
خ	: Xx
ذ	: Zz
ز	: Zz
س	: Ss
ص	: Şş
ض	: Żż/Dd
ط	: Tt
ظ	: Zz
ع	: ‘
غ	: Ğğ
ه	: Hh

#### 4.4. Metnê Dîwanê



## 1. (-a)

### [MUXEMMES 1]

*Mef 'û lu / me fa i lun / fe 'u lun*

1

Dil bedrê mûnîr e 'îşq û gêra<sup>2</sup>  
Ayatê celal e şewqê vêra  
Her dem remeqê ji zewqê dêra  
Perwanêsifet meraq pêra  
Pêra nekirim ji xeberî ra

2

Bostanê cemalê girt rewneq  
Xemlîne şenewber û murewneq  
Teşbîhê nucumê çerxê ezreq  
Dîbayê kuşa ji ser şebah berq  
Şehlûl û binal be bulbulê ra<sup>3</sup>

3

Xweş weqt e mecalê geşt û seyran  
Nêv baxçeê gul binevş û reyhan  
Sermest e ji keyf û 'îşq û heyran  
Erbabê meweddetê vedîran  
Çeşmê şeveqê ji sohbetê ra

4

Her dem di xeyalê min ney û mey  
Medhûş kirim ji wehdetê hey  
Ta yarê bibînîm û bi hey û hey  
Bûsim kefê destê dostê ba pey<sup>4</sup>  
Ku 'eqlê firaq û hicrê dîra

---

<sup>2</sup> ME: Dil bedrê mûnîr e 'îşqê gêra

<sup>3</sup> TÎD: Şehlûl û binal bi bulbulê ra

<sup>4</sup> TÎD: Bûsim kefê destê dostê ya pey

5

Ev Miksîyê Laîerî ku mest e  
Sekran ji kewşera elest e  
Yaran ji me ra ku 'eqd dibest e  
Qeṭ'a ku ji dabê ew nerest e<sup>5</sup>  
Şeyda û cunûn e her demê ra



---

<sup>5</sup> ME-TÎD: Qeṭ'a ku ji dabê ew nerest e

## 2. (-a)

### [QESÎDE 1]

*Mef' û lu / fa'î lâ tun / me fâ'î lu / fa'î lun*

1

Ruĥanîyan tu ruĥ î hem rewneq î ji gulê ra

Ṭufanîyan tu Nuĥ î der beĥrê xergulê ra

2

Nêv beĥrê Xutelê pur ney keştî û ne zewreq

Tu destegirê mayî burhanê bê dilê ra

3

Roza 'esîrê Ṭaha ma ra meke feramûş<sup>6</sup>

Sulţanê sedrê mehder feryadresê Melê ra

4

Murxê dilê 'uşşaqan şeyd in bi damê zulfet

Ey peykeranê qudsê şurîde bulbulê ra

5

'Umrê me bû nîhayet roja me çûye êvar

Ĥeyfa ku newcîwanî borî bi meşxelê ra

6

Pîrîyê natuwanim curm û qabaiĥem pur

Ef'al û qewlê xeyrem neyzade menzîlê ra

7

Barî Xudayê yekta mara bibexşe Ṭaha

Curm û gunehê min boş wek jengê şeyqelê ra

8

Miksî eger gunah e pur kirine wê tebah e

Racî ye ez Îlah e Xeffar e tewbe lê ra

---

<sup>6</sup> TÎD: Roza 'esîrê Ṭaha mara meke feramûş

### 3. (٢-b)

#### [QESÎDE 2]

*Fa'ilatun/Fa'ilatun/Fa'ilatun/Fa'ilun*

1

Ey şehînsahê 'Ereb pursê li halê ên xerîb  
Rehmê kun binger bi şefqet 'arzûhalê ên xerîb

2

Çetreseywan mah û keywan şerhê zûlf û xalê tu  
Ev sema û çerx û gerdan ba xeyalê ên xerîb

3

Ah û ezîn gerdûnê dîn kuştendeyê merdê Xuda  
Şed hezar şehzade wê mirne mîşalê ên xerîb

4

'Îd e yarê xemkûsarê herkesê ba teyrê şad  
'Ezmê yarem xef dibînim her qitalê ên xerîb

5

Ruh û ya dil ew dixwazit dê fedakem ey ciwan  
Şehrîyar e xwundkar e pakê falê ên xerîb

6

Surmeyê çeşman û dîde rewşenê ez xakê paş  
Ba duşed hîle û bazê çeşmeyê dalê ên xerîb

7

Sîneyê min kir hedef tîran ji qewsê ebrûyan  
Lê dibarînit peyapey ceng û zalê ên xerîb

8

Heyder e ya Rustem e der ceng erê ceng yan 'Omer  
Şahê merdan merdê meydan şehdê dalê ên xerîb

9

Ew perî çûn der ji burcê hate te'zîmê sucûd  
Wacib e ey Miksîyê Laxer bi halê ên xerîb

#### 4. (ç-b)

##### [XEZEL 1]

*Mefa'îlun / mefa'îlûn / Fe'û lun*

1

Felek dinya te kir îro pur aşûb  
Cîhan yekser te kir ateş xwe ra çûp<sup>7</sup>

2

Xelaîq ger bi vê rengê lîbasê  
Ûeta kengî zûlm bit bo te merxûb

3

Hemîşe karê tu efsan û hîle  
Be merdanê Xuda ra cengê û kûb

4

Cefa xuwahî tu ra karê qedîm e  
Nedîmê te bûye gerdûnî û dûb

5

Bi xedrê hoqqebazê nabkarî  
Cîhan yekser ji mekrê te bi mer'ûb

6

Eger camek şirîn dî tu kesê ra  
Bes jehrê dikî nêv camê meşrûb

7

Bes e Miksî bike kutah behsê  
Ji qîl û qalê Laşer şî'rê mensûb

---

<sup>7</sup> Li vir dijberê herfa qafîyeyê ya helbestê herfa “p”yê hatiye bikaranîn lew ku ev peyv tirkî ye û bi “p”yê diqede.

## 5. (ب-ب)

[QESÎDE 3] (bi farisî)\*

*Fa'ilatun/Fa'ilatun/Fa'ilatun /Fa'ilun*

گر خلیل آسا بگویم هر زمان یکتای رب  
آتاشی نمرود کر در جنت المای رب<sup>8</sup>

در هوا گوفتا به جبرل چون فتا دنداش بنار  
نیست مارا با تو حاجت بل الی بینای رب<sup>9</sup>

فرد حق فقموده (یا نار کونی بردا و سلاما)  
هم بدین سان مرد حق چو با که بی همتای رب<sup>10</sup>

گلشن و گلزار شود آتش بگرد حق پرست  
چن خلیل خود رهند شام همه دانای رب<sup>11</sup>

غیر تو گر من بجویم کور و نابینا شول  
در دمی روز قیامت دوزخ و مأوای رب<sup>12</sup>

دیو بی امری نمود خجلانه پوشده به شد  
طاعتش ضایع نماید روز حق مولای رب<sup>13</sup>

<sup>8</sup> Ger her dem wek Xelîl bibêjim Rebbê yekta  
Agirek Nemrûd ger di penahgeha ceneta reb de

<sup>9</sup> Dema avêtine nava êgir, li hewayê bi Cebreîl re got  
Li te na, lê belê hewcetîya me bi rebê bîna heye

<sup>10</sup> Ferdê heq fermî; ey agir sar be û silava te li Îbrahîm be  
Her wisa mêrê heq wek ku bi rebê bêhemta re

<sup>11</sup> Dibe gulşen û gulzar agir li dora heqperest  
Reb hemîyan rizgar dike, wek Xelîlê xwe rizgar kir

<sup>12</sup> Ji bil te bo hacetê ez li kesekî bigerim ez ê kor bibim  
Roj tê, qîyamet radibit, dojah û penahgeha reb

<sup>13</sup> Dêwê bêdestûrî kir şermezar hate wendakirin  
Taetên wî betal bûn di roja heq ya mewlayê reb de

آن چه در روز ازل کلک نوشت فرموده  
بر سر ما آن بیاید نیست شک فرمای رب<sup>14</sup>

خلقها ترسند از شما اجل از روز رفت  
زانچه فرماید شد باید شود اجرای رب<sup>15</sup>

مکسبیا تا کی بمانی در برین کاخ مجاز  
کوس رهلت را بزن جا بر فرا آرای رب<sup>16</sup>



---

<sup>14</sup> Her tiştê ku di roja ezelê de li qelemê ketîye  
Dê pêk bê ew miheqeq e şik nîne di qala reb da

<sup>15</sup> Xelk ditirsin ji şeva ecelê û ji roja malbarkirinê  
Bes ferz û eyn e ku ferma reb l'wan bê bicihanîn

<sup>16</sup> Miksîya ta kengî di ber vê qesra mecaz de dê bimînî  
Li dahola çûn û mirinê bixe, li xwe bike hêminî

*\*Mehdî Jafarzade ev helbest wergerandîye kurdî; spasîya wî dikim.*

## 6. (←b)

### [XEZEL 2]

*Mef'û lu / Mefâ'îlu / Mef â î lu / Fe'û lun*

1

Sewdaperîya mehrû îro kirime ya Reb  
Der zawîye putxane secde birime ya Reb

2

Rindan û perîpeyker mey nabi zûlal û gêran  
Zewqek ji şefa da min şeyda kirme ya Reb

3

Saqî çu nezer da min dîn ba dilê xaret kir  
Taqet me nema êdî wenda kirme ya Reb

4

Wey muxbeçeyê can bir der dawî bi yek 'îşwe  
Wek teşyrekî nîmbismil mewta kirme ya Reb<sup>17</sup>

5

Sermayeyê ehyayê saqî bi xwe ez girtim  
Da min ji nebatê nûş îhya kirme ya Reb

6

Şukrane birim secde pêş saqîyê meyxane  
Go: bendeyê dêrînî kehla kirme ya Reb

7

Her çende tu sultân î wek morê heqîr im ez  
Wî Asîfê ber textê bîna kirme ya Reb

8

Ba hîlm û melahet xweş çûn Yusufê dewran e  
'Îşqê ku Zuleyxayê sewda kirme ya Reb

9

Mîksî bi xezelxwanê bû şohreyê afaqan  
Ger çendî bi 'ebdalî peyda kirme ya Reb

---

<sup>17</sup> TÎD: Wek teşyrekî nîmbesmel mewta kirme ya Reb

## 7. (ç-p)

[XEZEL 3]

*Fa'ilatun / Fa'ilatun / Fa'ilatu / Fa'ilun*

1

Min sehergaha ezel dî meyfiroşan rast û çep  
Reqş û best in tèn semayê dûş bi dûşan rast û çep

2

Şahidên dêmbedr û saqîyê zehresîma Xizirpûş  
Muṭriban ney û çeng û awaz ba surûşan rast û çep

3

Dil ji min bir muxbeçanê sîmendami çehregul  
Çeşm û mestan cam di destan xemrenûşan rast û çep

4

Netrik û tîtan di nêv zulfên reyahîn tèn sema  
Hurî û qudsê bidîtin rû dipûşan rast û çep

5

Tên bi de'wayê û cîdalê cengîyanê meyperest  
Şubhetê şîr û jîyan û pur xurûşan rast û çep

6

Ew bi şîr û rimḥ û tîran tene ceng û bazîyê  
Şehlewendan libsê zirhê dir'dûşan rast û çep

7

Çust û çapûk tèn bi 'ezma kuştina tey Laxerî  
Miksîya heq bû şehîdê meyfiroşan rast û çep

## 8. (٢-b)

[XEZEL 4]

*Fa'ilatun/Fa'ilatun/Fa'latu/Fa'ilun*

1

Şahidên qed şubhê 'er'er sergiran tên roz û şeb  
Sunbulên ta ta li dêmê dîlberan tên roz û şeb

2

Saqîyan cam û qedeḥ ez xemrnûşîn pur kirim  
Dane destê 'aşiqan û meyxuran tên roz û şeb

3

Meyperestan helqebest in tên temaşayê melek  
Serwê azadî xeraman çîmenan tên roz û şeb

4

Ew perî ku ku dileyzin reqşîyan e rast û çep  
Hûr û qudusê xwe bi seyranê ewan tên roz û şeb

5

Çîmena sultânîyê rewneq ji rengê kewkeban  
Gulistana şahîyê serwê rewan tên roz û şeb

6

Sebzepûşanê çemen derber kirin huzurê qeban  
Faxîrane hem dipûşan lê nîhan tên roz û şeb

7

Dilberanê neyşeker bala şirîn reftarê xweş  
Ber serîrê seltenet ca ermeḥan tên roz û şeb

8

Ḥikmeta van remz û razan muşkilatê xemzeyan  
Kî di vê 'eşrê beyan ket bê 'eyan tên roz û şeb

9

Zemzem û eswed mezahir tên ji rûyê esmeran  
'Ezmê ba îḥram û 'umre hacîyan tên roz û şeb

10

Ferz û ‘eyn e ‘eqda ihramê dema bêt ew perî  
Lew di ‘ilmê ehlê halan weysîyan tîn roz û şeb

11

Ma murîdanê tewafîn der terîqê bê dilan  
Miksîyê Laxer bi şeydayê rewan tîn roz û şeb



## 9. (ت-ت)

[XEZEL 5]

*Fa'ilatun/Fa'ilatun/Fa'ilatun/Fa'ilun*

1

Dil ji min bir nazenînê zerkulahê keç û rast  
Şahê hûbban sorşêrînê pur sîpahê keç û rast

2

Dozexê hîcranê sohtim ez serî hetta qedem  
Ah ji ber tîrên firaqê rûsîyahê keç û rast

3

Weşlê şem'perwaneyê daîm he meqlûb e bi can  
Ger çi zahir pê disojit pur bi ahê keç û rast

4

Bulbulê dil pur birîn e ew ji xarê sorgulan  
‘Endelîban qîl û qalên şubhegahê keç û rast

5

Keçrû ye çerxê felek dêrîn neyar e pur bi kîn  
Her mûdam ew ceng û cû ye gah û gahî keç û rast

6

Bendeyê şadiq ji bo rager biket her ta'etê  
Dê vexut zehra helahîl her di rahê keç û rast

7

Key xelaş ey Laxerî ez mekrê wey pabem demê  
Miksîya dil cahê derdan e ji belahî keç û rast

**10.** (ت-ت)

[XEZEL 6]

*Fe'ilatun / Fe'ilatun / Fe'ilun*

1

Bide saqî meyê îro çep û rast

Bi îlhamê meyê îro çep û rast

2

Ûemê 'eşqê ku nabit bê mey û ney

Rîwayet ez meyê îro çep û rast

3

Şefayê mey dibit xem rengê ez dil

Bi şox im xaneyê îro çep û rast

4

Ûemdarê ji wê dil bûye sed ker

Şikîbayê deyê îro çep û rast

5

Ûeman dil kirîye cayê şadûmanî

Ji bin çûn kûçeyê îro çep û rast

5

Bibînin bulbul ji sewdayê belakêş

Fîxan û aheyê îro çep û rast

6

Ji Miksî Laxerî şeyda ye şahid

Meyê baqî deyê îro çep û rast

## 11. (ت-ت)

### [MUXEMMES 2]

*Fa'ilatun/Fa'ilatun/Fa'ilatun/Fa'ilun*

1

Husn û tefsîlê ne tê dê kî ye wê teqrîrî ket  
Bi qelem bêxte kitabê bi reqem defterî ket  
Bi feşahet key beyanê bi 'ilm zîwerî ket  
Bi qîyasê key mîşalê di libasê zerî ket  
Nayête şerh û beyanê ku debir tehrîrî ket

2

Ji cemala xwe hîcabê vekir û rojê hilat  
Perîya rengê ferîşteşenema leb ji nebat  
Bi Şemed sondê dixwem sermayeyê rûh û heyat  
Bi nefese 'Îsa ji wê îhya kirî 'ezm û rufat  
Ger nûmayed yekî engûşt cîhan dê kerî ket

3

Qe nizanim çi xeta dît ji min yarê yeqîn  
Wê bi guhdarî reqîban li me pur kîn e yeqîn  
Demekî dostê were û ji kerem ba me neşîn  
Hey bike murdeyê sed sale bi dîdarê vejîn  
Kes heye ma ji Xudê ra ku evê mehderî ket

4

Li meh û mîhrê şeveq daye ji zertacê serî  
Bi xusufê û kusufê girtine ba muşterî  
Perîya Qudsê libasê we ji rengê beşerî  
Dê durr û le'l û leb û xalê ji mişkê Teterî  
Dê bi şewkê serê zulfan me yeqîn ebterî ket

5

Bi helakên ji firaqê li me dil sed kerî kir  
Perîya şox û şepal sîne tejî xençerî kir

Bi du sed rengê ‘ezabê ku di nêv cîgerî kir  
Bi nîhan ateşî bû pêt û perengê qerî kir  
Kî bi vê zîlm û cefayê bi qele ber derî ket

6

Bi Xudê şahê sîtemkar e li textê sîtemê  
Ma li ‘ebdal û feqîran nezerê det bi demê  
Ku xerez qehre biket ew bi gedayane hemê  
Bê hesab xedr e li min kir û bi xezeb girtî rimê  
Li me da çûye hinavan cegerê min kerî ket

7

Laşerî emrê humayûn bi serim hatî çî kem  
Can ji min sîne dixwazit dil e dê wê jî bidem  
Belkê carek ew li halê me bipirsit ji kerem  
Nezerê ew li gedayan biketin şubhetê Cem  
Miksîya rabe ‘înayet bextê yarê mehrî ket

## 12. (ت-ت)

[XEZEL 7]

*Mef'ûlu / Mefâilu / Mefâilu / Fe'ûlun*

1

Ya Reb çi leîf zat e li min der nezerî hat

Ba 'eynê heqîqet bi çû mîrat û durrê hat

2

Dil birye ji min 'îşweşirînê bi şemaîl

Zerrînkemerê keçkulehê der muşterî hat

3

Xwahim binivîsim bi qelem şerhê cemalê

Ahê ji dilêm hat û we kulek bê serî hat<sup>18</sup>

4

Wek sohtî qelem dûdê nîhan 'eqlê nîhan bû

Êdî çi bikem laf û beyanê ji berî hat

5

Esrarê neyê dê ku biket huşê qîyasê

Herçendê ku ev cumle sema'ê di serî hat

6

Mexmûrê meyê husn û cemalê me çu Mecnûn

Leylâsîfetê mişlê neyê ew ku perî hat

7

Ey Laxerî şeyda ku di vê 'esrê çû Miksê

Aya bi şeca'et dil û can da ku zerî hat

## 13. (ت-ت)

<sup>18</sup> TÎD: Ahê ji dilêm hat û weh kulek bê serî hat

### [MUXEMMES 3]

*Mef'ûlu / Mefailun / Fe'ûlun*

1

Çîna ku bi muxnî û bi karest  
Neqşek ku reşandîye kenarest  
Bê şubhe li dil me yad karest  
Can kasteyê bi 'umrîya rast  
Feryadî dikem ji sozê narest

2

Efxan ji ateşê firaqê  
Sohtîme di hîsseyaya meraqê  
Gestîme bi ecderê heraqê  
Darûye ji le'l û lebê raqê  
Tiryaqê bide ji bo me karest

3

Gîsûyê çû marê reş bigestim  
Ev nîm û bi dabê zulfê bestim  
Mexmûrê ji kaseya elest im  
Kê em roz ji 'aqilê xwe xwestim  
Zahir ku me batîne veşarest

4

Bulbul te çî ye bi nal û efxan  
Hengame û xulxul û bi giryan  
Bi gul tu neşînî şubh û şaman  
Ney mişlê min î gûyîn û hîraman  
Daîm me ji yarê dilfikarest

5

Perwane eger çî dil dînîm e  
Bi yar yekê şem' e ew mûqîm e  
Canê xwe bi can didet ku dîme

Yar çendê disoji wey hekîm e  
Laşer di firaqê yarê zarest



14. (س-ث)

[XEZEL 8]

*Mef'ûlu / Mefâilu / Mefâilu / Fe'ûlun*

1

Îro elema dil ji firaqa te ye hadîş  
Şerha xem û derdê me telaqa te ye ba'îş

2

Carek ji Xudê ra tu firaqê bi telaqê  
Tebdîl bike dostê me ku şewqa te ye warîş

3

Min pur ji firaqa te di dil tîr û neşabin  
Xunê ji du çeşman vedirêjim çî ye ba'îş

4

Ma şem'ê wîsalê demekî şeb li me hilkey  
Dê kew bigrin cerhê meraqa te ye hadîş

5

Guhdarê reqîban meke dostê feramûş  
Ez behrê Xuda dostê bi dostê heye lamîş

6

Mecrûhê ji mizraqê reqîban tu dibînî  
Xûnabê dirêjin bikî jehrîye ye lawîş

7

Meqtûlê nebalê te ye Miksî di firaqê  
Carek nekirî dawa ji weşla xwe ye hadîş

15. (س-ع)

[MUXEMMES 4]

*Mef'ûlu / Mefâilu / Mefailu / Fe'ûlun*

1

Da me sed rengê 'ezabê û belayê xem û beş  
Bi hezar guneh 'îtabê û cefayê xem û beş  
Nekirî pursê li halê me bi bayê xem û beş  
Çi xeder bû li me kir şeh bi hewayê xem û beş  
Qe neanîne xeyalê bi edayê xem û beş

2

Te divê pursê bikî tu li esîranê firaq  
Bike seyrê demekî şahê li afaqê 'iraq  
Bi nezer bîne bi dîqet seh bike işraqê li taq  
Ji cefaya te mirin êdî çi şîrk e çi nîfaq  
Bes ke vê zîlm û 'îtabê û belayê xem û beş

3

Zulmekê pur pê xweş in ger bi me dî jehra hela  
Ji îta'et nekêşin ser bi cefayan û bela  
Lêke Barî bi 'înyet tu nezer de *bî fela*  
*Tey'esu'l- xeyre mînel-lhî bî qewlîn emela*<sup>19</sup>  
Ger çi danî me di nêv ateşhayê xem û beş

4

Dozex û cennet li min yeksan dibin ez lutfê yar  
Ger bipûşet gulê gulzar dibite xakê sar  
Cennetul Firdewsê dîn ez rûyê yar aşîkar  
Ku murad û weslê xwahîd destê ez axîyarê dar  
Qible dê yek bit ne du dil ra edayê xem û bes<sup>20</sup>

<sup>19</sup> Hêvîya xwe ji Xwedê nebirrin (Sûreya Yûsif, 12/87)

<sup>20</sup> Ev benda hanê di çapa Duskî û destxeta Mela Evdilmecîd da tune.

5

Miksîyê Laşer di nêv ateşê hecra te bisoxt  
Çehv û dîden wê bi emrê te ji exyarê bidoxt  
Her wekî perwaneyê wê can di rêya dînê firoxt  
Nagehan peykê qezayê ne'reyê zed ev çi got  
Bes bike tu ji vê meqalê purr şewaê xem û beş



**16.** (س-ث)

[XEZEL 9]

*Fa'ilatun/Fa'ilatun/ /Fa'ilun*

1

Wer temaşa carekî darê hudûş

Çi newa têtin ji dîwarê hudûş

2

Guh bide ber zîkr û awazê neyê

Ku bi qanûn tê ji dewwarê hudûş

3

‘Endelîban şî’r û qal e her mûdam

Wek tezerrû xweş û gulzarê hudûş

4

Tu bibîn weqtê sema tèn sorperî

Reqş û bazê wan çu şunqarê hudûş

5

Mûxnî û muṭrib bi çeng û nay û def

Saz diken îro di vê warê hudûş

6

Dil ji ḡerbê dilberan bû sed ker e

Merhemê naken ji dildarê hudûş

7

Tu meke behşê hudûşê ra bi kes

Şubḡ yarî nîne êvarê hudûş

8

‘Eynê jehrê qatil e nêv camê mey

Pê diken tecrube dîndarê hudûş

9

Ê bi vê ‘eynê fenayê dil bidet

Dê bibit ew dîn bi xeddarê hudûş

10

Yek ‘edîl in Һadiş û ‘eynê qedem

Ger nezer dî tu li esrarê Һudûş

11

Sirr û razê vê Һudûşê Һel diket

Ê te dil best e bi xeddarê Һudûş

12

Salikê weҺdetserayê Һey bi mey

Dil ne bende ew bi zûnnarê Һudûş

13

Laşerîyê Miksî bi wey ta key xurûr

Xudrehan ez destê mekkarê Һudûş

17. (س-ث)

[XEZEL 10] (bi erebî)\*

*Fa'ilatun/Fa'ilatun/Fa'ilatun /Fa'ilun*

لا مني نفس الهوى في حب من نعم الوراثة  
كادني قد أحرق شوقاً يراشد الغياث<sup>21</sup>

ذاقني كأس الملام ممزجا بالمسكرات  
تاليا عنى رأى أحلام الضغاث<sup>22</sup>

هدنى ميتا سوبيا منجزا عهدا وثاق  
غبت في بث القيام مغرما فيما يحاث<sup>23</sup>

يا نخيري مونساً رفقا ذليلا جانيا  
نجيني بالمنجز العهد الوفي المستغاث<sup>24</sup>

هاجر الخلال منى منذ رأوني مغرماً  
لاح روح الروح قى السر فواد لا يراث<sup>25</sup>

<sup>21</sup> Lewme kir l'min eşqa ruhê ku li evîna wê qenc bûme wêris  
Bi şewqa evîne hatim şewitîn nêzik bû hewar bigêhişte min

<sup>22</sup> Zewqê da min qedeha lewmê ku bi meyê bûye tevlihev  
Paşê dîtina xewn xeyalên tevlihev zahir bûn li min

<sup>23</sup> Gef li min xwar bi mirinê, sozê xwe bi teqez vebirî bi kirinê  
Noq bûm bi serxweşî di xubara qîyamê ku peyda bû l'min

<sup>24</sup> Ya zexîra min! Bibe hogir û dilovan ji bo min canî û zelîlê  
Min xelas bike bi soza pêkan û xwedî hawar e

<sup>25</sup> Terka min kirin dostan dema dîtî ku serxweşê îşqê me  
Di dilê bê wêris da razên rehetîya ruhê zahir bûye

حاوئى لوئ الهواء طار عقلى شغفا  
خرنى فى المصعقن كانت الناس يغاث<sup>26</sup>

أحرق الروح حرور شوق مكسى قاتلا  
يا غياث المثنغيثن فى الشداد الغياث<sup>27</sup>



---

<sup>26</sup> Alaya işqê li min alîya, evîna dijwar kir e'qil ji serê min firî  
Êxistim nav birûsklêketîyan, insan dihatin hawarî dikirin

<sup>27</sup> Dişewitand gîyan germaya evîna Mûksî wi wiha digot  
Ya hawara hewarkeran, di bobelatan da hawar û meded

*\*Veysi İnci ev helbest wergerandîye kurdî; spasîya wî dikim.*

18. ج-ع)

[XEZEL 11]

*Mef'ûlu / Mefailu / Mefailu / Fe'ûlun*

1

Saqî ji Xudê ra ku me mey xwar û şebê dac  
Rewşen li me ke wek şebê dîbaceyê mî'rac

2

Camê ji lebê nûşî peyapey li feqîran  
Bexşende bike xeyr û şewab e te me ra rac

3

Muştaqê meya nabe dilê pejmurdeyê rîş  
Camê bide saqî ji mey û abê ku recrac

4

Naçim bi kenîştan û derê dêr û mesacid  
Cuz meygedayê rind û xeraban ra bidem bac

5

Ez çûme gelek medreseyan qeç me nedî kes  
Ku dersê bide yane bixwûne 'işqê û minhac

6

Perwerdeyê pîrê ku mey û cam firoş im  
Ku ji xûb rûyê xwe bi me dan cam û meyê tac

7

Ustadê medares ku ji rêya rast kirim dûr  
Vê şeyxê muşan destê me girt û bi meyê wehhac

8

Ez birme di nêv bezmê melaêk xwey û sîret  
Go saqî bide bo vê esîrê camê wehhac

9

Seccade û sebhe me kirin rehnê zîyaret  
Laşer bibe tu şahidê Miksî di şebê dac

## 19. (ج-ع)

### [MUREBBE 1]

*Mefa'ilun / Mefa'ilun*

1

Çira sofi netê îman  
Di meyxanê biçî mî'rac  
Musilman be ji bo saqî  
Werin secde bi vê minhac

2

Şiraîte musteqîm ew bes  
Bi pîrê mustexaşan res  
Ji zuhdê 'abidê dil kes  
Vexwe mey dane ez sertac

3

Meya baqî bi muştaqî  
Vexwe raqê ji dest saqî  
Kemer dest bestê ya waqî  
Bi pêşî Azerê zertac

4

Li pêşber bût me bir secde  
Zunarê bermîyan bend e  
Hîcabî rakirin perde  
Numan mehtabê gerdên'ac

5

Numandin du keman yengê  
Kêşandin wê li ser cergê  
Xedeng erjengê şeb jengê  
Bişuştaxwînê ez dil zac

6

Bi zacê xwînê dil şeyqel  
Kirin Mîsrê û bê mesqel  
Kêşandî ber mehê cedwel  
Muselsel zulfê pur çîn û dac

7

Muselsel zulfê kakûl bûn  
Tejî misk û qerenfil bûn  
Bi xeṭaṭ û xalî filfil bûn  
Bi neqşê çînê bû emşac

8

Bi vê neqş û nîgarê Çîn  
Reyhan û sunbul û nesrîn  
Binevş û sosin û yasemîn  
Mu'aniq gerdenê wek 'ac

9

Mu'aniq destê gerden bûn  
Ṭewafa le'lê erzen bûn  
Hecac xal û hecerfen bûn  
Wekîlê Miksî Laxer hac

## 20. (ç-c)

### [MUREBBE 2]

*Mef'ûlu / Mefailun / Fe'ûlun*

1

Ev bende di 'îdê ger nebû hac  
Can daye bi destê wê bi tarac  
Wê kir seherê dilê me armanc  
Şed canfidayê dostê zertac

2

Her kes ku ji dostê 'eyd dared  
Sermayeyê weşlê şad dared  
Mî'badê wîsalê sûd dared  
Efraxîte wê seracê wehhac

3

Wê şem'ê şebê şemalê gerden  
Gulçehre dehan û xonçe erzen  
Wek sêb du nîm û lebşekerken  
'Uşşaqê bi qûtê can e muhtac

4

'Ebdalê di rojê 'eyd û hereman  
Ez bûm bi tenê di kuncê hicran  
Çeşmê me bi xwîn e dil bi giryan  
Vê narê firaqê kirme axac

5

Dozex ne mîşalê wê bisoje  
Ev narê mezin şexîr e doje(h)  
Kuffarê nedî mîşalê roj e  
'Aşiq ji cemalê 'işqê ewhac

6

Deryayê meweddetê bi coş hat  
Me'şûq ji der nîqabê pûş hat

Bê dil çû sehabê pur xurûş hat  
Şabaşê ewwel ku canê da bac

7

Perde ku ji rûyê yarê rabit  
‘Aşiq ji heyatê dê reha bit  
Hetta ve qêyametê nerabit  
Emma bi şehadetê di mî’rac

8

Miksî çi eger di ‘eyd û xwar e  
Miskîn û esîr û hicredar e  
Laşer me bes e şehîdê yar e  
Bûsek me bes e ji gerdena ‘ac

21. (ج-ع)

[MUREBBE 3]

*Mustef'îlun / Fa'ilun*

1

Ya Reb çi sor şîrîn e  
Ev serw û naz û xennac  
Xweş hûr û nazenîn e  
Gerden ji şoşeya 'ac

2

Qamet zerîf û mehbûb  
Asayîşê dil û dîn  
Mahê cemalê merxûb  
Her kes bi dîdenê hac

3

Gulçehre sîm û endam  
Sîretperî dilawêz  
'Aşiq bi *terfetu*'l- 'eyn<sup>28</sup>  
Sewda ne ev çi xennac

4

Bê dil ji qewsê ebrû  
Mecrûh e dil şikeste  
Nebalê xemzeyan pur  
Tên sîneyan ji ebrac

5

Her çi me dîtî kahî  
Çendan me kir nîgahî  
Xwundkar e padîşahî  
Canê didem bi tarac

---

<sup>28</sup> Aşiq çav diqurçîne.

6

Eswed şebîhê xalan  
Canê me bir bi talan  
Nî ev ji Hîndûyan tê  
Şehzade dê denê bac

7

Efxanî û Buxara  
Maçîn û Çîn û Dara  
Xercê diden bi can ra  
‘Er’er li bejnê dîbac

8

Tebrîz û Eşfehanî  
Şîraz û Ermeğanî  
Tînin bi ser nîhanî  
Der zîrê payê bi minhac

9

Miksî bi heqqê Qur’an  
Te’wîzê herz û canan  
Can ra bi baz û bend î  
Mezbûr ke bi medrac

## 22. (ç-h)

### [MUSTEZAD 1]

*Mef'ûlu / Mefâilu / Mefâilu / Fe'ûlun*

*Mef'ûlu / Fe'ûlun*

1

Da bende bi damê serê zulfa te sehergeh

Ku xwest ji me can rûh

Ma bo me dibit can û dilê direhtin xergeh

Dostem bistan rûh

2

Geh geh bi xeder dikirî barê kerîmê

Yarem tu keremkar

Şevqet bike carek me vexwîne bi herêmê

Mihman e me an rûh

3

Cisma di sera perdeyê ger çendî bimînit

Axir dê sefer ket

Bende ku eger baxwoy bi pêşî xwe ve înit

Çespan bider an rûh

4

Men bendeyê fermanberem ey şahê cihan yan

'Ebdalê vexwîne

Pêşî xwe muşerref me bike barî tu ey can

Hem canê cihan rûh

5

Sermayeyê çun dostê teleb kirye bidem zûd

'Umrê me bi ser çû

Bargahê sefer hatîye gûşê bi zened zûd

Xweş xweş tu deran rûh

6

Bê perde û rûpûş ji eywanê bimeş der  
Wer seyrê gulîstan  
Serwê sehî xemlîne nîhalê turre ‘er’er  
Bostanê rewan rûh

7

Herkes ji meyê le’l şekerlêbê te tê av  
Ez mame tenê têhnî  
Pêt û şewaîte cîgerem daye li berqan  
Buryanê geran rûh

8

Buryan kirim hîcr û firaqa te biraştim  
Xûrbet li me bar kir  
Nêv heps û cihê derd û xeman yarê gomaştam  
Zindanê xeman rûh

9

Miksî te tenê can bi xeman da di firaqê  
Laşer bi ciwanan  
Şeyxê me bi îrşadî çûye cayê ‘Iraqê  
Xûrbetkeşê man rûh

## 23. (ç-h)

[XEZEL 12]

*Mef'ûlu / Mefâilu / Fe'ûlun*

1

Xwîn rêhtinê 'aşiqan kî bah  
Kuştim te duhi bi xençer îdah

2

Seffak û qetîlê 'aşiqan î  
Mîsrî te kêşa li meqtelê lah

3

Meqtûlê di me'reka qetalê  
Hejmar me hezar û sed bi ermah

4

Yarim ku eger xerez te can e  
Perwane ye can te rû ye mîsbah

5

Şem'ê ruxê xod biker tecella  
Bêçare biden ji bo te erwah

6

Dil rame daye zulfê tu benda  
Ew nafeyê dil ji mîskê pur fah

7

Çîn girtîye muşkê tu seraser  
Ma Çînê diden xerac û erwah

8

Gîysûyê te ne payê bendê 'alem  
Seffak tu yî te qebûlê şah

9

Mîksî bi temennî ye şeb û rûz  
Ez destê te bit şehîdê ermah

## 24. (ç-h)

[XEZEI 13 ]

Mef'û lu /Fa i la tun/ Mef'û lu / Fa i la tun

1

Mestan û nazenîn î şûx û şepalê me rûh  
Xakanê kîşwerê dil her ca ji bo te meftûh

2

Sed Yusufê zeman î zîwer ji husnê ru'yet  
Tu canê cawîdan î sulţanê sîne meşrûh

3

Aşif weger Suleyman şed Xusrewan û Cemşîd  
Ser ber derê te danîn der bezmê koleyan rûh

4

Ey pîşewayê 'alem çerxê berîn ji bo Tûr  
Nêv keştê ger nebûya tufanê xerq dikir Nûh

5

Nedibû xelaş Xelîl e ez germenarê Nemrûd  
"Berden *selam*"<sup>e29</sup> Heq got nagahê geşte mefrûh

6

Ferdayê rojê meşser curm û nedametim pur  
Ummîdê ez tu Taha key tu şefa'atim rûh

7

Miksî ku kir perîşan kirne di roz û şevan  
Ruyê sîyahê dared lê kin ewî tu memdûh

---

<sup>29</sup> Jê ra hênîk û aram be (Enbîya 69).

25. (ç-x)

[MUXEMMES 5]

*Fa'ilatun / Fa'ilatun / Fa'ilatun / Fa'ilun*

1

Mujde da me nesîmê ji şepalê mehê rux  
Di sehergahê kerîmî bi wîsalê mehê rux  
Ji kuşad dil bû xerîmê di cemalê mehê rux  
Ji hesed sohtî reqîbê çu şemalê mehê rux  
Min dil perwaneyê şem'ê delal e mehê rux

2

Murxê dil kir ji kuşadê fir û perwazê huma  
Ji fereş şehperê hîmmet li serê sidr e nûma  
Soht dil canê reqîbê bi xem û derdê bi ma  
Perîya rûyî qemer ser ji hîcabê bi nûma  
Hazirê cezbeyê da dil ji cemala mehê rux

3

Ji kerem perde hilanî û me dîdarê bedît  
Mehê taban ji serê zulfê sîyeh lê bûne çît  
Ji xeyalê xemê buryan bi sema netrik û têt  
Bes tine helqe çeper 'eqrebê pur tabê 'ecêb  
'Eqdê îhramê girêdane ji yalê mehê rux

4

Ji xemê zulfê perîşan î nema şebr û qerar<sup>30</sup>  
Ji dil û sîne me çûn destê me ber gerdenê yar  
Di şebê 'eydê wîsalê ne xemî maye ne 'ar  
Xefletê nagehî xamûş kirim rû ve sitar  
Dil bir û can ma di bendanê xeyalê mehê rux

---

<sup>30</sup> ME, TÎD: Ji xemê zulfê perîşan im nema şebr û qerar

5

Perîya dêm bi nûr nar e weya nûr e cism  
Bi leţafet xwe şekerxa çî  ilism e çî ism  
Bi du zencîrê sîyeh  elqe girêdame resm  
Ger li ber quflê di zindanê kirim  eps bes im  
Bi me da cur'eyekî camê xeyalê mehê rux

6

Bi cunûnê me gelek taze û nûreste çinî  
Bû ji miskê perîya weslê cînanê medenî  
La erî bo negrî hîç kesê ins û cinî  
Kulbeyê baxê Qureysî bi nesîbê 'Eden î  
Miksîya serwê rewanê bi kemalê mehê rux

26. (ç-x)

[QESÎDE 4]

*Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun*

1

Şeba îro xeber anî ji ahûya şepal û şox  
Nesîmê da me mizgînî ku dê bêtin helatên tûx

2

Sehergeh min dî rast û çep xuya şahim bi şadî hat  
Sipahê pur giran şehbalê ber textê 'edalet çox

3

Cîhanabadê me'mûrî li textê selţenet rûnişt  
Xeyalim Mehdî ye min bûye zahir ew humayûn tûx

4

Eger Mehdî nîye kî dê di vê 'esrê 'edalet ket  
Cîhan der hem û pur aşûb şer û fitne muruwwet yox

5

Ji îhsan û kerem danî cîhan û kîşwer û teslîm  
Kusan ra leşker û halî nema kî dê biket ji ox

6

Nefes'Îsa û Loqman î şîfadarê hemû derdan  
Ku an dem wê birîn û cerh ku ji têtin 'edab û zox

7

Meke êdî ji bext û tali'ê şekwa ku xundkar im  
Kirim gosterde der rûyê zemîn mey daye şeyx û şox

8

Ji xanî dîr mebe Laşer ku Miksî xakê dergah e  
Qerîn û mehremê yar be xeyyarpûş be serkunkux

27. (ç-x)

[XEZEL 14]

*Mef'ûlu / Mefâilu / Mefâilu / Fe'ûlun*

1

Sed barê te kir zûlm e li min yarê sîtem çerx  
Yek barê nekir dost e li min karê kerem çerx

2

Bedkêş û cefa çûye kûhen kîn û neyar e  
Danîne di nêv sîne hezar xarê elem çerx

3

Xwînê vedirêjin ji dil û sîne hinavan  
Ser tîr û nîşabê ji kemandarê 'elem çerx

4

Cûbarê çira nîn çemenan eşkê di min bes  
Seyrab biken pê gul û gulzarê herem çerx

5

Vê carê kutubxaneyê derdan me teji kir  
Li xetmê kitabê nekuşa yarê qelem çerx

6

Ûemnameyê xetmê bikirim kîlkê ezel xast  
Der destê debîrê û ji ber karê qedem çerx

7

Axir bi xeman ser bi numa dîwaneyê Miksî  
Laşer bi xeman dostê wefadar î keşem çerx

28. (ç-x)

[XEZEL 15]

*Mef'ûlu / Mefâilu / Mefailu / Fe'ûlun*

1

Tîrek te li cergê me beyandî serê du şax  
Wek tîrê tuhemten li kêşanê perê bû ax

2

Şehzade bi xwe besmeleyê seyd û şikar gerd  
Keyber bikêşan ser bibire xweş birî kucax

3

Minnet ku ji bextê xwe me şakir di xerîbî  
Şeydê xwe kirim ser perîya Xosrewê nû kax

4

Seyqalê bi xwûna me ji nû wî daye şîrê  
Wê Xosrevê xûban ji ceger lê kirî bû zax

5

Guftar numa weqt e bes e êdî dereng e  
Gewher û xer û mûrê yek e qîymetxerê pûmax

6

Miksî me ji rengê te ye Laxer wekû teyrê  
Daîm di qefes bê xeber û xemxwarê çû ax

## 29. (d-d)

### [QESÎDE 5]

*Mef'ûlu / Mefailu / Mefailu / Fe'ûlun*

1

Ey namê tu heq rûzê ezel kirdî Muḥemmed  
Mezbûr e di Qur'anê reqem kirdî Muḥemmed

2

Tu eslê wucudê heme 'alem ji te peyda  
Barî ji te ra "lewlake"<sup>31</sup> fermûdî Muḥemmed

3

Can î û ne cism î û ji bo can ra heyat î  
Zerrek ji kemala te resûl bûdî Muḥemmed

4

Ey sedrê şefa'et ji tu ma umîdê mehder  
Der rojê qêyamet ku şeffî' bûdî Muḥemmed<sup>32</sup>

5

Destê me bigir û birehan me ji hesabê  
Feryadresê ummet î pujmerd î Muḥemmed

6

Meḥbûbê Xweda yî bi Xweda tu aşîna yî  
Meb'ussê li Meḥmûdê meqam ferdê Muḥemmed

7

Miksî me kuşa destê îradet ji meweddet  
Lazim bi meweddet bikirî hemdê Muḥemmed

---

<sup>31</sup> Tu nebûyayî

<sup>32</sup> ME, TÎD: Der rozê qêyamet ku şeffî' bûdî Muḥemmed

### 30. (ﻻ-ﻳ/ﻳ)

[TEXMÎS 1<sup>33</sup>]

*Mef'ûlu / Mefâilun / Mef'ûlu / Mefâilun*

1

Remzek ji nesîmê li çemen da û xweşî  
Rabû ji xewê sebze û şebnem diweşî  
Çendî xebitî dil ku biket seyr û neşî  
*“Nêrgîza mest û xeraman di sehergeh ku meşî  
Bişkiftî şîfetxunçe ji çara ereşî”*

2

Ûrên di beheştê û perî cumle cema tîn  
Zuhre reqîşî çeng û çexane bi xîna tîn  
Xulxul dikevîtin çemenan têk bi newa tîn  
*“Şîmşad bi meş sosin û sunbul bi sema tîn  
Ey serwê xiraman ku tu carek bimeşî”*

3

Çîn girtîye sirban ji seraser bi kef û kef  
Xwînê weh dirêjin ku li şûran cemidî kef  
Dunya bûye leylan ji lixaban diwerit kef  
*“Rom û ‘Ecemî girtîye oxilme bi şef şef  
Cohtê Moxulan hatine cengê Hebeşî”*

4

Weşfê di cemala te bû ewwel ku sebeq da  
Teşîn ji ustadê kelamê weh bi heq da  
Bawer ne meha bedrê bi enguştê du şeq da  
*“Wek zerre herê sîne ji mihra te şefeq da  
Bû şuhreya âfaqê bi xurşîdê weşî”*

5

---

<sup>33</sup> Ev texmîsa şî'rekî Melayê Cizîrî ye û tenê di destxeta Mela Evdilmecîd da heye.

Xal û nuqt û ‘enber û miskê te fişandî  
Yek nuqte nedî kes qelemê sehwe kişandî  
Kafûre kirî şefhe sewadê neqışandî  
*“Kê deste ji qudret weh kişandî weh reşandî  
Qewsê du hîlalan li beyazê bireşî”*

6

Hindî ku hebin xûb û zerif her di xemî ne  
Derxûnê ceger pareyê derd û elemî ne  
Wek şehde hebin da’i çi hacet qesemî ne  
*“Çendan te but û latê nîşarê qedemî ne  
‘Îcazê meke vê tu ji nesla Qereş î”*

7

Gazindê ji derd û eleman qet meke êdî  
Ev tali’ û bextê we mubarek te li kê dî?  
Meşûlê muradê me ji tîra bi çepê dî  
*“Ey dil ji kevanê helek exterme şehîd î  
Minnet ku tu exterme yî qewsê biweşî”*

8

Her gezme û awir ku ji çavên te bi kil hat  
Min sîne hedef da ber û yek yek ne bi tîl hat  
Ahek me nehişt şebr û sukûn bê tehemil hat  
*Derba cegerê bû ku me ev nale ji dil hat  
Ma ah û fixanan dikirit kes ji xweşî*

9

Bê keştî li ber behrê fîraqê erixîm ez  
Xewfek me hebû lew bi wîsalê perixîm ez  
Bîhnek ji wîsalê me bihîst û kerixîm ez  
*Wek tûle li pey mûçe li dorê çerixîm ez  
Çix kir me hebîbê go: Tu narî biqeşî*

10

Laxer di zemanê xwe di şî’rê tu ‘Ela yî  
Çendî te hebin daş û birîn têki bela yî

Rengîn î ji derd û eleman şubhê Wela yî  
*“Ellaħ çî tîbî’etbeşer î xwe ne Mela yî  
Vê cewr û cefayê tu peyapey dikeşî”*



## ENCAM

Yek ji mîrektîyên Kurdistanê ya ku bi çend sedsalan dewam kirîye û ku hê jî şûnmîrektîya xwe didomîne Mîrektîya Miksê ye. Di rêveberî û civaksazîya xwe da mîrektîyeke xurt û berfireh bûye. Di dema Osmanî û di serê sedsala bîstemîn da bi mîr û begên xwe ve di dîrokê da cihekî muhîm girtîye. Vê herêmê bi çend alîyan ve bala lêkolîneran kişandîye. Hêla ilm û edebîyatê yek ji van hêlan e. Wek ku tê zanîn, di heyama mîrektîyên Kurdistanê da ne tenê rêveberîya sîyasî ya biserûber derencamên serfirazîyê bi xwe ra anîne, her wisa vê desthilatdarîya xweser di pergala jîyana civakî û perwerdehîyê da jî kirîye ku gelek pêşketin û geşedanên berçav biqewimin û îstîqrar û xweşîyê bide wî mîletî.

Mîrektîya Miksê jî bi xêra vê pergala rêveberîyê bûye derfet ku li herêmê çand û edebîyateke xas bigeşide û daneheva ilm û irfanê pêk were. Medrese û tekya vebûne; alim, arif û şair gihiştine. Lewma jî ji huner, edebîyat, çand û zimên ra asoyên dorfireh û rêyên kêrhatî peyda bûne. Ji ber vê çendê jî ji herêmê gelek alim û helbestkarên ku li dû xwe şop, berhem, çîrok û peyrew hiştine û çûne, derketine. Feqîyê Teyran, Elîyê Teremaxî, Wedaî, Melayê Arwasî, Şefîk Arwasî, Hemzeyê Miksî; seyda û alimên Medreseya Mîr Hesenê Welî; şêx û meşayîxên terîqa neqşibendî ya ekola Erwasê çend mînakên sereke ne ku meriv dikare bide ber gotinê.

Wek çîrûskeke vê mîrateyê, Laxer jî wek alim û şairekî mutesewif ji vê herêmê ye. Ew di dawîya sedsala nozdemîn û di serê sedsala bîstemîn da jîyaye. Dora 66 salan umir kirîye û di sala 1927ê mîladî da wefat kirîye. Gora wî niha li gundê Zivistanîyê ye ku ev gund li ser Artemêt/Edremîta Wanê ye.

Wek kes û seyda, bi navê Mela Umerê Aşîq an jî Mela Umerê Tînîsîyê Miksî tê zanîn, bes lew ku di helbestên xwe da zêdetir mexlesa Laxer bi kar anîye, wek şair Laxer tê zanîn. Ew helbestvanekî klasîk e û temayên helbesta wî tesewîfî, dînî, evînî û siruştî ne. Ji gelek şairan binbandor bûye, lê belê ew zehftirîn di bin tesîra Melayê Cizîrî da maye. Gelek terkîb, hevoksazî û temayên helbesta wî dişibin ên Cizîrî. Lewma jî wî xwe mîna peyrewekî Melê dîtîye û rêya wî şopandîya.

Felaketên ku gelek berhemên ilmî, çandî û edebî yên kurmancî li ber xwe xistine û xisaret daye wan, zerereke mezin daye ya Laxer jî. Li ser gotina neviyê Laxer Mela Evdilmecîdê Tînîsiyê Miksî, ku hê jî li heyatê ye, bavê wî Mela Nûredîn bi havînekê Dîwan bi xwe ra birîye zozanan. Wê havînê baraneke gurr û xedar hatiye û çî heye daye ber xwe û di nav ava lehîyê da hiştîye. Mixabin ku dîwana Laxer jî di nava wan tiştan da bûye ku gelekî peritîye û êdî hew hatiye xwendin. Jê maye maye, ev her sih helbestên li ber destê me maye ku paşê ji aliyê kurê wî Mela Nûredîn ve ji nû ve hatiye nivîsîn, ku di nav destxetên li ber destê me da destxeta herî kevin jî ev e.

Merhaleye ewil a vê xebatê, xebata Tehsîn Îbrahîm Doskî û Huseyn Şemrexî bû ku bala me kêşand. Me dît ku ew şair ji Bakur e, bes ev xebat li Başûr bi herfên erebî hatiye weşandin û her wiha haya kesên Bakûr jê nîne. Piştî latînzekirina helbestan me ji arşîva malbatê destxetên helbestan jî peyda kirin. Me destxeta herî kevin ji xwe ra wek bingeş girt û yên dî dan ber vê liba kevintirîn. Me çî qas pirsîyar kir û em pê gerîyan jî, destxeta orjînal a helbestan ku ji Laxer bi xwe mabe, me nedît. Destxeta kevintirîn a kurê Laxer Mela Nûredîn bû. Ya duyem jî neviyê Laxer, yanê kurê Mela Nûredîn Mela Evdilmecîd bû. Piştî raberkirina van nusxeyan, em li ser sererastîya latîniya helbestan rawestîyan û da ku em kêmasî û xeletiyên xwe kêmbikin, me ji nû ve destxeta Mela Evdilmecîd bi birazîyê wî Seydayê Mela Eta da xwendin û teshîh kir. Paşê em derbasî tehlîl û dahûrandina helbestan bûn.

Bi xêra vê xebatê derket ber çavan ku Laxer bi bedewîya helbesta xwe di dîroka edebîyata kurdî da cihekî girîng heq kirîye. Di bikaranîna cuwankariyên edebî da şairekî serkeftî ye. Wî gelek mezmûn û motîfên hevpar ên helbesta cîhana Îslamî emilandine, lewma jî daye nîşan ku ew şairekî payebilind e û her wisa şarezayê ruh û şemalê helbesta klasîk e.

Nezelalîya li ser mexlesa Laxer careke din hatiye ronîkirin ku Laxer ne Xalid Axayê Zêbarî ye, bereks ew Mela Omerê Tînîsiyê Miksî ye. Texmîsa ku li ser nasnavê Laxer li ser xezeleke Melayê Cizîrî hatiye nivîsîn û di Şerha Gerdenîya Gewherî ya Mela Ehmedê Zivingî da jî hatiye weşandin a Mela Umerê Aşiq e ku di helbestên xwe da her daîm mexlesa Laxer bi kar anîye. Her wiha wî kêmban jî wek mexles, Miksî jî bi kar anîye.

Laxer şairekî pirziman e; ji bilî kurmancî bi erebî û farisî jî helbest nivîsandine. Di nav van her sih helbestên wî yên ku li ber destê me da ne, tenê yek farisî û yek jî erebî ye. Helbestên wî yên kurmancî jî gelekî di bin tesîra zimanên erebî û farisî da ne, lewra di helbestan da peyvên erebî û farisî pirr derbas dibin.

Helbestên ku di Dîwanê da ne, li gor rêza elîfbayê hatine nivîsîn. Ji karesata lehîyê tenê helbestên heta herfa dalê (ﺍ-ﺩ) hatine xilaskirin. Bi taybetî helbest bi herfên erebî hatine honandin. Bi herfên zimanê kurdî tenê bi herfa pe'yê (ﭘ-ﭘ) xezelek heye. Wî helbestên xwe li gor kêşeya erûzê ristine.

Ji celebên nezmê ku wî bi kar anîye kifş e ku ew beledê hunera helbesta klasîk e. Di Dîwanê da 15 xezel, 5 qesîde, 5 muxemmes, 3 murebbe, 1 texmîs û 1 mustezad hene. Tê dîtîn ku wî herî zêde celeba xezelê bi kar anîye.

Ji xwendin û dahûrandina helbestan me dît ku Laxer cih daye gelek unsûrên dînî, edebî û efsaneyî. Ji helbestên wî xuya dibe ku ew alimekî zana û asofireh bûye û wek şairekî ku haja wî ji seyra helbesta klasîk û mezmûnên wê hebûye, di dîroka edebîyata klasîk a kurdî da cihê xwe qewî kirîye.

## ÇAVKANÎ

Acar, H. (2016). *Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr*, İstanbul: Nûbihar.

----- (2016). Di Edebîyata Kurdî ya Klasîk da Farisînûsî: Nimûneya Wida'î, *e-Şarkiyat İlmî Araştırmalar Dergisi*, hej.1, 297-326, Dîroka Xwegihiştinê: 05.01.2019, <http://dergipark.gov.tr/sarkiat/issue/26985/283671>

Adak, A. (2014). *Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk*, (Çap 2). İstanbul: Nûbihar.

----- (2014) Di Edebîyata Kurdî ya Klasîk da Mesnewîyên Leyla û Mecnûnê, *Wêje û Rexne*, hej. 3, r. 99-119.

----- (2017) Serdema Xalidîtîyê di Tarîxa Edebîyata Kurdî ya klasik da, *Kürt Tarihi Dergisi*, 30, 591-64

Aydeniz, V. (2013). Kürdistan Dergisi Başyazarı Şefik Arwasi, *Kürt Tarihi Dergisi*, 9, 41-43

Bahçesaray İlçe Milli Eğitim Müdürlüğü. (2007). *Bahçesarayın Tarihçesi*. Dîroka Xwegihiştinê: 10.11. 1017, <http://bahcesaray.meb.gov.tr/www/tarihi/icerik/11>

Bedlîsî, Ş. (2007). *Şerefname, Dîroka Kurdistanê*, İstanbul: Avesta.

Beyaz, Ş. (2007). *Muzîka Serayê ya Kurdî*, İstanbul: Kom Muzik.

Bilgili, A. E. (2005). *Bir Yeryüzü Gezegeni, Bahçesarayda Tarih Toplum ve İnsan*, İstanbul: Şehir Yayınları.

Cihanî, P. (2013). *Şîroveya Mem û Zîna Ehmedê Xanî*, İstanbul: Nûbihar.

Ciwan, M. (1997). *Ahmedê Xanî (jîyan, berhem û bîr û bawerîyên wî)*, İstanbul: Doz.

Cizîrî, M. (?). *Dîwan*, İstanbul: Fırat Yayınları.

----- (2007) *Dîwan*, Arif Zêrevan (Transkripsiyon). Hewlêr: Aras.

Dilçin, C. (2009). *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, Ankara: TDK Yayınları.

Dêreşî, Seîd (2011). *Dîwana Feqîyê Teyran*, Dîyarbakır: Lis.

Doskî, T. Î., Şemrexî, H. (2011). *Perçeyek Ji dîwana Laxerî*, Duhok: Spîrêz.

Eagleton, T. (2011). *Şiir Nasıl Okunur*, Kaya Genç (çev.). İstanbul: Agorakitaplığı.

Epözdemir, Ş. (2015). *Medreseyên Kurdistanê*, İstanbul: Nûbihar.

Ergün, Z. (2014). *Bajar-Edebîyat û Cizîra Botan*, İstanbul: Nûbihar.

Gulnar, M. M. (2018) Dîsa Qesîdeyeke Feqîyê Teyran, *Nûbihar*, hej. 142, r. 88-89.

Hakan, S. (2002). *Müküs Kürt Beyleri Tarihi ve Han Mahmud*, İstanbul: Perî Yayınları.

Îcazetname, (1886). *Îcazetnameya Laxer*, Arşîva Mela Evdilmecîd

Jaba, A. (2000). *Çîrokên Kurmancî*, Stockholm: Weşanên Çanda Nûjen.

Kavak, A. (2014). Navendeke Edebîyata Kurdî: Miks, *Kovara Nûpelda* hej.14, r. 23-29.

Küleççi, N. (1999). *Açıklamalar ve Örneklerle Edebi Sanatlar*, Ankara: Akçağ yayınları.

Mewlana, (2017) Nefsa Ku Dibe Aşiq Êdî Emare Nabe, H. Acar (Wer). *Kovara Nûbiharê*, hej. 140, r. 38

Nursi, S. (2000). *Sözler*, İstanbul: Zehra.

Orbelî, Î. (2011). *Li Muksê Folklor û Jîyana Rojane*, Sinan Hakan (Amd.). İstanbul: Nûbihar.

Pala, İ. (2005) *Ansiklopedik Diwan Şiiri Sözlüğü*, İstanbul: Kapı Yayınları.

----- (2003) *Babil'de Ölüm İstanbul'da Aşk*, İstanbul: L&M Yayınları.

Sadinî, X. (2009). Warê Feyyê Teyran; Muks û Werezoz, *Kovara W*, hej.29, r. 54-55

----- (2014). *Feqîyê Teyran, Jîyan, Berhem û Helbestên Wî*, İstanbul: Nûbihar.

Sağniç, F. H. (2002). *Dîroka Wêjeya Kurdî*, İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.

Sezer, M. (2016). *Dîwanya Seyfîyê Şoşî*, Teza Mastirê ya neçapkirî. Mardin, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî.

Sunkur, İ. (2016). *Dîwana Weda'î (Beşa Farisî)*, Berhema Neçapkirî.

Taşkın, H. (2017, *Arşîva Sîpanî*, Dengê Mela Evdilmecîd. Wan: Nûbihar Komele

Uzun, M. (1995). Antolojîya Edebîyata Kurdî, c. 1, İstanbul: Tûmzamanlaryayıncılık.

Weda'î (2012). *Dîwan*, Seîd Dêreşî (amd.), İstanbul: Nûbihar.

Yıldırım, K. (2010). *Ehmedê Xanî, Mem û Zîn, Çeviri ve Kavramsal Tahlil*, İstanbul: Avesta.

----- (2013). *Tiba Melayê Erwasî*, Mardin, Mardin Artuklu Üniversitesi


Zeraq, D. (2005). *Ferhenga Biwêjan*, İstanbul: Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.

Zivingî, M. E. (2013). *Gerdenîya Gewherî (Şerha Dîwana Melayê Cizîrî)*, Emîn  
Narozi (wer.). İstanbul: Avesta.



# PÊVEK

## Pêvek 1



Wereqa pêşîn a destxeta Mela Nûredîne kurê Laxer

تیر از تیر گره بیا ندهد تیری در شاخ  
 و لایق بود توستی لیکشانی بوی به آخ  
 شهباز در جوی به سلسله صید از شاخ کرد  
 کبیر بیکشانی سر بود و خوشی بوی کو جاسخ  
 منت کوزنخی جوی ماه شکر و غریبی  
 صید و صوه کیم غریب را حشر وی کو جاسخ  
 سبغالی در خون آمد زوی و دایه غریبی  
 وی حشر وی خوبان ز جگر کی کو جاسخ  
 کف از عا و قند لبه ای در رنگه  
 کوه فر و موری یک تیت خری بیسج

مکتب مه گشت از لایق تیر لایق کو طیری  
 دایم در قفس خیر و غم خور و جواخ

ای عالم تو حق روزی از لایق محمد  
 مریب و در قفس ای رفیق محمد  
 تو اصل وجود هر عالمی از تیر پیدا  
 باری ز تر اولاد هر موی محمد  
 جانی و در جیبی ز تیر و جان لصابی  
 ز تیر کماله رسول سوی محمد  
 ای صد شفاعت ز تو ما امید مبدد  
 در روزی قیامت کو تیر و محمد  
 دینی و بگرو بر هاند ز جیبی  
 قرآن درسی آفت بزهری محمد  
 محبوب خدای ز خدا تو آشنای  
 معنویت محمد مقام هر وی محمد

مکتب مه گشت از لایق تیر لایق کو طیری  
 لایق بود توستی لیکشانی بوی به آخ

صلوات علی سیدنا محمد و آله و صحبه

Wereqa dawî ya destxeta Mela Nûredînê kurê Laxer

Pêvek 2



Gora Mela Umerê Aşiq (Laxer), Gundê Zivistanî, Artemêta Wanê

بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ وَبِسْتَعِينِ  
لِلْحَمْدِ لِلَّهِ الَّذِي جَعَلَ الْعُلَمَاءَ وَرِثَةَ الْأَنْبِيَاءِ فَلِذَا  
شَبَّهَ بِسِرَاجِ ظِلْمَاتِ الْجَهَنَّمَ وَنَجَّوْمِ الْأَهْتِدَاءِ وَ  
الضَّلُوعِ وَالسُّدَمِ عَلَى طُورِ التَّجَلِّيَاتِ الْأَحْسَابِيَّةِ  
وَعُرْوَسِ الْمَمْلُوكَةِ الرَّبَابِيَّةِ مُحَمَّدٍ مَظْهَرِ سِرِّ الْجُودِ الْخَرِيفِيِّ  
وَالْكَفَى أَنْ تَعِينِ الْوُجُودِ الْعُلُوقِ وَالسُّفَى  
وَعَلَى آلِهِ الْأَبْرَارِ وَصَحَابَتِهِ الْأَخْيَارِ وَبَعْدِ قَوْلِ  
الذَّلِيلِ الرَّاجِي عَفْوَ الْمَلِكِ الْجَلِيلِ بْنِ مَلَا عَبْدِ اللَّهِ  
الْمَكِّيِّ شُعْبَانَ الْحَقِيرِ الْعَلِيلِ الْمُقْتَدِرِ بِالْعُلَمَاءِ  
الْعَامِلِينَ الْمَاهِرِينَ وَالْخَادِمِ لِلْفِعْلِ الْعَارِفِينَ  
الْكَامِلِينَ لِمَا صَاحِبِنَا صَاحِبِ الطَّبَعِ الْجَلِيمِ وَ  
الْقَلْبِ السَّلِيمِ وَالصَّدَقِ الْعَمِيمِ جَعَلَهُ الرَّبُّ  
الْكَرِيمِ

Wereqa pêşîn a îcazetê ya ku Mela Umer di sala hîcrî 1304/mîladî 1886ê da standîye.

ووزرائه وامرئه ومن ولاة بشي من الاصور بحما  
اصلىت الخلفاء الراشدين برحمتك يا ارحم الراحمين  
اجرت المجاز وانا البعيد عن الاجازة لولا قدر  
ماض وحكم نفاذ الاحق من كل حقير والانقضى  
من النقيض والمظهير شعبان بن ملا عبد الله الملك  
القديم لهما ولجميع المسلمين برحمتك يا ارحم  
الراحمين والحمد لله رب العالمين  
اجت



قد وقع الفراغ من تسويد هذه الاجازة في كثر

ربيع الاول في يوم الاثنين

٢٨

١٣٢٤

Wereqa dawî ya îcazetê ya ku Mela Umer di sala hîcrî 1304/mîladî 1886ê da standîye.

T.C.  
MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ  
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ  
İNTİHAL RAPORU

Tez Başlığı: **DÎWANA LAXER/MELA UMERÊ AŞIQ (METN Ê LÊKOLÎN)**

Yukarıda başlığı gösterilen tez çalışmamın kapak sayfası, giriş, ana bölümler ve sonuç kısımlarında oluşan toplam 205 sayfalık kısmına ilişkin 15/02/2019 tarihinde tez danışmanım tarafından Turnitin adlı intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtrelemeler uygulanarak alınmış olan orijinallik raporuna göre, tezimin benzerlik oranı alıntılar dahil % 4

**Uygulanan Filtrelemeler:**

**Kaynakça hariç**

**Alıntılar dâhil**

**5 Kelimeden daha az örtüşme içeren metin kısımları hariç açıklamalar**

**Açıklamalar** Mardin Artuklu Üniversitesi Turnitin adlı intihal tespit programı sonucunda; azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içermediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Adı Soyadı: Hacı Yılmaz

Öğrenci No: 11711003

Tarih ve İmza

Programı: Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Statüsü: Yüksek Lisans

Danışman Onayı  
Onayı

A.B.D. Başkanı



T.C

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

**LAXER /MELA UMERÊ AŞIQ’IN DİVANI**

**(Metin-İnceleme)**

Hacı YILMAZ

11711003

Danışman

Doç. Dr. Hayrullah ACAR

Mardin 2019